



K. T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**DÎWANA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ
(GULCIVÎN)
-METN Û LÊKOLÎN-**

Nezir GÜMÜŞ

11711011

Şêwirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn 2019

K T

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tîrkiyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî
Teza Lîsansa Bilind

**DÎWANA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ
(GULCIVÎN)
-METN Ê LÊKOLÎN-**

Nezir GÜMÜŞ

11711011

Şêwirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn 2019

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “*Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî (Gulcivîn)-Metn û Lêkolîn-*” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

☐ Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

27.02.2019

Nezir GÜMÜŞ

QEBÛL Û PESENDKIRIN

Teza bi navê Dîwana *Mela Sîraceddînê Xelîlî (Gulcivîn) -Metn û Lêkolîn-* a ku ji aliyê Nezir Gümüş ve hatiye amadekirin û di tarîxa 16.01.2019an de di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de hatiye parastin û ji aliyê jûriya me ve wekî teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmza)

Doç. Dr. Hayrullah Acar

[Unvan, Nav û Paşnav] (Serok)

(îmza)

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

[Unvan, Nav û Paşnav] (Endam)

(îmza)

Dr. Öğr. Üyesi Osman Aslanoğlu

[Unvan, Nav û Paşnav] (Endam)

(îmza)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku Îmzayên jorîn ên endamên hîndekariyê yên navborî ne.

Îmza

Doç. Dr. Yunus CENGİZ

Rêvebirê Enstîtûyê

PÊŞGOTIN

Edebiyata Kurdî ya Klasîk dewlemend e. Lê belê ji aliyê xebatên akademîk ve îro Edebiyata Kurdî zêde hatiye îhmalkirin. Lewra heke em ji aliyê xebatên akademîk ve zimanê Kurdî bidin ber hinek zimanên roja me, pir hindik xebat li ser hatine kirin. Tevî ku ew qasî hatiye îhmalkirin jî gelek berhemên giranbiha heta îro hatine. Ne tenê îhmal, di ser de jî gelek caran hatiye qedexekirin, astengkirin û wêrankirin. Li dinyayê ji bo gelek zimanan, hêz û mesrefeke pir mezin tê xerckirin ku ev ziman û edebiyat bi pêş kevin û li ser lingê xwe bisekinin. Lêbelê di dîrokê de, zimanê Kurdî ev derfetên berfireh bi dest nexistine. Îro jî mixabin derfetên Ziman û Edebiyata Kurdî gelekî qels in.

Ziman û Edebiyata Kurdî tenê li ser milê xêrxwazên xwe maye. Êdî ku barê zimanekî, tenê mabe li ser milên xêrxwazên xwe, pêşveçûna wî zimanî pir zehmet e. Jixwe bi hezaran zimanên bi vî rengî heta roja me jî nehatine û di newalên kûr ên dîrokê de winda bûne. Zimanên ku heta îro mane jî, bi alîkariya tevger û saziyên siyasî û civakî jiyan xwe didomînin. Ji bo mînak di dîrokê de gelek caran mîr û serokan nivîsandina hinek zimanan teşwîq kirine û nivîskarên ku bi wan zimanan nivîsandine jî xelat kirine. Bi vî rengî hem aboriya nivîskaran baştir bûye û hem jî zanyaran wextê xwe bêhtir li ser edebiyat û ‘ilm û ‘irfanê bûrandine. Gelek caran zanyar û helbestvanên wiha di qesr û eywanên mîr û began de jiyan xwe derbas kirine û mîr û emîran jî wezîr û gizîrên xwe ji van insanan hilbijartine. Êdî van saziyên fermî pêşvebirina zimanan bileztir kirine.

Belkî ji bo Kurdî hinek saziyên piçûk hatibin vekirin jî lê bi rastî li gorî hijmara gelê Kurd û rewşa Kurdî ev pir hindik in. Ji ber vê yekê îro jî bo Edebiyata Kurdî mirov nikare tespîteke bi rêk û pêk bike. Lewra em baş nizanin ku çi qas berhemên Edebiyata Kurdî hene. Ku îro di coxrafyaya Kurdistan de xebateke berfireh were destpêkirin, dibe ku di demeke kin de gelek berhemên ku nayên zanîn, derkevin holê. Mixabin qada ziman û Edebiyata Kurdî ev qasî beyar e. Lewra îro gelek berhemên ku nivîskarên wan di sedsala me de jiyan xwe derbas kirine jî hene, lêbelê haya tu kesî ji wan nîn e.

Mela Sîraceddînê Xelîlî jî yek ji wan helbestvanan e ku li ser wî pir kêr xebat hatine kirin. Îro gelek hemsal û hemdemên wî hê jî li jiyane ne. Lêbelê ew bi xwe jî û berhemên wî jî baş nayên naskirin. Di derheqê jiyana û berhemên wî de pir agahî nînin. Em bi vê hişmendiye bi rê ketin û me xwest ku em li ser berhemeke bi vî rengî lêkolînekê bikin û wê, ji newalên kûr û tarî derxine ber ronahiyê. Mela Sîraceddînê Xelîlî di sedsala XXan de jiyan xwe derbas kiriye ku îro tevî hermeta wî û kurê wî gelek merivên wî hê li jiyane ne.

Xebata me ji sê beşan pêk tê. Beşa yekem li ser du binbeşan hatiye avakirin. Ewî em li ser hemû jiyan wî sekinîne. Di vê beşê de me cih daye jidayîkbûn, malbat û eşîra wî û em li ser perwerdeya wî û jiyan wî ya li derdora herêma Cizîrê sekinîne. Piştî jî me berhemên wî dane naskirin. Ji xeynî van, di vê beşê de me cih daye kesayetiya helbestvan û zimanê diwanê. Pêşiyê em li ser kesayetiya wî ya

edebî, ‘ilmî û hunerî sekinîne û paşî jî me zimanê dîwanê ji gelek aliyan ve nîrxandiye.

Di beşa duyem de metin ji aliyê şeklî û naverokê ve hatiye lêkolînkirin. Di vê beşê de em li ser “danasîna dîwanê û nusxeyên wê”, “şekl û cureyên nezmê”, “wezn”, “qafiye” û “redîf”ê sekinîne. Li vê derê jî bo zelalkirina hinek mijaran, me cih daye hinek tablo û grafîkan jî. Di heman demê de me cih daye hunerên edebî yên sereke ku di dîwanê de cih girtine. Di dawiya beşa duyem de me kesayetiyên edebî ku li ser Mela Sîraceddînê Xelîlî tesîr kirine, bi cih kirin.

Di beşa sêyem de me cih daye metnê dîwanê yê bi tenqîd.

Bi baweriya me dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî, berhemeke giranbiha ye. Ji ber vê yekê di prosesa xebatê de hewceyiya min bi alîkariya gelek insanên hêja çêbû. Wan jî di vê mijarê de texsîr nekirin. Di destpêkê de şewirmendê min ê tezê birêz mamoste Abdurrahman Adak gelekî bi min re betilî. Di pêvajoya nivîsandina tezê de barekî gelekî giran ji ser milê min rakir. Ez gelekî jê re spas dikim. Piştî jî hevalê min ê hêja mamosteyê edebiyatê Kasım Karaca di hemî pêvajoya tezê de, bi taybetî di mijara erûzê de alîkariya xwe ji ser min qut nekir. Kurê Seyda Mela Sîraceddînê Xelîlî birêz M. Vehbî Ataç jî di derbarê jiyan û danasîna bavê xwe de ji bo me bû alîkar. Birayê Mela Sîraceddînê Xelîlî birêz Mela Abdullah Ataç jî gelekî ji bo me alîkarî kir û exlebe ji bo jiyana Mela Sîraceddîn gelekî agahiyên girîng dane me. Ji bo wergera qismên ‘Erebî bi taybetî Seyda Mela Tahir Babür û hevalê min Îlyas Aslanhan alîkariyên xwe ji me re pêşkêş kirin. Ji bo wergera qismên Farisî jî, ji Urmîyê Walî Bedelpûr alîkariya me kir. Ez ji wan re jî gelekî spas dikim.

Nezir GÜMÜŞ

Mêrdîn 2019

KURTE
DÎWANA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ
METN Û LÊKOLÎN

Nezir Gümüş

Mela Sîraceddînê Xelîlî, di sala 1930î de hatiye dinyayê û di sala 1983yan de çûye ser dilovaniya xwe. Di van salan de Edebiyata Kurdî ya Klasîk hêdî hêdî qels dibû. Ya rast gelek nûnerên Edebiyata Klasîk di vê qadê de berhemên giranbiha pêk tanîn. Lêbelê; rewşa siyasî û civakî hêdî hêdî pêşiya Edebiyata Kurdî digirt. Mela Sîraceddînê Xelîlî; wekî Cegerxwîn, Seyîd Eliyê Findikî û Seydayê Tîrêj ku di vê sedsalê de berhemên hêja nivîsîne, careke dî ruh û can dida helbesta klasîk. Lewra êdî navendeke çand û ‘ilmê nemabû ku vê edebiyatê li ser lingan bisekinîne.

Xebata me ya bi navê “Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî (Gulcivîn) Metn û Lêkolîn; ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de bi gelemperî li ser jiyana wî hatiye sekinîn û berhemên wî hatine danasîn. Di beşa duyem de şexsiyeta wî ya edebî û zimanê helbestê hatiye nîrxandin û dîwan ji aliyê teşeyê ve bi hûrgilî hatiye lêkolînkirin. Di beşa sêyem de jî metnê dîwanê yê bi tenqîd cih girtiye.

Di transkrîpsiyona metnê de, ji bo tîpên ‘Erebî ku di Alfabe ya Kurdî de nîn in, tîpên transkrîpsiyona navnetewî, hatine bikaranîn. Mela Sîraceddînê Xelîlî, li gorî asta berhemên sedsala xwe, dîwaneke serkeftî pêk aniye. Di helbestên xwe de gelek qalibên wezna ‘erûzê bi serfîrazî bi kar anîne. Di helbestên wî de qusûrên ‘erûzê ew qasî kêmtir in ku mirov dikare bêje ‘erûza wî bêqusûr e. Di helbestên wî de aheng û lihevhatina dîwan, xwe baş nîşan dide. Di dîwana xwe de gelekî cih daye peyvên ‘Erebî û Farisî; lêbelê ji ber ku ev peyv di zimanê civakê de jî pir belav in, di fêhmkirina helbestan de zehmetiyê dernaxin. Helbestvan ji bo ku hunera xwe di zimên de nîşan bide, di dîwana xwe de bi çar zimanan (Kurdî, ‘Erebî, Farisî û Tirkî) helbest nivîsîne. Jixwe helbestên ku bi zimanê zikmakî ango bi Kurdî hatine nivîsîn ji yên dî gelekî zêdetir in. Ji xeynî van, di dîwanê de hindik be jî; mulemme’ên bi Kurdî-‘Erebî, bi Kurdî-Farisî û bi Kurdî-‘Erebî-Farisî jî hene. Bi qasî ku em ji helbestên wî fêhm dikin bi ‘Erebî û Farisî baş dizane; lêbelê ji du helbestên wî yên ku bi Tirkî nivîsîne, em fêhm dikin ku di zimanê Tirkî de gelekî qels maye.

Peyvên Sereke

Mela Sîraceddînê Xelîlî, Gulcivîn, Melayê Cizîrî, Şêx Muhemmed Nurullahê Cizîrî, Şêx Seyda, Loqmanê Hekîm, Cizîr Şêx Beşîrê Xelîlî.

ÖZET

MOLLA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ DÎVANI

METİN VE İNCELEME

Nezir Gümüş

Mela Sîraceddînê Xelîlî, 1930 yılında dünyaya gelmiş ve 1983'te hayata gözlerini yummuştur. Bu yıllarda, Klasik Kürt Edebiyatı duraklama dönemine girmişti. Aslında Klasik Edebiyatın birçok temsilcisi bu alanda değerli ürünler vermeye devam ediyordu; ama siyasi ve sosyal şartlar Kürt Edebiyatının ilerlemesini yavaşlatmaya hatta durdurmaya başlamıştı. Mela Sîraceddînê Xelîlî; bu dönemde eser veren Cegerxwîn, Seyîd Eliyê Findikî ve Seydayê Tîrêj gibi şairlerle Klasik Kürt Edebiyatını ayakta tutuyor ve ortaya koyduğu eserlerle adeta Klasik Şiire yeniden hayat veriyordu. Çünkü artık bu edebiyatı besleyecek önemli bir ilim ve kültür merkezi kalmamıştı.

Mela Sîraceddînê Xelîlî divanı (Gulcivîn) inceleme ve metin ve adlı bu çalışmamız, üç bölümden oluşmuştur. Birinci bölümde, genel hatlarıyla şairin hayatı üzerinde durularak eserleri tanıtılmış, edebi kişiliği ve şiirlerinde kullandığı dil üzerinde durulmuştur. İkinci bölümde, divan, şekil bakımından etraflıca incelenmiştir. Üçüncü bölümde ise tenkitli divan metni yer almıştır.

Divan metninin transkripsiyonunda, Kürt Alfabesinde karşılığı olmayan Arap harfleri için, uluslararası transkripsiyon harfleri kullanılmıştır. Mela Sîraceddînê Xelîlî, yaşadığı döneme göre edebi değeri yüksek bir divan ortaya koymuştur. Şiirlerinde aruz vezninin birçok kalıbını başarıyla kullanmıştır. Şiirlerindeki aruz kusurları yok denecek kadar azdır. Şiirlerinde sade ve anlaşılır bir dil kullanmıştır. Şiirlerinde ses uyumu ve ahenk üst seviyededir. Divanında Arapça ve Farsça kelimelere çokça yer vermiştir; ama bu kelimeler genelde halk dilinde de kullanılan ve şiirin anlaşılmasına engel teşkil eden kelimeler değildir. Şair dildeki maharetini göstermek için divanında dört dilde de (Kürtçe, Arapça, Farsça ve Türkçe) mülemmalar yazmıştır. Elbette anadili olan Kürtçe yazılmış şiirler açık ara öndedir. Bunun dışında divanında az da olsa Kürtçe-Arapça, Kürtçe-Farsça, Kürtçe-Arapça-Farsça karışık yazdığı şiirler de vardır. Şiirlerden anladığımız kadarıyla iyi derecede Arapça ve Farsça bilmektedir. Ama Türkçe yazdığı iki şiirden, Türkçesinin çok zayıf kaldığını söyleyebiliriz.

Anahtar Kelimeler

Mela Sîraceddînê Xelîlî, Gulcivîn, Melayê Cizîrî, Şêx Muhemmed Nurullahê Cizîrî, Şêx Seyda, Loqmanê Hekîm, Cizîr Şêx Beşîrê Xelîlî.

SUMMARY

MULLAH SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ'S DÎWAN

TEXT AND ANALYSING

Nezir Gümüş

Mullah Sîraceddînê Xelîlî was born in 1930, and departed this life in 1983. In these years, Classical Kurdish Literature entered the period of stagnation. In fact, many representative of Classical Literature were going on giving valuable product; but political and social condition started to slow down, even stop the improvement of Kurdish Literature. Mullah Sîraceddînê Xelîlî was keeping alive the Classical Kurdish Literature with the poets who produced works in this period like Cegerxwîn, Seyîd Eliyê Findikî and Seydayê Tîrêj; and was virtually giving life to classical poem with the words he produced. Because there weren't any important science and cultural centers left to maintain this literature.

Our this work named diwan, text and analysis of Mullah Sîraceddînê Xelîlî consists of three chapters. The first chapter lays emphasis on the life of the poet roughly and his works are introduced and also his literary personality and the language that he used in this poems. In the second chapter, diwan is examined in terms of structure thoroughly. And in the third chapter, there is a critical diwan text.

In the transcription of the diwan text, for the Arabic letters whose equivalence don't exist in Kurdish alphabet, international transcription letters were used. Mullah Sîraceddînê Xelîlî presented a diwan which had high literary value compared to the period in which he lived. He used many format of aruz prosody successfully in this poems. Aruz faults in his poems are almost nonexistent. He used plain and understandable language. Euphony and harmony are at a high level. He gave place to Arabic and Persian words quite often, but these words are the words which were used in the folk speech and didn't pose an obstacle to understand the poem. The poet wrote poems in four languages (Kurdish, Arabic, Persian and Turkish) to show his talent in his diwan. Of course, Kurdish, which is his mother tongue, poems are well ahead. Apart from these, there are poems mixed Kurdish-Arabic, Kurdish-Persian, Kurdish-Arabic-Persian even if just a pinch. As far as we understand from the poems, he knew Arabic and Persian very well. But, we can say that his Turkish was weak when we look at his two Turkish poems.

Keywords

Mela Sîraceddînê Xelîlî, Gulcivîn, Melayê Cizîrî, Şêx Muhemmed Nurullahê Cizîrî, Şêx Seyda, Loqmanê Hekîm, Cizîr Şêx Beşîrê Xelîlî.

NAVEROK

PÊŞGOTIN	IV
NAVEROK	IX
LÎSTEYA TABLO, GRAFÎK Û PÊVEKAN	XIII
TABLO	XIII
GRAFÎK	XIII
PÊVEK	XIII
KURTEBÊJE	XV
DESTPÊK	1
GIRÎNGÎ, ARMANC, ÇARÇOVE, RÊBAZ Û ÇAVKANIYÊN MIJARÊ	1
1. Girîngî û Armanc	1
2. Çarçove	1
3. Rêbaz	2
4. Çavkanî	2
BEŞA YEKEM	3
JIYAN Û BERHEMÊN MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎÎ	3
1. SERDEMA KU MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎÎ TÊ DE JIYAYE	3
2. JIYANA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎÎ	5
2.1. Nav û Mexlesa Wî	6
2.2. Jidayîkbûn û Zaroktiya Wî	10
2.3. Malbata Wî	10
2.4. Gund û ‘Eşîreta Wî	10
2.5. Perwerdeya Wî	11
2.6. Melatiya Wî	11
2.7. Terîqeta wî	12
3. BERHEMÊN MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎÎ	14
3.1. Yê ku Gihane Me	14
3.1.1. Gulcivîn (Dîwan)	14
3.1.2. Durra Birincî (Mewlûda Kurmancî)	14

3.1.3. Şîretên Hekîm Loqman	15
3.2. Ya ku Negihaye me	15
3.2.1. Gulbihara Kurdan	15
BEŞA DUYEM	16
VEKOLÎNA DÎWANA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ	16
2.1. DANASÎNA GIŞTÎ YA DÎWANA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ	16
2. 2. ZIMANÊ DÎWANÊ	17
2.2.1. Taybetiyên Devoka Torê	18
2.2.2. Taybetiyên Devoka Botan	21
2.3. Peyvên Kurdî Yê Resen	21
2.4. Biwêj û Gotinên Pêşîyan ku di Dîwanê de Hatine Bikaranîn	22
2.5. Unsûrên ‘Erebî, Farisî û Tirkî	23
2.5.1. Unsûrên ‘Erebî	23
2.5.2. Unsûrên Farisî	30
2.5.3. Unsûrên Tirkî	32
2.3. TEŞEYÊN NEZMÊ	33
2.3.1. Qesîde	35
2.3.2. Xezel	36
2.3.3. Mustezad	38
2.3.4. Murebbe ‘	38
2.3.5. Muxemmes	39
2.3.6. Qit’e	39
2.3.7. Mesnewî	40
2.3.8. Teştîr	40
2.3.9. Texmîs	41
2.3.10. Museddes	41
2.3.11. Li meqamê şeran	42
2.4. WEZN, QAFIYE, REDÎF	43
2.4.1. Wezn	43
2.4.1.1. Îmale	45
2.4.1.2. Med	45
2.4.1.3. Zîhaf	46

2.4.1.4. Wesl	47
2.4.2. Qafiye	48
2.4.3. Redîf.....	49
2.4.3.1.Redîfên ku di halê qertafan de ne	50
2.4.3.2.Redîfên ku di halê qertaf û bêje an kombêjeyan de ne	51
2.4.3.3.Redîfên ku di halê bêje an kombêjeyan de ne	51
2.5. HUNERÊN EDEBÎ.....	52
2.5.1. Telmîh.....	52
2.5.2. Tekrîr	54
2.5.3. Cînas	56
2.5.4. Tewriye	57
2.5.5. Tenasub.....	58
2.5.6. Teşbih.....	58
2.5.7. Tezad.....	59
2.5.8. Întaq	60
2.5.9. Aqrostîş.....	61
2.6. CUREYÊN EDEBÎ.....	64
2.6.1. Medhiye	64
2.6.2. Hicwiye	65
2.6.3. Mersiye	67
2.6.4. Bihariye.....	68
2.6.5. Şîtaiye	72
2.6.6. Remezaniye.....	76
2.6.7. Ne't	79
2.6.8. Munaceat.....	80
2.6. HIN TEMAYÊN DÎ YÊN DI DÎWANÊ DE.....	81
2.6.1. Hikmet.....	81
2.6.2. We'z û Nesîhet.....	81
2.6.3. Tewazu'	83
2.6.4. Dostanî:	83
2.7. PÊWENDIYA XELÎLÎ BI TRADÎSYONA EDEBÎ YA KURDÎ RE.....	84
5.1.Melayê Cizîrî.....	84

5.2.Ehmedê Xanî	86
BEŞA SÊYEMÎN.....	88
METNÊ DÎWANÊ YÊ REXNEYÎ.....	88
3.1.DANASÎNA NUSXEYÊN DÎWANÊ	88
3.1.1. Nusxeyên Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî	88
3.1.2. Tewsîfa Nusxeya Destnivîs ya Dîwana Xelîlî.....	88
3.1.2.Danasîna Çapên Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî	89
3.1.2.1.Danasîna Çapa Tehsîn Îbrahîm Doskî	89
3.2. DI AMADEKIRINA METNÊ DÎWANÊ DE RÊBAZA KU HATIYE	
ŞOPANDIN	91
3.3. METNÊ DÎWANÊ.....	94
KITABA GULCIVÎN	94
ENCAM	306
ÇAVKANÎ	307
PÊVEK.....	310

LÎSTEYA TABLO, GRAFÎK û PÊVEKAN TABLO

Tablo 1: Tabloya qesîdeyan û hijmara malikên wan.

Tablo 2: Tabloya xezelan û hijmara malikên wan.

Tablo 3: Tabloya murebe'an û hijmara malikên wan.

Tablo 4: Tabloya muxemmesan û hijmara malikên wan.

Tablo 5: Tabloya qit'eyan û hijmara malikên wan.

Tablo 6: Tabloya mesnewiyan û hijmara malikên wan.

Tablo 7: Tabloya testîran û hijmara malikên wan.

Tablo 8: Tabloya texmîsan û hijmara malikên wan.

Tablo 9: Tabloya ku qalib û behrên erûzê nîşan dide.

GRAFÎK

Grafîk 1: Grafîka ku rêjeya bikaranîna mexlesan nîşan dide.

Grafîk 2: Grafîka ku rêjeya cureyên helbestan nîşan dide.

Grafîk 3: Grafîka ku rêjeya behrên erûzê nîşan dide.

PÊVEK

Pêvek 1: Sûretê Mela Sîraceddînê Xelîlî (1)

Pêvek 2: Sûretê Mela Sîraceddînê Xelîlî (2)

Pêvek 3: Sûretê Kêla tirba Mela Sîraceddînê Xelîlî

Pêvek 4: Sûretê tirba Mela Sîraceddînê Xelîlî (1)

Pêvek 5: Sûretê tirba Mela Sîraceddînê Xelîlî (2)

Pêvek 6: NUSXEYA DESTXET YA Dîwana Mela Sîrac (MUSTENSIX: Mela Ebdullahê Dêrgulî)

Pêvek 7: NUSXEYA DESTXET YA Dîwana Mela Sîrac (MUSTENSIX: Mela Ebdullahê Dêrgulî)

Pêvek 8: NUSXEYA DESTXET YA Dîwana Mela Sîrac (MUSTENSIX: Mela Ebdullahê Dêrgulî)

Pêvek 9: NUSXEYA DESTXET ya Mewlûda Mela Sîrac (MUSTENSIX: Mela Sîrac)

Pêvek 10: NUSXEYA DESTXET ya Mewlûda Mela Sîrac (MUSTENSIX: Mela Sîrac)

Pêvek 11: NUSXEYA DESTXET ya Şîretên Hekîm Loqman ya Mela Sîrac (MUSTENSIX: Mela Ebdullahê Dêrgulî)

Pêvek 12: NUSXEYA DESTXET ya Şîretên Hekîm Loqman ya Mela Sîrac (MUSTENSIX: Mela Ebdullahê Dêrgulî)

Pêvek 13: NUSXEYA DESTXET YA Eqîda Îmanê ya Mela Sîrac (MUSTENSIX: Mela Sîrac)

Pêvek 14: NUSXEYA DESTXET YA Eqîda Îmanê ya Mela Sîrac (MUSTENSIX: Mela Sîrac)

Pêvek 15: NUSXEYA DESTXET YA Dîwana Melayê Cizîrî (MUSTENSIX: Mela Sîrac)

Pêvek 16: NUSXEYA DESTXET YA Dîwana Melayê Cizîrî (MUSTENSIX: Mela Sîrac)

KURTEBÊJE

amd.	:Amadekar
bnr.	:Binêrin
c.	:Cild
ç.	:Çap
h. b.	:Heman berhem
hwd.	:Her wekî din
j.	:Jimare
w.	:Weladeta wî/wê
m.	:Mirina wî/wê
r.	:Rûpel
wer.	:Werger
Mld.	:Mîladî
s.e.w.	:Selelahû eleyhî wesellem
e.s.	:Eleyhîssalam
r.e.	:Radiyahellahu enhum
b.n.b.	:Berhema navborî
Tîd	:Tehsîn Îbrahîm Doskî

DESTPÊK

GIRÎNGÎ, ARMANC, ÇARÇOVE, RÊBAZ Û ÇAVKANIYÊN MIJARÊ

Mijara vê tezê edîsyon krîtîka Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî (Gulcivîn) û analîza wê ya edebî ye. Li jêrê em ê cih bidin girîngî, armanc, çarçove, rêbaz û çavkaniyên vê mijarê.

1. Girîngî û Armanc

Heta roja me, ev berhem bi tîpên latînî nehatiye çapkirin û bi qasî ku em dizanin tu lêkolîn jî li serê nehatine kirin. Ji ber vê yekê em di wê baweriyê de ne ku ev xebateke girîng e. Çawa tê zanîn piraniya Kurdên Tirkiyeyê bi tîpên Kurdî-Erebî nizanin û ji ber vê jî ji xwendina berhemên Kurdî yên ku bi alfabeya Kurdî-Erebî hatine nivîsîn mehrûm dimînin. Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî jî berhemeke wisa ye. Ji ber vê yekê jî dîwana wî heta niha di tarîtiyê de mabû. Bi vê xebatê ev berhem wê bi xwendevanên xwe re hemhal bibe û di nav akademiya Kurdî de dê cihê xwe bigire. Îro gelek berhemên Kurdî yên destxet hene ku nehatine çapkirin. Gelek berhem hene ku haya tu kesî ji wan nîn e. Bêguman dîtina berhemên weha û çapkirina wan gelekî girîng e. Ji ber vê yekê em jî çapkirina vê berhema Mela Sîraceddînê Xelîlî hêja û girîng dibînin.

Em bawer dikin ku ev berhem ji hinek taybetiyên xwe ve gelekî balkêş e. Lewra ji aliyê edebî ve dîwaneke klasîk a serkeftî ye. Ev jî girîngiya mijarê zêdetir dike.

Armanca me jî vê tezê ew e ku em dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî bi awayekî akademîk vekolin û pêşkêşî cîhana edebiyata Kurdî bikin. Em dikarin bibêjin ku edebiyata Kurdî ya klasîk di sedsala me de jî bi awayekî serkeftî hebûna xwe domandiye. Armanceke me jî ew e ku em dîwaneke ku di vê sedsalê de hatiye nivîsîn derxin meydanê.

2. Çarçove

Çarçoveya teza me bi giştî Mela Sîraceddînê Xelîlî û dîwana wî ye. Di tezê de serdem, jiyan û berhemên Mela Sîraceddînê Xelîlî; herweha metnê dîwana wî digel analîza edebî cih digire. Eger em bi hûrgulî li naveroka xebatê binêrin, xebat ji destpêkek, sê beş, encam û pêvekan pêk tê. Di destpêkê de em li ser girîngî, armanc, çarçove, rêbaz û çavkaniyên xebatê sekinîne. Di beşa yekem de em li ser jiyan û berhemên Xelîlî sekinîne. Di beşa duyem de jî me cih daye vekolîna dîwanê ji aliyê şeklî ve. Di beşa sêyem de jî me cih daye metnê dîwanê yê bi tenqîd. Di pey metnê re me encamek nivîsiye. Di dawiyê de jî me cih daye hinek pêvekan.

3. Rêbaz

Di destpêkê de me hemî metnê dîwanê li gorî transkrîpsiyona navnetewî ya standard latînzê kir. Di pey re hem jî aliyê şeklî ve û hem jî ji aliyê naverokê ve me analîza edebî ya metnê dîwanê kir. Ji bo ku îqtîbasên dîwanê bi hêsanî werin dîtin, me hemî hejmarên malikên ku hatine îqtîbaskirin, di binê malikan de di nav kevanekê de bi cih kirin. Hijmara yekem, hijmara helbestê ye û ya duyem jî hijmara malikê ye.

Ji bo jiyana helbestvan jî me berhemên biyografîk û edebî vekolan û ji xeynî vê jî me ji malbat û nas û dostên wî gelek agahî standin. Di berhemên biyografîk û edebî de jiyana wî bi berfirehî cih negirtibû. Lêbelê dîsa jî me ji wan berhemên sûd wergirt. Lê bi piranî me jiyana wî ji kesên ku wî nas dikin, wergirt. Di destpêkê de birayê wî yê piçûk Mela Ebdullah Ataç û kurê wî M. Vehbî Ataç di vê mijarê de agahiyên girîng dane me. Ji bo ku agahiyên xelet tevî jiyana wî nebin, me agahiyên ku ji kesên cuda hatine wergirtin, dane ber hev û ji agahiyên ku hevdû digirin me encamek derxiste holê.

Di biwara amadekirina metnê dîwanê û latînzekirina wê de rêbaza ku hatiye şopandin di beşa sêyem a tezê de dê bi firehî wê bê pêşkêşkirin.

4. Çavkanî

Di amadekirina vê tezê de ji gelek çavkaniyan sûd hatiye wergirtin. Lêbelê hin çavkaniyên ku rasterast bi mijarên vekolîna edebî re têkildar girîng in. Berî her tiştî çavkaniya me ya sereke nusxeya tekane ya dîwanê ye. Em hebûna vê çavkaniyê gelekî girîng dibînin. Lewra hemî metnê dîwanê û hin helbestên di jî bi rengekî zelal tê de cih girtine. Ji bo analîza edebî ya metnê dîwanê jî me ji çend çavkaniyên sereke sûd wergirtiye ku em dixwazin li vê derê navên wan zikir bikin. *Eski Türk Edebiyatına Giriş: Biçim ve Ölçü* ya M. A. Yekta Saraç, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk* ya Abdurrahman Adak, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü* ya İskender Pala, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri (Belâğât)* ya M. Kaya Bilgegil, *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz* ya Haluk İpekten. Bi piranî berhemên *Biçim ve Ölçü* ya M. A. Yekta Saraç, û *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk* ya Abdurrahman Adak di analîza edebî ya tezê de pêşiya me ronî kirin.

Wekî din gelek endamên malbata Mela Sîraceddînê Xelîlî û yên derdora wî jî ji me re bûn çavkaniyên rasterast. Di sêrî de mamosteyê min û şêwirmendê teza min Doç. Dr. Abdurrahman Adak ji destpêka pêvajoya tezê heta dawiyê alîkariyeke baş da me. Hem jî bo lêkolîna berhemên û hem jî ji bo pêwendiyên kesên derdora Mela Sîrac, alîkariya xwe ji ser me qut nekir.

BEŞA YEKEM JIYAN Ê BERHEMÊN MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ

Li ser dîwan û jiyana Xelîlî heta niha pir kêr xebat hatine kirin. Jiyana wî di du sê çavkaniyan tenê de bi sê çar hevokan cih girtiye. Li ser dîwana wî jî tenê xebatek hatiye kirin. Ew jî xebata Tehsîn Îbrahîm Doskî ye. Xebata Doskî jî tenê ji weşana metnên dîwanê ya bi tîpên erebî pêk tê. Ji xeynî vê jî helbestên ‘Erebî, Farisî û Tirkî jî di xebata Doskî de cih negirtine. Êdî me xwest ku em vê dîwanê ji her aliyê ve vekolin û pêşkêşî bazara ilmî û edebî bikin. Me pêşiyê jiyana wî ya ku di hinek berhemên de cih girtiye derxist û paşî jî me ji derdor û nasên wî (wekî kurê wî, birayê wî û hwd.) jiyana wî berhev kir. Me bi van kesan re rû bi rû hevdiştin pêk anîn û agahiyên hemîyan dane ber hev. Me xet û serdemên bingehîn yê jiyana wî jî derxistin holê. Li ser dîwanê jî me xebateke berfireh kir. Muheqqeq lazîm e ku hinek xebatên berfirehtir jî li serê werin kirin, lêbelê em bawer dikin ku ev xebat wê ji bo peyrewên xwe bibe ronahiyeke gurr û geş. Di mijara lêkolîna metnê dîwanê de me serî li hinek berhemên adademîk yê wekî *Eski Türk Edebiyatına Giriş: Biçim ve Ölçü* ya M. A. Yekta Saraç, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk* ya Abdurrahman Adak, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü* ya İskender Pala, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri (Belâğât)* ya M. Kaya Bilgegil, *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz* ya Haluk İpekten; daye.

1. SERDEMA KU MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ TÊ DE JIYAYE

Di hemî demên dîrokê de rewşa siyasî li ser rewşa edebî bandor kiriye. Di vê mijarê de Hayrullah Acar di berhema xwe ya bi navê “Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr de wiha dibêje: “Diyardeyeke aşîkar e ku derketin û pêşketina edebiyatê bi rewşên siyasî ve girêdayî ye. Bêguman di serdema mîrektîyan de rewşa siyasî ya herêma Botan rasterast bi mîrektîya Botan ve girêdayî ye.”² Êdî jî bo edebiyat bi pêş bikeve divê desthilateke bihêz û alîkarê edebiyatê hebe. Di vê mijarê de jî Acar vê tespîtê dike: “Dema em ji aliyê edebiyata Kurdî ya klasîk ve li profîla bajarê Cizîrê dinêrin, em dibînin ku her sê sitûnên bingehîn ên edebiyata Kurdiya Kurmancî Mela, Feqî û Xanî bi bajarê Cizîrê û desthilatdariya mîrektîya Botan re di nav têkiliyê de ne.”³ Mela Sîraceddînê Xelîlî piştî dawîlêhatina serdema mîrektîyan hatiye dinyayê.

Mela Sîraceddînê Xelîlî di sala 1930î de hatiye dinyayê û di sala 1983yan çûye rehetê. Di vê beşê de em ê li ser rewşa siyasî ya vê serdemê bikeskinin ku Mela Sîraceddînê Xelîlî jî tê de jiyana xwe derbas kiriye. Lewra ji bo ku mirov şexsekî û berhemên wî baş nas bike, divê pêşiyê mirov rewşa serdema wî baş bizanibe. Çawa tê zanîn jiyana, fikr û berhemên mirovan di bin bandora rewşa jiyana de ne. Ji ber vê yekê divê em jî şert û mercên dîroka jiyana Mela Sîraceddînê Xelîlî

² Hayrullah Acar, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr, Weşanên Nûbiharê*, Stenbol, 2016, r. 29.

³ Acar, b.n.b., r. 40.

baş bizanibin. Ji bo vê jî li jêrê em ê bi kurtî li ser bûyerên ku di serdema Xelîlî de qewimîne, biserkinin.

Serdema ku Mela Sîraceddînê Xelîlî tê de jiyan xwe derbas kiriye ji bo Kurdan û ji bo mirovahiyê, serdemeke dijwar e. Lewra piştî ku dewleta Osmanî belav dibe, rewşa Kurdan xirabtir dibe. Şerê Cîhanê yê yekem dibe sedem ku Kurd di nav dewletên Iraq, Îran, Tîrkiye û Sûriyê de bîn belavkirin. Berî vê demê, ne bi gelekî; Kurd mecbûr mane ku di nava çar dewletên cuda de jiyan xwe berdewam bikin. Ev tenê jî bandoreke gelekî dijwar li ser jiyan netewekî dike. Piştî vê re jî Şerê Cîhanê yê Duyemîn di vê serdemê de çêdibe. Piştî avakirina Komara Tîrkiyê jî, nexweşî û gengeşî bi dawî nabin.

Di sala 1934an de li Tîrkiyê “qanûna yekîtiya perwerdeyê (tewhîd-î tedrîsat kanunu)” tê qebûlkirin. Vê qanûnê bi du awayan zerar daye Kurdan. Lewra bi vê qanûnê re medreseyên Kurdan jî têne girtin û wekî din di perwerdehiyê de bikaranîna zimanê Kurdî tê qedexekirin. Vê geşedanê bandoreke zêde xirab li ser ziman û edebiyata Kurdan kiriye.

Bûyerên siyasî yên serdema Tîrkiyê ji bo numûne bûyera Şêx Seîd jî bandoreke xirab li ser ziman û civaka Kurdan kiriye. Kurd di nav şertên zehmet re derbas bûne. Gelek mela û giregirên Kurdan di dawiya vê bûyerê de hatine nefikirin an jî hepiskirin. Zextên li ser Kurdan zêdetir bûne û vê yekê bandoreke neyînî li edebiyata Kurdî jî kiriye. Mela Sîrac jî di nav van şertên zehmet de mezin bûye û bi awayekî qedexê perwerde dîtiye.

Ev serdema ku Mela Sîraceddînê Xelîlî tê de jiyaye, ji avakirina Komara Tîrkiyê dest pê dike û heta piştî sê salên darbeya 1980yî didome. Ev serdem jî bo gelê Tîrkiyê hemiyan, belkî serdema herî zor, zahmet, xizan û perîşan e. Di vê serdemê de hinek bûyerên girîng rû dane. Em ê li jêrê hinekî li ser wan bûyeran bisekinin.

Zehmetiyan, hê berî komarê dest pê kirine. Bo nimûne; **Alayên Hemîdiyê, Alayên Eşîretan** yên **Siwariyên Sivik, Alayên Şemsedînovan**. Siltanê Osmaniyan Evdilhemîd, di sala 1881ê de bi navê Alayên Evdilhemîd yekîneyên siwariyên nenîzamî ava kirine. Bi vê biryara xwe Evdilhemîd du tişt kiriye hedefa xwe. Yek jê qontrolkirina Kurdan e, ya dî jî mînimîzekirina tehdîda Ermeniyan e. Di sala 1908an de dema ku hikûmeta îttîhat û terakiyê rêvebirî ji Evdilhemît stendiye, tenê bi guhertina navê wê ve ev alay hiştine. Navê wan ê nû jî bûye “alayên eşîretan.” Ev alayên ku qeweta xwe direct ji navendê girtibûne li herêmê tu qanûn û zagon guhdarî nekirine, zilm û zordestiya kesên ji xwe zeîftir kirine. Heta, li Ermeniyan jî gelek eziyet kirine. “Di rastiye de beriya şerê cîhanê yê yekemîn de Kurd, bi nezanîbûn û rêbirîne û bi eziyetên ku li Ermeniyan kirine ve hatine rojevê.”⁴

Hereketa Şêx Seîd jî bûyerek e ku bandoreke xirab li ser civaka Kurdan kiriye. Bûyer di sala 1925an de çêbûye. Yanî hê Mela Sîracê Xelîlî nehatiye dinyayê. Lê belê bandora vê bûyerê gelekî dirêj e. Ji ber vê yekê em ê hindikî behsa vê bûyerê bikin. Lewra bandora vê bûyerê gelekî zêde li ser pêşeroja gelê Kurd bûye.

⁴ Dawid McDowal, Modern Kürt Tarihi, Doruk Yayıncılık, Ankara, 2004, r. 83.

Li gor ku Bruinessen dibêje di Sibata sala 1925an de, li Başûrê Rojhilata Tirkîyê serhildaneke mezin çêbû. Navendên bajarên hikûmeta navendî ketine destê alîgirên serhildanê û memûr jî ji herêmê hatin qewirandin an jî êsîrkirin. Serokê vê serhildanê, kesekî jixwerazî bû. Ev serokê karîzmatîk şêxê Neşîbendiyan Şêx Seîd bû. Armanca serhildanê ya eşkere ew bû ku dewleteke Kurdan ya Îslamî were avakirin ku ew prensîbên Îslamê ku ji aliyê Tirkîyê ve hatine binpêkirin, careke di rûmeta xwe bistînin.⁵

Hereketa Şêx Seîd û encamên wê hem navbera gelê Kurd û dewleta Tirkîyê xira kir û hem jî navbera eşîrên Kurdan xira kir. Lewra ji bo piştgiyaya hereketê, hemî eşîran li hev nekiribû. Hin eşîr bi Şêx Se'îd re bûn hin li dijî wî bûn.⁶

Piştî vê bûyera aloz ne bi gelekî, bûyera Agiriyê dest pê kir. Vê bûyerê jî li ser jiyana Kurdan bandoreke neyînî berdewam kir. Em ê bi çend hevokan wê bûyerê jî bi bir bînin.

2. JIYANA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ

Di destpêkê de em vê bibêjin ku lêkolîneke berfireh li ser jiyana û berhemên Mela Sîraceddînê Xelîlî heta niha nehatiye kirin. Di derbarê jiyana Mela Sîraceddînê Xelîlî de, me jî derdorê agahî kom kirin. Ji birayê wî Mela Abdullah Ataç, kurê wî M. Wehbî Ataç, Biraziyê wî Mela Seîd Ataç, gundiyê wî mamosteyê edebiyatê Kasım Karaca û hinek kesên ku ew dîtine, me ev agahî civandine.

Mela Sîraceddînê Xelîlî hemî jiyana xwe di sedsala XX. de derbas kiriye. Di serê çaryeka duyem ya sedsala XX. de hatiye dinyayê û di serê çaryeka dawî ya sedsala XX. de wefat kiriye. Kesên ku ew dîtine gelek jê niha li jiyana ne. Dema ku wî jiyana xwe lê derbas kiriye ji aliyê aborî, siyasî û edebî ve jî bo gelê Kurd pir dijwar bû. Hinekî jî ji ber vê yekê baş nehatiye naskirin. Tê zanîn ku di vê demê de nivîsandina bi Kurdî zêde ne derbasdar bû û gelek zext jî li ser zimanê Kurdî hebûn. Gelek nivîskaran kitêb û nivîsên xwe yên bi Kurdî diveşartin. Êdî jixwe di demeke wiha de nasbûn û belavbûna berhem û nivîskaran pir zehmet e. Ji ber van û gelek sebebên cuda Mela Sîraceddînê Xelîlî jî baş nehatiye naskirin.

Abdulkadir Bingöl di pirtûka xwe ya bi navê Kulîlkên Baxê Botan de Xelîlî bi vî şiklî daye:

“Molla Sirac (Ataç) (1930-1983)

Kurê Mela Ebdulhekîm e. Bi ‘eslê xwe ji Torê ji ‘eşîra ‘Erebiyan e. Di sla 1930î de li gundê Xelîla hatiye dinyayê. Di sala 1971ê de li gundekî Cizîrê yê bi navê Behmûr dest bi melatiya fermî kiriye. Di sala 1974an de tayîna wî çûye Mîdyadê. Li wê derê du sala maye û di sala 1977an de dîsa hatiye Cizîrê. Li mizgefta

⁵ Martin van Bruinessen, Ağa, Şeyh, Devlet, İletişim Yayınları, İstanbul, 2011, r. 387.

⁶ Şerefhan Cizîrî, Omeriya Mirsom, Weşanên MAR-HASê, Mêrdîn, 2009, r. 246.

Hz. Nûh wezîfe kiriye. di sala 1982yan de teqawît bûye û di sala 1983yan de çûye rehmêtê.

Berhemên wî: Mewlûda menzûm, pirtûka helbestan ya bi navê Gulcivîn.”⁷

2.1. Nav û Mexlesa Wî

Navê helbestvan Sîraceddîn e. Bi awayê fermî pašnavê wî Ataç e. Lê ji ber ku mela ye û ji gundê Xelîla ye, wekî Mela Sîraceddînê Xelîlî tê binavkirin. Di nava gel de ji ber ku nav hinekî têne kurtkirin, bêhtir wekî Mela Sîracê Xelîlî tê naskirin.

Mela Sîraceddînê Xelîlî di helbestên xwe de gelek mexles bi kar anîne: “Sîraceddîn”, “Mihemed Sîraceddîn”, “Muhammed Sîrac”, “Sîrac”, “Sîraco”, “Sîracî”, “Sîracê Xelîlî”, “Sîn”, “Sîrac Ataç” û “Sîn û Cîm”. Bi gelemperî mexlesa “Sîraceddîn” û varyantên peyva “Sîraceddîn; wekî “Sîrac”, “Sîracî”, “Sîraco” hwd. bi kar anîne. “Sîrac” li şêst cihî, “Sîraceddîn” li bîst û çar cihan, “Sîracî” li heşt cihan, “Sîraco” li hivdeh cihan “Sîn û Cîm” li şazdeh cihan, “Sîrac Ataç” û Mihemed Sîraceddîn” li du cihan, “Sîn”, li çar cihan, Mihemed Sîrac” û “Sîracê Xelîlî” jî tenê li cihekî hatine bikaranîn. Di hinek helbestên (51, 56, 75, 77, 79, 80, 81, 82, 84, 85, 87, 88, 90, 91, 92, 94, 95, 96, 97 û 98an) de mexlesa xwe bi kar neaniye. Ev jî bi piranî an helbestên ‘Erebî ne an jî werger in. Wekî din di hemî helbestên xwe de mexlesa xwe bi kar aniye. Niha em ê cih bidin hinek mînakên bikaranîna mexlesan.

Di dîwanê de li bîst û sê cihan mexlesa “Sîraceddîn” hatiye bikaranîn. Me li jêrê cih daye hinek mînakan.

Sîraceddîn ji xew rabe di hîkmê wî tu derya be

Ku bê wî çîz tu ca nabe rica ke şubhê dîwanî

(1/13)

Ya Reb bi cahê Ehmed ser bê şelat û rehmêt

Sîraceddîn ‘efû ke Te gotî ez Geffar im

(27/13)

Me li jor jî gotibû “Mihemed Sîraceddîn” tenê li du caran hatiye bikaranîn. Me li jêrê cih daye wê jî.

M’hemmed Sîraceddîn gelek te‘da di mexlûq û melek

Selam ji bo çavreş belek şandin seher badê gehand

(110/10)

⁷ Abdulkadir Bingöl, Kulîlkên Baxê Botan, Weşanên Enstituya Kurdî, Amed, 2008 r. 172; Tehsîn Îbrahîm Doskî, Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî, Çapxaneya Zankoya Selaheddîn, Hewlêr, 2014, r. 7; Adak Abdurrahman, “Dergahê Şêx Seyda” *Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre*, (ed. M. Nesim Doru), Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2012, r. 239.

Di malika jêrê depeyva “Sîraceddîn” bi şeklekî serfirazî û edebî bi kar aniye û peyva “Sîraceddîn” kiriye du beş û bi vî rengî kiriye ku du me’ne jê derkevin. Bi vî şiklî jî “tewriye” kiriye. Me’neyek jê jixwe bi ‘Erebî ye ku tê me’neya “ronahiya dîn”, ya di jî “Sîracê dîn (mecnûn, dîwane)”.

Summe ev Muḥemmed Sîrac ê dîn e

Xemxwarê te ye kû dilbirîn e

(140/28)

Bi şeklê Muhemmed Sîrac tenê ev mînaka li jêrê heye.

Muḥemmed Sîrac gazî dikê j’Rebbê mezin hêvî dikê

Efwê ji gunhê wî bikê tu b’sed û çardeh sûreta

(4/114)

Di dîwanê de herî zêde “Sîrac” wekî mexles hatiye bikaranîn. Di tevahiya dîwanê de pêncih û heşt caran cih girtiye. Li jêrê me cih da du mînan.

Sîrac bike wa zê li xwe teftîş bike ‘eybên di xwe

Derman bike qelbê di xwe belê eşil negotin in

(3/41)

Ev **Sîrac** ‘ebdek zelîl e wî guneh nayên hesab

Lêbelê rehîma te zehf e ê bixwazê layured

(5/27)

Di dîwanê de “Sîraco” hivedeh caran wekî mexles hatiye bikaranîn. Du mînak me li jêrê nîşan dan.

Heta sed salî hêj bêjim xilas nakim tu ca hikmet

Sîraco şîreta xwe tu l’xwe ke her dem bibêj Ellah

(2/43)

Sîraco tu bibe hişyar kelemça nefsê bişkêne

Ne heyf e xwe bikê êsîr bi vî ‘eqî û bi danaê

(10/34)

Di dîwanê de “Sîracî” heşt caran wekî mexles hatiye bikaranîn. Li jêrê me cih daye du mînan.

Ricakarê du ‘agoyan kerîmê rûzê her rûyan

Bîbexş ber xatirê cûyan bi **Sîracî** de wan ya Reb!

(6/25)

Ji dergahê rica ke belkî Reḥman

Xelat kê te û **Sîracî** bi ridwan

(30/30)

Di vê malika jêrê de jî mexlesa xwe wekî “Sîracê Xelîlî” bi kar aniye. Tenê di vê malikê de ev reng heye.

Bes nal û fiḡanan ke merêj xûnê ji Nîlî

Sîracê Xelîlî

(107/29)

Di malika jêrê detenê bi şeklê “sîn” mexlesa xwe bi kar aniye. Lewra xîtabî xwe dike û ji ber vê yekê em dizanin ev peyv wekî mexles hatiye bikaranîn. “Sîn” di alfabeya ‘Erebî de tîpek e û navê “Sîrac” jî bi vê tîpê dest pê dike. Tenê di vê malikê de bi vî rengî bi kar aniye.

Ka bes binale herfê **Sîn** zêdey te ne sê nuqtê şîn

Zanim yeqîn herfa henê yan şîn e yan şeynê me bû

(68/23)

“Sîrac Atac” tenê di du malikan de hatiye bikaranîn. Jixwe di Edebiyata Klasîk de di rengê roja me de paşnav nîn in. Mela Sîraceddînê Xelîlî di dema Komara Tirkîyê de jiyana xwe derbas kiriye. Ji ber vê yekê paşnavê wî bi Tirkî ye. Paşnavê xwe zêde bi kar neaniye. Cara pêşî di helbesta bi zimanê Tirkî de bi kar aniye. Êdî ev navê wî yê fermî ye. Ji ber vê yekê belkî bi şeklê “Sîrac Ataç” nivîsiye. Ataç bi “ç”yê nivîsiye. Cara duyem jî bi şeklê “Sîrac Atac”, yanî bi “c”yê nivîsiye.

Kılma hesabsız ah û zar **Sîrac Ataç** Allah Geffar

Sen kölesin o handekar dinle beni dinle beni

(45/12)

Tali ‘dema defter vekir yek yek li nava meyze kir

Ser şefḥeyê –not û puwan- **Sîrac Atac** navê me bû

(68/5)

“Sîn û Cîm” jî di tevahiya dîwanê de deh caran wekî mexles hatiye bikaranîn. Weke ku tê zanîn “Sîn” û “Cîm” du tîpên Erebi ne. Ji ber ku di peyva “Sîrac” de peyva pêşî û ya dawî “Sîn û Cîm” e, wî jî wekî mexles hilbijartiye. Di helbestên klasîk de ev reng pir belav e. Wekî Feqîyê Teyran jî bi me’neya “Mihemedê Hekarî” mexlesa “Mîm û Hê” bi kar aniye. Me li jêrê cih daye du mînakên.

Sîn û Cîm’a pur gunehkar hêvîkarê rehetê

Ya Îlahî me w hevala tevde bêxê cennetê


(16/39)

Xezela kayê ji ber kir Haşimo ka bi xwe wer kir

Sîn û cîmê pêre şer kir lew ji heddê çûye der

(65/10)

Li jêrê em cih bidin grafîka rêjeya bikaranîna mexlesan nîşan dide.



Grafîk 1: Grafîka ku rêjeya bikaranîna mexlesan nîşan dide.

Mela Sîrac di nava helbestvanên klasîk de bi bikaranîna gelek mexlesan temayûz dike. Wî gelekî girîngî daye bikaranîna mexlesê. Ev rêbaz jî bo helbestvanên klasîk pir girîng e. Lewra mexles weke înzeya helbestvanan e. Mela Sîrac di helbestên xwe de hem navê xwe yê ‘eslî (Sîrac) û hem navê xwe yê fermî (Sîrac Ataç) û hem jî tîpên pêşî û dawî yên navê xwe li gorî alfabeya Erebi (sîn û cîm) bi kar anîne.

2.2. Jidayîkbûn û Zaroktiya Wî

Mela Sîraceddînê Xelîlî di sala 1930î de li gundê Xelîla hatiye dinyayê. Ji bo vê serdemê zanînên hûrgilî di destê me de nîn in. Mela Sîraceddîn zaroktiya xwe li Xelîla derbas kiriye. Heta pazdeh saliya xwe li Xelîla maye û li wir xwendiyê. Wekî ku berî niha jî me got Mela Sîraceddînê Xelîlî jî gundê Xelîla ye û Xelîla gundekî herêma Torê ye û jî aliyê îdarî ve li ser qezaya Kerboran (Dargeçit) û wîlayetê Mêrdînê ye. Xelîla gundê herî mezin ê Kerboran e. Kesên ji Xelîla dibêjin ku demekê heft sed mal di vî gundî de hebû. Piştî 2000an demekê wekî belde hatiye qebûlkirin. Xelîla jî aliyê eşîrî ve navenda eşîra Erebiyan e. Niha jî di nava gundên ‘Eşîra ‘Erebiyan de gundê herî mezin e.⁸

2.3. Malbata Wî

Malbata Mela Sîraceddîn malbateke naskirî ya gundê Xelîla û devera Kerboran e. Ji vê malbatê gelek alim, mela û edîb derketine. Navê bavê wî Mela Ebdulhekîm e. Mela Evdilhekîm⁹, kurê Mela Birahîm, kurê Mirad, kurê ‘Umer, kurê Rustem, kurê Behrem, kurê Rustem, kurê Şêlîl, kurê Xelîl, kurê Muhemed Erebiyan e.¹⁰ Muhemed Erebiyan jî ew kes e ku ‘eşîra ‘erebiyan pê bi nav bûye. Ji malbata wan gelek alimên mezin derketine. Bavê wî jî ‘alimekî mezin bû. Pênc bira û sê xwihên wî hene. Birayên wî ev in: Mela Monîr, Mela Nezîr, Mela Ehmed, Şêx Beşîr û Mela Ebdullah. Ji xeynî Mela Ebdullah, hemiyên di emrê Xwedê kirine. Xwihên wî jî ev in: Zeyneb, Reqya û Fatîma. Her sê xwihên wî jî çûne rehmetê. Bi navê Wehbî, tenê kurekî wî heye. Wehbî teqawîd bûye û ew û diya xwe Şerîfa Xanim (jina Mela Sîraceddîn) niha li Diyarbekirê bi hev re jiyana xwe didomînin.¹¹

2.4. Gund û ‘Eşîreta Wî

Li gor ku Altan Tan di berhema xwe ya bi navê Turabidin’den Berriyyê’ye de dibêje, ‘eşîra ‘Erebiyan “di herêma Kerboran de ‘eşîra herî mezin e. Di navbera ‘eşîra Basqîl û çemê Dicleyê de dimîne. Navenda navçeya Kerboran jî di nava tixûbê vê ‘eşîrê de ye. Navenda ‘eşîrê, gundê Çêlik (Çêlika ‘Eliyê Remo) e ku di ber keviya çemê Dicleyê de ye.¹²

Xelîla û eşîra Erebiyan dikevin herêma Torê. Herêma Torê navê herêmî yê deverê ye. Li gorî hafizeya gel ku me tesbît kiriye Kerboran, Midyad, Kercos dikevin nav devera Torê. Altan Tan sînoren devera Torê berfirehtir kiriye û sînoren wê gihandiye heta bi Mêrdînê (qezaya Mehseretê) û qezaya Hezexê ku niha li ser wîlayeta Şîrnexê ye.¹³

⁸ Altan Tan, *Turabidin’den Berriyyê’ye*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2015, r. 119; İlyas Savcı, *Dargeçit Kültür ve Mimarisi/Çand û Avahîsaziya Kerboranê*, İmleç Kitap, İst. 2012, r. 38-44.

⁹ Mele Evdilhekîm ‘alimekî mezin bû û li Darayê li cem Şêx Beşîrê Darayî xwendibû.

¹⁰ Mela Sîrac bi xwe jî di nusxeya Dîwana Melayê Cizîrî ya ku wî bi destxeta xwe nivîsandiye de bi vî rengî şecereya xwe nivîsandiye.

¹¹ Abdullah Ataç, *Birayê Mela Sîraceddînê Xelîlî yê piçûk*, (Kerboran/2018).

¹² Tan, b.n.b., r. 113.

¹³ Tan, b.n.b., r. 113.

Di du çavkaniyên sereke yên ku qala Kerboran dikin de (*Turabidin'den Berriyyê'ye* ya Altan Tan û Dargeçit Kültür ve Mimarisi/Çand û Avahîsaziya Kerboranê ya İlyas Savcı) derheqê Kerboran û eşîrên wê de agahiyên berfireh hatine dayîn. Li gor van agahiyan navê Xelîla ji kurê 'Ereb yê bi navê Xelîl tê. Xelîla niha bi navê "Kılavuz" beldeyeke Kerboranê ye. Teqrîbî tevahiya gund, neviyên Xelîl in. Berî Xelîl hinek malbat li Xelîla hebûn û ew jî ji 'Eşîra Sînka bûn. Gundê Xelîla ji heft bavikan pêk tê: Budaxkî, 'Eydokî, Şêlîlkî, Aslankî, Mahmereşkî, Hûrikî û Sînkî. Ji xeynî Sînkîyan, evê dîtir hemî zarokên Xelîl in. Ji ber ku Hûrikî hindik bûn, malbatên 'Eşîra Qêratan jî tevî wan bûn. 'Exlebên 'eşîra Sînkîyan li dora Batmanê dijîn. Gundî hemî bi Kurdî diştexilin.¹⁴

Zanîna qedrê ilm û irfanê li cem Xelîliyan gelek zêde ye. Piraniya Xelîliyan zarokên xwe şandine medreseyan herêmî. Loma ji Xelîla gelek alim derketine û li deverên cûrbicûr melatî kirine. Malbata helbestvanê me jî di vê çarçoveyê de ye.

2.5. Perwerdeya Wî

Mela Sîraceddîn pêşî li cem birayê xwe Şêx Beşîr xwendîye. Di sala 1945an de çûye Amûdê. Li Amûdê di mizgeft/medreseya mala Şêx Ehmedê Kesk de xwendina xwe domandiye. Piştî çûye Qamîşlo û li wê derê li cem Mela Ehmedê Zivingî (w.1893, m.1971) xwendîye. Mela Ehmedê Zivingî miftîtiya Qamîşlo kiriye û alimekî hêja bûye. Nêzikî 7 salan li Sûriyê maye. Li gorî zanînen me bi dest xistine, li Amûdê çûye mala Cegerxwîn û li wir wî û Cegerxwîn hevdû dîtine. Lê tiştekî balkêş ku di tu helbestên xwe de behsa Cegerxwîn nekiriye.¹⁵ Piştî di sala 1952yan de veqetiyaye Tirkîyeyê û li gundê Eleqemşê xwendina xwe domandiye. Eleqemşê dikeve navbera Nisêbîn û Cizîrê û 45 km.yan ji her du navçeyan jî dûr e. Lêbelê îro di fermiyetê de girêdayî Hezexê ye. Li wir li cem birayê xwe Şêx Muhemmed Beşîr maye. Perwerdeya xwe bi piranî li vir temam kiriye. Li wê derê li cem Şêx Muhemmed Beşîrê 'Evdikî xwendîye. Di dîwanê de li ser vî seydayê xwe helbestek jî nivîsandîye.¹⁶

2.6. Melatiya Wî

Mela Sîraceddînê Xelîlî piştî ku li Eleqemşê îcazet standîye, dest bi melatiyê kiriye. Wî bi qasî sih salî bi piranî li gundên Hezex û Cizîrê ev wezîfe anîye cih. Pêşî li Danêrê¹⁷ bi cih bûye. Li wê derê demekê melatiya gund kiriye. Li wir zewiciye. Birayê wî Şêx Beşîr çûbû Eyserê¹⁸ û birayê xwe Mela Sîraceddîn bi xwe re biribû Danêrê. Bi qasî 15 salan li Danêrê maye. Di wê demê de ji ber pîrsgirêka eskeriyê bi qasî 6 mehan ketiye hebsê. Lê piştî ku eskerbûnê qebûl dike, tê berdan. Wextê ku li wir bû çûye eskeriyê. Piştî eskeriyê jî çend salan li wir maye. Di sala 1961ê de ji wir diçe gundê Xirabê Nêriya.¹⁹ Li wê derê jî 2 salan melatî kiriye. Di sala 1963yan de

¹⁴ Tan, b.n.b., r. 119; İlyas Savcı, Dargeçit Kültür ve Mimarisi/Çand û Avahîsaziya Kerboranê, İmlec Kitap, İst. 2012, r. 38-44.

¹⁵ Abdullah Ataç, Birayê Mela Sîraceddînê Xelîlî yê piçûk, (Kerboran/Dargeçit) Tebax, 2018.

¹⁶ Abdullah Ataç, Birayê Mela Sîraceddînê Xelîlî yê piçûk, (Kerboran/Dargeçit) Tebax, 2018.

¹⁷ Danêrê gundekî Cizîrê ye. Bi Tirkî navê wî Duruköy e.

¹⁸ 'Eyserê gundekî Hezexê ye. Bi Tirkî navê wî Pınarbaşı ye.

¹⁹ Xirabê Nêriya gundekî Hezexê ye. Bi Tirkî navê wî Tekeköy e.

çûye gundê Dikiyê.²⁰ Çend salan li wir jî melatî kiriye. Ji wê derê diçe Kavilbekranê.²¹ Kavilbekranê gundekî Cizîrê ye û dikeve ber hidûdê Sûriyê de û nêzikî Dêrika Hemko²² ye. Di sala 1964an de çûye Cizîrê. Li Cizîrê qedroya xwe standiye. Li ser qedrogirtina xwe jî helbestek nivîsandiye û di dîwanê de, vê helbestê cih girtiye. Her du malikên pêşî yên helbestê li jêrê ne:

Tarîx hezar û neh sed in

Heftey û yek salê me bû

Qur'a Nebî Yûnus li min

Ketbû yeqîn şensê me bû

(68/1)

Va'j (Enqere) dîn amirê

Bo –cizre- qadro jê b'girê

Ê îmtîhana wê bidê

Go yek ji îmamê me bû

(68/2)

Mela Sîraceddîn di sala 1971ê de li gundê Behmûrê yê Cizîrê dest bi melatiya fermî kiriye. Di sala 1974an de tayîna wî çûye Herêma Midyadê û li gundê *Dubenê*²³ nêzikî çar salan maye û melatiya gund kiriye. Di sala 1977an de dîsa hatiye Cizîrê. Li mizgefta Nûh Nebî melatî kiriye. Di sala 1982yan de teqawît bûye.

Di 3yê Kanûna pêşîn (meha 12an) a sala 1983yan de di 53 saliya xwe de wefat kiriye. Tirba wî li Cizîrê li ziyareta Mîr Evdaliyê ye.²⁴

2.7. Terîqeta wî

Mela Sîraceddîn ji aliyê tesewûfî ve bi terîqa neqşîbentîtiyê re di nav pêwendiyê de bû. Pêwendiya malbata wî bi şêxê terîqeta Neqşebendiyan Şêx Seyda (W. 1889- M. 1968) re hebû. Bo nimûne birayê Mela Sîraceddîn yê mezin Şêx Beşîr, xelîfeyê Şêx Seyda bû û Mela Sîraceddîn ji birayê xwe Şêx Beşîr jî pir hez dikir û li ser wî jî medhiye û mersiye nivîsîne. Dema birayê wî ji Şêx Seyda xelîfetî standiye, Mela Sîrac bi vê minasebetê helbestek nivîsiye û behsa vê bûyerê kiriye.

²⁰ Dikiyê gundekî Hezexê ye. Bi Tirkî navê wî Yörükköy e.

²¹ Kavilbekranê gundekî Cizîrê ye.

²² Bajarekî binxetê (Sûriyê) ye.

²³ Gundekî Midyadê ye. Dikeve rojhilatê Midyadê. Bi Tirkî İkizdere.

²⁴ Abdullah Ataç, Birayê Mela Sîraceddînê Xelîlî yê piçûk, (Kerboran/2018).

Em pozîsyona Mela Sîrac ya di terîqetê de baş nizanin. Lêbelê em dikarin bibêjin ku ji Şêx Seyda û kurê Şêx Seyda Şêx Muhemmed Nûrullah (W. 1948- M. 1985) pir hez dikir.

Abdurrahman Adak Mela Sîraceddîn wek helbestvanekî muhîta edebî ya dergahê Şêx Seydayê Cizîrî li qelem daye. Li gor wî, Dergahê Şêx Seyda di sedsala XXan de dergahêkî zêde bi bandor û berhemdar e. Ev dergah di destpêka sedsala XXan de li Cizîrê ava bûye û ji wê demê heta bi salên notî bûye navendeke tesewwûfî ya gelekî bi hêz û li dora wî dergahî mûhîteke edebî ava bûye ku Mela Sîrac jî di nav wê mûhîte de cih digire.²⁵

Pêwendiya Mela Sîraceddîn a bi dergahê Şêx Seyda re, rengê xwe daye dîwana wî jî. Di dîwana wî de li ser Şêx Seyda û kurê wî Şêx Muhemmed Nûrullah medhiye û mersiye hene.

Me ji van helbestên wî çend malik li jêrê bi cih kirine.

Şubhetê *murşidê Seyda* bû di weqtê me de peyda

Da ji wî bigrê tu feyda j' dest vexwe şerbet û av

(17/17)

Ey **Sîrac** ma vî zemanî şubhetê Seydaî kanî?

Her du 'ilman ew dizanî lewra Seyda bûye nav

(17/20)

²⁵ Abdurrahman Adak, "Serdema Xalidîtiyê Di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîk de" Kürt Tarihi, hijmar 30, 2017, r. 64.

3. BERHEMÊN MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ

Berhemên Mela Sîraceddînê Xelîlî bi giştî çar heb in. Sê heb ji van gihane me, lêbelê yek ji wan negihaye me. Ji ber vê jî em dixwazin berhemên wî ji vî aliyê ve li ser du beşan dabeş bikin: Yên ku gihane me û ya ku negihaye me.

3.1. Yê ku Gihane Me

Berhemên Mela Sîraceddînê Xelîlî yê ku gihane me sê ne: *Durra Birincî* (Mewlûda Kurmancî), *Gulcivîn* (Dîwan), *Şîretên Hekîm Loqman*. Li jêrê em ê van berhemên bidin nasandin.

3.1.1. Gulcivîn (Dîwan)

“Gulcivîn” dîwana wî ya helbestan e ku ji 143 helbestan pêk hatiye. Navê dîwanê (Gulcivîn) ji aliyê helbestvan ve hatiye danîn. Li ser cildê pirtûka destxet jî hatiye nivîsîn. Li ser mijarên civakî û eşqê hatiye nivîsîn. Di heman demê de helbestên dînî jî tê de pir in. Berhemeke giranbiha ye. Ji ber ku di beşa *danasîna dîwanê û nusxeyên wê* de bi hûrgilî em li ser dîwanê sekinîne, em ê li vê derê kurt bibirin.

3.1.2. Durra Birincî (Mewlûda Kurmancî)

Wekî ku ji nave wê jî tê fêhmîkirin ev berhem mewlûd e. Ji hivdeh beş û sed û heftê û pênc beytan pêk hatiye. Di serê her beşê de sernavek nivîsandiye û naveroka beşê eşkere kiriye. Sernavên beşan ev in: Hemd û Sena, sebebê nivîsandina mewlûda nebî, pesnê nebî, şêklê nebî, tebî’etê nebî, xasîyetê nebî, mu’cîzatê nebî, şiyandina nebî, xêra selewatan li ser nebî, xêra mewlûda nebî, silsila nebî, wiladeta nebî (bi navê “wiladeta nebî” sê beş hene), bixêrhata nebî, dawîya mewlûda nebî û du’aya mewlûda nebî. Beşa sisêyan ji dozdeh malikan, beşa dehan jî ji deh malikan pêk tên. Wekî din ew beşên dî hemî ji yazdeh malikan pêk tên. Di dawîya hemî beşan de sê malik tênê dubarekirin. Beşa dawî du’aya mewlûdê jî, wekî mensûr hatiye nivîsîn. Weke gelek mewlûdên dî, ew jî bi wezna erûzê ya “Fa’îlatun Fa’îlatun fa’îlun” hatiye nivîsîn.

Mela Sîraceddînê Xelîlî mewlûda xwe bi zimanekî fesîh û zelal nivîsandiye. Zimanê rojane bi kar aniye. Îro kesekî ku xwendina wî tune be jî dikare bi hesanî zimanê mewlûdê fêhm bike.

Ev mewlûda wî bi tîpên ‘erebî li Nisêbînê ji aliyê biraziyê wî Mehmet Siddîk Ataç ve hatiye çapkirin.²⁶ Lêbelê bi tîpên latînî nehatiye çapkirin. Ev mewlûd jî aliyê me ve wek semînera lîsansa bêtez (Jiyan û Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî) li Zanîngeha Mardin Artukluyê hatiye amadekirin.²⁷

²⁶ Bnr. M. Siddîk Ataç, Kitaba Durra Birincî Mewlûda Kurmancî, Renk Ofset, Nusaybin 2001.

²⁷ Nezîr Gümüş, Jiyan û Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî, Projeya Lîsansa Bilind, Mêrdîn, 2017.

3.1.3. Şîretên Hekîm Loqman

“Şîretên Hekîm Loqman” jî weke ku ji navê wê jî tê zanîn ji şîretên ku Hekîm Loqman yên li kurê xwe kirine pêk tê. Nesîhetnameyeke menzûm e. Şîretên wî bi nezm û bi zimanekî herikbar nivîsîne. Ji zimanê Farisî hatiye tercûmekirin. Berhem ji neh rûpelan pêk tê. Bi destpêkekê dest pê dike û di bin 34 sernavan de tê temamkirin. Her sernavek bi gelemperî ju du-sê malikan pêk tê û li ser mijareke hikmetê disekine. Ev berhem jî nehatiye çapkirin. Li gor xebatên me destnivîsên wê jî di piyasê de nîn in. Tenê fotokopiya destxeta Mela Ebdullahê Dêrgûlî di destê me de heye.

3.2. Ya ku Negihaye me

Berhemên Mela Sîraceddîn yên ku negihane me jî hene. Çiqas berhemên wî negihane me, ji sedî sed ne zelal e; lêbelê berhema bi navê Gulbihara Kurdan yek ji wan e.

3.2.1. Gulbihara Kurdan

Berhema Xelîlî ya ku negiyane me, ya bi navê “Gulbihara Kurdan” e. Hebûna vê berhemê ji aliyê biraziyê wî Mihemed Siddîq Ataç ve hatiye tesbîtkirin. Li gor ku ew dibêje navê berhemê “Gulbihara Kurdan” e û mijara wê jî ev e: “Derb û meselokên Kurdî ne û gotinên pêşîvanan ji aqilmend û qendan”.²⁸

Çawa ku tê dîtin, bêşik e ku berhemeke Xelîlî li ser gotinên pêşîyan yên Kurdan heye. Em dikarin bibêjin ku ev berhemeke civakî û netewî ye. Mixabin heta niha ev berhem winda ye. Li gor agahiyên ku me ji malbatê bi dest xistine, malbatê ev berhem veşartîye û piştî berhem winda bûye.

Biraziyê Xelîlî Ataç, ji vê berhemê du beyt neqil kirine. Ataç, di dawîya fotokopiya dîwanê de gotiye “*Dersê Gulbiharê de ev şî’ra ha nivîsiye*” û piştî cih daye her du beytan.

Birayê min bibêje feyde nîn e qet di vê xêzê

Heçî zanê dizanê Gulbiharem xeyrê payîzê

Heçî me danîbû li vir guh bidiyê rast tû bike xet

*Tû l’me neke paşî nifir ger çî me xet bûye xelet*²⁹

²⁸ Mela Sîraceddînê Xelîlî, *Kîtaba Gulcivîn*, nusxeya destnivîs, istisnax: 1999, r. 213.

²⁹ Xelîlî, b.n.b., r. 213.

BEŞA DUYEM VEKOLÎNA DÎWANA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ

2.1. DANASÎNA GIŞTÎ YA DÎWANA MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ

Di Dîroka Edebiyata Klasîk de bi gelemperî helbestvanan berhemên xwe pêşkêşî desthilatdarekî dikirin. Lewra wî wextî wekî îro berhem di çapxaneyan de nedihatîn çapkirin an jî bi rêya çapemeniyê reklamên wan nedihatîn kirin. Êdî ji bo ku berhemek meşhûr û belav bibe, çend rêyên wê hebûn. Yek jê wextê ku alimekî/helbestvanekî mezin berhemek nivîsand, gelek caran tabî', murîd an jî xwendevanên wan ew berhem bi destnivîsê dinivîsandin û bi vî rengî ew berhem belav dikirin. Êdî yekî ji yekî dî distand û ew berhem zêde dibû. Heta gelek caran ji ber ku ji aliyê gelek kesan ve dihatin nivîsandin, êdî nusxe jî ji hev cuda dibûn.

Rêyeke dî jî ew bû ku helbestvanan berhemên xwe pêşkêşî desthilatdarekî dikirin. Êdî heke desthilatdarî ew berhem ecibandibana, ferman dida katibên xwe û ew berhem belav dikirin. Gelek caran jî nivîskar an jî helbestvan xelat dikirin. Ev xelat jî cur bi cur bûn. Carinan 'erdek an jî rezek didan û carinan jî pez û zêr û dirav didane wan. Carinan jî di memûriyeta dewletê de wezîfe didane wan.

Lê mixabin ev fersend ji bo helbestvan û nivîskarên Kurdan pir hindik çêbûye. Gelek caran berhemên ku hatine nivîsandin, bêxwedî mane. Heta carinan ji ber ku ew berhem bi Kurdî bû, xwediyê berhemê leqayî gelek astengên cuda jî hatiye.

Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî jî bi qasî ku em dizanin pêşkêşî tu desthilatdaran nehatiye kirin. Jixwe di dema wî de tu desthilatdarên Kurdan tune bûn.

Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî yek ji dîwanên girîng ê edebiyata Kurdî ye. Dîwana di destê me de dîwaneke serdema edebiyata klasîk a dawî ye. Xelîlî bi xwe navek li dîwana xwe kiriye. Navê dîwanê jî Gulcivîn e. Di dîwanê de 143 helbest cih digirin. Em dikarin bibêjin ku ew dîwana di destê me de dîwaneke muretteb e. Di dîwanê de ji xeynî çend tîpan, bi hemî tîpên alfabeyê, helbest hatine nivîsandin. Tenê bi tîpên *c, f, q, x'yê* helbest nehatine nivîsandin. Êdî ji ber çî bi van tîpan helbest nehatine nivîsandin, em baş vê nizanin. Dibe ku ew helbest winda jî bûbin. Em vê yekê bi zelalî nizanin. Lêbelê rêzkirina helbestan, ne li gorî rêza alfabeyê ye. Sebeba vê yekê jî ne eşkere ye. Dibe ku piştî helbestvan nivîsandin, hinek katiban tevî lêv kiribin, an jî jixwe, ne li gorî rêzê bin.

Ji ber ku taybetiyên fîzîkî yên dîwanê di beşa metnên dîwanê de hatine dayîn, li vê derê em wan dubare nakin.

Di vê beşê de em ê bi rêzê li ser zimanê dîwanê, teşeyên nezmê yên ku dîwanê de hatine bikaranîn, hêmanên rîtmîk (wezn, qafiye û redîf), hunerên edebî û cureyên nezmê rawestî.

2. 2. ZIMANÊ DÎWANÊ

Em dikarin bi rehetî vê bibêjin ku Mela Sîraceddînê Xelîlî ji aliyê zimên ve gelekî serkeftî ye. Zimanê ku di helbestê de bi kar aniye, xurt û herikbar e. Xelîlî bi Kurdî, ‘Erebî, Farisî û Tirkî dizanîbû. Em dikarin bibêjin ji xeynî Tirkî di her sê zimanên dî de gelekî serkeftî ye. Lewra helbestên spehî bi van her sê zimanan nivîsandine. Helbestên wî yên bi Tirkî gelekî zeîf in. Êdî di Tirkî de axaftina wî jî wilo ye an na, em vê baş nizanin. Eşkere ye ku Tirkîya wî li gorî zimanên dî zeîf e. Lewra wî di saziyên fermî de perwerde nedîtiye, di medreseyan de perwerde dîtiye û di şûna Tirkî; ‘Erebî û Farisiya wî bi pêş ketiye. Em ê ji van her çar zimanan jî li jêrê mînakên bidin.

Wekî din zimanê wî gelekî sivik e û di roja me de bi hêsanî tê fêhmkirin. Peyvên ku bi zimanên biyanî bi kar anîne jî, fêhmkirina helbestê zehmet nakin. Ji bo ku zimanê wî yê helbestê hinekî were fêhmkirin em ê niha li jêrê hinek mînakên ji dîwanê rêz bikin:

Qenc guh bidin gellî biran vê şîretê hîffiz bikin

Da hilnedin barê giran roja ji qebrê derkevin

(3/1)

Goştê te ax hestî çiya pirça te wek dar û giya

Xûn rengê ava kaniya her dem diherkê wek şetek

(7/12)

Guh nede şeytan û nefsê her divin kû tu bitehsê

Bi ser û pa herê hepsê divedin pêşya te dav

(17/7)

Wekî ku di van malikên li jorê de jî xuya dike, di zimanê dîwanê de bi piranî peyvên rojane hatine bikaranîn. Carinan peyvên zimanên biyanî bi kar anîne, lêbelê dîsa jî zimanê dîwanê tê fêhmkirin.

Mela Sîraceddîn di dîwana xwe de Kurdiyeke dewlemend bi kar aniye. Di destpêkê de em dikarin bibêjin ku cihê ku jiyana xwe lê derbas kiriye, navenda Kurdistan û Kurdiyê ye. Lewra ji bo demeke dirêj herêma Botan ji bo ‘ilm, çand û Edebiyata Kurdî wekî navend xwe daye qebûlkirin. Em dikarin bibêjin ku Zimanê Kurdî jî herî baş li vê herêmê dihate istimalkirin. Mela Sîraceddîn piraniya ‘emrê xwe li herêma Botan derbas kiriye. Qismê dî jî li Herêma Torê derbas kiriye. Jixwe axaftina van herêman ji ber ku nêzîkî hev in, ji hev zêde ne cuda ye. Êdî bandora van

her du herêman jî li ser zimanê wî heye. Lêbelê ji ber ku cihê jidayîkbûna wî ye em dikarin bibêjin ku herêma Torê hinekî serdesttir e.

2.2.1. Taybetiyên Devoka Torê

Mela Sîraceddînê Xelîlî li herêma torê hatiye dinyayê û destpêka jiyana xwe jî li vê herêma derbas kiriye. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin zimanê wî yê resen li ser devoka Torê ye. Yanî dîwan bi devoka Torê hatiye nivîsîn. Di helbestên xwe de peyvên herêma torê û taybetiyên vê devokê bi giranî bi kar anîne. Êdî ji ber ku li Herêma Bota jî pir maye; hinekî bandora Bota jî di dîwanê de xuya dike. Em ê niha bandora devoka Torê bi hinek mînakên nîşan bidin:

Di devokê torê de qertafa dema niha ya kesê sêyem yê tekane, ne “e” wekî “ê” tê bikaranîn. Ev rewş di beyta jêrê de baş xuya dike û gotiye “dinalê”.... û “diçê”...

Dinalê her dem û gavê wekî êsîrkî der davê

Diçê jê xwîn wekî avê gelo dermanê min kanî

(1/9)

Di malika jêrê depeyva “wilo” hatiye bikaranîn. Em dikarin bibêjin ku bi piranî li Herêma Torê ev peyv tê bikaranîn. Li herêmên di peyvên “wisa”, “welê”, “werrê” û hwd. têne bikaranîn.

Wilo zane kû tu mislê yekî rêweng û mêhvanî

Dinê wek kolika nator hesêb kin ya îbadellah

(2/35)

Di devoka torê de ji bo tîpa kelijandinê, ji bedêla “y”ê gelek caran “w” tê bikaranîn. Di vê malika li jêrê de ev taybetî xwe nîşan dide. Ji xeynî vê, taybetiyeke di jî heye. Di rêza duyem de ji bedêla bêje “gunhê min” gotiye “gunhêm”. Ev taybetî di devoka torê de gelekî belav e. Mînak: “Hevalêmin nîn in.”

Rehman tu wî erhem tu wî deyyan tu wî e‘zem tu wî

Ĝefarê her *gunhêm* tu wî hem heftê yû heşt qebheta

(4/56)

Di malika jêrê depeyva “titkirinê” hatiye bikaranîn. Bi qasî ku em dizanin ev peyv di devoka torê tenê de tê bikaranîn û me’neya wê “qeşitandin” e. Li hinek herêmên di jî bo vê peyvê “qewirandin” tê bikaranîn. Yanî mirov yekî ji cem xwe bi bêrûmetî bike der.

Yazdeh neqil tu b’Cim’e kê vî qeşmerî kolê xwe kê

Wî j'ber derê xwe *tit nekê* b'kû ve herê qencî ji ta

(4/62)

Taybetiyeke Kurdî jî tewang e. Lêbelê ev taybetî li hinek herêman kêmbûye an jî wîndabûye. Lê li herêma torê hê jî baş tê bikaranîn. Di beyta li jêrê de jî ev taybetî di peyva “Ezmên” de xuya dike. Lewra ev peyv “Ezman” e û jî ber tewangê bi şêklê “Ezmên” hatiye bikaranîn. Bi taybetî ev cureyê tewangê li herêma Torê heye.

Ezmên de ba w baran hene hilm û dimû'ê te hene

Ezmên de sayî 'ewr hene kêf û gedeb tên yek bi yek

(7/8)

Di devoka torê li hinek cihan tîpa kelijandinê nayê bikaranîn. Di vê malika jêrê de peyva “nayê” bi şêklê “naê” hatiye nivîsîn.

Ellah ew e em 'ebdê wî Sîrac ji bo gunha jî wî

Efwê bixwaze navê wî Geffar e rehm *naê* hedek

(7/31)

Di malika li jêrê de jî peyva “laş” hatiye tewandin û bi şêklê “lêş” hatiye bikaranîn.

Wextê ku rûh derket ji bin tiştê di 'erdê de hebin

Avêt û ma vala kirin rabû li *lêş* qiyametek

(7/29)

Di malika li jêrê de jî peyva “limêj” hatiye bikaranîn. Ev peyv bi 'eslê xwe “nimêj” e. Lêbelê di devoka Torê de bi şêklê “limêj” pir tê bikaranîn.

Zanibe dunya ne mal e genî yû pûç û betal e

Her bike bo Zilcelal e hecc û rojî yû *limêj*

(18/9)

Lê li herêma Torê qertafa dema niha bi piranî tê serê peyvê û bi vî rengî tê gotin. Wekî dirazin, dirûkin, divekin ûwd. Ev taybetî jî di gelek cihên dîwanê de xwe nîşan dide. Di malika li jêrê de peyva “dirûnin” hatiye bicihkirin. Ev peyv li gelek herêman bi şêklê “rûdinin” tê bikaranîn. Lê ev taybetî jî li gelek cihên dîwanê xwe nîşan dide.

Pal nede rengê emîra kû *dirûnin* ser herîra

Lê bibe mislê feqîra rûne ser merş û kulav

(17/4)

Di malika li jêre de jî peyva “halo” hatiye bikaranîn. Ev peyv jî bêhtir li herêma torê tê istimalkirin. Wekî di jî di peyva “serê bîn” û “karwên” de jî taybetiya tewangê heye.

Dunya fena ye dil lê nerûnên meznatiya wê *halo* bihesbên

Wek tu ji hewşê çûyî *serê bîn* ku rojê avêt bar kirye *karwên*

(19/13)

Êdî li herêma Torê li hinek cihan ji bedêla peyva “tu”, peyva “tî” tê bikaranîn. Çawa ku carna “tê” tê gotin, carna jî “tî” tê gotin. Ji bo mînak: Tî çawa yî? Bersiv jî dibêje: Ezî baş im. Belê wekî ku tê dîtîn ji bedêla “tu”, “tî” û ji bedêla “ez”, “ezî” tê bikaranîn. Ev taybetî li gelek cihan xwe nîşan dide. Di malika li jêre de peyva “tî” hatiye bicihkirin. Ev peyv ne di me’neya “tî û birçî yanî têhn” de hatiye bikaranîn. Me’neya wê ev e: “Tu” yanî kesê tekane yê duyem.

Digotin min tu pur baş î ji min re qenc î qerdaş î

Xelet bûm nedgo *tî* şaş î çikû ew hingî mayî birç

(41/3)

Di malika li jêre de peyva “geriham” hatiye bicihkirin. Li herêmên di bi piranî ji bo vê peyvê “geriyam” tê gotin. Lê herêma Torê ji bo tîpa kelijandinê ji bedêla “y” gelek caran “h” tê bikaranîn. Wekî “xiriham” (xiriyam), “westeham” (westiyam), “razeham” (raziyam) ûwd. Di vê malikê de û di gelek cihên di de jî ew taybetî xwe nîşan dide.

Qelesa min binivîs ez li dinê pur *geriham*

Me nedît û ne bihîstî di çîqa weqt û heyam

Kû di bin emrê ewan de bigerê çerxê nîzam

Kaxedê yek bibirê wek te di ‘efw û di ‘îdam

Qelesa min qelesa min qelesa min qelemê

(63/11)

Di malika li jêre de peyva “dohn” hatiye bicihkirin. Me’neya vê peyvê “rûn” e. Li herêma Torê di dawîya hinek peyvan de giraniya tîpa “h”yê heye. hinek jî van peyvan: Rahn (ran), sohr (sor), pahn (pan), şêhr (şêr) ûwd. Vê taybetiyê jî di dîwanê de li gelek deran cih girtiye.

J’ken û kélma di nav lêvê ji dostê rê li ser sêvê

Ji wê 'enya kû nîv şêvê şefeq bê gaz û *dohn* dabû

(105/10)

2.2.2. Taybetiyên Devoka Botan

Ji ber ku Mela Sîraceddîn demeke dirêj li herêma Cizîrê maye, bandora devoka Bota pir têsîr li zimanê wî kiriye. Ev têsîr di helbestên wî de jî xwe baş nîşan dide. Li jêrê me çend mînak ji dîwana wî wergirtin.

Peyva *welê* bêhtir li Herêma Bota tê bikaranîn. Li herêmên di ji bo vê peyvê “wilo” û “wisa” tê bikaranîn. Di malika jêrê depeyva “*welê*” hatiye bicihkirin.

Tu têr nexwe hinda *welê* ma lazim e qulpik hilê

Lê paşî tê bêjê melê seyda bi lez limêj bikin

(3/31)

Peyva “*fekirîn*”ê li herêma Bota bi me’neya nêrîn/meyzandinê tê bikaranîn. Di malika jêrê depeyva “*fekirî*” hatiye bikaranîn.

Paşî li ‘erdê *b’fekirî* Xaliq tu wek wî çêkirî

Hun her du wek yek menzerî nuqsan nehiştî zerreyek

(7/10)

Li herêma Bota ji bo peyva “*we*”, peyva “*hewe*” tê bikaranîn. Tenê li Herêma Bota bi şêklê “*hewe*” tê gotin. Di malika jêrê depeyva “*hewe*” hatiye bikaranîn.

Sûnda mezin min xwarî kû heştta rûhê me p’çek hebê

Terka me nîn e ji bo *hewe* tû emîn bibe bike tû yeqîn

(120/2)

2.3. Peyvên Kurdî Yên Resen

Mela Sîraceddînê Xelîlî di berhema xwe de gelek peyvên Kurdî yên resen bi kar anîne. Gelek peyvên ku îro hatine jibîrkirin di dîwana wî de cih girtine. Lewra peyvên ku hatine jibîrkirin, di berhemeke edebî de bi rengekî zindî derdikevin pêşîya me. Ev yek jî di navbera îro û dîroka edebiyatê de dibine wekî pirekê. Bi rastî peyvên wiha pîr gelek in, bi sedan e. Ev jî nîşan dide ku helbestvan di zimanê Kurdî de mahir e serbest lê diçe. Hinek ji wan peyvan ev in: çeper, dav(ik), bor, derîzan, girîş, hedan, jih, kever, kewgîr, mamik, miz, qozeqer, qeraş, pût, soba, şûv, suxrevan, xewnerojk, ziha, qamçûrçî, ting û hwd. Bi rastî peyvên gelekî zêde ne. Ji van peyvan em ê li jêrê hinekan di nava malikan de nîşan bidin.

Çeper: kozik (24/10), **davik:** xefk (30/20), **bor:** çemê piçûk (33/48), **derîzan:** stara li ber devê dêrî (53/9), **Girîş:** loda dexla gêrenekirî (31/6), **demûş:** tiştê mezeloqî (31/6), **hedan:** sekin, tebat (114/2), **jih:** benikê kevanê (33/5), **Kever:** reş û spî (108/7), **qozeqer:** keskesor (108/7), **kewgîr:** nêçîrvanê kewan (69/1), **mamik:** bilmece (bi tirkî) (47/1), **miz:** tirş û şîrîn (91/2), **qeraş:** aşvan (124/8), **pût:** êmê salê yên heywana (64/12), **soba:** kesê bi avê dizane (46/3), **şûv:** erda neajotî (47/16), **suxrevan:** şixulker, pale (53/17), **Xewnerojk:** xewna bi rojê tê dîtin (30/16), **kunoj:** qesîs (30/16), **ting:** sergo (11/9), **ziha:** marê mezin (47/15)

2.4. Biwêj û Gotinên Pêşyan ku di Dîwanê de Hatine Bikaranîn

Helbestvan di dîwana xwe de biwêjên Kurdî pir bi kar anîne. Ev hêza zimên zêdetir dike. Di helbestê de bicihkirina biwêjan bi rastî hostetiyê dixwaze. Mela Sîrac di vê mijarê de jî gelekî jêhatî ye. Biwêjên ku bi kar anîne, me'ne û hêza helbetstê zêdetir kiriye.

Mele Sîraceddînê Xelîlî di exlebê diwana xwe de zimanê rojane bi kar aniye. Çawa ku di zimanê rojane de gotinê pêşyan û biwêj pir tene bikaranîn, di dîwanê de jî gelek biwêjên Kurdî cih girtine. Hinek ji wan biwêjan ev in:

Tê paşî çê tilyê bigez (3/25)

Şeytan bi wê b'te d'leyîzin (3/25)

Xwariye lew şîrê xav (17/9)

Nikare bi kerê, li kurtên dixê (21/14)

Teyrikê tûretanî, te mala xwe xira kir; ya me jî li ser danî (22/35)

Hasil giha Mûsil (24/23)

Heta min xwe nas kir, min emrê xwe xilas kir (24/60)

Qedrê gulê çi zane, kerbeş divê kerê reş (29/04)

Xêra bike li masî welew masî nizanê (29/08)

Bû dizê sola xwe (29/29)

Weke marê di tûr de (31/04)

Weke kerê elimiye girîşê (31/06)

Limêjê pa tu çi limêj î (33/09)

Jîjo dibêje çiqas çêlikê min şahîk in (42/18)

Gêsin di çavên yekî de bû, digot binêrin şûjin di çavên filankes de ye (4/19)

Dostaniya quling û rovî (46/6)

Ji dest hev hilanîn (54/9)

Mirov sê dide xatirê xwedî (64/34)

Mirov bi xweziya nagihe keziya (70/28)

Rê ji dila diçne dila (100/1)

Dew birayê mêst e (126/7)

2.5. Unsûrên ‘Erebî, Farisî û Tirkî

Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de taybetiyeke wiha heye ku helbestvanan bi zimanên biyanî jî helbestan dinivîsin û di dîwanên xwe de cih didine wan jî. Bi vî rengî dixwazin ku mehareta xwe ya di zimanên biyanî de bidin nîşandan. Ji ber vê yekê helbestvan bi çend zimanan bizanibin, bi hemiyan helbestan dinivîsin. Carinan tevahiya helbestê bi zimanekî cuda dinivîsin û carinan jî her rêzeke malikê/bendê bi zimanekî cuda dinivîsin. Ji helbestên wiha pîrzimanî re *mulemme*’ tê gotin.³⁰ Ji bo mînak rêza pêşî bi ‘Erebî, rêza duduyan bi Kurdî, rêza sisiyan bi Farisî û hwd... Carinan jî malîkek bi Kurdî, yek bi ‘Erebî/Farisî û hwd... Mela Sîraceddîn jî bi çar zimanan (Kurdî, ‘Erebî, Farisî û Tirkî) helbest nivîsandine.

2.5.1. Unsûrên ‘Erebî

Di diwanê de piştî Kurdî herî zêde bi ‘Erebî helbest hatine nivîsandin. Êdî carinan helbest bi tevahî bi ‘Erebî hatine nivîsandin, carinan îfadeyeke ‘Erebî cih kiriye û gelek caran jî ji ayet û hedîsan îqtîbas hatiye kirin.

2.5.1.1. Îqtîbas

Îqtîbas ew e ku helbestvan an jî nivîskarek ayet an jî hedîsekê tevî berhema xwe bike.³¹

Yên berê îqtîbas wekî mustehsen û mustehcen dikirin du şeq. Mustehsen bi me’neya ya ku xweşik hatiye hesibandin û mustehcen jî bi me’neya ya ku xirab hatiye hesibandin.

1. Îqtîbasa (mustehsen) ku xweşik hatiye hesibandin

Îqtîbasa mustehsen ew e ku peyvên hatine girtin, ne li dijî şerî’etê bin û li xweşiya guhdar û xwendevanan were. Êdî ev îqtîbas jî bi nave “ehsen” û “hasenê” dibe du şeq. Îqtîbasa ehsen tê me’neya ya herî xweşik û hasen jî tê me’neya ya xweşik.

³⁰ Saraç, b.n.b., r. 57.

³¹ Bilgegil, b.n.b., r. 268.

a.Îqtîbasa (ehsen) herî xweşik

Bi şertê ku şîreteke bi feyde tê de hebe û di navbera îfadeya helbestvan an jî nivîskar û ayet an jî hedîsê de ahengek hebe û bandroreke xweş li ser gundar an jî xwendevanan bike; ev îqtîbasa (ehsen) herî xweşik e.

Di malika jêrê de ayeteke Quranê hatiye wergirtin: “*Wellahû xeyru 'l-makirîn layehdî keyde 'l-xaînîn*”³² ku tê me'neya “Xwedê di nava kesên ku xefkan divedin de, yê herî bi xêr e û nahêle ku kesên xayîn bigihin mexseda xwe.

Wellahû xeyru 'l-makirîn layehdî keyde 'l-xaînîn

Nedwetgerênê roj û şev pîlangirê pîlê me bû

(68/13)

Di malika jêrê de ayetek ji sûretê îxlasê hatiye wergirtin. Ayeta destpêka sûretê îxlasê ku dibêje: “*Qul huwe-llahu ehed*”³³ yanî “Bibêje Xwedê yekî bi tenê ye.”

Ka ji vê çêtir behatir ka ji vê xweştir gelo?

Gih dixwênin Fatiha gih “*Qul huwe-llahu ehed*”

(5/14)

Di malika jêrê de dîsa hedîseke li ser qelbê insanan bi cih kiriye. Di hedîsê de dibêje “*Ku kibir di dilê kesekî de hebe, ew tu caran naçe cennetê.*” Li malika li jêrê de ev hedîs bi cih kiriye û taliyê jî gotiye “*got qasidê insan û cin*” weke ku tê zanîn qasidê insan û cin Muhemmed Mustefa (s.e.w.) e.

Kesê di qelbê wî hebê kibr wek misqalê zerre bê

Di cennetê çûnî nebê got qasidê insan û cin

(3/18)

b.Îqtîbasa (hasen) xweşik

Bi şertê ku di navbera îfadeya ku hatiye standin û ayet an jî hedîsê de tiştekî li dijî şerî'etê tune be û bandroreke xweş li ser gundar an jî xwendevanan bike; ev îqtîbasa (hasen) xweşik e.³⁴

Di vê malika li jêrê de jî meala ayetekê bi tevahî nivîsandiye. Di ayetê de mealen bi erebî dibêje: “*Me cin û insan, tenê ji bo ku ji me re îbadetan bikin, afirandine.*”³⁵

³² Suretê Enfal, ayeta 30î.

³³ Sûretê Îxlasê, ayeta 1ê.

³⁴ Bilgegil, b.n.b., r. 268.

Xuda gotî me nexulqand ne cinn û hem me ne insan

Ji geyrî kû bikin ta 'et ji bona Rebbê xwe Ellah

(2/9)

2.Îqtîbasa mustehcen

Îqtîbasa mustehcen ew e ku ayet an jî hedîsek di nava îfadeyeke ne li gorî edebê Islam û şerî'etê de cih bigire.

Ji xeynî vê jî îqtîbas bi vî rengî tê tesnîfkirin. Li gorî girtina hedîs an jî ayetê bi tevahî an qismî ye. Yanî heke bi tevahî hatibe girtin, **îqtîbasa tam**; heke qismî hatibe girtin jî **îqtîbasa naqis** jê re tê gotin.³⁶

a.îqtîbasa tam

Di van malikên jêrê de îqtîbasa tam heye:

Di malika jêrê de ayetek ji sûretê tebbet hatiye wergirtin. Ayeta “*Fil-cîdî heblun min-mesed*”³⁷ ku dibêje “*tevî werîsekî ku stûwê wî de ye*”

Şukrê ser van ni 'meta ma kengî em dikne xilas

Kû nedan em te j'ewê “*Fil-cîdî heblun min-mesed*”

(5/15)

Di malika jêrê de jî dîsa hedîsek bi kar aniye. Di hedîsê de dibêje: Di laşê mirovan de parçeyek goşt heye ku ew baş û paqij be, laş hemî paqij e; lê ku ew xirab û qirêj be, hemî laş pîs û xirab e.” Li jêrê ev hedîs aniye zimên.

Di lêş de parçeyek ger ew sehîh bê laşî tev sag e

We ger mufsid bê laş cumle xirab e got hebîbullah

(2/28)

Di malika jêrê de hedîseke meşhûr bi cih kiriye. Li gorî gotina pêxember, divê mirov ji bo tiştê haram nebêje helal e û ji bo tiştê haram jî nebêje helal e. Ku mirov wisa bibêje mirov dikeve kufrê de. Ji xeynî vê jî divê musulman tu caran li gorî zenna xwe 'emel nekin.

Ger tiştê helal bikê ji cem xwe yan heram bikê

³⁵ Sûretê Zariyatê, ayeta 56an.

³⁶ M Bilgegil, b.n.b., r. 268.

³⁷ Sûretê Tebbet, ayeta 5an.

Biya nefis û zennê bikê îman û dîn herdu diçin

(3/34)

Di hedîsekê de Resûlê Ekrem wiha gotiye: Di heyamê ku ummeta min ji rêya min dûr ketiye de, kî xwe bi sunneta min bigire; ji bo wî xêra sed şehîdî heye. Di vê malika li jêrê de ev hedîs îktîbas kiriye.

“Kesê xwe bi sunneta min bigrê nik îfsadê insana

Ji xêra sed şehîda jê re kêr nîn e” Ji vê hijmar

(11/56)

b.Îqtîbasa naqis

Di van malikên jêrê de îqtîbasa naqis heye:

Di malika jêrê de peyva “*lateqrebû*” ayeteke Quranê ye û tê me’neya “*nêzîk nebin*”. Li vir îqtîbasa naqis heye. Tevahiya ayetê cih negirtiye. Lê ji ber ku di dewama wê de dibêje “*zina çavan*”, em dikarin bibêjin ku ev ayet e ku dibêje “*Nêzîkî zinayê nebin.*”³⁸

Heramî pê nezer yek car neke ew tîrê Şeytên in

Zina çavan ev e *lateqrebû* gotî Kitabullah

(2/13)

Di malika jêrê de ji ayetekê tenê peyvek hatiye wergirtin. Peyva “*La teqnetû*”³⁹ ku tê me’neya “*Hêviya xwe qut neke.*”

Çiku “*La teqnetû*” gotî di Qur’ana Kerîm de ez

Her ro her her bi hêvî me ji rehîma dergehê Geffar

(11/59)

Di malika jêrê de hevokek ji ayetekê hatiye wergirtin. Di rêza pêşiyê de gotiye “*Elestu b’Rebbîkum.*” Ev ayet di edebiyata klasîk de pir tê bikaranîn. Meala vê ayetê ev e: “*Ma qey ez ne rebbê we me?*”⁴⁰ Di pey re jî helbestvan me’neya wê jî nivîsiye.

Di rêza duyem de jî dewama ayetê gotiye: “*Bela!*”⁴¹ yanî “*belê.*”

Got: “*Elestu b’Rebbîkum*” qey ez ne Rebb im bo hewe?

³⁸ Sûretê Îsra, ayeta 32yan.

³⁹ Sûretê Zumer, ayeta 53yan.

⁴⁰ Sûretê E’raf, ayeta 172yan.

⁴¹ Sûretê E’raf, ayeta 172yan.

Wan “Bela!” gotin belê çiqqa ced û bav û weled

(5/3)

Di malika jêrê de ayetek ji Quranê wergirtiye ku ev ayet di gelek sûretan de derbas dibe. Di heman demê de peyva pêşî ya kelîmeya şehadetê ye jî ku dibêje “*La îlahe îllellah*”⁴². Tê vê me’neyê: “*Ji xeynî Xwedê tu îlah nîn in.*” Jixwe me’na ayetê bi Kurdî gotiye.

Bang kirye wî ba zar û ah (*ğeyrî te nîn in tû Îlah*)

(Subhan ji te E’ji zalima me) xalibê emrê me bû

(68/16)

- Îqtîbasên ji Ayetan

Helbestvan di helbestên xwe de gelek caran ayetên Quranê bi kar anîne. Helbesta 4emîn hemî li ser sûretên Quranê hatiye nivîsîn. Helbest bi xwe jî 114 malikan pêk tê. Her malikek li ser sûreteki Quranê hatiye nivîsîn û gelek caran jî wî sûretî hinek ayet hatine îqtîbaskirin. Ji ber ku di Quranê de 114 sûret hene, helbest jî jî 114 malikan pêk hatiye. Ji bo mînak em li jêrê cih didine sê malikên vê helbestê yên pêşî.

Ya Reb bi *Fatiha* kitab qelbê me veke *b’heft ayeta*

Sabit bike b’enwar û tab zail ke jê her ‘illeta

(4/1)

Tu b’hurmeta *El-beqerê* j’min bib heçî gunhê berê

B’du sed û heştê w şeş perê min tu bide pir hikmeta

(4/2)

B’*Imran* û *du sed gewhera* j’min tu muhû ke deftera

Fisq û fucûr û kedera ‘ewnê dixwazin em ji te

(4/3)

- Îqtîbasên ji Hedîsan

Di Edebiyata Klasîk de helbestvan gelek caran ayet û hedîsan bi kar tînin. Ev, nîşan dide ku ew di ‘ilmên olî de gelekî kûr û mahir in. Ji xwe exlebên helbestvanên Kurd, di medreseyan Kurdî de xwendine û di qada ‘ilmên (neqlî) olî de zêde pêşketî ne. Mela Sîrac jî di dîwana xwe de pir cih daye hedîsên pêxember (s.e.w.). Em ê hinek hedîsan li jêrê rêz bikin:

⁴² Sûretê Muhemmed, ayeta 19an.

Di malika jêrê de hedîseke pêxember gotiye. Hedîs bi tevahî zikir kiriye û di dawiyê de jî gotiye: “got Resûlullah.” Yanî eşkere kiriye ku ev peyv, peyva Resûlê Xudê ye.

Kesê kû dagirê çavan b’heramî dê di heşrê de

Xuda dê dagirê çavê wî agir got Resûlullah

(2/14)

Di malika jêrê de hedîseke meşhûr bi cih kiriye. Di hedîsê de dibêje kesê ehlê Xudê be, divê qencyên xwe jibîr bike û gunhê xwe bîne bîra xwe. Dîsa çavkaniya xwe bi peyva “*gotî Şefî’ê mey mezin*” eşkere kiriye. Li gorî baweriya Îslamê Resûlê Ekrem (e.s.w.) roja qiyametê wê şefa’etê li muslumanan bike. Mela Sîraceddîn bi xwe jî di mewlûda xwe de dibêje:

Çêtir e bo me ji rûh û can û mal

Şafî’ê roja giran e ey heval⁴³

Kesê Xuda hez jê bikê wê qenciya xwe j’bîr bikê

Gunhê xwe wê l’bîra xwe kê gotî Şefî’ê mey mezin

(3/22)

Di malika jêrê de hedîseke li ser xwarinê gotiye ku pêxember dibêje “Wextê ku zik têr bin ruhaniyeta mirovan dimire, kengî zik birçî dibe rûhaniyet careke dî tê bedenê de.” Di gelek hedîsan de bi meala “*xwarina zêde nebaş e*” îfade hene. ‘Eynî weke ku ava zêde ji dextl û giyayan re nebaşê. Di dawiyê de jî gotiye: “*ev gotinê pêxember in*”.

B’têrbûnê qelb ruhê jê diçê çawa dexil rengê jê diçê

Baran gelek kû tê diçê ev gotinê Peygamber in

(3/32)

Di malika jêrê de hedîseke ji bo axrê zemên hatiye bicihkirin ku pêxember gotiye “Di axrê zemên de ava Çemê Feratê wê biçike û çiyayekî zêr wê ji binê avê derkeve û ji ber vê xizînê ji sedî nod û neh insan wê bêne kuştin.”

Nema ku pur çiyaê zêr ji bin ava Furat der bê

J’sedan yekê jê xilas bê not û neh bîn kuştin û bê zar

(11/37)

Niha jî em ê çend malikên ku hedîsan di xwe de dihevin li jêrê bi cih bikin.

⁴³ Ataç M. Sıddik, Kitaba Durra Birincî Mewlûda Kurmancî, Renk Ofset, Nusaybin, 2001 r. 9.

Nema pur ku nefîr 'ema mezin rabê biqelhin mêr

Serê pênceh jinê mêrek bibê malxwê bibê cotar

(11/41)

Nema pur Mehdî zahir bê le 'în Deccal suwarê ker

Nebî Îsa ji 'ezmana bibê nazil û bêtin xwar

(11/42)

Nema pur derkevin Ye 'cûc û Macûc ew ji bin seddê

Vexun avê çem û behran çikû zehf in gelek diwar

(11/43)

Nema pur Dabbet-ul Erdê ji nîv rukn û meqam bê der

Dirifkin nas bikin herkes kî ye mu'min kî ye kuffar?

(11/44)

Nema pur ku ji rojava ve roja me bibê tali '

Derê tewbê werê girtin li piştê bar bê her du bar

(11/46)

Çewan ku zehmet e qencî di vî weqtî wulo feyda

Ewî zehf e Çewan ku gotî serdarê sehab û yar:

(11/55)

Dinê ger bi hêja perê mêşekî

Li cem Xaliqê 'erş û Ferş û beşer

(24/51)

Qe ned'da ji wê wî bi yek kafirî

Tu tiştêk welew qasî misqalê zer

(24/52)

Gelo qey te navê ku dunya betal

Ji bo wan bibê mesken û musteqer

(24/53)

Ji bo me hebê cenneta baqî ye

Me lezzet herê wî cihê bê keder

(24/54)

(Di cam 'ê de munafiq her wekî masî di tore de)

Di heqqê wî de ev hatî hedîsa nazik û şîrîn

(32/7)

Limêja tû dikê wek dîk du sê nikla li 'erdê dê

Bi rojê re dikê subhê dikê nîvro di 'esrê de

(33/8)

2.5.1.2. Biwêj û Îfadeyên 'Erebî yên ku di Dîwanê de Hatine Bikaranîn

Li jêrê me cih daye hinek biwêjên erebî ku Mela Sîraceddîn di dîwana xwe bi kar anîne.

Ehlê civata hazir bêjin hemî temamî

Li ser nebî selewat hebin 'eled dewamî

(40/1)

*(Fenafîl-hurûf bûm)*⁴⁴ di vê meclîsê

Gerîq im ji bêhna gul û nercîsê

(70/30)

Dixum sûndê bi Zatê Lemyezel⁴⁵ ez

Eger wek wan bikê qencî ji canî

(22/24)

2.5.2. Unsûrên Farisî

Di dîwanê de gelek peyvên Farisî hatine bikaranîn, lêbelê wekî helbest, pir hindik in. Li gorî 'Erebî jî gelekî kêmtir in. Tenê du helbest bi tevahî bi Farisî hatine nivîsandin. Wekî din di hinek helbestan de îfadeyên Farisî jî hene. Ji xeynî van jî,

⁴⁴ Di nava herfan de tune bûm, winda bûm.

⁴⁵ Yê ku bêdestpêk e. Ev peyv, tenê ji bo Xwudê tê gotin.

hinek helbestên ku bi Kurdî hatine nivîsandin jî, ji Farisî hatine wergerandin. Ji xwe di despêka helbestan de ev yek, hatiye eşkerekirin.

Helbestên 43 û 44an bi tevahî bi Farisî hatine nivîsandin. Me helbesta 43yan xwendina wê ya bi tîpên latînî û me'neya wê jî bi Kurdî nivîsandiye. Sê malikên helbestê li jêrê ne:

Der î n donya kesê bî gem nebaşed

Weger başed benî-adem nebaşed

Li vê dinyayê kesî bêgem nîn e

Heke hebê jî ew benî adem nîn e

(43/1)

Yekî ra ba gemê î n darê fanî

Kê ûra meylê an donya nebaşed

Yek di vê xema vê dinyaya fanî de ye

Ku ew kes meyl û daxwaz ji dinyaya din çinîne

(43/2)

Dêger gerq est şuda ez fikrê 'oqba

Kê î n donya çê der fêkreş nebaşed

Yekî dî daîm di fikra 'uqbayê de gerq bûye

Û guh nade û nafikire ku ev dinya çi ye

(43/3)

Wekî me li jor jî got gelek caran peyvên Farisî di helbestan de hatine bikaranîn. Çend mînak li jêrê ne.

Gunahê min pur in mislê *turab* û *seng* û hem remlê

Îlahî l'min neke hemlê giran ta bikme fîganî

(1/4)

Min bistirên ez her ziyan *der* hîfzê xwe d'kin *ma-nehan*

Mî-sernehim ber asîtan ez barê hejdeh Hûcreta

(4/50)

Li alîkî wekî şêran li alîkî wekî rovî

Li alîkî wekî mêşin li ê dî *gurgê* çiyaê

(10/17)

Dema bimrim gelî yaran me bikne nava dîwaran

Me bispêrin di nav maran *der an halet* bibim tazî

(13/2)

Dinalê her dem û gavê wekî êsîrkî *der* davê

Diçê jê xwîn wekî avê gelo dermanê min kanî

(1/9)

Sîraceddîn ji xew rabe di hikmê wî tu derya be

Ku bê wî çîz tu ca nabe rica ke şubhê dîwanî

(1/13)

Xulqandî insanek delal *ba* şeklekî rengê hilal

Dayêde qedd û wechê xal nîn e di rengê wî de yek

(7/2)

2.5.3. Unsûrên Tirkî

Di dîwanê de unsûrên Tirkî jî gelekî hindik in. Tenê du helbest bi Tirkî hatine nivîsandin. Helbestên 45 û 80yan bi tevahî bi Tirkî hatine nivîsandin. Her du helbest jî zêde ne dirêj in. Ji xeynî van jî kêmkê caran peyvên Tirkî di nava helbestan de hatine bikaranîn.

Ji aliyê edebî ve helbestên Tirkî zêde ze'îf in.

Ji helbestên Tirkî me (ya 45 û 80yan) her yekê 3 malikên pêşî li jêrê me rêz kirin.

Ey hemşerim dinle beni söyleyelim dinle beni

Çok dertliyim dinle beni dinle beni dinle beni

(45/1)

Dünyayı gezdim çok zaman hiç bulmadım birden aman

Çoğaldı bu fışk û ziyan dinle beni dinle beni

(45/2)

Her nerde gitsem görmişem tem‘ ve hesed can pişmişem

Tar oldu dünya demişem dinle beni dinle beni

(45/3)

Ey muhterem hocalarım topunuzun çapındayım

Öldürmeyin bir hocayım çalışalım yol alalım

(80/1)

Şu atlasın bilgileri denizaltı gemileri

Kaptansınız hocaları kurtar aman yol alalım

(80/2)

Kimi sever tahrib eder kendi eliyle yaptılar

Yapi inanmaz bu haber çalışalım yol alalım

(80/3)

Ji xeynî van her du helbestan, car caran hinek peyvên Tirkî di helbestan de hatine bikaranîn. Lêbelê ev jî pir kêr in. Hinek mînak ji van li jêr in.

Eger te lîm û dersgirtin wezîfa xwe bi rastî kir

Tu dê terfîyekê *taq* kê ji nik wî Erhemê Geffar

(11/14)

Şev û roj dikuddênin li dunyaê naê dest

Behar û zivistana temûz û di *mayîsa*

(21/10)

Emanet da bi kîn û buxz û qehrê te nebin *qoşmê*

Tuwê hingî di dest wan de bibê bergîlê xwey hevsar


(11/6)

2.3. TEŞEYÊN NEZMÊ

Di vê beşê de em ê li ser aliyê dîwanê yê şiklî (cureyên nezmê, wezin, qafiye, redîf û hwd.) bisekinin. Di van mijaran de me serî li hinek berhemên adademîk yên

wekî *Eski Türk Edebiyatına Giriş: Biçim ve Ölçü* ya *M. A. Yekta Saraç, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk ya Abdurrahman Adak, Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü* ya *İskender Pala, Edebiyat Bilgi ve Teorileri (Belâğât)* ya *M. Kaya Bilgegil, Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz* ya *Haluk İpekten*; daye.

Li vê derê em ê li ser teşeyên nezmê yên ku Mela Sîraceddînê Xelîlî di dîwana xwe de bi cih kirine, bisekinin. Mela Sîraceddînê Xelîlî gelek şiklên nezmê bi kar anîne. Exlebên van cureyan, yên edebiyata klasîk in. Yanî cureyên edebiyata klasîk bi kar anîne; lêbelê hinek helbest, hemî taybetiyên van cureyan di hundirê xwe de nahewînin. Heta hinek cure jî hene ku mirov bi rengekî qet'î nikare bêje ev helbest dikeve nav filan cureyê helbestê de. Bi piranî jî helbestên ku bi 'Erebî û Farisî hatine nivîsandin bi vî rengî ne. Di dîwanê de ev cure helbest hatine bikaranîn: 59 qesîde, 39 xezel, 8 muxemmes, 6 murebbe', 10 qit'e, 8 mesnewî, 3 teşîr, 2 texmîs, 1 museddes, 1 mustezad. Helbestek jî di meqamê şeran de hatiye nivîsîn. Yanî wekî stranên dengbêjan. Ev helbest jî helbesta herî dawî ye. Di serê helbestê de helbestvan wiha nivîsandiye: Li meqamê şeran hatiye nivîsîn. Ji xeynî van jî du helbest (helbesta 95 û 96an) bi şiklekî dîtinî nivîsandine. Yanî li gorî rêza defterê li pey hev nenivîsandine û di nava hevdû de tevlihev nivîsandine. Weke şiklên geometrik nivîsandine.⁴⁶ Ev jî cudatiyeke Mela Sîraceddîn a dî ye.



Grafîk 2: Grafîka ku rêjeya cureyên helbestan nîşan dide.

⁴⁶ Bnr. Helbestên 95 û 96an.

2.3.1.Qesîde

Qesîde navê wê şiklê nezmê ye ku beyta wê ya destpêkê di nava xwe de û yên mayîn jî bi beyta yekemîn ve bi qafiye ne û hejmara asayî ya beytên qesîdeyekî 15 in û dive hemî beytên qesîdeyekî bi heman weznê hatibine nivîsandin.⁴⁷

Hijmara malikên qesîdeyan di navbera 33 û 99an de ye. Lê em dibînin ku Helbestvan zêde li gorî vê qaîdeyê neçûye. Ji xeynî sêzdeh qesîdeyan, yên di li derveyî vê qaîdeyê ne.

Di dîwanê de şiklê nezmê yê ku herî zêde hatiye bikaranîn qesîde ye û di dîwanê de 59 qesîdeyan cih girtine. Qesîdeyên di dîwanê de jî 1382 malikan pêk hatine.

Li jêrê qesîdeyên ku di dîwanê de cih girtine û hijmara malikên wan di tabloyekê de hatine diyarkirin.

Tablo 1: Tabloya Qesîdeyan û Hijmara Malikên Wan.

Rêza qesîdeyan ya di dîwanê de	Hijmara malikan
1	13
2	44
3	42
4	114
5	28
6	25
7	31
8	10
9	9
10	35
11	60
12	26
13	12
14	13
15	36
17	21
18	12
20	11
21	14
22	37
23	21
24	79
26	18
27	13

⁴⁷ Saraç, b.n.b., r. 21.

29	30
31	25
32	15
33	48
35	10
36	9
38	18
39	15
40	12
41	7
42	39
43	12
44	10
45	12
46	12
47	36
48	47
49	10
53	48
54	20
55	29
57	16
58	16
59	24
62	20
64	36
65	10
66	8
69	10
71	9
73	13
75	7
78	10
80	4
86	11

2.3.2.Xezel

Xezel wekî terîmeke edebî tê me'neya helbesta ku malika pêşî di nava xwe de bi qafiye be û rêza duyem ya malikên dî bi malika pêşî re bi qafiye be û bi heman weznê hatibe nivîsandin û bi piranî hijmara malikan di navbera pênc û nehan de be.⁴⁸

Xezel ew girîngtirîn şîklê nezmê ye ku di helbesta klasîk a gelê Rojhilat de herî zêde hatiye bikaranîn. Xezel li ser eşq û evînê tê nivîsandin. Şîklê qafiya wê

⁴⁸ Saraç, b.n.b., r. 56.

wekî qesîdeyê ye. Yanî malika pêşî di nav xwe de bi qafiye ye û rêza duyem yê malikên dî jî bi malika pêşî re bi qafiye ye. Hijmara malikên wê di navbera 5 û 9an de diguhere. Mela Sîrac carinan li derveyî van hijmaran malik nivîsandine. Herî zêde xezelê bi 26 malikan heye û yek jî bi 4 malikan heye. Helbestan bi çar malikan jî werger e. Em dikarin bibêjin ku malikên 26 xezelan, li gorî qaîdeyan hatine nivîsandin.

Wekî hemî helbestvanên klasîk, Mela Sîraceddînê Xelilî jî zêde qedir daye xezelê. Lewra piştî qesîdeyê herî zêde xezel nivîsandine. Hijmara xezelên di dîwanê de 39 in. Wekî ku tê zanîn, helbestvanên ji xwe qaîl, zanebûna xwe ya helbestê, bi xezelê nîşan didin. Mela Sîraceddîn jî gelek xezelên giranbiha nivîsandine.

Li jêrê xezelên ku di dîwanê de cih girtine û hijmara malikên wan di tabloyekê de hatine diyarkirin.

Tablo 2: Tabloya Xezelan û Hijmara Malikên Wan.

Rêza xezelan ya di dîwanê de	Hijmara malikan
81	5
87	4
96	21
101	9
102	16
103	14
104	15
105	14
106	8
108	11
109	10
110	10
111 (1)	11
111 (2)	18
112	18
113	11
114 (1)	8
114 (2)	10
115	7
116	18
120	8
121	11
123	10
124 (1)	26
124 (2)	22
125	6
126	10
127	12
128	7

129	13
130	20
131	6
133	10
134	14
135	22
136	18
137	10
138 (1)	12
139	16

2.3.3. Mustezad

Mustezad, ew şiklê nezmê ye ku ji xezelan pêk tê û yek risteya wê dirêj û yek jî kurt e. Mustezad bi hinek weznê tayînkirî tene nivîsandin.⁴⁹ Di dîwana Mela Sîraceddîn de tenê mustezadek heye. Ew jî helbesta 107an e. Ev mustezad bi wezna Me'ûlû Mefa'îlû Mefa'îlû Fe'ûlûn+ Me'ûlû Fe'ûlûn ya behra Hezecê hatiye nivîsîn û ji 30 bendî pêk tê.

2.3.4. Murebbe

Murebbe' ew şiklê nezmê ye ku her bendeke wê ji çar rêzikan pêk tê. Di Murebbe'an de bi giştî benda pêşî di nava xwe de bi qafiye ye û sê rêzên pêşî yên bendên dî di nava xwe de bi qafiye ne û rêzên dawî dîsa bi benda pêşî re bi qafiye ne.⁵⁰

Di dîwanê de 6 murebbe' hene. Hijmara bendên murebbe'an tevde 65 e.

Li jêrê murebbe'ên ku di dîwanê de cih girtine û hijmara bendên wan di tabloyekê de hatine diyarkirin.

Tablo 3: Tabloya Murebbe'an û Hijmara Malikên Wan.

Rêza murebbe'an ya di dîwanê de	Hijmara Bendan
16	21
37	11
68	24
81 (2)	1
94	2
132	6

⁴⁹ Saraç, b.n.b., r. 60.

⁵⁰ Saraç, b.n.b., r. 79.

2.3.5.Muxemmes

*Muxemmes ew şiklê nezmê ye ku her bendeke wê ji 5 rêzikan pêk tê. Di muxemmesan de benda pêşî di nava xwe de bi qafiye ye û sê an çar rêzên pêşî yên bendên di di nava xwe de bi qafiye ne û rêzên dawî dîsa bi benda pêşî re bi qafiye ne.*⁵¹ Di dîwanê de 8 muxemmes hatine nivîsandin. Hijmara bendên muxemmesan tevde 64 e. Di dîwanê de muxemmes bi hinek qalibên cuda yên behra remel û behra rezecê hatine nivîsandin. Ji van muxemmesan heft bi Kurdî ne. Yek tenê jî bi ‘Erebî ye. Ew jî helbestan 138 (2)yê ye.

Li jêrê muxemmesên ku di dîwanê de cih girtine û hijmara bendên wan di tabloyekê de hatine diyarkirin.

Tablo 4: Tabloya Muxemmesan û Hijmara Malikên Wan.

Rêza muxemmesan ya di dîwanê de	Hijmara bendan
56	8
60	10
61	8
63	14
100	6
117	5
119	6
138 (2)	7

2.3.6.Qit’e

Qit’e bi me’neya ferhengî parçe ye. Qit’e, wekî têgeheke nezmê, ew şiklê nezmê ye ku herî kêr ji du beytan heta 9-10 beytan pêk tê. Wekî xezelê şiklê qafiye xa xa xa ye. Di qit’eyê de bi giştî malika metle’ û mexlesê nîn e. Ji xeynî vê jî hinek cudatîyê di di navbera xezel û qit’eyê de hene. Qit’eyên ku ji du beytan pêk tên hene, lê belê xezelên ku ji du beytan pêk tên nîn in. Xezel ji 15 malikan zêdetir nayên nivîsandin, lê belê qit’e heta bi 30-40 malikan jî tene nivîsandin. Ji qit’eyên wiha re qit’eya kebîre tê gotin.⁵²

Di dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî de 10 qit’e hene. Qit’eyên di dîwanê de tevde ji 42 beytan pêk tên.

Li jêrê qit’eyên ku di dîwanê de cih girtine û hijmara malikên wan di tabloyekê de hatine diyarkirin.

⁵¹ Saraç, b.n.b., r. 81.

⁵² İpekten, b.n.b., r. 52.

Tablo 5: Tabloya qit'eyan û Hijmara Malikên Wan.

Rêza qit'eyan ya di dîwanê de	Hijmara Bendan
25	12
34	10
82	1
83	2
84	2
85	1
90	2
91	2
118	6
142	5

2.3.7. Mesnewî

*Mesnewî ew cureyên nezmê ne ku her malik bi heman weznê û di nava xwe de bi qafiye ne.*⁵³

Di dîwanê de 8 mesnewî hene. Lê belê ji ber ku mesnewiyên di nava dîwanan de hinekî kurt in, Mela Sîrac jî gelek mesnewiyên xwe kurt nivîsîne. Di dîwanê de mesnewiyên herî kurt ji 5 û ji 7 malikan pêk tên. Mesnewiya herî dirêj jî ji 65 malikan pêk tê. Mesnewiyên di dîwanê de tevde ji 228 malikan pêk tên.

Li jêrê mesnewiyên ku di dîwanê de cih girtine û hijmara malikên wan di tabloyekê de hatine diyarkirin.

Tablo 6: Tabloya mesnewiyan û Hijmara Malikên Wan.

Rêza mesnewiyan ya di dîwanê de	Hijmara Malikan
30	30
67	20
70	65
72	7
86 (3)	5
99	61
140	29
141	11

2.3.8. Teştîr

Teştîr şeklekî terbi' û texmîsê yê dî ye. Divê mirov teştîrê bike du şeq. Teştîr wekî cureyekî nezmê ye ku helbestvanek dido an sê rêzikan têxe nava malikên xezela

⁵³ Saraç, b.n.b., r. 64.

*helbestvanekî dî. Divê ku wezn û qafiyeya helbestên neyê xirakirin û yekîtiya me'neyê jî neyê windakirin.*⁵⁴

Di dîwanê de 3 teşîr hatine nivîsandin. Yek jê li ser helbesteke Melayê Cizîrî, yek jê li ser helbesteke Salih Begê Hênî, ya dî jî li ser helbesteke Fatima Nebî hatiye nivîsîn. Teşîra 93yan ya li ser helbesta Fatima Nebî bi 'Erebî ye. Lewra eslê helbestê bi xwe jî bi 'Erebî ye.

Li jêrê teşîrên ku di dîwanê de cih girtine û hijmara malikên wan di tabloyekê de hatine diyarkirin.

Tablo 7: Tabloya Teşîran û Hijmara Malikên Wan.

Rêza teşîran ya di dîwanê de	Hijmara Malikan
50	20
92	5
93	4

2.3.9. Texmîs

*Texmîs ew cureyên nezmê ne helbestvanek sê rêzikan têxe serê her malikên xezela helbestvanekî dî. Divê ku wezn û qafiyeya her sê rêzê nû û yên xezelê wekî hev bin.*⁵⁵

Di dîwanê de 2 texmîs hene. Yek jê li ser xezeleke Îmam Zeynelabidîn û ya dî jî li ser xezeleke Hesên bîn Sabit hatiye nivîsîn. Her du texmîs jî bi 'Erebî hatine nivîsandin.

Li jêrê texmîsên ku di dîwanê de cih girtine û hijmara malikên wan di tabloyekê de hatine diyarkirin.

Tablo 8: Tabloya Texmîsan û Hijmara Malikên Wan.

Rêza texmîsan ya di dîwanê de	Hijmara Malikan
51	10
52	8

2.3.10. Museddes

*Museddes wekî terîmeke edebî, navê wan helbestan e ku ji bendên 6 rêzan pêk tê. Hijmara bendên museddesan di navbera 5 û 7an de ne.*⁵⁶ Di dîwanê de tenê helbestek wekî museddes hatiye nivîsîn û ew jî hebesta 19an e.

⁵⁴ Pala, b.n.b., R.455.

⁵⁵ Saraç, b.n.b., r. 83.

⁵⁶ Saraç, b.n.b., r. 85.

2.3.11.Li meqamê şeran

Di dîwanê de helbesteke taybet heye. Ev cure helbest di Edebiyata Klasîk de nîn e. Mela Sîraceddînê Xelîlî bi meqamê şeran helbestek nivîsandiye. Jixwe wî jî di serê helbestê de gotiye “Li meqamê şeran hatiye gotin.” Helbest bi xwe jî gelekî serkeftî ye. Ev helbest ya 143yemîn e û di heman demê de helbesta dawî ye. Di helbestê de wezin nîn e, lêbelê kafiye heye.

Helbest di şeklê bendan de hatiye nivîsîn. Helbest ji 11 bendan pêk tê û her bendek jî ji 10 rêzan pêk tê. Di her bendekê de 9 malikên pêşî, di nava xwe de bi qafiye ne û rêza dihan di dawiya hemî bendan de tê tekrarkirin. Her rêzek jî li gorî helbestan pir dirêj e.

Helbest li ser mijarên civakî û olî hatiye nivîsîn û bi tevahî ji we’z û nesîhetan pêk hatiye.

Ev helbest teşeyeke orjînal e; lewra heta niha nehatiye tespîtkirin ku helbestvanên klasîk bi vî rengî helbest nivîsîne.

2.4. WEZN, QAFIYE, REDÎF

2.4.1. Wezn


Helbestên ku di dîwanê de cih digirin bi 8 cure behrên erûzê hatine nivîsandin. Wekî di dîwanê de 27 qalibên erûzê yê cuda hatine bikaranîn. Ji behra remel 4, ji behra recez 6, ji behra hezec 9, ji behra Muteqarib 2, ji behra muserîh, besît û mutedarik her yekê 1 qalib hatine bikaranîn. Li jêrê di tabloyê de bi hûrgilî ev qalib û behr hatine nîşandan.

Tablo 9: Tabloya ku Qalib û Behrên Erûzê Nîşan Dide.

BEHR		QALIB	HIJMARA BIKARANÎNÊ	
			Hijmara Helbestan	Yekûna Behran
Remel		Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun	15	20
		Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun	1	
		Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun	1	
		Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun	3	
Recez		Mustef'ilun Mustef'ilun Mustef'ilun Mustef'ilun	22	33
		Mustef'ilun Mustef'ilun	2	
		Mufte'ilun Mufte'ilun Fa'ilun	2	
		Mustef'ilûn fa'ilûn mustef'ilûn fa'ilûn	1	
		Mustef'ilun Mustef'ilun Mustef'ilun	3	
		Mustef'ilatun Mustef'ilatun	3	
Hezec		Mefa'ilu fa'ilun mefa'ilun fa'ilun	5	16
		Mefa'ilun mefa'ilun fe'ûlun	6	
		Mefa'ilûn mefa'ilûn fe'ilûn	2	
		Mef'ûlû mefa'ilûn mefa'ilûn fe'ulûn	3	
		Mefa'ilun Mefa'ilun Fe'ilun	1	
		Mefa'ilun Mefa'ilun Mefa'ilun Mefa'ilun	23	
		Mef'ûlû Mefa'ilû Mefa'ilû Fe'ûlûn	3	
		Mefa'ilun Mefa'ilun fe'ûlun	9	
		Mef'ûlu Mefa'ilun Fe'ûlun	1	
		Fe'ûlun Fe'ûlun Fe'ûlun Fe'ûl	6	7
Muteqarib		Fa'ilu fe'ûlun fa'ilu fe'ûlun	1	
Medîd		Mustef'ilun Fe'ûlun Mustef'ilun Fe'ûlun	1	3
		Mustef'ilun fa'ilun Mustef'ilun fa'ilun	2	
Munserih		Mustef'ilun Fe'ûlun Mustef'ilun Fe'ûlun	2	2
Besît		Mustef'ilun Fa'ilun Mustef'ilun Fa'ilun	1	1
Mutedarik		fe'lun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun	1	1

Wekî ku di grafîkê de jî xuya dike, di dîwanê de behra Remel, Recez û hezec bi gelemperî hatine bikaranîn.

Lê jêrê me rêjeya behran bi grafîkekê nîşan daye.



Grafîk 3: Grafîka ku rêjeya behrên erûzê nîşan dide.

Mela Sîraceddînê Xelîlî ji aliyê erûzê ve jêhatî ye. Jixwe li jorê jî me got gelek qalibên erûzê di dîwanê de bi kar anîne. Qusûrên erûzê di helbestên Mela Sîrac de gelekî kêr in. Lêbelê tevî vê jî, di hinek helbestan de hinek qusûr xuya dikin. Êdî em baş nizanin ku bi rastî jî Mela Sîrac ev qusûr di helbestê de kirine an jî katibên ku ev helbest nivîsandine xeletî kirine. Lewra exlebên helbestên wî ji aliyê erûzê ve bêqusûr in. Ji ber vê yekê em dibêjin dibe ku wextê ku katiban ev helbest nivîsandin hinek xeletî kirine. Lewra eşkere xuya dike ku Mela Sîrac zêde li ser weznê sekiniye. Heta jê hatiye nehiştiye ku qusûr bikevine erûza wî. Ji ber vê yekê gelek caran bi şiklê peyvan yên eslî leyîstîye. Carinan hinek tîp ji peyvê derxistine û carina li peyvê zêde kirine. Ji bo mînak di malika jêrê de peyva “min” bi şiklê “m” nivîsandiye û tîpên “im” jê daxistiye.

Fe-wellahî gunehkar im ji rehma te ricakar im

Wekî bilbil bi hawar im ji bo *m*'kamil ke îmanî

(1/5)

Di malika jêrê de peyva “xweher” hatiye bikaranîn. Ev peyv bi eslê xwe “xwehr” e. Lê belê Mela Sîrac ji bo weznê lev bîne, bi şiklê “xweher” nivîsandiye û kîteyêke ku ji bo weznê lazim e, ji xwe re peyde kiriye.

Hin coyê avê dîkin kun bûne kêvjalê xweher

Hin ji hinka re dibin tajî xezala digirin

(31/8)

Di malika jêrê de îfadeya “e’l’dilberê” hatiye gotin. Eslê vê îfadeyê “ez li dilberê” ye. Êdî ji bo ku weznê bi’edilêne, ji her du peyvan tîpek daxistiye û bi şiklê “e’l’dilberê” nivîsandiye.

Çiqqa ji min ‘ernê bikê cewr û eziyet pur bikê

Bêhtir me ‘îşq ê zêde bê *e’l’dilberê* bûme bela

(42/6)

Di dîwanê de li hin cihan med, zîhaf, îmale û wesl hene. Em ê niha ji wan mînakên hinekan nîşan bidin.

2.4.1.1. Îmale

*Eger hêceyeke kurt ya beytekê, bi mebesta ku li weznê bê dirêj bê xwendin, wê demê îmale pêk tê. Bi gotineke dî, îmale, dirêjxwendina hêceyeke kurt e. Hebûna îmaleyê ji helbestvan yan nazimî re wekî qusûr tê qebûlkirin. Lê ev qusûr ne di dereceya zîhafê de ye. Jê siviktir e.*⁵⁷ Em ê niha çend mînakên îmaleyê nîşan bidin.

Qenc guh bidin **gellî** biran vê şîretê hîffiz bikin

Da hilnedin barê giran roja ji qebrê derkevin

(3/1)

Gerçî navê me musulman e belê **batînê** me

Dil gerav bûne tejî bûye ji efkarê beçal

(55/2)

2.4.1.2. Med

*Dirêjkirin, kişandin. Di erûzê de xusûsek e ku bandoreke baş li ser ahengê dike.*⁵⁸ Di malika jêrê de kîteya “te” li gorî erûzê divê li vê derê dirêj bê xwendin. Li ser vê yekê med li vir heye.

Li gorî erûzê med qusûr e lê ne bi qasî zîhafê.

Di helbestan de ji bo ku erûz li hev were carinan hinek kîte hatine daxistin. Li beyta jêrê ji bedêla ku bêje “ji bo min kamil ke îmanî” gotiye “ji bo m’kamil ke

⁵⁷ Adak, b.n.b., r. 382.

⁵⁸ Pala, b.n.b., r. 313.

îmanî” û kîteya “im” hatiye daxistin. Bi gelemperî daxistin di daçekan de (ji, di, li, bi) tê bikaranîn. Lê carinan weke mînaka jêrê di peyvên de jî xuya dike.

Fe-wellaî gunehkar im ji rehma te ricakar im

Wekî bilbil bi hawar im ji bo m’kamil ke îmanî

(1/5)

Me’neya bingeîn ya medê dirêjkirin e. Di erûzê de dirêjxwendina hinekî zêde ye.

Em ê niha çend mînakên medê nîşan bidin.

Di malika jêrê de kîteya “ji” kin e lê li cihê kîteya dirêj hatiye bikaranîn. Ango kêmasiya dirêjkirinê (med) hatiye kirin.

Ya Reb ji rehm û fezlê her ji te hêvîkar im

Zanim ku ez neqenc im bi gazî yû bi zar im

(27/1)

Li vir kîteya “te” kin e lê li cihê kîteya dirêj hatiye bikaranîn. Ango kêmasiya dirêjkirinê (med) hatiye kirin.

Li te roj derketî hat hewlê nîro

Nedî min rengê razana te îro

(30/2)

2.4.1.3. Zîhaf

*Eger hêceyeke dirêj ya beytekê, bi mebesta ku li weznê bê, kurt bê xwendin, wê demê zîhaf pêk tê. Bi gotineke dî, zîhaf, kurtxwendina dengdêrekî dirêj e. Hebûna zîhafê ji helbestvan yan nazimî re wekî qusûr tê qebûlkirin.*⁵⁹

Zîhaf ew e ku mirov di helbestê de kîteyeke dirêj kurt bixwîne.

Em ê niha çend mînakên zîhafê nîşan bidin.

Di vê malika li jêrê de kîteya “ê” dirêj e lê li cihê kîteya kin hatiye bikaranîn. Ango kêmasiya kinkirinê (zîhaf) hatiye kirin.

Bêxwedî der çol beyarê hiştîme bêdad resed

⁵⁹ Adak, b.n.b., r. 382.

Ta ‘icaca ‘iŝqê rabû hilfirandim wek kereng

(103/2)

Di vê malika li jêrê de kîteya “a” dirêj e lê li cihê kîteya kin hatiye bikaranîn. Ango kêmasiya kinkirinê (zihaf) hatiye kirin.

Li wê bejnek he ye ‘er‘er du reş mar û kezî ‘enber

Li ser zertaca Îskender du çavê reş ne kil daê

(106/4)

Di vê malika li jêrê de kîteya “û” dirêj e lê li cihê kîteya kin hatiye bikaranîn. Ango kêmasiya kinkirinê (zihaf) hatiye kirin.

Rûmah û xed şemsa şefaf zulf û gulê bûne metaf

Qam wek gula girtî xunav teşbîhê ev derbûmesel

(113/4)

2.4.1.4. Wesl

*Me'neya wê ya ferhengî, pevekirin û gihandin e. Wekî têgiheke erûzê wesl, tê wê me'neyê ku mirov du kelîmeyan peve bike an jî bi hev re bixwîne. Tîpên dengdar, tenê bi tîpên dengdêr re dikarin bêne xwendin. Wextê ku di pey kelîmeyeke ku bi tîpa dengdar xilas dibe re, kelîmeyeke ku bi tîpa dengdêr destpêk dike hat; dengdara li dawîya kelîmeya pêşî, bi destpêka kelîmeya dawî re tê xwendin.*⁶⁰

Niha em ê li jêrê ji bo “w esl”ê çend mînakên bidin:

Tu nafîkrê li xwe insan çawan tu hatî dunyayê

Bi vê husn û bi vê şeklê tu xulqandî Xuda Ellah

(2/2)

Tu b'Şad û Qurana Kerîm heştê yû heşt ayê ‘ezîm

Rehîni ke pê çavê delîm hem wech û dêm û cebheta

(4/38)

Çiqa tu hâkimê hukm î te heyrandin ‘eqil hemmî

Bi tedbîra xwe ya samî bi teqlîba zeman ya Reb!

(6/20)

⁶⁰ İpekten, b.n.b., r. 142.

2.4.2. Qafiye

*Qafiye, herî kê m li dawîya du risteyan dubarekirina dengan e. Bêjeyên ku di xwe de dubarekirina van dengan dihewînin, divê an bi xwe an jî wateya wan cuda be. Peywireke din a qafiyeyê jî ew e ku di helbestê de ahengê ava dike.*⁶¹

2.4.2.1. Qafiyeya Murdef

*Qafiyeya murdef ew qafiye ye ku di xwe de herfa “rîdf”ê dihewîne. Herfên rîdfê jî “elîf, waw, yê” ne. Divê yek ji herfên îletê bêtî ku herekeyek stendibe, beriya herfa rewiye û di qafiyeyê de bê dubarekirin.*⁶² Wekî “...belaş/...qeraş”, “...kevan/...şivan”

Tîştî mirov nizanê kesê bibêjê şaş e

Ya jî nebînê feyde zanîna wî belaş e

(8/1)

Ela ey ehlê îmanê li dînê xwe bibe guhdar

Bibe nobetçiyê huznê şev û rojê bibe hişyar

(11/1)

Digot wey ax çima kirme ez hişyar

Çi xew xweş bû nexasim subhê adar

(30/7)

Der muh̄beta dilberê girtî tenê rêç û şop

Bê şek ewê esmerê berdane dil teng û top

(125/1)

2.4.2.2. Qafiyeya Mucerrred

*Qafiyeya ku tenê bi dubarekirina herfa rewiye pêk tê qafiyeya mucerrred e.*⁶³ Wekî ... “...der/...ber”, “...gelek/... salek”.

Sed ah û nalîn tîn ji min roj û şevan wek bilbula

⁶¹ Önder Beyter, Dîwana Mela Ehmedê Heyderî, Teza lîsansa bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zîmanê Zîndî yê li Tîrkiyeyê, Mêrdîn 2012, r. 78.

⁶² Beyter, b.n.b., r.78

⁶³ Beyter, b.n.b., r. 79.

Dûr im ji yara nazenîn ka tê gelo buxçê gula

(42/1)

Ya Seydayê Cizîrî l'bextê te me l'meşşerê

Li ber sekrata mewtê gava biçme meqberê

(53/1)

Ez birîndar û 'elîl im ji mîlak û cegerê

Li me roj bûye şeva tarî bi hukmê qederê

Dikelim pêtê ji dil çû şubhê narê seqerê

Çare nîn e ji me re kanî Nesîmê seherê

Bi xwe wî berda min û agir gurî kirye yeqîn

(61/2)

2.4.2.3. Qafiyeya Muqeyyed

Qafiyeya muqeyyed, di menzûmeyekê de ji xeynî herfên rîdfê (elîf, waw, yê) beriya herfa rewiye bi dubarekirina herfên hemcîns ên ku bêhereke ne pêk tê.⁶⁴ wekî "...ceng/...jeng", "...mehr/...qehr".

Çîqa zehf in ji bo min yar heta ku min hebîtin pirç

Dibin dostê me mişk û mar kedî bûn ev gur û ev hirç

(41/1)

Aniya ber bisk û poran tev de gewga herî û ceng

Kirme beyhûş kirme sewda lew ji min dernayê deng

(103/1)

Dil bûye cihê kul û xem û derd

Zer bûye bizan wekî bih û werd

(140/21)

2.4.3. Redîf

⁶⁴ Beyter, b.n.b., r. 79

*Redîf ew qertaf, qertaf û bêje yan jî kombêje û an tenê bêje an kombêjeyên ku li ser şêwazekî di dawiya riste an jî malikan de têne dubarekirin e.*⁶⁵

Li jêrê em ê cih bidin *Redîfên ku di halê qertafan de ne, Redîfên ku di halê bêje an kombêjeyan de ne, Redîfên ku di halê qertaf û bêje an kombêjeyan de ne* ku di helbestên wî de hatine bikaranîn.

2.4.3.1.Redîfên ku di halê qertafan de ne

Qertaf	Jimar
-in	: 3
-a	: 4
-e	: 8
-ê	: 10
-im	: 27
-ayet	: 35
-a	: 42
-ê	: 49
-ê	: 53
-ê	: 63
-ek	: 87
-ê	: 104
-and	: 110
-im	:111 (2)
-im	: 124(1)
-ekê	: 124(2)
-in	: 131
-andin	: 132
-im	: 133

⁶⁵ Beyter, b.n.b., r. 80

2.4.3.2.Redîfên ku di halê qertaf û bêje an kombêjeyan de ne

-ê xwe	: 28
-pê re bê	: 37
-jina pîs e	: 47
-ve bûm	: 69

2.4.3.3.Redîfên ku di halê bêje an kombêjeyan de ne

-ya Reb	: 6
-digel ‘usrê bizan yusr e:	14
-bû	: 29
-nebaşed	: 43
-dinle beni dinle beni	: 45
-remezan	:62
-bû	: 64
-yol alalım	: 80
-dikê	: 86 (1)
-bidê	: 98
-emman dilo emman dilo:	111 (1)
-me dît	: 126
-ke	: 128

2.5. HUNERÊN EDEBÎ

Asta kesayetiya Mela Sîraceddînê Xelîlî ya edebî pir bilind e. Di warê helbesta klasîk de jêhatî ye. Di helbestê de fikr û ramanên xwe bi hêsanî û herikbar anîne zimên. Peyv bi ahengeke bilind li hev anîne û mehareta xwe ya di helbestê de nîşan daye. Di nava helbestvanên piştî serdema mîrektiyan de helbestvanekî jêhatî ye. Helbestvan hunerê xwe ji bo gel bi kar anîye û huner û edebiyat ji bo wî armanca duyem e. Jixwe wextê ku mirov li dîwanê binêre, giraniya dîwanê li ser helbestên civakî ye. Helbestvên civakî, rexne, we'z û nesîhet û îrfan; di dîwanê de giraniya xwe nîşan didin. Li gorî yên di helbestên evînî cihekî piçûk digirin. Tevî vê jî di helbestên evînî de jî zimanê wî serkeftî ye. Pir nebe jî hunerên edebî bi kar anîne. Wextê ku hunerên edebî bi kar anîne jî mivov dizane ku di wê qadê de jêhatî ye. Dîsa ji naveroka dîwanê tê fêhmîkirin ku eleqeyeke wî ya zêde li ser helbest û edebiyatê heye. Belkî ne tenê edebiyata Kurdî, heta edebiyata Erebî û Farisî jî. Lewra di dîwanê de teşîrên helbestên Erebî hene. Wekî din ji xeynî Kurdî, bi Erebî, Farisî û Tirkî jî helbest nivîsandine. Hinek helbestên Erebî û Farisî jî wergerandine zimanê Kurdî. Şîretên Hekîm Loqman ji Farisî bi şîklê nezmê wergerandine Kurdî. Dîwana Melayê Cizîrî bi destxetê xwe bi tîpên Erebî nivîsandiye. Ev xal hemî jî nîşan didin ku helbest û edebiyat di jiyana wî de cihekî girîng digire.

Mela Sîraceddînê Xelîlî di dîwana xwe de gelek hunerên edebî bi kar anîne. Hinek jê zêde cih daye wan û hinek jî kêr. Ji bo mînak em dikarin bibêjin ku bi sedan mînakên telmîhê hene. Di dîwana xwe de telmîha mesnewiyên wekî Mem û Zîn, “Leyla û Mecnûn”, Ferhad û Şîrîn, qîssetên pêxemberan, Harût û Marût, navdarên dîrokê yên girîng û hwd. kiriye. Hinek huner jî kêr cih daye wan, wekî “cînasê”. Bi qasî ku me tespît kiriye tenê di çar pênc helbestan de cînas hatiye bikaranîn. Hinek huner jî di dîwanê de pir kêr cih girtine. Ji bo mînak em, tenê li cihekî leqayî aqrostîşê bûn.

Di vê beşê de em ê cih bidin hinek hunerên edebî yên sereke ku di dîwanê de hatine bikaranîn. Berî wê jî em ê bi giştî qala hunerên edebî bikin.

Hunerên Edebî, xemla peyvê ne ku di cihê xwe de ne; yanî belîx in ku ji wan re “Senayiya Bedîa” jî tê gotin. Mijara ilmê bi navê “Bedî”ê ev teşkîl dîkin.⁶⁶

Em ê li jêrê cih bidine hinek hunerên edebî yên ku di dîwanê de hatine bikaranîn.

2.5.1. Telmîh

Me'neya wê ya ferhengî biriqandin e. Di edebiyatê de telmîh ew e ku mirov di berhema xwe de bi rêya temsîlê; îşaretî qîssetekê, çîrokeke meşhûr, îfadeyeke belav, bûyereke dîrokî, behseke ‘ilmî bike. Bi vî rengî îfade jî tê biriqandin.⁶⁷

Niha em ê ji dîwanê çend mînakên hunera telmîhê li jêrê bi cih bikin.

⁶⁶ Kamil Edib Kürkçüoğlu, Edebiyat Lügati, Enderun Kitabevi, İstanbul, 1994, r. 40.

⁶⁷ M. Kaya Bilbegil, Edebiyat Bilgi ve Teorileri (Belagat), Enderun Kitabevi, İstanbul, 1989, r. 267.

Di malika jêrê de telmîha Adem (e.s.) kiriye ku ji dara qedexe xwariya û paşî jî ji cenetê hatiye avêtin.

Adem bi hîrşê dar kû xwar çawa ji jorê hate xwar

Bû 'asiyê Rebbê Kubar her weqtî vê fikrê bikin

(3/8)

Di malika jêrê de telmîha berhema Ehmedê Xanî ya navdar Mem û Zînê dike. Lewra Beko, Mîr, Zîn û Mem qehremanên vê berhemê ne. Behsa fitna Bekoyê Ewan dike ku Mem û Zînê ji hev veqetandine.

Kengî – Beko- evna kirî men 'a jin û mêr jev kirî

Bes gote –Mîr- Zînê mede lew Mem ji Kurmancê me bû

(68/13)

Di malika jêrê de telmîha sê mesnewiyên navdar kiriye. Bi peyva “Zîn”ê telmîha berhema Ehmedê Xanî ya navdar “Mem û Zîn”ê dike. Bi peyva “Leyla” telmîha mesnewiya navdar ya “Leyla û Mecnûn” û bi peyva “Şîrîn” jî telmîha mesnewiya “Ferhad û Şîrîn”ê dike.

Dikim qurban ji bona yek teliyya ta bi engoşter

Du sed Zîn û du sed Leyla du sed Şîrîn ji Îranê

(104/7)

Di malika jêrê de telmîha Mûsa (e.s.) dike. Lewra di Qurana Kerîm de navê Mûsa (e.s.) û Tûrî Sîna bi hev re tê zikirkirin.

Te Sîm û Cîm kirî şeyda te hicret pê kirî 'îda

Belê beyhûş we bêfeyda diçê ser Tûrî Sînayê

(106/8)

Di dîwanê de carinan telmîha hinek çîrokên Kurdî jî hatine kirin. Wekî çîroka teyrikê tûretanî ku jî ber teyrikê tûretanî karwan zû derdikevine rê û di berfê de diqufilin.

Xera mek mala xwe gel ya hevalan

Di berfê de bi rengê tûretanî

(22/35)

Di malika jêrê de îfadeya “*masî ji şûva sor derêxistî*” heye.

Eger bêjin çi ye *masî ji şûva sor derêxistî*

Ez ê bêjim girêda mêr bi dîwanî jina pîs e

(47/16)

Ev îfade jî telmîha çîrokeke Kurdî ya kevin dike ku jinek bi fêl û fenên xwe zîlamê xwe dîn dike.

Di malika jêrê de jî îfadeya “*bi mekrê wan çiya hûr bûn*” heye ev jî telmîha çîrokekê dike ku di çîrokê de jinek exlaqxirab mêrê xwe dixirîne û wî dide bawerkirin.

Eger bêjin çi ye ya kû *bi mekrê wan çiya hûr bûn*

Ez ê bêjim binêre tu li Furqanê jina pîs e

(47/22)

2.5.2. Tekrîr

Tekrarkirin. Di helbestekê ji tekrarkirina peyvekê an jî kompeyvekê re tekrîr tê gotin. Li vê derê armanc ew e ku hêza berhemê were zêdekirin û me’neya peyvê were xweşikirin. Heke peyva ku tê tekrarkirin, me’neya vegotinê xweştir neke, ev qusûrek e. Lê belê tekrîr helbestê zindîtir dike.⁶⁸

Niha em ê ji dîwanê çend mînakên hunera tekrîrê li jêrê bi cih bikin.

Di malika jêrê de peyva “kesî” sê caran bi ahengî tê tekrarkirin û îfadeya peyvê pê xweş kiriye. Belê peyva “melkesî” û kesî ji aliyê me’neyê ji hev cuda ne. Lê belê ji ber ku peyva “kesî” di nava peyva “mel-kesî” de mewcûd e, wekî sê caran peyva “kesî” hatiye tekrarkirin.

Bexîlî yû îman *kesî* nedî ketin qelbê *kesî*

Yek toz e yek wek *melkesî* her dû ji hev re dijmin in

(3/28)

Di destpêka van malikên li jêrê de peyva “Li alîkî” hatiye bikaranîn. Ev peyv 69 caran hatiye bikaranîn. Yanî di 23 malikan de di rêza pêşî de du caran û di rêza duyem de carekê tekrar kiriye.

Li alîkî bilûrzan e *li alîkî* şî’îrbêj e

Li alîkî girî yû zar li ê dî wey li min daê

(10/3)

⁶⁸ Pala, b.n.b., r. 460.

Li alîkî çî xweş roj e li alîkî şevêk tarî

Li alîkî bihar û gul li ê dî berf û ba daê

(10/4)

Li alîkî dikin ava li alîkî kirin wêran

Li alîkî evîndar in li ê dî tawî yû baê

(10/5)

Li alîkî dî sağ in hem li alîkî dî bêmar in

Li alîkî ji nûka hê jî zaye nû bûye j' daê

(10/6)

Helbesta 47an jî ji 36 malikan pêk tê û di hemiyan de îfadeyên “*Eger mamik werê daran/Ez ê bêjim*” tê tekrarkirin. Em ê sê malikan wekî mînak li jêrê bidin.

Eger mamik werê daran bibêjin çî l' dinê pîs e

Ez ê bêjim weke golê li garanê jina pîs e

(47/1)

Eger bêjin çî ye bêhna kelaş û serkil û rîxa

Ez ê bêjim ew e me' d û mirûsdanê jina pîs e

(47/2)

Eger bêjin çî ye ya kû zîlamî sağ dikê jehrî

Ez ê bêjim ji lêv û dev xeberdanê jina pîs e

(47/3)

Di helbesta 14an de 13 malik hene û di dawîya rêza duyem de îfadeya “*digel 'usrê bizan yusr e*” hatiye tekrarkirin. Yanî 13 caran. Berî niha di helbestekê de di serê rêzan de tekrar hebû. Di vê helbestê de jî di dawîya rêzan de cih girtiye. Em sê malikan wekî mînak li jêrê didin.

Bikin sebrê eya ixwan di sal û mah û hîn û an

*Tefekkur ke li der Furqan digel 'usrê bizan yusr e*⁶⁹

(14/1)

⁶⁹ Bizanibe bi zehmetiyê re hêsantî heye.

Bikin şukrê Xuda her dem bikin tewbe wekî Adem

Nebêjin min fulan kerdem *digel 'usrê bizan yusr e*

(14/2)

Bitirsin hun ji sexta wî bi hêvî bin ji rehma wî

Mekin goftin bi şuxla wî *digel 'usrê bizan yusr e*

(14/3)

Helbesta 15ê ji 36 malikan pêk tê. Ji xeynî malika dawî, di serê hemî rêzan de îfadeya “*Estegfirullah ji ber gunhê*” hatiye bikaranîn. Yanî 70 carî ev îfade hatiye tkrarkirin. Em sê malikan wekî mînak li jêrê didin.

Estegfirullah ji ber gunhê me ‘ebd û insan

Estegfirullah ji ber gunhê çîqa musulman

(15/1)

Estegfirullah ji ber gunhê ku destê me kir

Estegfirullah ji ber gunhê bi qelb û ziman

(15/2)

Estegfirullah ji ber gunhê bi çav û bi pê

Estegfirullah ji ber gunhê bi lêv û devan

(15/3)

2.5.3. Cînas

*Cînas ew hûner e ku mirov du peyvên ku hevdeng in û me’neya wan ji hev cuda ye, bi hev re bi kar bîne. Di hevokekê de ji topkirina peyvên bi cînas re “tecnîs” tê gotin.*⁷⁰

Niha em ê ji dîwanê çend mînakên hunera cînasê li jêrê bi cih bikin.

Di malika jêrê de peyva “dîn” du caran hatiye bikaranîn û her yekê me’neya wê cuda ye. Di rêza pêşiyê de peyva “dîn” bi me’neya dînbûn, harbûn an jî mecnûnbûnê hatiye bikaranîn. Di rêza duyem de jî bi me’neya “dîtînê” hatiye bikaranîn.

Di nav ‘alema wan de bûm har û dîn

⁷⁰ Pala, b.n.b., r. 102.

Bi şekl û bi me'na kû min cumle *dîn*

(70/37)

Di malika jêrê de peyva “*bivê*” du caran hatiye bikaranîn û her yekê me'neya wê cuda ye. Ya pêşî bi me'neya “*bixwaze*” hatiye gotin. Ya duduyan jî cuda ye. Di zimanê zarokan de tiştê ku mirov jê bitirse. Tiştên weke êgir û sobê.

Îro wî şalek ka divê hingî xilas nabê *bivê*

Gava xuya kir wê *bivê* ew mehkeme gava vebû

(64/27)

Di malika jêrê de peyva “*zebanî*” du caran hatiye bikaranîn û her yekê me'neya wê jî ya dî cuda ye. Peyva pêşî bi me'neya zimên de hatiye gotin. Ya dî jî di me'neya zebaniyê cehnemê de hatiye bikaranîn.

Eger dil wek *zebanî* ba bila nefsim *zebanî* ba

Min ê hikmet deranî ba bi qewl û gotin û goftar

(102/7)

Di malika jêrê de peyva “*dinê*” du caran hatiye bikaranîn. Ya pêşî bi me'neya “*dinyayê*” û ya dî jî bi me'neya “*ya dî/ya dîtir*” hatiye bikaranîn.

Lê tev me dîn yarê *dinê* ev girtin berdan ya *dinê*

Her sinfekî j'seda yek pur e b'vê faniyê nebê mubtela

(42/31)

2.5.4. Tewriye

*Di edebiyatê de tewriye ew e ku mirov peyveke xwedî du me'neyan, ji bo belaxetê, bi me'neya dûr bi kar bîne. Me'neya ku tê qestkirin, hinekî tê veşartin. Bi vî rengî guhdar an jî xwendevan pêşiyê me'nê fêhm nake.*⁷¹

Niha em ê ji dîwanê çend mînakên hunera tewriyê li jêrê bi cih bikin.

Di malika jêrê de peyva “*Mecnûn*” bi tewriye hatiye bikaranîn. Lewra du me'neyên peyva *Mecnûn* hene. Yek jê *Mecnûnê* di çîroka “*Leyla û Mecnûn*”ê de û ya dî jî kesê “*dîn*”.

‘Eşqa te kirim *Mecnûn* lew derdê me tev nû bûn

Hestiyê me tev hûr bûn kû tû ketî niqabê

⁷¹ Bilbegil, b.n.b., r. 192.

(123/6)

Di malika jêrê de peyva “Sîrac dîn e” bi du me’neyan hatiye bikaranîn. Lewra me’neyeke wê *nûra dîn* an jî *ronahiya dîn* e. Ya dî jî *şexsê Sîrac dîn bûye*. Yanî di malika jêrê de du me’ne derdikevin. Ya pêşî: Sîraceddîn e yê ku bi şev û rojan wekî bulbul dinale. Ya duduyan jî: Sîrac dîn bûye û bi şev û roj weke bulbulan dinale. Em dikarin bibêjin ku di vê malikê de bi hostayî hunera “tewriyê” bi kar aniye.

Sîrac dîn e şev û rojê wekî bulbul dinalê

Ji destê dilbera kû derd û derman tev li balê

Dixûm sûndê bi çav û ebrûyê ta wek hîlalê

Ji bîra min tu ca naçê dilberê tim tû l’xeyalê

Tebarek ez dibêjim her ji ber husn û cemalê

(119/1)

2.5.5. Tenasub

*Hevgirî, ahengî, levhatin. Di edebiyatê de tenasub ew e ku mirov du peyv an jî ji duduyan zêdetir peyvên ku bi me’neyê bi hev ve girêdayî ne, bi ahengî li cem hev bi kar bîne.*⁷²

Niha em ê ji dîwanê çend mînakên hunera tenasubê li jêrê bi cih bikin.

Di malika jêrê de peyvên “keşte”, “Nûh”, “Cûdî”, “cumle alem”, bi hev re di nava ahengê de hatine bikaranîn. Ev hemî peyv jî bi “tofana Nûh (e.s.) re eleqedar in. Yanî hûnera tenasûbê berbiçav e.

Keşte yeqîn Nûh tev civand ser cumleyê ‘alem gerand

Gava me dî min ser tewand bûm *Cûdiyê* jana ecel

(113/7)

2.5.6. Teşbîh

*Tişbihandin. Teşbîh ew huner e ku mirov ji du tiştên ku di navbera wan de eleqeyek heye, yê ze’îf bişibîne yê bihêz.*⁷³

Niha em ê ji dîwanê çend mînakên hunera teşbîhê li jêrê bi cih bikin.

Di malika jêrê de helbestvan “dinya” şibandiye “hewiyê”. Ji ber ku hewiya mirov ji mirov hez nake, دنیا şibandiye hewiyê. Lewra dixwaze ku bibêje دنیا ji mirov hez nake.

⁷² Pala, b.n.b., r. 460.

⁷³ Pala, b.n.b., r. 465.

Dinê hewya min e qeṭ guh nede wê

Ewê paşî te kê destê zebanî

(22/9)

Di malika jêrê de helbestvan “*nefs*” şibandiye “*bulbul*” û “*dinya*” şibandiye “*gula sor*”. Yanî hezjêkirina mirovan ya dinyayê şibandiya hezjêkirina bulbul ya gula sor.

Nefsa me bulbul dunya gula sor

Gava dinê dît pê bûye mexror

Pîra hezar sal pê bûye wek hor

Zahir bi çav e nefsa e di xef kor

Yan ‘Enter e yan ew lawê Qeysê

Hawar ji destê dunya û nefsê...

(19/4)

Di malika jêrê de helbestvan “*dunya*” şibandiye “*otêl û xanê*”. Ji ber ku insan di otêl û xanan de ji bo demeke kin dimînin, li vê derê helbestvan fanîbûna dinyayê şibandiye otêl û xanê.

Dunya ji bo me otêl û xan e

Qey roj û danek em tê de mane

Lê bûye êvar axirzeman e

Dunya gelo kî lê kir demane

Teşbîhê leylan j’ dûr ve dîtîsê

Hawar ji destê dunya û nefsê...

(19/9)

2.5.7. Tezad

*Dijbûn, tersbûn. Di edebiyatê de tezad ew e ku mirov di navbera du fikir, du xeyal an jî du hestan de taybetiyên wekhev an jî cuda bi hev re bi kar bîne. Tezad ji hunerên bedî’ e û bi navên weke tîbaq, mutabeqat, tetbîq û teqafû jî tê zanîn.*⁷⁴

Niha em ê ji dîwanê çend mînakên hunera tezadê li jêrê bi cih bikin.

⁷⁴ Pala, b.n.b., r. 468.

Di malika jêrê de helbestvan gotiye “*li bêhna kebaba çûm, bi ser daxa kerê kurmî ve bûm*” Yanî helbestvan çi hêvî kiribe, rastî berevajîya wê hatiye.

Nêzî derêxistim ji mal meşham li sûk û çarşiya

L’bêhna kebaba çûm bi ser daxa kerê kurmî ve bûm

(69/2)

Di malika jêrê de helbestvan gotiye “*ez dixwazin ava weke şerbetê vexwum, lê bi ser govşa rehê rûlê ve bûm.*” Weke tê zanîn rûl cureyekî daran e û pir tehl e. Helbestvan hêviya şîraniyê dike, lê belê rastî tehliyê tê.

Ava şetê wek şerbetê bûbû mereq kû *qur bikim*

Hayhayî derbas bûm bi ser govşa *rehê rûlê* ve bûm

(69/5)

Di malika jêrê de helbestvan dibêje “*Biwelidin ji bo mirin ava ji bo xira bikin*”. Li vê derê mirin û welidandin li dijî hev in û avabûn û xirabûn bi heman şiklî.

Melek ji bo xaliq he ne her roj dibakin bi *yeqîn*

Biwelidin ji bo mirin ava ji bo *xira* bikin

(85(1)/2)

Di malik ali jêrê de kesê ku ji bo eybên xwe kor e, ji bo eybên xelkê dûrbîn e. Kesê ku gêsîne di çavê xwe nebîne û şûjina di çavê xelkê bibîne jî di nava tezaadê de ye.

Herkes me dî j’eybê xwe *kor* l’eybê heval *dûrbîn* e zor

Gêsin di çavê xwe nedît dît şûjina çavê j’*kila*

(42/19)

2.5.8. Întaq

*Peyîvandîn. Hunerê ku tiştên nikarin bipeyivim, mirov wan bide peyîvandîn.*⁷⁵

Di malika jêrê de helbestvan dîk daye axaftin û gotiye “*dîk go ez im bazê sipî*” û bi vê îfadeyê hunera întaqê bi kar aniye.

Her kes dibê ez ho me ez dirha reşik go bûme rez

Dîk go ez im bazê sipî çeng lev kutan deng çû mila

(42/17)

⁷⁵ Pala, b.n.b., r. 246

Di malika jêrê de helbestvan jîjo daye axaftin û ji bo çêlikên xwe gotiye “*çi nerm û nazik in ê gij ew in çelyê çila*” û bi vê îfadeyê hunera întaqê bi kar aniye.

Jîjo dimalin herdu dest ser çêliyê pur xeşt û zişt

Gotî *çi nerm û nazik in ê gij ew in çelyê çila*

(42/18)

2.5.9. Aqrostîş

*Aqrostîş ew huner e ku wextê ku tîpa serê her rêza helbestê ji jor ber bi jêr ve hate xwendin navek derdikeve.*⁷⁶

Bi qasî ku me tespît kiriye di dîwanê de tenê di helbestekê de aqrostîş heye. Jixwe helbestvan di serê her rêzê de tîpa pêşî cuda jî nivîsandiye û eşkere kiriye. Taliyê weztê ku mirov ji jor ber bi jêr ve dixwîne, îfadeya “*Înnel hedaya ‘ela mîqdarî mehdîha*” derdikeve. Me’neya vê îfadeyê bi kurdî wiha ye: “Bêşubhe, xelatên ku tên dayîn, bi qasî qedrê kesê ku xelatê distîne ye.”

Em ê vê helbestê li jêrê nîşan bidin.

(Mefa‘îlun Mefa‘îlun Fe‘îlun)

Hezec · - - - / · - - - / · - -

Elîf. Ela ey dostê yarê bav û kalan

Temaşa kin binêrin rehîma rehman

Nûn. Nikarim şukrê xaliq bênime cih

Bedêla nî‘meta dayî me insan

Nûn. Niha dîsa li me kirye xelatek

Bi destê şeyxê heqqê şahê zozan

Elîf. Ewî jî wek xelîlî agirê dil

Li me berda selama kirye ridwan

Lam. Li ‘Urfaya welatê me bela kir

Suhûfê xwe bi ezmanê me kurdan

⁷⁶ www.edebiyatgretmeni.org

Hê. Hemî ehlê me pê hatin girêdan
Bila Nemrûdî tev herne denîran

Dal. Dizanim kû hekîm xibret hebê hem
Kemij qabil bê bo tedbîr û derman

Elîf. Eva helbet ji wîna zêrê xalis
Dikarê çêbikê enwa'ê aman

Yê. Yeqîn heqqê bi xwe eksîre zanim
Xelefê me' denê pak in ji *Zengan*

Elîf. Emîn im kû xelîfê wî bi carek
Li ser şer' û terîqê kirne seyran

Eyn. 'Umûma hem xusûsa Şeyxê Ehmed
Ewê necle ji bo wî şahê merdan

Lam. Li dergahê ewî min pur rica kir
Me bîrê bîrê roja tev de heyran

Yê. (*yewedul-mucrîmu lew yeftedî mîn*)
'Ezabê heq bi zar û ehl û îxwan

Mîm. Murîdê jê bikê hêvî bi dil şaf
Ne wek (bo cehlê) lê teşbîhê (Selman)

Qaf. Qerara erzûhalê bêne ber der
Dibîrê nûjedara destê Luqman

Dal. Dilê murd edîbê sag û selamet
Bi feyda me' newî teşbîhê Seyhan

Elîf. Ezî lal im ji pesnê wî çî bêjim
Rûh û canê me her dem jêre qurban

Rê. Rêya pêxemberê me lê kirî meş
Li ser wê rê diçê tê an û ezman

Mîm. Mera ya Reb bi heqqê nûr Muḥemmed
Şelat û pur selam ser bêne baran

Hê. Her û her tû bide şêxê me neşret
Bi destê wî vekê koda dil û can

Dal. Du‘ayê me ji wî re tû bi tabî‘
Muhur ke, ê ewî jî bo me bendan

Yê. Yekî bêşek tû yî murîd û fe‘al
Bi keyfa xwe dikê tiştê tû pê zan

Hê. Hewar û hêviya **Sîrac** e Ellah
Bi şeyxa re me derbas kê ji nîran

Elîf. Îlahî tû qebûl kê vê du‘ayê
Bi Ehmed (*sad û sîn*) ser bikne dûman

2.6. CUREYÊN EDEBÎ

Mela Sîraceddîn di dîwana xwe de di gelek mijarên cuda de û bi şêwazên pirrengî helbest nivîsandine. Li jêrê em ê li ser mijarên ku dikevin nav cureyên edebî de bisekinin.

Di van malikên jêrê de mirov dikare bi hêsanî vê taybetiya helbestên wî bibîne:

2.6.1. Medhiye

*Medh û pesin. Di edebiyatê de medhiye ew helbest an ew nivîs in ku ji bo ku pesnê kesekî bidin, têne nivîsîn.*⁷⁷

Şêxê Terîqa Neqşebendiya, Şêx Seyda, bandoreke girîng li ser Mela Sîraceddîn kiriye. Em dikarin bibêjin ev bandor di gelemperê dîwanê de xwe nîşan dide.

Di malika jêrê de gotiye “*Murşîdê Seyda*” û behsa Şêx Seyda kiriye. Weke ku tê zanîn Şêx Seyda şêxê terîqeta Neqşîbendiyê ye û li Cizîrê dawîya jiyana xwe derbas kiriye. Di çaxê xwe de bandor li ser gelek ‘alim û helbestvanên Kurd kiriye. Bi rastî Seyda leqebek e û ji bo ‘alimên hêja û zana tê bikaranîn. Lêbelê ev leqeb ji Şêx Seyda re weke nav hatiye qebûlkirin.

Şubhetê *murşîdê Seyda* bû di weqtê me de peyda

Da ji wî bigrê tu feyda j’dest vexwe şerbet û av

(17/17)

Di gelek cihan de medhiye ji bo Şêx Seyda nivîsîne. Ji wan medhiyan em ê sê malikên dî ji li jêrê bi cih bikin.

Ya Seydayê Cizîrî l’bextê te me l’mehşerê

Li ber sekrata mewtê gava biçme meqberê

(53/1)

Li te îro hewar e ya murşîdê zemanî

Weqtê mîzan bê danîn bo min bike mehderê

(53/2)

Çawa distîne îmdad tû j’Ehmedê nûranî

Xwudyê tac û buraqê xwedyê hewzê kewserê

⁷⁷ Pala, b.n.b., r. 313.

(53/3)

2.6.2. Hicwiye

*Hicviye ew helbest in ku ji bo rexnekirinê tene nivîsîn. Ziddê medhiyê ye. Hicviye ji bo ku kes, civak an jî saziyek bi taybetî were rexnekirin jî tene nivîsîn û di heman demê de di nava hinek menzûmeyan de jî cih digirin.*⁷⁸

Di dîwanê de rexne cihekî girîng digire. Gelek aliyên civakê rexne kirine. Lêbelê em dikarin bibêjin ku rexneya mezin li ser “jina pîs” kiriye. Lewra helbesta 47an bi tevahî li ser “jina pîs” nivîsiye û “jina pîs” li erdê xistiye. Ev helbest ji 36 malikan pêk tê. Em ê ji vê helbestê, li jêrê sê malikên pêşiyê bi cih bikin.

Eger mamik werê daran bibêjin çi l’dinê pîs e

Ezê bêjim weke golê li garanê jina pîs e

(47/1)

Eger bêjin çi ye bêhna kelaş û serkil û rîxa

Ezê bêjim ew e me’ d û mirûsdanê jina pîs e

(47/2)

Eger bêjin çi ye ya kû zîlamî sağ dikê jehrî

Ezê bêjim ji lêv û dev xeberdanê jina pîs e

(47/3)

Mela Sîrac li ser kesekî ku helbesta wî dizîbû jî helbestek nivîsiye. Em dikarin bêjin ku ev helbest jî ji bo hicviyê nimûneyeke baş e. Me ew helbest jî li jêrê bi cih kiriye.

Derheqê biraderekî de kû qesîda kayê gotibû min gotiye ji nezma min e. melaê xemse eşir

(Fe‘ilatun fe‘ilatun fe‘ilatun fe‘ilun)

Remel · · — — / · · — — / · · — — / — · —

Ey birader Haşimo ‘ilmê te tev bûye jiber

Te hîfîz kirye fetawa Meher û Îbnî Hecer

Te bibişkuvê dev û lêvê xwe barandine gul

⁷⁸ Pala, b.n.b., r. 219.

Te bivê tê bikê sor ger te bivê tê bikê zer

Xwe dipesnênê dema rahjê qelem bêjê şî'ir

Ji qesîdên te negotî vedidê pêre keser

Te ji bo xwe bi nezanî xwe ji dûrnasa kirî

Lê nizanî bikê ferqê tû di nav şebb û şeker

Ev çi hîl û fen û xapên te li xwe kirne xemil

Ji elfîbêtka evînê qe nizanê ser û ber

Hê nebû **Sîrac** di şî'rê de wekî Şeyxê Cizîr

Pa çi zûka xwe hesêb kir te (*Mela xemse 'eşir*)

Yan tû girhayî çi ferq e ev çi *Findik* çi Finik

Tû melayê çi li gundik çi konek bo te meqer

Ger qesîda Kayê qulbandiye ser navê xwe lê

Ka bi şalê ve me qulbandî li ser navik û ser

Tû bixwe kayê ji lewre ji qesîdên me tamam

Ji xwe re ya kayê bir dil li xwe pê kirye cehir

Xezela kayê ji ber kir Haşimo ka bi xwe wer kir

Sîn û cîmê pêre şer kir lew ji heddê çûye der

Ev her pênc malikên li jêrê jî di mijarên civakî û rexneyê de hatine nivîsandin.

Wek sîsyark û dubirak şeş heft melayê naz û pak

Kom bûn li birhana kelaş kî bighiyê bazê me bû

(68/3)

Zahir melaq in wek pîsik batin wekî marê di tûr

Binhêr devê wan cennet e dil bû bizotê cehnemê

(46/5)

Rast û durustî nav he ye wek Sîmirê wî nîn e laş

Ev hewl û meydan ya vira ye vî çemî kir lemlemê

(46/9)

Kerê bar ke ji kitêban gelo çi ji wa dizanê

Çi zanê gul çi reng e dixwazê kerbeşa şîn

(54/14)

Bi heqqê şehde wunda bû li me zarok buyin amir

Ketî bin emrê jin mêrik jin û mêr tev de bûn tucçar

(11/31)

2.6.3. Mersiye

Di edebiyatên Îslamê de ji wan helbest an jî nivîsan re mesriye tê gotin ku li ser xema mirina kesekî tene nivîsîn û pesnê wî kesî didin.⁷⁹

Bi munasebeta wefata Şêx Muhemmed Se'îd Seyda û xilafeta kurê wî Muhemmed Nûrullah

fa'ilatûn fa'ilatûn fa'ilatûn fa'ilûn

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · -

Ax felek dîsa te kul kir dilê min kirye qedîd

Taviya huzn û xema barandiye ser min şedîd

⁷⁹ Pala, b.n.b., r. 319.

Ez kirim ‘ebdal û kole te li dergah û wesîd
 Em ji seydayê me dûr kirne bi sed menzîl be‘îd
 Bilbilê dil hû dixwênê negme û nezm û neşîd
 (56/1)

Ma gelo kengî dibê xweş ser dilê min ev birîn
 Ger li gor huznê sebir çêkirye rebbu-l‘alemîn
 Firqeta Seyda ji bîr bir bîl‘umûm kovan û şîn
 Qet bi huzna wî guhertin nîn e bo qelbê yeqîn
 Serwer û pîrê terîqa neqşîya şêxê se‘îd
 (56/2)

Zahir û xef bo murîd û sofîyan bû elmeded
 Sîr û eḫwal û teweccuh remz û nîşan bê ‘eded
 Ma dikarim kû ḫebîb kim pesnê wî min geyrî ḫed
 Ew ji bo koma murîda minzila bav û weled
 Reḫmet û şefqet ji bo wan *kullu yewmun fî mezîd*
 (56/3)

2.6.4. Bihariye

*Di edebiyatê de ji helbestên ku bi teswîra biharê dest pê dîkin re “bihariye” tê gotin.*⁸⁰

Mela Sîraceddîn di dîwana xwe de cih daye gelek giyayên welatê xwe. Me 140 navê giyayan di dîwanê de tespît kirin. Di gelek cihên dîwanê de navê giyayan derbas dibe û helbesta 12an, bi tevahî li ser giyayan hatiye nivîsîn. Me helbesta 12an li jêrê bi cih kir.

12

Êlûn- 1- 1372

Mustefîlun fe‘ûlun mustefîlun fe‘ûlun

Munserih — · — / · — — / — — · — / · — —

⁸⁰ Pala, b.n.b., r. 66.

Subhan ji Rebbê e‘la xelq çêkirin çi xweşkok

Rizqê ewan derêxist ji çêriyê pel û kok

Bi wan wî daye zanîn çi b’xwun ji her giyaî

Da ku li wê biçêrin gava ku hat sibatok

Dibişkivin yek û yek heta ku hat dema wan

Giya û dar kirin şîn wek sosin û gangilok

Hin şîrîn in hinek tal hin nazik in hin qîval

Hin tuj in wek reşadî hinek tîrş in wek tîrşok;

Hinek şor in hinek miz hin kerbeş in hin nêrgiz

Ev serbimast û zîwan ev tehlî û penîrok;

Ev zûrçik û ev nefel ev ‘endeko ev xerdel

Ev qûncir û zilindar hêlkê şimqet pîvazok;

Qeyinbre û strîzerk ev parpar e ev guhbelk

Ev pûng û tolik û xes ev xuşîlo xecxecok;

Ev pîrqelaçk û kardî ev tûzika qelandî

Ev gêzgêzk û gûnîpez ev sûrim û sêvanok;

Ev şoqîl û kerengzer ev kulîlka sor û zer

Ev xemrî yû xercûnî şaşkê mela mîjmijok;

Qerenful û sorilyaz sîrik û sîr û pîvaz

Ev catir û jeħmasî kuncî kerk û gultîtok;

Strîmişk û xelendor ev dedefêrş û kerkor

Paryêmihe giyaxwîn ev be'cik û teptepok;

Ev rezrûvîk û 'elbik qozyadûpişk û banik

Ev gûriz û têlantir ev karûş û rîşrîşok;

Ev wek firîz û sorik giyareş û pûşdanik

Ev lavlak û derzîndank şekronek û dardarok;

Ev tirhûn û petrûşik birûskafir razyanik

Ev şembelîlk û hermel ev bilbizêk û pîvok;

Ev zehferan û beybûn ev wek benc û wek tûtûn

Ev reyhan û ev çiçek ev zirpûng û darhîrok;

Giyagerm û sitirhik giyayê mêrg û gerzik

Ev bacanê reş û sor ev xaşxaş û çeçeqok;

Ev bamî yû ev kindir ev lûbiya û kundur

Ev qawun û fasolî ev şebeş û şimamok;

Ev tivr û ev toletirşk ev betat û hilotirşk
Sêvê bin ‘erd û pincar ev silk û ev hîbelok;

Ev tîto ev hîştirav nîlûfera di nêv av
Reşkaşespa barevîn nivînhirç û rizyanok;

Ev ‘agol û bureqran ev wek reşada diyan
Ev hêliz û rîvaz in zimançûk û zengilok;

Ev genim û ce kuncî nîsk û şolik birincî
Ev baçîk û ev maşîk ev garis û eva nok;

Hinek jehr in hin derman hin bi ra ne çiqil dan
Hin bi ber in hin bi şîr hin nêr û mê hin zarok;

Hin avî hin bejanî hin çolî hin zozanî
Hin bi stirî hinek nerm hinek hişk in hin zirhok;

Hin li Çîn û Hindistan hin li Mîsr û Kurdistan
Hin li Sûdan û Hebeş hin li Danêr û Rêzok;

Her yek bi sirr û hikmet çêkirne Şahê Qudret
Ewan tesbîhê Barî xilas nabê şev û rok

Ibret tu bigre bo xwe Sîraco b’gotinê xwe
Dê w bav biçin buhuştê herê li deştê çîrok

2.6.5. Şîtaiye

*Şîtaiye ew qesîde ne ku di beşa wan a teşbîbê de behsa zivistan û rewşa zivistanê tê kirin.*⁸¹

Bi qasî ku me tespît kiriye di dîwanê de şîtayeyek heye. Ev helbest li ser zivistana sala 1959ê hatiye nivîsandin. Di nava gel de ji wê salê re divêjin sala xelayê an jî sala berfa giran. Mela Sîrac jî di vê helbesta xwe de rewşa zivistanê û halê zehmet yê herêmê jî bi raxistiye ber çavan. Em dikarin bibêjin ku ev helbest ji bo şîtaiyê mîna keke serkeftî ye. Li jêrê em ê vê helbestê bi cih bikin.

Mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun

Recez ---/---/---/---

Sala hezar û neh sedî pênciy û neh tarîx de bû

Zistan bi çavan kes nedî qeṭ 'ewr û ba peyda nebû

Xelqê digo sala me çû agir li ax û pûş diçû

Heṭṭa sibat pênc roj diçû 'ewrê sipî wek 'eyne bû

Berfek dibarî pêşemê wek wê nedît kes vê demê

J'berfa mezin naxwê xemê Xaliq bi fermana Te bû

Subhan ji ê çêkir heyat berfê veşartin teht û lat

Deşt kirye Sîpanê Xelat zêde nebê kêmtir nebû

Ned'go me sala serhejên hê çêtire j'ya dûvhejên

Hê maye heyva gagurên çêle li me nû peyde bû

Zêde me kir êmê bizin çinkû hero hin jê dizin

⁸¹ Pala, b.n.b., r. 447.

Heṭṭa nema ka û kizin qeṭ ev li bîra min nebû

Barî li me berfa sibat va xweypeza naê tebat
Ê ka heyî pî daye lat xweska bi wî lodek hebû

Kayê xilas kirne pere inşaf birî şaşik zer e
Ma nayê weqtê bêndere çaxê te qîmet qeṭ nebû

Kayê nehişt yek serpiya ne j'ḥaciya ne j'sofiya
Murwet ji xas û 'amiya wunda kirî tiştê hebû

Hin jê kirin bê bext û soz hin tevlî kayê kirne toz
Hin jê bi kakir nadê poz nabêjê ev dostê me bû

Dosta gelek dost dakirin ḥubba berê wunda kirin
Xwe j'bê'eqilmenda kirin çimkû seradek ka hebû

Dostê minê bê pût û zad ger pê nedim ez yek serad
Kengî ji bo wî yek murad ḥasîl dikim lew ḥîle bû

Hat berfeka sor û sipî firkand li me l'daran kepî
Binhêr li şopê pî li pî kakir li ser wek ce'de bû

Kakir didane kafiros test û kulav merş û beroş
Piştî nema pol û quroş ka wek heşaşîn feyde bû

Ax kayê ma tu l'kû heyî şêrîntirî j'çîta neyî
Xweska bi ê ka wî heyî kî ma bi te muhtac nebû

Kakir dibêjê wey li min çawa ku min loda mezin
Tijî nekir bona bizin lê ev ji bêhişya me bû

Hatî sibata qirr û qat hişk çû terî qet jê nehat
Nû bariye berfa gulat qût jî xilas bû pût nebû

Hetta nebû adar du şev qet qut nebû berfa me jev
Nûka çema dev kirne hev herkîn şev û roj nale bû

Salê hejand dûvê xelek kayê serî bir ber felek
Nalîn ji derdê wê gelek çiqqa kesê heywan hebû

Yek kakirî yek heq sitand ku bû subeh heq zîvirand
Ê zêdekê wî ka hiland halo me soz beyhûde bû

Hin jê di nav kayê de bûn piştî bi heq lev hatibûn
Got bîst quroş lê zêde bûn ger wan nedê ka b'te nebû

Vê kayê madem ev kirî ka çend qroşek kar kirî
Wucdan ji xudyê xwe birî lewre temaî zêde bû

Ê ka heyî ew bûye mîr lê ê neyî bûye esîr
Tebîat ewan kirne jibîr nabê me heywan berze bû

Xweska heba *xernûf* û dar belkî miyê qer nebne jar
Da wan di sergo nekme xwar laşê miyan bê hemye bû

Wer va kelaşê ser birî hin bê kefel hin bê hirî
Dunyahebên dîn ser kirî ‘ibret di qelbê wî nebû

Ê pez heyî dil bû kebab dîtî li vê dunyê ‘ezab
Hê mayiye roja hisab ê ku feqîr xem pê nebû

Îro wî şalek ka divê hingî xilas nabê *bivê*
Gava xuya kir wê *bivê* ew mehkeme gava vebû

Zanê çima hat ev bela pursê bike j’şeyx û mela
Her kes bi hev bûn mubtela ev tev ji ber zulma me bû

Herçî ku nanek xwariye wî îş temayî w bitrî ye
Nabê me cîran birçî ye nanek ji destan der nebû

Ma qey nizanê ku feqîr ehl in ji bo Rebbê qedîr
Çiqqa kesê wan kê jibîr Xaliq li wî xwey de‘we bû

Bo wan eger kir xizmetek dî mal xwedî bidnê çi yek
Geyrî peza şeht û kulek yan şîr û yan pûrt lê nebû

Şukrê Xudê nakin yeqîn çawa me ê wextê xwe dîn

Çiqqa hebin hesp û mehîn belkî li ferzan guh nebû

Lê hê jî rehîma Wî heye ger kuç bibarin ser me ye
Em nagihin heqqê xwe ye dunya me girt axret nebû

Wellahî ez pur tirsîyam nişkê ve ku rabê qîyam
Ba jorê Rehman zûriyam rehmet ji niqmet zêde bû

Ya Reb bi heqqê esîya rehîmê bike l'me 'asiya
Seh bid bi xatrê xwedîya **Sîrac** ji kolê derge bû

Qasî evê berfa mezin selewat ji Wî Rebbê mezin
Ser Ehmedî hê zêde bin ê ku bi wî rehîme l'me bû

2.6.6. Remezaniye

*Remezaniye ew qesîde ne ku helbestvanên klasîk ji bo hatina meha remezanê pîroz bikin nivîsîne û pêşkêşî mezinên dewletê dikirin.*⁸²

Bi qasî ku me tespît kiriye di dîwanê de remezaniyeyek heye. Ew jî helbesta 62yan e û me ew qesîde bi tevahî li jêrê bi cih kiriye.

Bi munasebeta hatina serê meha remezanê

Mefa 'îlun fe 'ûlun mefa 'îlun fe 'ûlun

Hezec · — — — / · — — / · — — — / · — —

Bi xêr hatî bi xêr hat bi xêr hatî remezan

Bi xêr û sed selamet miha rojî remezan

Çi heyvekî mubarek xuda ji bo me rêkir

Ya reb şukr û sena kû da ummetê remezan

⁸² Pala, b.n.b., r. 387.

Nazil kirin di wê de te kîtab û suhûf tev
Heyîv temam kirin kêr serdar kirî remezan

Roja yekê remezan suhûf te dan Xelîlî
Zebûr ji bonî Dawud da hijdehê remezan

Roja şeşê remezan Tewrat te daye Musa
Încîl ji bonî Êsa da sêzdehê remezan

Quran di bîst û çarê te da Muhemmedê (s.e.w.) xwe
Bêhed şelat li ser wan heta hebê remezan

Roja serê remezan derê cennet vekirye
Girtî ne dozexê der hemî ewê remezan

Derê rehmê vekirye Îblîs kû tê girêdan
Tewbe qebûl dibê her divê mahê remezan

Şeş sed hezar ji wanê bûn laîqê 'ezabê
Xuda 'efwê didê wan çîqa şevê remezan

Bi qasî wan temamê kû tê de bûne azad
Car dî şeva xelasek dan xatirê remezan

Ya 'nî çîqa remezan ji mîlyona seh û şeş

Xuda li wan dibûrî bigrin qedrê remezan

Rebbê mezin digotî (rojî ji bo min e hem)

Ez im ceza didim ê girtî sihê remezan

Gotî Resûlê Ekrem (ger ummeta'm bizanê)

Xêra Xudê şiyandî bo wî divê remezan

Dê ummetê bixwesta bi dîlxweş û bi hêvî

Kû sal hemî bi carek jê re bibê remezan

'Erş û kursiyy û eflak gava kû heyv bi nû bû

Dikin qîr û dibêjin şeva yekê remezan

Xwezuya me bê ji bo te ya ummeta Muḥammed (s. 'e. w.)

Tu l'cem Xudê bi qedr î çiqî kû tê remezan

Roj û heyiv stêrik şev û roj teyrik û hût

Bo te du'a dikin tev çiqî şevê remezan

Xuda dibê melekno xêra rojiyy û tesbîh

Dibê mihê bidin bo rojîgirê remezan

Şeva qedrê di wê de hê çêtir e ji hezar meh

Heştê w sê sal û çar heyv bîst û heftê remezan

Ya Reb ji bo remezan miskîn **Sîrac** ‘efû ke

Ji me heta kû sağ in qebûl bikê remezan

2.6.7. Ne’t

*Ne’t ew helbest in ku di Edebiyatên Îslamê de ji bo pesnê pêxember bidin û şefa’etê jê bixwazin têne nivîsîn.*⁸³

Bi qasî ku me tespît kiriye, di dîwanê de, tenê li ser Resûlê Ekrem Muhemmed (s.e.w.) helbest nehatine nivîsîn. Lê belê helbestek bi giştî li ser pêxemberan hatiye nivîsîn. Di helbestê de li gorî tespîta me navên 14 pêxemberan derbas dibe. Navê Resûlê Ekrem Muhemmed (s.e.w.) tê de derbas dibe. Me ji wê helbestê 5 malik li jêrê bi cih kirin.

Di piştî rohnîkê meblûl di gel bê emriya men’ûl

Bi Adem tobe kê meqbûl te da koma giran ya Reb!

(6/4)

Mirand Idrîs li dunyâ te cardî hem heyat daê

Birî cennet jixwe naê te kir terzî cilan ya Reb!

(6/5)

Nebî Nûh dayê te fulkek xilas kir te bi wê qewmek

Li ser Cûdî kirin destek bi wan nû bû cihan ya Reb!

(6/6)

Xilas kir Hûd ji qewmê ‘Ad ku pêre wan kirin ‘innad

Fena kir te bi nar û bad me girt ‘ibret ji wan ya Reb!

(6/7)

Devha Şaliḥ te j’yek kuçek derxistî min qeṭ nîn e şek

Ku kafîra kuşt bûn helek bi qîra qasidan ya Reb!

(6/8)

⁸³ Pala, b.n.b., r. 363.

2.6.8. Munaceat

*Axivîna bi dengê nizm, lavakirina ji Xwedê. Munaceat di edebiyatê de helbesta ku mijara wê lavakirina ji Xwedê ye. Heke pexşan hatibe nivîsîn jê re tezerruname tê gotin.*⁸⁴

Di dîwanê de wekî helbest zêde munaceat nîn in. Lêbelê di gelek helbestan de lavakirina ji Xwedê, cih girtiye. Em dikarin bibêjin ku helbesta 2yê munaceat e. Me çend malik ji wê helbestê li jêrê bi cih kirin.

Bizanin hûn bira cumle ku dunya fani ye billah

Muheqqeq dê biçê boşê ji geyrî zîkrê heq Ellah

(2/1)

Tu nafîkrê li xwe insan çawan tu hatî dunyayê

Bi vê husn û bi vî şeklî tu xulqandî Xuda Ellah

(2/2)

Ji yek nuqta jin û mêrî di malzarokê de çil roj

Bûyî xûn paşî bû goşt paşî bû suret ji nik Ellah

(2/3)

Di çar heyva de ruh berda bi ser laşê te de miskîn

Bi dest û pê bi çav û guh tu ‘ebd î Xaliq e Ellah

(2/4)

⁸⁴ Pala, b.n.b., r. 353.

2.6. HIN TEMAYÊN DÎ YÊN DI DÎWANÊ DE

2.6.1. Hikmet

Hikmet di gelemperê dîwanê de cihekî girîng digire. Helbestvan di gelek helbestên xwe de cih daye hikmetê. Di malikên li jêrê de mirov dikare eşkere bibîne ku Mela Sîraceddîn bi zimanekî edebî cih daye hikmetê.

Bexîlî yû îman kesî nedî ketin qelbê kesî

Yek toz e yek wek melkesî her dû ji hev re dijmin in

(3/28)

Xulqandî insanek delal ba şeklekî rengê hilal

Dayêde qedd û wechê xal nîn e di rengê wî de yek

(7/2)

Çêkir di mislê asiman hem mislê 'erdê bê goman

Hejdeh hezar 'alem heman insan li wan kir mesterek

(7/3)

Nîv kufîrî ye feqîrî nîv dînîtî evîndar

Nîv mirin e esîrî nîvê dehan yek û çar

(9/1)

Nîv êş û jan çî ta ye nîv rehîm xwe ewr û ba ye

Mewlîdxwên nîv mela ye 'eza ye nîvê muxtar

(9/3)

Ne l'mêjker nîv nesar e cahil ku nîv dewar e

Şerwal ku nîv sitar e j'aşî re nîv e destar

(9/5)

2.6.2. We'z û Nesîhet

We'z şîret di dîwanê de cihekî berfireh digirin. Me berî niha îfade kiribû ku Xelîlî di helbestên xwe de armanca civakî xistiye pêş. Ji ber vê yekê jî di gelemperê dîwanê de we'z û nesîhet cihekî girîng digirin. Ev malikên li jêrê, di mijarên we'z û şîretan de hatine nivîsîn.

Îlahî tu Xudayê min tu Şafiyê çi derdê min

Efû ke tu xetayê min çiku her tu dilo van î

(1/2)

Hemma wê her bikne zelal jê der bixin pîsê fi 'al

Pur nûr bikin rengê hilal j' exlaqê qencî dagirin

(3/3)

Bo şehwetê derman bizan neçe civata tu jinan

J' wan his neke beyt û stiran bo te me şîret her ev in

(3/13)

Kesê wî pêş neraêx 'emel pêşya hevalan

Bi navê bav û bapîr dimênê her li paş e

(8/9)

Tu tefekkur ke ji zû ve ê berê çûne bi kû ve

Ew kesê ku mewt li dûv e çi bikê j' zêr û dirav

(17/2)

Ger çîqa malê te pur bê hin ji zêr û hin ji durr bê

Kû mirin teşbîhê gur bê heyf e tu berdiyyê çav

(17/5)

Nefsa me îro bûye emîrek

Şeytan ji wê re bûye wezîrek

'Aqil melik bû bûye esîrek

Şer tev civandin wîna bi qîrek

Ez yek tenê me dijmin me her sê

Hawar ji destê dunya û nefsê...

(19/10)

2.6.3. Tewazu'

Di helbestên xwe de gelek caran tewazu' kiriye û pesnê xwe nedaye. Ji bo helbestvanekî klasîk ev cudatîyek e. Lewra helbestvanên klasîk bi pîranî pesnê xwe didin. Ji bo mînak; Melayê Cizîrî di helbesteke xwe de wiha dibêje:

Ger luluyê mensûrî ji nezmê tu dixwazî

*Wer şî'rê Melê bîn te bi Şîrazî çî hacet*⁸⁵

Lêbelê bandora Terîqa Neqşebendiyê li ser Mela Sîraceddîn heye û weke ku tê zanîn tewazu ji bo terîqetan pir girîng e. Ji ber vê yekê di piraniya helbestên xwe de pesnê xwe nedaye û xwe nimz kiriye. Di van malikên jêrê de ev taybetî eşkere xuya dike:

Ev Sîrac 'ebdek zelîl e wî guneh nayên hesab

Lêbelê rehîma te zehf e ê bixwazê layured

(6/25)

Defter ku nîv heval e d'ber avêt nîv su'al e

Nîv dehbe bê mital e Sîrac e nîv şe'ar e

(9/9)

Hê nebû Sîrac di şî'rê de wekî Şeyxê Cizîr

Pa çî zûka xwe hesêb kir te (Mela xemse 'eşir)

(65/6)

2.6.4. Dostanî:

Di dîwanê de helbestvan li ser dostaniyê jî sekiniye û helbesta 99an bi tevahî ji vê mijarê re hiştiye. Ev helbest jî 62 malik in. Ji xeynî vê helbestê jî di dîwanê de cih daye mijara dostaniyê. Me ji helbeta 99an sê malik li jêrê bi cih kirin:

Kû sohbet te kir guh bide her kesî

Dibê dost ji bo te kesê nanasî

(99/1)

Bila zanibin ku tû hij wan dikê

Bi hûrmet bi qelbî biya wan dikê

⁸⁵ Mela Ehmedê Zivingî, Gerdeniya Gewherî, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, weşanên Avestayê, Stenbol, 2013, r. 226.

(99/2)

Muheqqeq bizane kû ew jî wisan

Ji bona te cumle dibin dostê can

(99/3)

2.7. PÊWENDIYA XELÎLÎ BI TRADÎSYONA EDEBÎ YA KURDÎ RE

Mela Sîraceddînê Xelîlî di sêrî de di bin bandora Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî de maye. Lêbelê em dikarin bêjin bêhtir di bin ya Melayê Cizîrî de maye. Lewra terse helbestên wî dişibine helbestên Melayê Cizîrî û di dîwana xwe de helbestên Melayê Cizîrî teşîr kirine û wekî di jî navê wî di helbestên xwe de zikir kiriye.

5.1. Melayê Cizîrî

*Melayê Cizîrî, di sala 1570ê li Cizîra Bohtan/Botan hatiye dinyê. Navê wî Ehmed e. Ji eşîra Bextiyan e. Bavê wî Şêx Muhemmed, alimekî muderris e. Mela pêşî li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye, dûv re li medresên Hekarî û Îmadiyê xwendiyê û dawiyê jî li gundekî Diyarbekirê ku jê re Sitrabês/Sitrabas tê gotin, li cem Mela Taha xwendina xwe bi dawî anîye û ji wî zatî îcazeta xwe stendiyê. Piştî ku îcazet wergirtiye, li medresa Heskîfê dersa feqîyan gotiye, piştî çûye Cizîrê, li medresa xwe ya navdar, Medresa Sor, dest bi tadrîsatê kiriye û heta sala ku çûye rehmetê li vê medresa meşhûr seydatî kiriye. Gora wî, hezar nûr lê bibare, îro li Cizîrê di wê medresê de ye. Nayê zanîn ku zewiciye ya nezewiciye.*⁸⁶

Mela Sîrac gelekî di bin bandore Melayê Cizîrî de maye. Em dizanin ku dîwana Melayê Cizîrî jî li cem wî pir bi qedir bû. Mela Sîrac li ber çapa ya dîwana Melê ya bi tîpên erebî ya Ebdurrehîm Rehmî, bi destxetê xwe nusxeyeke dîwana Melayê Cizîrî nivîsiye. Di dawiya vê nusxeyê de medhiyeyek ji Melayê Cizîrî re nivîsiye. Me ew medhiya ku ji çar malikan pêk tê, li jêrê me bi cih kiriye.

Îro me tu seyda yî ey xewsê çîqa uşşaq

Lew muqtebis in em bo nûra te ye pur berraq

Eşqa te hemî nûr e hubba te ye rehmanî

Lefzê te hemî merhem me l' derdê dila danî

⁸⁶ Osman Tunç, Selman Dilovan, Melayê Cizîrî Dîwan, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2010, r. 9.

Kengî Hafîzê Sîraz rengê te dibî emman

Qet feyda dilan nadî dermanê Hekîm Loqman

Hêvî me ji me'bûd e seydayê me bî Ehmed

Der roja qiyamê de me gel teleba kî 'ed⁸⁷

Ev destxet jî niha mewcûd e û di destê merivên wî de ye. Me du sê rûpelê wê dîwanê jî di nava pêvekan de nîşan dane. Bi qasî çil pêncih rûpelên dîwanê kêmin; lê belê qismê mayî zelal e û baş tê xwendin. Ji bo ku wî nebe me ew nusxe jî bi scanerê qeyd kir. Tenê ew nusxe jî bandora Melê ya li ser Mela Sîrac eşkere dike. Di dîwanê de bandora Melayê Cizîrî gelekî berbiçav e. Terzê nivîsandina wî jî dişibe yê Melayê Cizîrî. Heta mirov dikare carinan helbestên wan tevlihev bike. Belkî ev ferq heye ku Mela Sîrac huner jî xwe re nekiriye armanca pêşî. Mela Sîraceddîn di dîwana xwe de helbesteke Melayê Cizîrî testîr kiriye. Helbesta 50î testîra helbesta Melayê Cizîrî ye.

*Teştîr şeklekî terbi' û texmîsê yê dî ye. Divê mirov testîrê bike du şeq. Teştîr wekî cureyekî nezmê ew ku helbestvanek dido an sê rêzikan têxe nava malikên xezela helbestvanekî dî. Divê ku wezn û qafiyeya helbestên neyê xirakirin û yekîtiya me'neyê jî neyê windakirin.*⁸⁸

Em ê li jêrê sê malikên pêşî yê testîra Melayê Cizîrî bi cih bikin.

يُزَمِّكُهُ إِسْرَافِي دِ قَتْلَى مُبَاخْ

يا نور عيني مضي عمري وراخ

Pir meke israfê di qetlê mubax

Ya nûre 'eynî meza 'emrî werax

(50/1)

فِي كُلِّ وَقْتٍ لَكَ قَتْلُ الْعَشِيقِ

سَفْكَ دَمِ الْعَاشِقِ مَا لَا يَبَاخْ

Fî kullî weqtin leke qetlul 'eşîq

Sefku demil 'aşîqi ma la yubax

(50/2)

⁸⁷ Mela Sîraceddînê Xelîlî, *Dîwana Melayê Cizîrî*, nusxeya destnivîs, istisnax: 1999, r. 290.

⁸⁸ Pala, b.n.b., R.455.

سینه بدستی خوه مبارک فکه

والله دل زر بویه رنگی تفاق

Sîne bi destê xwe mubarek veke

Wellahi dil zer bûye rengê *tufah*

(50/3)

Di malika jêrê de jî nave Melayê Cizîrî zikir kiriye û ji şexsê xwe re gotiye; hê tû di helbestê de wekî Melê bi pêş neketiye. Em ji vê yekê fêhm dikin ku Mela Sîraceddîn, Melayê Cizîrî ji xwe re wekî rêber û hedef dibîne.

Hê nebû Sîrac di şî' rê de wekî Şeyxê Cizîr

Pa çi zûka xwe hesêb kir te (Mela xemse 'eşir)

(65/6)

5.2.Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî di sala 1061ê hicrî de ku beramberî sala 1651ê mîladî tê, li Bazîdê hatiye dinyayê. Wî bi xwe di berhema xwe ya bi navê "Nûbihara Piçûkan" de tarîxa jidayîkbûna xwe (li gorî hesabê hicrî) wiha aniye zimên:

Lewra ku dema ji xeybê fek bû

Tarîx hezar û şêst û yek bû

Peyva "Xanî", eşîra wî nîşan dide. Eşîra Xanî, eşîrek ji eşîrên herêma Hekkarî ye. Malbata Xanî, di sedsala XVIem de ji herêma Hekkarî pêşî koçî Wanê kirine, piştî ji wir jî koçî Bazîdê kirine.

*Navê bavê Xanî Mela Îlyas, navê diya wî jî Gulnîgar e. Bavê wî Mela Îlyas û birayê wî Mela Qasim wekî katibên diwana mîrên Bazîdê wezîfe kirine. Xanî jî piştî wan di dema mîr Mihemed Pirbelalî de ev wezîfe domandiye.*⁸⁹

Em dikarin bibêjin ku piştî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî bandor li ser Mela Sîraceddînê Xelîlî kiriye. Lewra di helbesta pêşî de navê wî zikir kiriye û ji Xwedayê xwe xwestiye ku zimanekî wekî yê Ehmedê Xanî bide wî.

Li jêrê me malika ku navê Ehmedê Xanî tê de derbas dibe, bi cih kiriye.

Bide min 'ilmekî nafi' 'emelek şalih û rafi'

Zimanek zikir û nabi' çû benda *Ehmedê Xanî*

⁸⁹ Şamil Esgerov, Mehmet Kaplan, Huseyn Şemrexî, Mem û Zîn Ehmedê Xanî, Nûbihar, İstanbul, 2015, r. 5.

(1/7)

Ji xeynî vê jî navê “Mem” 7 caran û navê “Zîn”ê jî 16 caran di dîwanê de derbas bûye. Wekî ku tê zanîn berhema bi navê “Mem û Zîn”ê, berhema Ehmedê Xanî ya herî girîng e û di Dîroka Edebiyata Kurdî de jî şaheserek e.

Li jêrê em ê çend malikên ku navê Mem û Zînê derbas dibe, bi cih bikin.

Li alîkî şerabnoş in li alîkî siyehpoş in

Li alîkî *Mem* û Mecnûn li ê dî *Zîn* û Leylaê

(10/21)

Hemî bûn *Mem* û hin jî Mecnûnê dîn

Dinê *Zîn* û Leyla ye kul kir ceger

(24/6)

Qelesa min binivîs bo me murad û meremê

Lê me dil bûye teji ketme cihê *Zîn* û *Memê*

(63/1)

BEŞA SÊYEMÎN METNÊ DÎWANÊ YÊ REXNEYÎ

3.1.DANASÎNA NUSXEYÊN DÎWANÊ

3.1.1. Nusxeyên Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî

Di destê me de, tenê nusxeyeke destnivîs ya dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî heye. Ew jî ji aliyê Mela Ebdullahê Dêrgulî ve hatiye nivîsîn. Biraziyê Mela Sîraceddîn ê bi navê M. Siddîq Ataç⁹⁰ perçeyên dîwanê ku ji helbestên wî pêk dihatin birine cem Mela Ebdullahê Dêrgulî û xwestiye ku jê re bi xetê xwe nusxeyekê binivîse. Lewra Mela Ebdullahê Dêrgulî mustensixekî navdar bûye û xetê wî gelekî xweşik bûye. Ev nusxe wekî fotokopî gelekî belav bûye û fotokopiyêke wê ketiye destê me jî. Me çiqas ji bo nusxeyên cuda lêkolîn kir jî me nusxeyeke cuda nedît. Loma ev nusxeya Dêrgulî nusxeya tekane ye. Tehsîn Îbrahîm Doskî di sala 2014an de dîwana Xelîlî bi tîpên ‘Erebî çap kiriye û wî jî ev nusxeya Mela Ebdullahê Dêrgulî esas girtiye.

Li jêrê em ê li gor krîterên zanistî vê nusxeya destnivîs ya dîwana Xelîlî bidin nasîn:

3.1.2. Tewsîfa Nusxeya Destnivîs ya Dîwana Xelîlî

Li jêrê em ê li gor usûla navnetewî ya danasîna destxetan, tewsîfa destxeta tekane ya dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî pêşkêş bikin.

1. **Navê berhemê** : Kitaba Gulcivîn Dîwana Qesîdên Muhemmed Sîraceddîn kurê mela Ebdulhekîmê Xelîlî Xudê Rehma Xwe li Wan Bikê Amîn ya Rebbe’l-‘alemîn
2. **Te’lîf, tercume, şerh** : Te’lîf
3. **Navê nivîskar** : Muhemmed Sîraceddînê Xelîlî
4. **Navê xwedî** : M. Siddîq Ataç
5. **Zimanê destxetê** : Kurdî (Kurmancî)
6. **Serbixwe-mecmû’e** : Serbixwe
7. **Menzûm-mensûr** : Menzûm
8. **Rengê kaxezê** : Spî
9. **Jimara wereqan** : 95 wereq e. Lêbelê li gor sîstema rûpelan jî jimare hatine dayîn.
10. **Ebadên kaxezê** : 21x15
11. **Cureya xetê** : Xeteke şexsî di navbera sulus û nesxê de
12. **Îmla** : Îmlaya wê xweş e û bi hereke ye.
13. **Murekkeb** : Reş

⁹⁰ M. Siddîq Ataç, kurê birayê wî Şêx Beşîrê Xelîlî ye.

14. Cedwel : Di hemû wereqan de li her çar kenaran cedweleke duxêzî heye. Sernavên helbestan jî di nav cedweleke cuda de ne. Di hin helbestan de jî du navbera her du misrayan de cedweleke sitûnî hatiye xêzkirin.

15. Serlewhe : Di serlewheyê de bi zimanê erebî “Bismillahirrehmanirrehîm we bihî neste’în” hatiye nivîsîn.

16. Besmele : Heye

17. Sernav : Sernav tunene. Lêbelê carinan li jora helbestan munasebeta nivîsîna helbestê hatiye nivîsîn. Dîsa li jora hemû helbestan hejmar jî hatine nîşandan. (ji 1ê dest pê kiriye heta 143yan). Di piraniya helbestan de dîroka nivîsandinê jî cih girtiye.

18. Jimara beytan : Teqrîbî 3420 beyt in.

19. Jimara rêzan : 18

20. Peyva te’qîbê : Heye

21. Cihê istînsaxê : Dêrgulê (Şîrnex)

22. Qeyda istînsaxê : Di dawîya berhemê de qeyda istînsaxê heye: “Temmet we ‘ela nazimîha we katîbîha er-Rehmet amîn”

23. Tarîxa istînsaxê : 22.07.1999

24. Cihê istînsaxê : Dêrgulê (Şîrnex)

25. Navê mustensix : Ebdullah Îmam Qeryet Dêrgulê

Temelluk : El-Musahhiḥ We N-naşir Muḥemmed Siddîq
Atac El-Xelîlî

26.

27. Hamîş/derkenar : Tenê du sê heb hene.

28. Destpêka destxetê : “Bi navê rebbê pur xeffar kerîm Rahim û Rehmanî”

29. Dawîya destxetê : “De lo lo delal de lo lo delal delolo delal gunhê me pur in xêrê me kanîn”

3.1.2. Danasîna Çapên Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî

Heta niha dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî careke tenê hatiye çapkirin. Ew jî çapa Tehsîn Îbrahîm Doskî ye.

3.1.2.1. Danasîna Çapa Tehsîn Îbrahîm Doskî

Ev nusxe di sala 2016an de li Hewlêrê ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve hatiye çapkirin. Ev çap jî li ber destxeta ku me jê îstîfade kiriye, hatiye amadekirin. Tehsîn Îbrahîm Doskî helbestên Erebi, Tirkî û Farisî nexistine çapê de. Yanî tenê helbestên Kurdî hatine bicihkirin. Di çapê de pêşgotinek, danasîna Mela Sîraceddîn, metnê dîwanê, mewlûda Mela Sîraceddîn ya bi navê Durra Birincî û di pey wê re jî wergera Mela Sîraceddîn ya bi navê Şîretên Loqmanê Hekîm cih girtiye. Çap jî 352 rûpelan pêk hatiye. Çap li ber desxetê hatiye nivîsîn û bêhereke ye. Di destxetê de navê helbestan nehatiye danîn. Lewra her helbestek bi rêzê bi hijmaran hatibû nîşandan. Lêbelê Doskî di serê her helbestekê de qismekî rêza pêşî ya helbestê bi cih kiriye. Çapê piştî pêşgotin û danasîna Mela Sîraceddîn; bi vê çarînê dest pê kiriye:

Herkesê ku lê binêrê ew bi qelsîti yeqîn

Her du çavê wî wekî çavê çilîstê ro nebîn

Ev du xet roja biharê jê diçin şewq û beraq

Ma ne hêja ye ku em navê wê deynin Gulcivîn

Çap bi vê malikê jî bi dawî dibe:

Lewra Xwuda efû dike gunehan

Çiqa bikin bi deh sal û mehan



3.2. DI AMADEKIRINA METNÊ DÎWANÊ DE RÊBAZA KU HATIYE ŞOPANDIN

Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî cildê wê jî di nav de ji serî heta dawiyê bi baldarî hatiye latînîzekirin. Li jêrê me cih daye rêbaza ku di amadekirina metnê dîwanê yê bi tenqîd de hatiye şopandin.

1. Wekî ku me li jorê jî behs kir ji bo amadekirina metnê dîwanê me jî ev nusxeya Mela Ebdullahê Dêrgulî wekî esas qebûl kiriye.

2. Di latînîzekirina metnê orîjînal yê bi alfabeya kurdî-‘erebî de, ji bo tîpên ku di alfabeya Kurdî ya latînî de cih nagirin, me alfabeya transkrîpsiyonê ya navnetewî ya ku di weşana berhemên bi tenkîd de tê bikaranîn, hilbijartîye.

Alfabeya Transkrîpsiyonê

ء : ‘

ث : Ṣ ṣ

ح : Ḥḥ

ذ : Ẓẓ

ص : Şş

ض : Žž

ط : Ṭṭ

ظ : Ẓẓ

ع : ‘

غ : Ğğ

3. Di vê nusxeyê de ji bo her helbestekê hijmarek hatiye dayîn. Di heman demê de hijmara rupelan jî hatiye nivîsîn. Me jî di îqtîbasa beyt û malikan de hijmara helbestan û beytan tenê nivîsî. Yanî hijmara pêşî, ya helbestê û ya dawî ji ya beytê ye. Bi vî rengî dîtina van îqtîbasan hêsantir dibe. Ji bo mînak:

Tu têr nexwe hinda welê ma lazim e qulpik hilê

Lê paşî tê bêjê melê seyda bi lez limêj bikin

(3/30)

Li vê derê reqema pêşî (3) hijmara helbestê, reqema diduyan jî (30) hijmara beytê nîşan dide.

4. Ji ber ku hecma dîwanê mezin e û gelek helbest jî dirêj in, carinan dîtina hinek malikan zehmet dibû. Ji bo vê yekê, me jî serê helbestan heta dawiya helbestê hijmara malikan di serê rêza pêşî ya malikan de bi cih kir.

5. Ji bo ku helbest û malikek bi hêsanî were dîtin, me hijmara rûpelên destxetê jî di serê rûpelê de li milê rastê di nava kevaneka bi goşe de nivîsî.

6. Helbest bi wezna ‘erûzê hatine nivîsandin; lêbelê helbestvan ev nîşan nedane. Me di amadekirina metnê dîwanê de, di serê hemî helbestan de wezna helbestê û behra qalibê wê bi cih kir.

7. Xwendina metnê dîwanê, zêde ne zehmet bû. Ji ber ku xetê katip (Mela Ebdullahê Dêrgulî) pir xweşik bû. Bi rastî hema bêje wekî metbe’ê nivîsandiye. Lê belê dîsa xwendina hinek cihan zehmet bû. Êdî an ew peyv xelet hatine nivîsandin an jî me nikariye bixwîne. Lê bi rastî carinan tîp û peyv gelekî xweşik tê xwendin lê belê me’neyeke mentiqî jê dernakeve. Di cihên wilo de, me cudanivîsîna çapa Tehsîn Îbrahîm Doskî jî wekî jêrenot bi cih kiriye. Mînak; di helbesta giya û riwekan de, peyvek me bi şêklê “qeyinbre” xwendiyê, lê belê Tehsîn Îbrahîm Doskî ev peyv bi şêklê “qeyinper” nivîsandiye.

8. Di zimanê Kurdî de, ji ber ku ji bo demeke dirêj, perwerdeyeke navendî çênebûye; hinek peyv li gorî herêman ji hev cuda têne gotin. Mînak: Mî/mih, sî/sih, hij/hez, nimêj/limêj. Em li gorî metnê helbestvan çûne. Yanî helbestvan bi çi şiklî nivîsandibe, me jî wilo nivîsandiye.

9. Helbestvan ji bo wezn û qafiyê carinan hinek peyv piçekî guhertine û bi wî şiklî nivîsandine. Di vê rewşê de jî em li tekstê dîwanê sadiq mane. Lê me wekî jêrenot îzaha wê kiriye.

10. Ayet, hedîs û îfade û gotinên bi ‘Erebî, Farisî û Tirkî yên di dîwanê de cih girtine, me bi şiklê îtalîk nivîsandine û me’neya wan a Kurdî jî wekî jêrenot nivîsiye. Çend helbestên ku bi tevahî bi van zimanan hatine nivîsandin jî hene. Me di binê her malikekê de de me’neya wan a Kurdî nivîsandiye.

11. Di metnê de ji ber ku wezin li hev were, carinan helbestvan hinek peyv kurt nivîsîne. Me jî li gorî metnê nivîsiye û di cihê kurtkirinê de apostrof bi cih kiriye. Mînak:

Fe-wellahî gunehkar im ji rehma te ricakar im

Wekî bilbil bi hawar im ji bo m’kamil ke îmanî

(1/5)

12. Heke di metnê xeletiyêke eşkere hebe, me ew jî sererast kiriye. Mînak: Di vê malikê de hijmara ayetên sûretê Nîsa wekî “sed û bîst û şeş hatibû nivîsandin; lê belê me wekî rastiya wê bi şiklê “sed û heftê w şeş” nivîsiye.

Tu sed û heftê w şeş ji hûr ez wan Nisa'ê der qusûr

B'rizqê me ke Rebbê şekûr ya sahibê her minneta

4/4

13. Ji ber ku di destxetê de hijmarên rûpelan hatibûne nîşandan, me jî ew hijmar di metnê latînzekirî de bi şeklê “[r.1]” nîşan dan.



[r.1]

3.3. METNÊ DÎWANÊ

KITABA GULCIVÎN⁹¹

DÎWANA QESÎDÊN MUḤEMMED SÎRACEDDÎN KURÊ MELA
EBDULḤEKÎMÊ XELÎLÎ XUDÊ REḤMA XWE LI WAN BIKÊ AMÎN YA
REBBEL 'ALEMÎN

Fa 'ilatun fa 'ilatun fa 'ilatun fa 'ilun
Remel – · – – / – · – – / – · – – / – · –

Herkesê ku lê binêrê ew bi qelsîti yeqîn

Her du çavê wî wekî çavê çilîstê ro nebîn

Ev du xet roja biharê jê diçin şewq û beraq

Ma ne hêja ye ku em navê wê deynin Gulcivîn

Di pey ra kitaba rusta durra şîretê Luqmanê Ḥekîm ê gotine ji lawê xwe re

MUḤEMMED SÎRACEDDÎN

NIVÎSANDINA KITABÊ (MÎLADÎ 1978 HICRÎ 1398)

El-Musahhiḥ We N-naşir Muḥemmed Siddîq Atac El-Xelîlî

⁹¹ Ev rûpel, cildê kitêbê ye.

[r. 2]

Bismillahirreḥmanirreḥîm

We bîhî neste'în

1

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Bî navê Rebbê pur Ğeffar Kerîm Raḥîm û Reḥmanî
Celîl û Xaliq û Settar 'Ezîm Qadir û Mennanî
2. Îlahî tu Xudayê min tu Şafiyê çi derdê min
'Efû ke tu xetayê min çiku her tu dilovan î
3. Çiku reḥma te baran e tijî kir erd û esman e
Ji bo derdê me derman e dinalim ez ji kovanî
4. Gunahê min pur in mislê turab û seng û hem remlê
Îlahî l'min neke ḥemlê giran ta bikme fiḡanî
5. Fe-wellahî gunehkar im ji reḥma te ricakar im
Wekî bilbil bi hawar im ji bo *m*⁹² kamil ke îmanî
6. Tu îmanê bike kamil tu nefsa min bike 'adil
Gunahê min bike za'il tu qelbê min ke Reḥmanî
7. Bide min 'ilmekî nafi' 'emelek şalih û rafi'
Zimanek ḡakir û nabi' çû benda Eḡmedê Xanî⁹³
8. Derê te her kuşayîd e li ber wê mewsim û 'îd e
Li ber min daniye cî de dinalê qelbê elwanî
9. Dinalê her dem û gavê wekî êsîrkî der davê
Diçê jê xwîn wekî avê gelo dermanê min kanî
10. Eger pîrsa te derman e bike hêvî ji Reḥman e
Ji şahê erd û esman e bibê l'derdê m'ke dermanî
11. Bike tewbe ji ewzara di her subḡ û di êvara
Çiku Rebbê me Ğeffar e Xudanê we'da Qurânî
12. Heye wî reḡmetek wasi' û nûrek muşriq û sati'
Hene min pur guneh tabi' li ber 'efwê tune kanî

⁹² Li vir ji ber weznê peyva "min" bi şeklê "m" hatiye kurtkirin.

⁹³ Helbestvanê Kurd ê bî nav û deng, nivîskarê Mem û Zînê.

13. **Sîraceddîn** ji xew rabe di hikmê wî tu derya be
Ku bê wî çîz tu ca nabe rica ke şubhê dîwanî

2

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun
Hezec · — — — / · — — — / · — — — / · — — —

1. Bizanin hûn bira cumle ku dunya fani ye billah
Muheqqeq dê biçê boşê ji geyrî zîkrê heq Ellah
2. Tu nafîkrê li xwe insan çawan tu hatî dunyayê
Bi vê husn û bi vî şeklî tu xulqandî Xuda Ellah
[r. 3]
3. Ji yek nuqta jin û mêrî di malzarokê de çil roj
Bûyî xûn paşî bû goşt paşî bû suret ji nik Ellah
4. Di çar heyva de ruh berda bi ser laşê te de miskîn
Bi dest û pê bi çav û guh tu 'ebd î Xaliq e Ellah
5. Di zik de neh miha da te heyat û rizq û hem şehwet
Tu qulbandî çep û rastê tebarek sed te'alellah
6. Bi sehl û merhemet pur hengî milyaket tu anî xwar
Diya te xew nehatî ta tu razandî *bi ismilla*
7. Heta kû tu bûyî zarok di piştî bûyî pazdeh sal
Ne heyf û sed gebînet kû ne hişyarî li emrillah⁹⁴
8. Çiqa kû tu dikê gunhan heman ew her didê ni'met
We ger kû tu bikê tewbe qebûl dîsa dikê Ellah
9. Xuda gotî me nexulqand ne cinn û hem me ne insan
Ji geyrî kû bikin ta'et ji bona Rebbê xwe Ellah
10. Me navê qet ji wan rizq û me navê bidne min xwarin
Muheqqeq razîq û ê pur quwet her dem ew e Ellah
11. Xuda dan bo te heft e'za tu bigre pê derê agir
Heqê her yek eda ke da nebê 'asî li cem Ellah
12. Ewî çavê di reş dan te bibînî tu bi wan asar
Bigir 'ibret bi wan hem tu bixwêne pê Kelamullah
13. Hêramî pê nezer yek car neke ew tîrê Şeytên in

⁹⁴ Ji bo emrê Xudê.

Zina çavan ev e lateqrebû⁹⁵ gotî Kitabullah

14. Kesê kû dagirê çavan b'heramî dê di heşrê de
Xuda dê dagirê çavê wî agir got Resulullah
15. Ji bona his bikê we'z û hedîsê daye te du guh
Di emrê dîn û dunyayê bizanê nehy û emrullah
16. Neke casûsî yû hem his neke geyb û seb û sazî
Risasê kû helandî wê tijî guh kin bi van tellah
17. Xuda da te zimanek tu bixwêne pê kitaba wî
Bike pê şukr û pê xeyrê û we'zê tu l' 'ibadillah
18. Derew geyb û seb û fitne neke pê her tu wê gem ke
Bi wê paşî tu wê bê daleqandin nav 'ezabullah
19. Zikê te çêkirî ev rûvî yû nav û tihêl gurçik
Bike tê de helal xwarin kû têr bû bêje hemdullah
20. Hëramî qet nexwe lewra kû xwîn û goşt ji wê çêbûn
Du'ayê te qêbûl nabin tijî dê bê ji narullah
[r. 4]
21. Bi dawa xwe helal fê'lê bike zarok bidê bo te
Bibîne lezzet û keyfê ku kir bêje tu bismillah
22. Heqê wê tu zinayê qet nekê lewra di 'uqbayê
Lehî bû pêteyê agir ji wê der tên me'azellah
23. Ewî dest û telî dane bidê pê xeyr û pê danê
Cihadê pê bikê nayên hesabê ni'metê Ellah
24. Bi wan zulmê meke lê ger tu pê bukjê yekî bê heq
Ceza'ê te bizan agir muheyya ye li ba Ellah
25. Du lingê muntazam ser wan diçê yû tê bi serbestî
Here baskî riya heccê weya mizgeft û ehlullah
26. Emanet tu neçê baskî dizî yan pêşiya xelqê
Belê tê ser pirê şemtê kevê nîv dijminê Ellah
27. Ji bona van tevan hakim heye yan zalim û 'adil
Dil û qelb e bizan ew amirê wa ye herê wellah
28. Di lêş de parçeyek ger ew sehîh bê laşî tev sag e

⁹⁵ Nêzîk nebe.

Weger mufsid bê laş cumle xirab e got hebîbullah

29. Heman her dem bike cehdê di islaḥa dilê janî
Eger tu karibê wî qeṭ netirse tu ji geyrillah
30. Neke dil ḥubba dunyayê serê çiqqa gunahan e
Nebêje ez çiqqa mêr im me mal zehf e di erdillah
31. Di paşî tê biçê gorê te mal û mêr xuya nakin
Zimanê te bibê lal kû te dîtin qasidê Ellah
32. Pepûko kanî mêranî feqîro kanî malê te
Bike qencî yû e 'malê di xeyrê tu ji bo Ellah
33. Çikû dost sê ne milk û mal yek e û ê duwê ehl in
Ewê dîtir bi zan e 'mal di teqwa yan di sextullah
34. Heta tu saḡ î mal dost e heta ser tîrbê ehlê te
Tenê e 'mal di tîrbê de heval e ta gihê Ellah
35. 'Emel ger qenc e tîrba te dibê yek rewzeya cennet
Weger pîs e dibê dozex hewar jê naçê nik Ellah
36. Wilo zane kû tu mislê yekî rêweng û mêhvanî
Dinê wek kolika nator hesêb kin ya 'îbadellah
37. Me mala rastî 'uqba ye dinê seyrana e cismanî
Ne heyf e vê dîkin ava dîkin wêrane darullah
38. Xwezî me b'wî bi vê fikrê bigir 'îbret ji dunyayê
Li vê dê ew bibê mutî ' li wê dê nîv rîza Ellah
[r. 5]
39. Dibînê ya kû qeṭ çavan nedîtî hem nehatî guh
Ji keyf û nî 'meta hazir kirî bo 'ebdê xwe Ellah
40. We ger 'asî bê hem dîsa dibînê ya ḥisab na'ê
Ji nar û dojeḥa pêxistî bona dijmina Ellah
41. Belê her kes heye du aqlê zikmakî yû 'elmandin
Ku zikmakî nebê 'elmandî feyda kanî 'ebdellah
42. Çewan roja ku bêfeyde kesê bê çav û ḥafîz bê
Weha min dîtiye Şêrê 'Elî gotî weliyyullah
43. Heta sed salî hêj bêjim xilas nakim tu ca ḥikmet
Şîraco şîreta xwe tu l'xwe ke her dem bibêj Ellah

44. Şelat û pur selamê heq li ser şafi‘ Muḥemmed bin
Dî gel al û şehaba min ‘efû ke ya Xuda Ellah

3

Sîn- 1372 sibat (Mld. 1953)

Mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. Qenc guh bidin gellî biran vê şîretê ḥiffiz bikin
Da hilnedin barê giran roja ji qebrê derkevin
2. İnsan bi qelb saġ e çira çawa gotî Xeyrulwera⁹⁶
Wer ew mirî bê nîne ra j’laşî ra da hûn zanibin
3. Hemma wê her bikne zelal jê der bixin pîsê fî‘al
Pur nûr bikin rengê hilal j’exlaqê qencî dagirin
4. Sippî bikin bi xwendinê hem b’zîkir û l’mêjkirinê
Le‘în ji ser wî berdinê cihê Xudê l’dînê dil in
5. Dêrde di dil de pazde ne hîrş û hesed sû‘u zen e
Hem şehwet û qeḥra te ne kibr û riya ‘ecbandin in
6. Temayî û lez û buxul zeḥf bûne mal têr bûn cehil
Bo ‘alîman re hem cedel her yek bi yek derman dibin
7. Dermanê hîrş qena‘et e her tiştê kû reb dane te
Ew tişt ji bo te babet e yek gavî zêde xwe neçin
8. Adem bi hîrşê dar kû xwar çawa ji jorê hate xwar
Bû ‘asiyê Rebbê Kubar her weqtî vê fikrê bikin⁹⁷
9. Bona hesed derman ev e j’mehsûdê xwe tu tê deva
Bo wê du‘an roj û şeva bikin ji nû ve tobe kin
10. Iblîs bi wê bûye le‘în Qabîl bi wê çû safilîn
Xaliq du çavê wî derîn kesê ji wê durî nebin
11. Zenna pîs tu derman bike xwe b’‘eybê xwe meşgûl bike
Behsa musulmanan meke heṭṭa ku tu saġ î ji bin
[r. 6]
12. Ete‘murûnennase⁹⁸ hat bo neshe bêjê bê xebat

⁹⁶ Mirovê herî bi xêr, Resûlê Ekrem.

⁹⁷ Telmîha ku Adem (e. s.) ji cennetê hatiye derxistin.

- J' 'eybê xwe kor bûn lew necat peyda nekîrbûn ta mirin
13. Bo şehwetê derman bizan neçe civata tu jinan
J'wan hîs neke beyt û stiran bo te me şîret her ev in
 14. Tîrê di Şeytên in nezer kesê nekê di bê şeker
Bo wî 'ibadet hat xeber min dîtiye bawer bikin
 15. Qehrê tu ger derman bikê b'hîlmê Xuda razî bikê
Şeytanê Mel'ûn pîs bikê j'pîsî devê wî dernexin
 16. Belê kesê serxweş bibê di qehrê ew çavsor dibê
Şeytan li wî suwar dibê wek kerê bê hefsar kirin
 17. Dermanê kibra ê kû wî bo xaliq û mexlûqê wî
Xwe kêmbikê hem bêjê wî j'yek nuqte av em çêkin
 18. Kesê di qelbê wî hebê kibr wek misqalê zerre bê
Di cennetê çûnî nebê got qasidê insan û cin
 19. Bo rûmetê derman bizan qet nîn e feyde j'kes ciwan
Illa ji Rebbê asîman hem xêr bi wê l'boşê diçin
 20. Şirka biçûk riya'î ye wê kêma gunha wek çi ye?
Weke li Rebbê banî ye b'emrê wî lê hîle kirin
 21. Dermanê 'ucbê ey heval çiqqa bikin 'ilm û fî'al
Ger kû nedê te Zulcelal quwwet hûn ê kengî bikin?
 22. Kesê Xuda hez jê bikê wê qenciya xwe j'bîr bikê
Gunhê xwe wê l'bîra xwe kê gotî Şefî'ê mey mezin
 23. Dermanê tem'a qelbê xwe tu her su'alê j'Rebbê xwe
Bike ne j'dost û yarê xwe ew jî wekî te hewce yin
 24. Tewekkulê li ser Xudê kesê bidê ew jî didê
Rizqek wilo ji dûr didê kû bîra wî qet ned'birin
 25. Sebrê bike dermanê lez tu car di şuxlan tu nebez
Tê paşî çê tilyê bigez Şeytan bi wê b'te d'leyîzin
 26. Peygamberê axir zeman gotî sebir nîvê iman
Hemme di nîv dil de tu dan tiştê giran pê sehl dibin
 27. Derman bike bexîliyê b'dana zekat û qencyê

⁹⁸ Gelo hûn ji mirovan re emir dîkin (Ev ayeteke Qur'anê ye ku di dewama vê fermanê de wiha dibêje: "Gelo hûn ji mirovan re başiyê emir dîkin û xwe ji bîr dîkin? Tevî ku hûn kitêbê (Qur'anê) dixwînin!" Sûretê Beqere, Ayeta 44an.

Tirsê neke j' feqîriyê Ellah e Rezzaqê mezin

28. Bexîlî yû îman kesî nedî ketin qelbê kesî
Yek toz e yek wek melkesî her dû ji hev re dijmin in
29. Malê ku pur hej jê neke zêdey kefaf teleb meke
Dînê xwe pê nuqsan neke eger dikê pursê ji min
[r. 7]
30. Mal ger helal bê ew hisab ger kû heram bê tev 'ezab
Wekî wilo ye malxirab zêdey xwe mêl xweyî nekin
31. Tu têr nexwe hinda welê ma lazim e qulpik hilê
Lê paşî tê bêjê melê seyda bi lez limêj bikin
32. B'têrbûnê qelb ruh jê diçê çawa dexil reng jê diçê
Baran gelek kû tê diçê ev gotinê Peygamber in
33. Tiştê nizanî qet mebej j'ber xwe nebe zimandirêj
Pirsa xwe ya rojî limêj ji 'alimê xwe hûn bikin
34. Ger tiştê helal bikê ji cem xwe yan heram bikê
Biya nefis û zennê bikê îman û dîn her dû diçin
35. Meqqersiyê neke filan li şaliş û li 'aliman
Her dem bikin ikrama wan lew warisê Muḥemmed in
36. Halê miqerris bêne bîr Fir'awn û Nemrûdê heqîr
Ebû Cehil tev çûn se'îr le'net li wan her dem dibin
37. Tixtoriyê l'qelbî bike derdê ewî derman bike
Hubba Xudê lê zêde ke da şewq û tîrêj jê herin
38. Kummê xwe bik qazî delal tu l'xulwe çêkê ey heval
Bêje dinê pûç e betal l'bîra xwe bêne tû mirin
39. J'dunyayê bigrin 'ibretê tê de nebûrên lezzetê
'Emel bikin bo axretê nef'a mezin hûn jê bikin
40. Ya Reb bi lûfê xwe xefî qelbê me bo xwe bik şefî
B'heqqê Muḥemmed ew şefî'ê ummetê gel mêr û jin
41. **Sîrac** bike we'zê li xwe tefîş bike 'eybên di xwe
Derman bike qelbê di xwe belê eşil ne gotin in
42. J'ewwel heta axir selam hem gel şelat û ihtiram
Li ser hebîbê kû xitam Xuda nebî bi wî kirin

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
 Recez -- . - / -- . - / -- . - / -- . -

1. Ya Reb bi Fatiha kitab qelbêm veke b'heft ayeta
Sabit bike b'enwar û tab zail ke jê her 'illeta
2. Tu b'hurmata El-beqerê j'min bib heçî gunhê berê
B'du sed û heştê w şeş perê min tu bide pir hikmeta
3. B'Imran û du sed gewhera j'min tu muhû ke deftera
Fisq û fucûr û kedera 'ewnê dixwazin em ji te
4. Tu sed û heftê w şeş ji hûr ez wan Nisa'ê der qusûr
B'rizqê me ke Rebbê şekûr ya sahibê her minneta
[r. 8]
5. B'wan sed û bîst rengê te'am şîrîn bike pê fah û kam
Hêvî ji te Rebbê enam mehrûm nekê j'Maideta
6. L'E'raf dibin şeş darê şîn gul dû sed ez rewdê hişîn
Gel Ehmedî ke hem neşîn vî bed fi'alê bê mita
7. B'En'am bike en'am li me b'wan sed û şêst û pêncê me
Efwê bike ewzarê me ya Gafirê her xet'eta
8. Enfal û heftê pênc nehîb hem dûr bike mel'ûn reqîb
Paşî bide weşla hebîb l'nava buhuşt û cenneta
9. B'Tewbet tu sed û bîst û neh polan li cuzdanê bi neh
Da kû nebînim tirsê reh êmin bibim bera'eta
10. Yûnus sed û neh mewcê av me j'ûrê hûtî bêne nav
Wan buğçêê bû çûn gulav paqij ke e'za j'zilleta
11. B'wan sed û bîst û sê wedûd min dûr bike j'qewmê cihûd
Bu'den li-'adin qewmî Hûd¹⁰⁰ binvîs ji qenca ummeta
12. Yûsuf sed û yazdih sitar pê hîfz bike me j'her fucar
Nefsê derêxe j'tengêzar paşî bide weşlaeta
13. Ya Reb çil û sê carê min mehfûz bike ez narê min
Re'dê nede lew barê min nîn e ji pêt û hîrqeta

⁹⁹ Ev helbest li ser Sûretên Qurana Kerîm hatiye nivîsîn. Ji bo her Sûretêkî malikek, yanî tevde 114 malik nivîsandine. Li gorî rêzê ji Sûretê Fatîhayê dest pê kiriye û heta dawiyê hatiye.

¹⁰⁰ Qewmê Hûd (ji rehma Xudê) dûr ma. (Sûretê Hûd, ayeta 60î).

14. Barê bi Îbrahîm Xelîl l'her dû dina min mek zelîl
Pêncî yû du wesfê cemîl bo min bide gel rehmeta
15. Ya Reb bi hîcr û zemzemê mehrûm nekê me j'qulzemê
Tu b'not û nih nava zemîn ser min meke pehn û duta
16. Hêvî ji te j'Nehlê 'esel sed û bîst û heşt renga j'gul
B'rizqê me kê ya Reb emel me j'te ev e her sa'eta
17. Dîsa bi Êsra kirî têr ke me j'ava kewserî
Wek şîr sipî tam şekerî yazdeh digel sed gurfeta
18. Der Kehfê xwe min bik xefî hem bo xwe ke dost û şefî
Ez b'her sed û deh û şefî'an tu nebêjê men eta
19. Ya Reb bi Meryem gel Mesîh nehwê û heşt wesfê melîh
J'mîn dûr bike wesfê qebîh bid racyê wan şefqeta
20. Tu b'sed û bîst û pênc resûl de'w û rica me b'kê qebûl
B'Taha nebî dijmin zelûl tedmîr bike tu b'setweta
21. Imdad ji te Şahê Kerîm kû sed û dozdeh parçe gîm
Ser min bikê lutfa 'emîm tu b'Enbiya w dû qibleta
22. Heftê û heşt Hecca ji min mebrûr tu binvîse ji min
Bed kar û fê'lê pîs ji min lutf û 'efû her dem ji te
[r. 9]
23. Tu bistrêne gunhê çûn bid xatirê zendê bi xûn
Ê qalû -inna Mu'mînûn-¹⁰¹ tu b'sed û hejdeh gezweta
24. Şêst û cihar texlîte Nûr birjêne ser qelbê şerûr
Werne derên dem şud tenûr bo qabilê deh tebbeta
25. Ya Reb tu Furqana Mubîn der qebrê bo min ke qerîn
Heftê û heft tîrsa hilîn tu b'de me xeyr û nî'meta
26. Dîsa du sedd û bîst û heft j'wan gotinê bê hezz û bext
Sadîr buyîn j'beyhuş û mest nenvîs ji Şe'r û fiqreta
27. Not û sisê we'zê di pak der qelbê min rûnêne çak
Da îm li bîrê bêne xak hişyar bike wek Nemleta
28. Heştê yû heşt tizkarê xweş b'wan dil bike rehî nî yû geş
Fê'lê nebaş bik tar û reş hîkmet bide me Qisseta

¹⁰¹ Gotin em mumîn in.

29. Şêst û nihan perde w hicab deyne di nav berx û zi'ab
Lê 'Enkebût girtî zubab nalîn diçê çerxa duta
30. Gâlib neke mel'ûnê Rûm hêvî ji te Rebbê qeyûm
Şêst roj nekê roja seyûm hemlam nekê l'bêtaqeta
31. Hikmetê Loqmanê hekîm tu sih û çar cara bidîm
Da kû nebim pîs û le'îm bim qabilê du xesreta
32. Sih car li min ferza kû ez bo te bibim Secde bi lez
Kû em nedan qewmê terez her an û hîn û muddeta
33. Deyne li dûr bajarê dil heftê yû sê dîwarê dil
Ku qeṭ nekin azarê dil Ehṣabê bavê murreta
34. Merqed li min bik xweş mekan wî deyne nava cennetan
Rengê Sebe' l'her du milan wek pêncî yû çar beldeta
35. Hemdî leke ya Fatirî behra me kir şîn û girî
Tu b'çil û pênc peyxemberî ḥasil kê ram û telbeta
36. Paşî tu Yasînê delal bo min ke hem rah û heval
J'heştê û sê rahê zelal dûr ke bi şer' û sunneta
37. B'Safat û sed û heştê w du car min ḥifîz ke ez 'edû
Nik qabilê welew ruddû ê kû ji qenca milleta
38. Tu b'Sad û Qurana Kerîm heştê yû heşt ayê 'ezîm
Rehîni ke pê çavê delîm hem wech û dêm û cebḥeta
39. Heftê yû pênc êlê nebaş tu min ji wan ke dûr û şaş
Da kû nekim se'ya belâş bid me tu başa Zumreta
40. Ez Mu'min im dîsa bi te b'fereşte û nebyê di te
Heştê yû pênc carê ji te hêvî bidê her munyeta
[r. 10]
41. Ayatuke qed Fussilet kelimatuke ma enfedet
Pêncî yû çar ismit bidet b'wan berze ke me'siyyeta
42. Şûra û rahê musteqîm nîşanî min de ya 'Elîm
Pêncî yû sê fikrê qedîm ê bed bike dûr û meta
43. Tu Zuxruf û Zîna dinê bik wek kulîlka tûtînê
Heşt yû neh carê dinê amîn qeḥul ke de'weta
44. Ya Satir û ya Mustecîr j'Duxan û hem narê se'îr
Pêncî yû neh dehrê kebîr min dûr bike j'wan zulmeta

45. Tu sih û heft sûr û hisar dair bike her çar kenar
Da dest nedê nefsa gedar hem jê nekim Casiyyeta
46. Xêr û xweşî her bik nesîb hinga turab seng û kesîb
Der wadi yû cebb û qelîb b'Ehqaq sih û pênc ze'feta
47. Tu b'sih û pênc suhba Xuda zenba 'efû ke tu geda
Hem dûr nekê j'Muhemmeda ser bin şelat her sa'eta
48. We-fteħ lena fetħen mubîn¹⁰² tu bîst û neh nesr û mu'în
Bid min ku dijamin bin bi xwîn ya Fatîhê her furceta
49. Min bistirên ez her ziyan der hîfzê xwe d'kin manehan
Mîsernehim ber asîtan ez barê hejdeh Hucreta
50. Sunda te bê, Qaf û kitab vî mucrimî dil çûn kebab
Dûr kê ji wan ehlê 'ezab tu b'wan çil û pênc leyleta
51. Hem buğçeê 'umrê 'ezîz şîn ke bi şêst gulnar û gwîz
Bêber neke seyf û pehîz nik pel weşîn b'Zariyyeta
52. Tûrê dilê min bik mekan bona kelîmê da'ïyan
Hem çil û neh dengê 'eyan têde bide ez bid'me ta
53. Necma sureyya bik delîl da em li rê neb'ne zelîl
Wunda nekin dînê Xelîl sih û du cara ezbeta
54. Pêncî yû pênc heyvê ku her şanî me dê wechê Qemer
Lê tene dil ah û keser xwîn jê diçê rengê şeta
55. Rehman tu wî erhem tu wî deyyan tu wî e'zem tu wî
Gefarê her gun'hêm tu wî hem heftê yû heşt qebheta
56. Eşhabê rast û çep hene ni'met hemîm wa têde ne
Nihwêt û şeş wesfê te ne hafîz tu wî d'Waqî'eta
57. Tu bîst û neh qeydê hedîd bid kû bidim zora 'enîd
Lê tu neda be'sa şedîd ya munzilê her ayeta
58. Ê kû bikin Mucadelet bîst û du cara bik gelet
Bo min bide heyl û quwet hem husn û zenna w neşreta
[r. 11]
59. Heşra me 'evdalê pepûk nek tu digel qewmê çirûk
Bîst û çihar horî yû bûk bik hemreh û hem suhbeta

¹⁰² Fetha eşkere li me veke.

60. Çardeh şefî hûr û melek pê sûr bike ey dilpelek
J'îşqa te nalîn çû felek feqbil 'ebîdek tewbeta¹⁰³
61. Yazdeh neqil tu b'Cim'e kê vî qeşmerî kolê xwe kê
Wî j'ber derê xwe tit nekê b'kû ve herê qencî ji ta
62. Wehfezhu min kulli-l futûn weqtel heyatî we-l menûn¹⁰⁴
Yazdeh ji ê Mûnafiqûn bo wî fida ke j'zehmeta
63. Roja Tegabûn ku werê nozdeh zebanî ber derê
Agir ji bîra wan herê ev mucrimê reş kağeta
64. Dunya gedar min dûr ke jê dozdeh telaq min berde jê
Hê ez neberdame bejê wunda nekîr me j'refqeta
65. Ya Reb nekê Tehrîm li min tiştê helal kû daye min
D'wazdih tekalîfa li min bik sehl û qenc û rağeta
66. Sih rojê rojî tu ji me meqbûl bike wan tu ji me
Bi sûrê Mulk ma tu ji me nakê gezer ez şeqweta
67. Nûn bo te bê sond û qesem pêncî yû du êş û elem
Berbad kun ez can û dilim manendê mihr û zulmeta
68. Tu pêncî yû du şalihan bik piştemêr û rûgiran
Da kû nebêjim el-eman min hewlî yewm-il Haqqeta
69. Weqtê Me'aric kû melek teyran kirin çûne felek
Binvîs çil û çar reş belek dagir ji xeyr û se'deta
70. Tofan li dil rabû yeqîn Nûho bilez bêne şefîn
Lê bîst û heşt şef lê civîn ser cûd qefîna ummeta
71. Hem bîst û heşt Cin û teyar gel marida kirne hewar
Girtin li min her çar kenar Asif li wan şûr bik duta
72. Tu bik Muzemmil vî heqîr bîst car bi rehîma xwe kesîr
Da kû netirsê j'zemherîr bo 'efwê her tu babeta
73. Dîse ji dijmin bistirên pêncî yû şeş perda çikên
Bişkên li wan tîr û kevên tu bik Mudessir 'aleta
74. Gava Qiyamet radibê sewdan û hiş wunda dibê
Çil tîrs û bîm peyda dibê bik peyre wî xwey himmeta

¹⁰³ Tewbeya ebdê xwe qebûl bike.

¹⁰⁴ Di dema heyat û mirinê de wî ji hemî fitneyan biparêze.

75. Dehrê kû çûn tu bêne dil 'ibret bide me b'ê ewil
Ba seh û yek barê li mil ê pîs nebin xwey kizweta
76. Wel-Murşelat sunda te hat pencî neqil wan munserat
Birjêne ser dil kû heyat lê şîn bibê wek nexleta
[r. 12]
77. Nebe'tena anî gefûr feqbel de'ewnake şekûr¹⁰⁵
Çil guneh û 'eyb û qusûr xwezîya bi ê kû jê çita
78. We'n-Nazî'at tu min tu car nek nav ewan qewmê kufar
Weqtê mirin deyne sitar tu çil û şeş hêtê duta
79. Ez behrê ê kû bû 'Ebes tu min neke dîn û teles
Gava herê bêhn û nefes hem çil û du mu'cizeta
80. Roja 'umur bû Kuwwîret nefs hînî bû ma eħderet¹⁰⁶
Bîst û neh ay qed urqîmet îman heye b'wan ayeta¹⁰⁷
81. Sunda me sûrê infitar bêşek dizanim nozde car
Kû her tu wî Rebbê gefar nenvîse me j'bêhurmeta
82. Tu min neke j'Muteffîfîn gava didin nabin emîn
Lê 'adil in weqtê kirîn tu b'sih û şeş cewhereta
83. Gava sema bû inşîqaq teklîf neke ma-la-yutaq¹⁰⁸
Da nav 'eyal bim ez 'uşaq xwey bîst û pênc keyf sohbeta
84. Sunda te bê zat-u'l-Burûc b'alî xwe ve min bik 'urûc
Hem bistrên bîst û du sûc 'edlê neke l'jêrî keta
85. Subħan ji te tu xaliq î insan te j'ava dafîqî
Çêkir bide me j'Tariqî xêrê bi hivdih sûreta
86. Sebbehna bi'-smî rebbîna el 'E'la iz xeleqtana¹⁰⁹
La tunsina ma-qre'tena¹¹⁰ b'wan nozdihê hatin ji ta
87. Ya Reb di roja ğaşıye atîne wechen na'ime¹¹¹
Lî se'yiha¹¹² hem radiye hem bîst û şeş merfû'eta
88. Ma ne te gotî wel-Fecir b'qedrê wele-yalin 'eşir¹¹³

¹⁰⁵ Te em derxistin holê, me şukur kir û dua ji Te re kirin, ji me qebûl bike.

¹⁰⁶ Her nefs wê tişta hazir kirî, wê bizanibe. (Sûretê Tekwîr, Ayeta 14an).

¹⁰⁷ Bîst û neh ayet hatin hijmartin û bêşubhe îman bi wan heye.

¹⁰⁸ Tişta ku qeweta mirov pê nakeve.

¹⁰⁹ Bi navê Rebbê me yê li cihê herî bilind, me kire sibeh ku Wî em afirandin.

¹¹⁰ Wextê ku ji me re hate xwendin, me jibîr neke.

¹¹¹ Ya Rebbî di roja xaşiyê de wechê nerm bide me.

¹¹² Ji yê xebitî.

- B'sirra heyî d'shef û wutir seh car me bêxê cenneta
89. Esleḥ bike qelb û kebed b'Ummul-qura Ummul-beled
Ta bîst ji walid hem weled binvîse xwey-meymeneta
90. Şemsa duḥa dînê mubîn ez beḥrê şazdeh rê meşîn
Bik kehrebê şêvê reşîn da qeṭ nebînim zulmeta
91. Leyla li qebrê kû kevim yazdeh hevalan ez divim
Da kû bi qencî xweş nivim sehlê bike her zehmeta
92. Weqtê Duḥa sunda te bê tişta bi radiya te bê
Bid ê li dergahê te bê bêhtir ji yazdeh xidmeta
93. Tu Inşirah bik sîneê şafî ke çûn ayîneê
Heşt barê ser qolî ke ê deyne bi lez beyn-yusreta¹¹⁴
94. Ya Reb bi teşrîfa li Tîn¹¹⁵ zeytûna ser tûr û sinîn
Heşt car me dûr kê j'safilîn bid me çi başe sin'eta
[r. 13]
95. Tişta nizamîm bêje me çewa te gotî Adem e
B'sûrê 'Eleq bendê te me nozdeh ji fikrê ḥikmeta
96. Mûcib di wê şêva Qedir pênc carî hê berya fecir
Şanî me de rûḥ der emir deyne çîqa selameta
97. Tu min ji şerr-il berriye¹¹⁶ dûr ke bi wan heşt deriye
Binvîs ji xeyr-il berriye¹¹⁷ daxil ke nîva cenneta
98. Gava zemîn bû Zelzelet bir'jêne ser min merḥemet
Mîzan giran ke rengê heşt etbaqê cennetê eta
99. Herçî kû min kir der zeman ez bê heşî yû bê goman
B'wan 'Adiyat¹¹⁸ ke el eman heşîf ke yazdih merreta
100. Piştî mirin weqtê heşîr vî bed fi'alê bê sebir
Mehfûz bike hem der qebir b'wan yazdeha j'Qari'eta
101. Tu mi b'Tekasur nek zelûl da kû nebim pîs û melûl
Lê ger nekê tu min qebûl nabim şekûr b'heşt ni'meta

¹¹³ Bi fecrê û dih şevan sund dixum. Sûretê Fecrê, ayeta 1ê.

¹¹⁴ Di navbera hêsantiyê de.

¹¹⁵ Hejîr (Navê Sûreteki quranê).

¹¹⁶ Insanê herî xirab.

¹¹⁷ Insanê herî bixêr.

¹¹⁸ Hespên ku bilez dibezin (Navê Sûreteki quranê).

102. Sûnda te hatî wel 'Esir sê car bi wê sundê sebir
Bid min ne kû bi 'sû decir da kû nebînim şiddeta
103. Tu b'neh hurûfakê Xuda rûreş nekê min der geda
B'cahê hebîbit Eħmeda nenvîse me j'Humezeta
104. Vî leşkerê şeytanê Fîl d'wan werke ger zehf û qelîl
Pênc qumberê j'kevrê sicîl kû qet nemênê j'wa kita
105. 'Ebdê te ne em wek Qureyş wek wan bide me taze 'eyş
Çar weqtê salê êş û teyş dûr ke ji me her zehmeta
106. Îman bi dîn tê ta kî sağ heṭṭa hebê ruħ der dimağ
Qet ez ji Ma'ûn û firaq men'ê nekim heft milleta
107. Ez têhnî bûm hê l'vê derê sê car me av de j'Kewserê
J'hewzê resûl peyxemberê exir zemanê ummeta
108. Şeş car bibêjim ez bitûn herçî dîkin ew Kafîrûn
La e'budu ma te'budûn fedrib 'eleyhim zilleta¹¹⁹
109. Nesrê bide dînê me her sê car bi fethên her çeper
Estağfirullah ez xeter bo min qebûl ke tewbeta
110. Kafir helak bûn ta ebed Fil 'cîdî heblun min mesed¹²⁰
Feydê tu nadê pênc meded hem zêr û mal û dewleta
111. B'İxlas xilas kê min ji bed çar car bi heqqê xwe Ehed
Her yek tu wî ya Reb Şemed ez hewce yim bo rehmeta
112. Pênc dehrî dûr ke me j'Feleq bîra kû kafir tê de gerq
Bona dinalin bê feleq inna ne'ûzû bik¹²¹ ji ta
[r. 14]
113. Hîfzê dikim xwe b'Rebbê nas şeş car ji weswasil-xenas
Ê mufsdî bû cinn û nas Qur'an qebûl ke de'weta
114. Miħemmed **Sîrac** gazî dikê j'Rebbê mezin hêvî dikê
Efwê ji gunhê wî bikê tu b'sed û çardeh sûreta

¹¹⁹ Ez wan tiştên ku hûn dihebînin, nahebînim. Zilletê li wan bike.

¹²⁰ Tevî ku di stûwê wan de werîsekî stûr hebe. (Sûretê Tebbet, ayeta 5an).

¹²¹ Muheqqeq em xwe bi Te dispêrin.

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · -

1. Hêmd ji wî Rebbê mezin re weşfê wî naên 'eded
Ni' meta islamê da me ew e Ellahus Şemed¹²²
2. Em ji piştê bavê mey Adem derêxistin tamam
Dabû me 'eqî û tekelluf dabû me qelb û kebed
3. Got: "Elestu b'Rebbîkum"¹²³ qey ez ne Rebb im bo hewe?
Wan "Bela!"¹²⁴ gotin belê çiqqa ced û bav û weled
4. Kafîr û muşrik şikandin 'ehd û soza Rebbê xwe
Em Musulman man li ser 'ehda xwe hetta ta ebed
5. Ni' meta meştîr gelo kanî ji vê kû her zaman
Em bi navê wî dibakin ente Ellahun Ehêd¹²⁵
6. Piştî vê Wî kir mezin bona me Îbrahîm Xelîl
Em kirin ser milletê wî Baniyê Ummul Beled
7. Paşî hê çêtir ewî ni' met li ser me kirne mij
Em kirin nîv ummeta nebyê xwe Mîm û Hê û Med
8. Sahîbê Qurana mu'ciz sahibê tac û Buraq
Bo gunehkara dikê mehder kû namênin meded
9. Çêtir û hem xatemê cumle resûl û enbiya
'Arîcê seb'ut-tibbaq¹²⁶ pesnê ewî qetî nîn e hed
10. Çawa kû bû qencê mexlûqan ji cin ins û melek
Ummeta wî çêtir e j'wan ummetê çûn sed bi sed
11. Pişt û dîwarê me ye kengî ditirsîn em gelek
Kû mirin ser gorina me bête danîn kêl û hed¹²⁷
12. Hin ji me bûn Malikî hin Hênbelî hin Şafî'î
Hin Hênîfî tev heq in geyrî evan nîn in sened

¹²² Herkes muhtacê Wî ye, Ew ne muhtacê tu kesî ye (Sûretê Îxlasê, ayeta 2yan).

¹²³ Qey ez ne Rebbê we me? (Sûretê E'raf, ayeta 172yan).

¹²⁴ Belê (Sûretê E'raf, ayeta 172yan).

¹²⁵ Tu Xudayê bi tenê yî.

¹²⁶ Yê ku heft qeta bi asîmana ve bilind dibe.

¹²⁷ Hed: Kevirê ku dideynine ser tîrbê.

13. Dîsa hemd jêre kû em kirne ji Ehlê Sinneta
Em nekirne Rafîzî Şî'î Wehabî pîs û bed
14. Ser 'eqîda Eş'erî em dane der 'ilm û 'emel
Ne j'ewan heftê-yû du êlê genî qelb û cesed
15. Hin ji me ketne terîqa Kubrewî hin Qadirî
Hin Tîcanî Neqşebendî Rakibî şêr û esed
[r. 15]
16. Hin ji me bûn peyrewê Ğewsê li Beğda hin ji me
Bûn Refa'î bûn murîd hin jî dibê Seyda meded
17. Ka ji vê çêtir behatir ka ji vê xweştir gelo?
Gih dixwênin Fatiha gih Qul huwe-llahu ehed¹²⁸
18. Şukrê ser van ni'meta ma kengî em dikne xilas
Kû nedan em te j'ewê Fil-cîdî heblun min-mesed¹²⁹
19. Ya îlahî qasî her tayê geya û dar û ber
Qas çiyayê kû ji 'erdê re kirin sing û weted
20. Qas stêr û menzil û ebrac û eflakê sema
Qas çîqa derdan û derman qas muwê post û lebed
21. Qasî enfas û nerîna ins û emlak û zirûh
Qas çîqa leptandin û seknê wekî rehî û cemed
22. Qasî çîqqa luget û herf û tekellum şewt û deng
Qasî i'rab û bînaê wek ser û ber cezm û şed
23. Qas nufûsa kû nivîsandî bi wan lewh û qelem
Qasî 'ilmê tu dîzanê ta hebin ewlad û ced
24. Ji te re Subhân nikarim bo te hijmêrim sena
Ji te re hemd her wekî weşfê xwe daye bê 'eded
25. Ya îlahî ne te got ger hûn bikin şukrê me dê
Ni'meta xwe l'we ez ê zêde bikim bê 'edd û hed
26. Tu li me zêde bike îman û Islam her demê
'Ef bike gunhê me ê hindik digel zehf û lebed
27. Ev **Şîrac** 'ebdek zelîl e wî guneh nayên hisab
Lêbelê rehîma te zehf e ê bixwazê layured¹³⁰

¹²⁸ Bêje Xwedê yekî tenê ye. Sûretê Îxlasê, ayeta yekemîn.

¹²⁹ Tevî ku werîsekî tewandî di stûwê wan de. Sûretê Tebbet, ayeta 5an.

¹³⁰ Nayê xwestin.

28. Pur şelat û pur selaman tu bide ser Eħmedî
Hem digel al û şehaba şubhê baran û beled

6¹³¹

-13- Gulan-1373- (Mld. 1954)

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun
Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Felek îro li min rabû qiyamet el-aman ya Reb!
Ji ber bilbil bihar rabû ji kû bênê gulên ya Reb
2. Ku nîsan û gulên tev çûn li dil hizn û keser pur bûn
Birîne rîş hemî der bûn fîğan çû asîman ya Reb
3. Îlahî her ji te îhsan tu şîn bik çiçek û reyhan
Bide ber pozê van teyran ku pê bibne ciwan ya Reb!
4. Di piştî rohnîkê meblûl di gel bê emriya men'ûl
Bi Adem tobe kê meqbûl te da koma giran ya Reb!
[r. 16]
5. Mirand Idrîs li dunyâ te cardî hem heyat daê
Birî cennet jixwe naê te kir terzî cilan ya Reb!
6. Nebî Nûh dayê te fulkek xilas kir te bi wê qewmek
Li ser Cûdî kirin destek bi wan nû bû cihan ya Reb!
7. Xilas kir Hûd ji qewmê 'Ad ku pêre wan kirin 'innad
Fena kir te bi nar û bad me girt 'ibret ji wan ya Reb!
8. Devha Şaliħ te j'yek kuçek derxistî min qeṭ nîn e şek
Ku kafira kuşt bûn helek bi qîra qasidan ya Reb!
9. Xelîlê xwe te kir peyda şikandin wî kevir tev da
Te ew qa agirê 'evda kirî rewza cinan ya Reb!
10. Qewmê nebî Lût fê'lê pîs kafîr kirin man bê reîs
B'kevra te kuştin ew xebîs te dabû Lût eman ya Reb!
11. Zebîhê xwe te kir heyran bi wê xewna ku dê xullan
Di paşî kir feda qurban te yek kebş û beran ya Reb!
12. Te Yûsif kirye zindanê di piştî bîra Kin'anê
Li Misrê ketye eywanê bû sultanê tevan ya Reb!

¹³¹ Ev helbest li ser pêxemberan hatiye nivîsîn. Di her malîkê de behsa pêxemberekî kiriye.

13. Te Ye‘qûb kir hezîn û kor dema destê xwe hilda jor
Te dayê Yûsifê wek hor li ser rehma biran ya Reb!
14. Di piştî wî bela Eyyûb te avêtin hemî miqrub
Te dayê xweş şîrîn meşrûb digel mal û kuran ya Reb!
15. Te Mûsa rakirî bindest heta bû xortekî serbest
Ji bo Fir‘ewn kirî serdest te gerq kir dûşiman ya Reb!
16. Te Yûnis kir zikê hûtî bi wan lefzê ku wî gotî
Derêxistî belê rûtî ji bo te pasipan ya Reb!
17. Nebî ‘Îsa te da Meryem şîfa kir te bi wî ebkem
Ji ber dijmin hilanî hem te birye asiman ya Reb!
18. Muhemmed Mustefa ummî te rakir ew di nav qewmî
Bide wî himmeta Rûmî te kir serdarê wan ya Reb
19. Şelat û pur selam her dem li ser wan bê heta Adem
Tu heşra me bikê ba hem bidê me mehderan ya Reb!
20. Çîqa tu hâkimê hukm î te heyrandin ‘eqil hemmî
Bi tedbîra xwe ya samî bi teqlîba zeman ya Reb!
21. Bi van tev enbiyaê xwe bi ehl û ewliyaê xwe
Bibûre tu j’gedaê xwe esîrê bargiran ya Reb!
22. Li dunyayê bidê rehmet digel ram û digel dewlet
Li ‘uqbaê bidê cennet digel hûra hisan ya Reb!
[r. 17]
23. Eger ez kêmê ‘ebda me ji ber gunha di qeyda me
Melûl û dîn û şeyda me tu wî Rebb û Xudan ya Reb!
24. Bi te pişta me bin bara me ‘ebdal û gunehkara
Qewînekî dîkin zara ‘efuwwê her kesan ya Reb!
25. Ricakarê du‘agoyan kerîmê rûzê her rûyan
Bibexş ber xatirê cûyan bi **Sîracî** de wan ya Reb!

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. Subhan ji Şahê Zulcelal ew sani'ê 'erş û felek
Her sin'et û hikmet li bal ew xaliqê ins û melek
2. Xulqandî insanek delal ba şeklekî rengê hilal
Dayêde qedd û wechê xal nîn e di rengê wî de yek
3. Çêkir di mislê asiman hem mislê 'erdê bê goman
Hejdeh hezar 'alem heman insan li wan kir mesterek
4. Tiştê heyî der 'alemî j' mexlûq û mesnû'an hemî
Mewcûd kirin der ademî da zanibê Ellah e yek
5. Çawa ku got şêrê 'Elî serdarê xaşsan û welî
Tu xwe nebîn esger belî 'alem di te kom bû demek
6. Ewwel li jorê tu binêr wan ne felek tu bihijmêr
Paşî li xwe meyze ke têr wersel neh in laş e te yek
7. Dozdeh brûc 'ezman hene laşê te dozdeh kun hene
Seyyare tê de heft hene e' daê te bûn şeş û yek
[r. 18]
8. 'Ezmên de ba w baran hene hilm û dimû'ê te hene
'Ezmên de sayî 'ewr hene kêf û gezeb tên yek bi yek
9. Tê de hene ev berq û deng tu qîr dikê hem ken û beng
Geh legleg î geh wek piling hê jî hene bê şubh û şek
10. Paşî li 'erdê b'fekirî Xaliq tu wek wî çêkirî
Hûn her du wek yek menzerî nuqsan nehiştî zerreyek
11. Şerq û cenûb şîmal û gerb wek pêş û paş û rast û çep
Va têde ne ev roj û şeb pêşî yek û paşî te yek
12. Goştê te ax hestî çiya pirça te wek dar û giya
Xûn rengê ava kaniya her dem diherkê wek şetek
13. Ev me'denê wek zîv û zêr mîjî di hestî de binêr
Kurm û sipih wek kêz û mêr mikrob wekî beqa belek

¹³² Ev helbest li ser anatomî û xulqandina insên û alemê hatiye nivîsîn.

14. Şubhê zemîn bûye misal payîz zivistanê di sal
Tu pîr dibê paşî de kal nîn e 'eceb nîn e meçek
15. Sal sê şed û şêst roj hene laş sê sed û şêst ra hene
Wêna bihar havîn hene zarokî xortanî te wek
16. Meymûn hene rovî yû gur va fisq û hîlê dizdê ker
Şêr û şe mêrê newbeker exlaq bi weşşan meşbehek
[r. 19]
17. Wek navê Muhammed nebî b'xettê qedîm tu çêdibî
Ser mîm û dest hê çêdibî zik mîm du ling dal nîn e şek
18. B'fezla Xudê ismê hebîb mu'min tu car nabin nehîb
Kafir jî ku ketne lehîb hin wek beraz meymûn hinek
19. Çawa hêdîs qencê kelam gotî di wê roja qiyam
Herkes wekî fî'lê xwe tam mesix dibê d'bê dehbeyek
20. Laş hem weke bajarekî xwey 'esker û xunkarekî
Qenc lê binêre carekî da bigrê jê tu 'ibretek
21. Aqil di ser de rengê şah rûniştî ba text û kulah
Ser memleket hikm û nigah her dem dikê b'cundê gelek
22. Nobetçî wî wek çav û gûş e 'za hemî bûn zirxê pûş
Metbaxçî hâzîm e beroş ûr e dinan aşê şebek
23. Katib wî hâfîz e bizan cazîb e qamçûrçî¹³³ heman
Casûs xiyal e bê goman qelb e wezîr û rêberek
24. Hêddad e namê tercuman çîqa luget zanê ziman
Cellad du dest in ey cuwan sir posteyal û wek çelek
25. Cotarî yû şûv mêr û jin ev tov e zarok şîn dibin
Hin sêv in û hin wek gul in hin tehl in û hin wek genek
[r. 20]
26. Hem şekletî qiyametî çêkirye Rebbê 'îzzetî
Ji weq'et û zelzeletî di laşî tèn ew yek bi yek
27. Laş 'erd e ku zilzal dibê hestî çiya ye hûr dibê
Qelb roj e ew tarî dibê hewwas dirijhin kewkebek
28. Mîjî ye esman şeqqî bû xwêhdan ku behr e hişkî bû
Ling merkeb e 'etlandî bû naçê li rê gav û piçek

¹³³ Tehsîldar.

29. Wextê ku rûh derket ji bin tiştê di 'erdê de hebin
Avêt û ma vala kirin rabû li lêş qiyametê
30. Subhên ji wî Şahê mezin ew sahibê 'erşê mezin
Her weşfê qencî jêre bin wî nîn e şekl û sûretek
31. Ellah ew e em 'ebdê wî **Sîrac** ji bo gunha ji wî
Efwê bixwaze navê wî Geffar e rehm naê hedek

8

- Sibat- 22-1372 (Mld. 1953)

Mefa 'ilun fe 'ûlun Mefa 'ilun fe 'ûlun
Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Tiştê mirov nizanê kesê bibêjê şaş e
Ya jî nebînê feyde zanîna wî belaş e
2. Kesê bixwênê mewlîd karê bikê melatî!
Wek min di vî zemanî belê wellahî haşe
3. Kesê bi dest û pê bê xwedî nekê 'eyalê
Qet karê dîn û dunya nekê bizan kelaş e
4. Kesê bi 'ilm û zanîn bibê wekî Xezalî
'Emel nekê ji bo Reb birincek bê tewaş e
5. Destar hene bi gîrgîr dihêrin dan û savar
Dixun nanê ewan lê çî feyda ew ne aş e
[r. 21]
6. Kesê 'emel bi rûmet bikê bi cehd û te'bê
Bila bi şev nerazê paşî bê ew qeraş e
7. Kesê ji bo dinya xwe bidê we'z û dirûsan
Xelîfe sed hezar bin şefarek bê me'aş e
8. Kesê ji her gunahan bikê tewbe bi dev bes
Hezar wirda bikêşê d'efwê li jêrî kaş e
9. Kesê wî pêş neraêx 'emel pêşya hevalan
Bi navê bav û bapîr dimênê her li paş e
10. **Sîrac** li neqşê dunya nebe gafil 'ezîzo
Cila tu l'ser dirûnê merş e ne ku qumaş e

Mefa 'ilun fe 'ûlun Mefa 'ilun fe 'ûlun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Nîv kufîrî ye feqîrî nîv dînîtî evîndar
Nîv mirin e esîrî nîvê dehan yek û çar
2. Tedbîr e nîv me'îşet dostanî nîv qerabet
Bazdan e nîv şeca'et mekrûhî nîv gunehkar
3. Nîv êş û jan çî ta ye nîv rehîm xwe ewr û ba ye
Mewlîdxwên nîv mela ye 'eza ye nîvê muxtar
4. Xortanî nîv musulman awir ku nîv xeberdan
Ewan e nîvê şeytan rênçber bû nîvê cotar
5. Nel'mêjker nîv nesar e cahil ku nîv dewar e
Şerwal ku nîv sitar e j'aşî re nîv e destar
6. Şivîl e nîv rê ye ew susk û tivîlk çî nîv kew
Nîv taştê xwarina dew nîv zanebûn e guhdar
7. Bêlûte nîv dîlan e kavir ku nîv beran e
Zindan e nîv ceban e me'mûr e nîv giriftar
8. Sebr e çî nîvê îman rih qoş e nêv gulîzar
Meydan e nîvê bêlan çirav e nîvê cobar
9. Defter ku nîv heval e d'ber avêt nîv su'al e
Nîv dehbe bê mital e **Sîrac** e nîv şe'ar e

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Dilo rabe were reqsê li ber vê 'ûd û vê naê
B'hejêne xwe ji her du mil li ber tebl û kemençae
2. Çî govend û çî dîlan e ketî 'erdê di vê 'esrê
Çî gulgul şewşew e rabû li ser vî ehlê dunyae
[r. 22]
3. Li alîkî bilûrzan e li alîkî şî'irbêj e
Li alîkî girî yû zar li ê dî wey li min daê

4. Li alîkî çi xweş roj e li alîkî şevêk tarî
Li alîkî bihar û gul li ê dî berf û ba daê
5. Li alîkî dîkin ava li alîkî kirin wêran
Li alîkî evîndar in li ê dî tawî yû baê
6. Li alîkî dî sağ in hem li alîkî dî bêmar in
Li alîkî ji nûka hê jî zaye nû bûye j' daê
7. Li alîkî kur û bûk in li alîkî girêdan reş
Li alîkî dî derbest in li ê dî man di bin taê
8. Li alîkî kitabxwên in li alîkî sohbeta xass e
Li alîkî pez birin çêrî li ê dî birne ber çaê
9. Li alîkî dîkin we' zê li alîkî dîkin bendê
Li alîkî dîkin tobê li ê dî naê meraê
10. Li alîkî diçin heccê li alîkî diçin qudsê
Li alîkî vexwar raqî li ê dî şerbeta çaê
11. Li alîkî di cem'ê de li alîkî di qehrê de
Li alîkî girtina rojî li ê dî bê limêj maê
12. Li alîkî teheccud kir li alîkî diçin dizyê
Li alîkî du'axwaz in li ê dî nav kûçik daê
13. Li alîkî mutî'ê Reb li alîkî senem parêş
Li alîkî dîkin îrşad li ê dî man di beydaê
14. Li alîkî qufirkol¹³⁴ in li alîkî dîkin aşêv
Li alîkî li ser kursî li ê dî şahê Begdaê
15. Li alîkî di germê de li alîkî di berfê de
Li alîkî di gemyan e li ê dî man di sermaê
16. Li alîkî ebûqat in li alîkî ker û lal in
Li alîkî xeberboş in li ê dî got bi zanaê
17. Li alîkî wekî şêran li alîkî wekî rovî
Li alîkî wekî mêşin li ê dî gurgê çiyaê
18. Li alîkî dîkin parsê li alîkî parî tê ber dev
Li alîkî dixun nextê li ê dî mal sebîl daê

¹³⁴ Kesê ku qufran dikolin. Qufur, kolana bi tevrên e.

19. Li alîkî kirin çar jin li alîkî mirin bê jin
Li alîkî di qesrê de li ê dî gor xuya naê
20. Li alîkî gelek merd in li alîkî çîqa kund in
Li alîk ew bi xwe naxwê li ê dî daye ber baê
[r. 23]
21. Li alîkî şerabnoş in li alîkî siyehpoş in
Li alîkî Mem û Mecnûn li ê dî Zîn û Leylaê
22. Li alîkî me ew dost in li alîkî hemî dijmin
Li alîkî ‘ezazîl¹³⁵ e li ê dî melekê baê
23. Li alîkî sewabdar in li alîkî gunehkar in
Li alîk ‘abidê Xaliq li ê dî ‘ebdê dunyaê
24. Li alîkî diçin cennet li alîkî diçin dojê
Li alîkî wekî teyran li ê dî pê li pey naê
25. Li alîkî me ew dîtin li alîkî bihistî me
Li alîkî nizanim hêj li ê dî qetî hesab naê
26. Dilo hişyar bibe derkev ji vê govend û vê reqsê
Bigir hikmet bi fikrê xwe nebe gafil li ber naê
27. Ev e tev hikmeta Barî cihan xulqand bi vî rengî
Weha reng e di ‘uqbaê bizan ey ehlê danaê
28. Wekî lebt û sikûn û hem wekî jor û wekî jêrî
Terî yû hem zuwaî germ di mûqabil de sermaê
29. Wekî erd û wekî asman wekî cennet wekî narê
Wekî cinn û wekî ins û melek şeytan û dehbaê
30. Wekî camid wekî namî wekî heywanê canîwer
Wekî ax û wekî av û wekî agir wekî baê
31. Ji bona imtihanê daye me ev mirin û sağî
Gelo kanî kî ye mûti‘ kî ye emrê wî derdaê
32. Çîqa tiştê ku xulqandin hemî jevre kirin dijmin
Ji ewwel ve heta axir binêr dunya û ‘uqbaê
33. Bi vê derketiye sirra: “Leyse kemislihî şey’un”¹³⁶
“Welem yekun lehû kufwen ehed”¹³⁷ der erd û balaê

¹³⁵ Şeytan.

¹³⁶ Yên weke wî nîn in (Sûretê Şûrayê, qismekî ayeta 11an).

¹³⁷ Hempayên wî nîn in (Sûretê Îxlasê, ayeta 4an).

34. **Sîraco** tu bibe hişyar kelemça nefşê bişkêne
Ne heyf e xwe bikê êsîr bi vî 'eqî û bi danaê
35. Dikim hêvî ji Rebbê xwe bidem nesret li ser nefşê
Şelat û pur selaman ser nebî her weqt û anaê

11

Sibat- 5 1371 (Mld. 1952)

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Ela ey ehlê îmanê li dînê xwe bibe guhdar
Bibe nobetçiyê huznê şev û rojê bibe hişyar
2. Bizan dijmin te pur zehf in wekî şeytan û dunyâê
Dikin paş dizyê her dem bo ewê nefsa te ya xeddar
[r. 24]
3. Bi xef geh tîn û geh zahir di şeklê dost û yarê te
Bi hîl û mekr û sehharî dibên bo te em in tev yar
4. Eger tu tit bikê¹³⁸ wan wek se wû tole d'hejênin dûv
We ger bêjî ewan rûnin te hingêvin bi şubhê mar
5. Bi hirs û yan hesed ya rûmet û yan kibr û yan 'ucbê
Ku bîn te hilde mertalê qena' û zîll û ifqîtar
6. Emanet da bi kîn û buxz û qehrê te nebin qoşmê
Tuwê hingî di dest wan de bibê bergîlê xwey hevsar
7. Bike zîkrê Xuda her dem bibe mûtî'ê emrê wî
Bi teb'ê xweş li nêv 'ebdan bibe wek sêveke berdar
8. Divin ku te b'xirênin ew bi mal û yan bi ehlê te
We ya qesr û qonaxê te we ya lawîniyê¹³⁹ ey yar
9. Hesêb ke xwe suwarê çîtika zarok li ser tingê¹⁴⁰
Jin û ehlan wekî bûka ku çêkirne ji kinc û dar
10. Tu wan qesr û qonaxê xwe bibîne xaniyê zarok
Dikin ava heta nîro dikin wêran ku bû êvar
11. Bi malê xwe tu Qarûn bê bi quwwet Rustemê Zal bê
Bi qesran Şahê Kisra bê bi ehlan Dawudê serdar

¹³⁸ Biqêştîne, biqewirîne.

¹³⁹ Ciwanî.

¹⁴⁰ Sergo, sorgeh.

12. Di yek lehza ji destê te temam dê derkevê beyhûd
Ji geyrî şalihê e' mal tu nabîn feydeê yek car
13. Bizane ev dinê qurs e cihê te' lîm û darsa ye
Di wê de 'eskerê îro siba mal cennet e yan nar
14. Eger te' lîm û dersgirtin wezîfa xwe bi rastî kir
Tu dê terfîyekê taq kê ji nik wî Erhemê Geffar
15. We ger tiştê ne' elmê hem şikandî emrê sobayî
Tuwê bê pîs nefer hem bin meşî' a hâkimê Cebbar
16. Tefekkur ke çîqa weqtê me bû zehmet ji qenca re
Dizanim war ew e lê ka gelo ewna behar û dar
17. We ger dunya temam pîs e ji ewwel lê nexasim ku
Digotin qernê me îro ketî qernê dehan û çar
18. Muheqqeq hun bizanin ku ev e axir zeman e lew
Çîqa nîşan me dîtî dîn di mistê bûye nar û ar
19. Emanet çû xîyanet hat cehil pîr bû 'ilîm kanî
Heqî ket bin zikê baîlî li me bêbav buyin serdar
20. Dilan rehmet nema tê de bereket çû ji ser 'erdê
'Edalet çû ji nik hâkim jinan kanî heya û 'ar
[r. 25]
21. Ji bo dunya dîkin xwendin dibin tacir diçin heccê
Heçî mizgevt bûyin vala ku bû îrî kirin guftar
22. Şivanê pez ewê serrût û xwas xweş çêkirin koçik
Kuran dê w bav ji bona xwe kirin cêriyy û xizmetkar
23. Xwedî kirne mirîşk çiqqa kesê dewletliy û zengîn
Binêr dunya temam bûn katib û cumle buyin tucçar
24. Bi vir sûnda dixwin hem 'elb û kîlo gaz û metra xwe
Kîrî wan kêmi yû zêde di nav rûn av kirin cobar
25. Diqîrênin diceyrênin çîqa mizgevt belê paşî
Cema'et tê de nabin ger hebin jê nîn e zêdey çar
26. Me dîtî 'abidê cahil ji xelqê re buyin rêzan
Ewan û 'alîmê sû' tev li dîn wêran kirin dîwar
27. Rîba zehf bû 'eraq pur bû şehadet zor û bêbextî

Heqê hespan giran bû jin beha bûn ta bi sed qintar

28. Bi Qur'anê stranê her dîkin ew xwende û fasiq
Cilê mêşin dipoşin ser dilê gurgan û hem keftar
29. Selamê ew didin ser xas û nasa rehîma pismama
Xuya nabê zekata xwe kirin şûna çi yadigar
30. Kuleh wunda bû hem pîrek suwar bûne li ser zîna¹⁴¹
Bi qencî kes emir nakê j' neqencî nakê kes inkar
31. Bi heqqê şehde wunda bû li me zarok buyin amir
Ketî bin emrê jin mîrik jin û mîr tev de bûn tucçar
32. Mezin rehîmê qe nakin ser biçûka hem biçûkê me
Qe nakin hurmeta pîra hinek wek gur hinek wek kar
33. Me mal pur bû feqîr nîn e zekata min ku bistênê
Xwedîeslê me bûne kêr geda bûn waliy û muxtar
34. Ji bo bav kur dibê dilêş di havîna de tê baran
Me'arif saz û mîzrîq e xuya bûn her bikin hawar
35. Bi qamçiy û bi sola xwe xeber dan hev bi berqiyê
Dîkin le'nê li pêşîvan evê paşiyê ya Settar
36. Nema pur ku xweziya xwe bixwazin em bi ê ku mir
Ji zulm û kotekiya ku ketî 'erdê li ser ê jar
37. Nema ku pur çiyaê zêr ji bin ava Furat der bê
J'sedan yek jê xilas bê not û neh bîn kuştin û bê zar
38. Nema pur ku li şerq û hem li xerb û nêv 'Erebistan
Di 'erdê de herin xwar pur gelek gund û gelek bajar
[r. 26]
39. Nema pur ku hinek 'alim mesix bin şeklê meymûna
Ku heq wunda kirin baîl kirin pîş û kirin îş'ar
40. Nema pur ku bi insana re biştexlin gur û dehbe
Nema pur ku jin û mîr nebne hewcey hev di îş û kar
41. Nema pur ku nefîr'ama¹⁴² mezin rabê biqelhin mîr
Serê pênceh jinê mîrek bibê malxwê bibê cotar
42. Nema pur Mehdî zahir bê le'în Deccal suwarê ker

¹⁴¹ Ev peyv "zîn" e, yanî kurtan. Lê ji ber qertafa piraniyê (a-an) wekî "zîna" hatiye nivîsîn.

¹⁴² Şerê Mezin, an jî qirkirin.

Nebî 'Îsa ji 'ezmana bibê nazil û bêtin xwar

43. Nema pur derkevin Ye'cûc û Macûc ew ji bin seddê
Vexun avê çem û behran çikû zehf in gelek dijar
44. Nema pur Dabbet-ul Erdê ji nîv rukn û meqam bê der
Dirifkin nas bikin her kes kî ye mu'min kî ye kuffar?
45. Nema pur ku ji singa hafîza Quran bibê wunda
Bimênê kaxezek vala nemênê gaziya û simsar
46. Nema pur ku ji rojava ve roja me bibê tali'
Derê tewbê werê girtin li piştê bar bê her du bar
47. Nema pur ku xerîb dîsa bibê dînê me çawan ku
Ji ewwel ve xerîb bû ey hevalo pur ke isti'far
48. Nema pur ku wekî qewmê berê hin çêbikin esnam
Çîqa îşê ku wan kirbûn li nîva me biyê ichar
49. Nema ku pur ne wî dîtî di dunyâê musulmanek
Hemî kafîr bibin carek 'ezabê heq li wan bê xwar
50. Nema pur dê ji zaro şîrika xwe ku bibê gafil
Hemildar ber biavêjin bibin serxweş wekî meyxwar
51. Nema pur ku sipî bin zarokê ser destê dayîna
Fena bin 'erd û 'ezman tev li emrê heq bibin guhdar
52. Yeqîn nêzîk e ku rabin li gora ku dibên 'alim
Belê em pê nizanin wek nişadir ew kesê şeffar
53. Ji bêhna zulm û bêbextî li me poz hatiye girtin
Bi miska qenciya û teqwa xwe bêhnxeş kin gelî guhdar
54. Limêj û rojiya û hecc û zekata xwe bi rastî kin
Heta hûn wan nekin kamil j'xilasîyê re kanî çar
55. Çewan ku zehmet e qencî di vî weqtî wulo feyda
Ewî zehf e Çewan ku gotî serdarê sehab û yar:
56. "Kesê xwe bi sunneta min bigrê nik ifsadê insana
Ji xêra sed şehîda jê re kê nîn e" Ji vê hijmar
[r. 27]
57. Xuda tu b'hurmeta Wî kê tu dînê me bikê mehfûz
Me b'êxî ser rîya Wî hem li emrê xwe me bik hişyar

58. **Sîrac** ‘ebdek zelîl e ger nekê rehîmê li wî Rebbî
Kî ye ku karibê ‘efwê bidê barî wiyê ewzar
59. Çiku “La teqnetû”¹⁴³ gotî di Qur’ana Kerîm de ez
Her ro her her bi hêvî me ji rehîma dergehê Geffar
60. Şelat û pur selaman tu bide ser qencê mexlûqan
Digel al û sehaba ehl û ewladê wî yê mehpar

12

Êlûn- 1- 1372 (Mld. 1953)

Mustefîlun fe ‘ûlun mustefîlun fe ‘ûlun

Munserih — · — / · — — / — — · — / · — —

1. Subhan ji Rebbê e ‘la xelq çêkirin çi xweşkok
Rizqê ewan derêxist ji çêriyê pel û kok
2. Bi wan wî daye zanîn çi b’xwun ji her giyaî
Da ku li wê biçêrin gava ku hat sibatok
3. Dibişkivin yek û yek heta ku hat dema wan
Giya û dar kirin şîn wek sosin û gangilok
4. Hin şîrîn in hinek tal hin nazik in hin qîval
Hin tuj in wek reşadê hinek tîrş in wek tîrşok;
5. Hinek şor in hinek miz hin kerbeş in hin nêrgiz
Ev serbimast û zîwan ev tehlî û penîrok;
6. Ev zûrçik û ev nefel ev ‘endeko ev xerdel
Ev qûncir û zilindar hêlkê şimqet pîvazok;
7. Qeyinbre¹⁴⁴ û strîzerk ev parpar e ev guhbelk
Ev pûng û tolik û xes ev xuşîlo xecxecok;
8. Ev pîrqelaçk û kardî ev tûzika qelandî
Ev gêzgêzk û gûnîpez ev sûrim û sêvanok;
9. Ev şoqil û kerengzer ev kulîlka sor û zer
Ev xemrî yû xercûnî şaşkê mela mîjmijok;
10. Qerenful û sorilyaz sîrik û sîr û pîvaz
Ev catir û jehrmasî kuncî kerk û gultîtok;
11. Strîmişk û xelendor ev dendefêrş û kerkor

¹⁴³ Hêviya xwe qut nekin. Sûretê Zumer, ayeta 53yan. Di dewama ayetê de dibêje “Ji hêviya Xwedê”.

¹⁴⁴ Tehsîn Îbrahîm Doskî ev peyv bi şeklê “qeyînper” nivîsandîye.

- Paryêmihê giyaxwîn ev be' cik û teptepok;
12. Ev rexrûvîk û 'elbik qozyadûpişk û banik
Ev gûriz û têtantir ev karûş û rîşrîşok;
 13. Ev wek firîz û sorik giyareş û pûşdanik
Ev lavlak û derzîndank şekronek û dardarok;
[r. 28]
 14. Ev tirhûn û petrûşik birûskafir razyanik
Ev şembelîlk û hermel ev bilbizêk û pîvok;
 15. Ev zehferan û beybûn ev wek benc û wek tûtûn
Ev reyhan û ev çiçek ev zirpûng û darhîrok;
 16. Giyagerm û sitirhik giyayê mêrg û gerzik
Ev bacanê reş û sor ev xaşxaş û çeçeqok;
 17. Ev bamî yû ev kindir ev lûbiya û kundur
Ev qawun û fasolî ev şebeş û şimamok;
 18. Ev tivîr û ev toletirşk ev betat û hilotirşk
Sêvê bin'erd û pincar ev silk û ev hîbelok;
 19. Ev tîto ev hîştirav nîlûfera di nêv av
Reşkaheşpa barevîn nivînhiş û rizyanok;
 20. Ev 'agol û bureqran ev wek reşada diyan
Ev hêliz û rîvaz in zimançûk û zengilok;
 21. Ev genim û ce kuncî nîsk û şolik birincî
Ev baçîk û ev maşîk ev garis û eva nok;
 22. Hinek jehr in hin derman hin bi ra ne çiqil dan
Hin bi ber in hin bi şîr hin nêr û mê hin zarok;
 23. Hin avî hin bejanî hin çolî hin zozanî
Hin bi stirî hinek nerm hinek hişk in hin zirhok;
 24. Hin li Çîn û Hindistan hin li Mîsr û Kurdistan
Hin li Sûdan û Hebeş hin li Danêr û Rîzok;
 25. Her yek bi sirr û hikmet çêkirne Şahê Qudret
Ewan tesbîhê Barî xilas nabê şev û rok
 26. Ibret tu bigre bo xwe **Sîraco** b'gotinê xwe
Dê w bav biçin buhuştê herê li deştê çîrok

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Hewar e sed hewar e sed hezar carî dikim gazî
Gelo çawa bê halê min dema bimrim belengazî
2. Dema bimrim gelî yaran me bikne nava dîwaran
Me bispêrin di nav maran der an halet bibim tazî
3. Di tirs û wehşeta qebrê gelo çawa bikim sebrê
Di wê kûranî yû gewrê ku hem Reb jî nebê razî...
4. Hewar nîn e ne feryad e ne av û xwarin û zad e
Ne qinyat e ne imdad e ne xan e ku tu lê razî...
[r. 29]
5. Du milyaket werin ser min bipirsin ew jî halê min
Ewê pirs kin jî Rebbê min diçê j' dest hîle perdazî...
6. Eger qulto minel heqqî huwellah xaliq-ul xelqî
Muhammed cae bissidqî feqed fuzto bi efwazî¹⁴⁵
7. Me'azellah eger hûn in me got her ew qe narûnin
Ewê endama tev hûnin tevî hûr kin wekî mazî
8. Îlahî tu bi qenca kê bi qedrê neby û welya kê
Bi eħbab û muħebba kê bidê'm an dem serefrazî
9. Hene ni'met te bê husban li ber rehma te heşt asman
Di gel heft erd û heft beħran di bin yek pirtikê bazî
10. Gunahê min wekî axê li ber tavê ku tu daxê
Heçî kê m e tu wî daxê bi rehma xwe ke efrazî
11. **Sîrac** 'ebdê te ya Rebbî divê 'efwa te ya Rebbî
Rica rehma te ya Rebbî dikê tu wî bike razî
12. Digel cûmle musulmanan jî pîr û pîrek û canan
Bi qas 'ilmê te her anan şelat ser Ehmedê Xazî...

¹⁴⁵ Heke ez heqîqetê bibêjim, Ew Xuda Xaliqê mexlûqa ye, Muhammed bi rastiye hat. Min bi şeklê herî baş qezenc kir.

14
1370 (Mld. 1951)

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun
Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Bikin sebrê eya ixwan di sal û mah û hîn û an
Tefekkur ke li der Furqan *digel 'usrê bizan yusr e*¹⁴⁶
2. Bikin şukrê Xuda her dem bikin tewbe wekî Adem
Nebêjîn min fulan kerdem *digel 'usrê bizan yusr e*
3. Bitirsîn hun ji sexta wî bi hêvî bin ji rehîma wî
Mekin goftin bi şuxla wî *digel 'usrê bizan yusr e*
4. Bikin xeyra ji bo Rehman ne ku bo rûmeta xelqan
Hemî 'ebd in xudî 'isyan *digel 'usrê bizan yusr e*
5. Xuda Rebbek dilovan e ji bona xas û 'aman e
Çi kafir çi musulman e *digel 'usrê bizan yusr e*
6. Di weqtê tu bibê gêj e ji xewnê hêstiran rêje
Tefekkur ke bira bêje *digel 'usrê bizan yusr e*
7. Eger her dem te xem pur bin wekî min ew bi coxur bin
Bila daman tejî dur bin *digel 'usrê bizan yusr e*
8. Tunîn e feydeya malî meger ku qelb nebê xalî
Ji zîkrê Rebbê 'ebda lê *digel 'usrê bizan yusr e*
9. Tu bawer ke der an wextî tu sultanê li ser text î
Xudî taca zer û bextî *digel 'usrê bizan yusr e*
[r. 30]
10. Tefekkur ke li der Adem li Eyyubê wusa xweyxem
Li Îbrahîm û Nûh her dem *digel 'usrê bizan yusr e*
11. Li Zennûn Şalîh û Yehya li Ye'qûb Yûsuf û hemya
Li qenc û efzelê heyra *digel 'usrê bizan yusr e*
12. Şelat û tehyeta Ellah li ser wan bê di sal û mah
Di heşrê bo me bin hemrah *digel 'usrê bizan yusr e*
13. **Sîraceddîn** bi kovan e dikê gazî yû aman e
Meded Kafi yû Rehman e *digel 'usrê bizan yusr e*

¹⁴⁶ Bizanibe bi zehmetiyê re hêsantî heye.

1. Estegfirullah ji ber gunhê me 'ebd û insan
Estegfirullah ji ber gunhê çiqqa musulman
2. Estegfirullah ji ber gunhê ku destê me kir
Estegfirullah ji ber gunhê bi qelb û ziman
3. Estegfirullah ji ber gunhê bi çav û bi pê
Estegfirullah ji ber gunhê bi lêv û devan
4. Estegfirullah ji ber gunhê ku hatî di guh
Estegfirullah ji ber gunhê me ê her zeman
5. Estegfirullah ji ber gunhê êvar û sibeh
Estegfirullah ji ber gunhê di roj û şevan
6. Estegfirullah ji ber gunhê bi qest û xelet
Estegfirullah ji ber gunhê dizî yû 'eyan
7. Estegfirullah ji ber gunhê bi herf û kelam
Estegfirullah ji ber gunhê seb û xeberdan
8. Estegfirullah ji ber gunhê bihar û havîn
Estegfirullah ji ber gunhê pehîz û zistan
9. Estegfirullah ji ber gunhê rûniştî jipê
Estegfirullah ji ber gunhê bi lok û bazdan
10. Estegfirullah ji ber gunhê ketî xiyalî
Estegfirullah ji ber gunhê ne ku tê ziman
11. Estegfirullah ji ber gunhê ji nefsa me bê
Estegfirullah ji ber gunhê ji alî şeytan
12. Estegfirullah ji ber gunhê ku çûn hê ji mêt
Estegfirullah ji ber gunhê ku min kir nihan
13. Estegfirullah ji ber gunhê li ber sih û tav
Estegfirullah ji ber gunhê zeman û mekan
[r. 31]
14. Estegfirullah ji ber gunhê bi tirs û bi zor
Estegfirullah ji ber gunhê bi keyf û xendan

15. Estegfirullah ji ber gunhê li çol û çiya
Estegfirullah ji ber gunhê li deşt û zozan
16. Estegfirullah ji ber gunhê li xilwexana
Estegfirullah ji ber gunhê di şehr û gundan
17. Estegfirullah ji ber gunhê limêj û rojî
Estegfirullah ji ber gunhê zekat û heccan
18. Estegfirullah ji ber gunhê di hindik û pur
Estegfirullah ji ber gunhê biçûk û giran
19. Estegfirullah ji ber gunhê di roj û heftê
Estegfirullah ji ber gunhê di sal û mehan
20. Estegfirullah ji ber gunhê di pazdehsalî
Estegfirullah ji ber gunhê di bîst û sehan
21. Estegfirullah ji ber gunhê huqûqê Xuda
Estegfirullah ji ber gunhê huqûqê `ebdan
22. Estegfirullah ji ber gunhê heval û hogir
Estegfirullah ji ber gunhê gundî yû cîran
23. Estegfirullah ji ber gunhê dê yû babê min
Estegfirullah ji ber gunhê huqûqê biran
24. Estegfirullah ji ber gunhê huqûqê şerîk
Estegfirullah ji ber gunhê huqûqê jinan
25. Estegfirullah ji ber gunhê bi fetwa me kir
Estegfirullah ji ber gunhê fitû lê neman
26. Estegfirullah ji ber gunhê elîf tê hebê
Estegfirullah ji ber gunhê bi bê yû têyan
27. Estegfirullah ji ber gunhê hebê tê de sê
Estegfirullah ji ber gunhê bi cîm û hîyan
28. Estegfirullah ji ber gunhê bi xê yû bi dal
Estegfirullah ji ber gunhê bi zal û rêyan
29. Estegfirullah ji ber gunhê bi zeyn û bi sîn
Estegfirullah ji ber gunhê bi şîn û şeran
30. Estegfirullah ji ber gunhê bi sad û bi dad
Estegfirullah ji ber gunhê bi ta û milan

31. Estegfirullah ji ber gunhê bi za 'eyn û geyn
Estegfirullah ji ber gunhê bi fa ey fulan
[r. 32]
32. Estegfirullah ji ber gunhê bi qaf û bi kaf
Estegfirullah ji ber gunhê bi lam û leman
33. Estegfirullah ji ber gunhê bi mîm nûn û ha
Estegfirullah ji ber gunhê bi waw û beran
34. Estegfirullah ji ber gunhê bi lamelîf bê
Estegfirullah ji ber gunhê bi ya û ciran
35. Estegfirullah ji ber gunhê ku tene hijmar
Estegfirullah ji ber gunhê ku nîn e husban
36. Ya Reb bi navê Ğefûr **Sîrac** bixefrêne tu
Bê hed şelat û selam ser xatemê enbiyan

16

Adar-22- 1373 (Mld. 1954)

Merş û Xweşxana¹⁴⁷ Feqehan

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · - -

1. Tevde Bismillahî bêjin hemdê Ellah der xitam
Her bixwênin 'ilm û xwendin ku biçin Darusselam
Da ku em dîne Muḥemmed nû bikin qesd û meram
Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
2. Em dixwênin xwendina Quranê Rebbil Alemîn
Em dîkin tefsîr û te'wîl her ji bo dîne mobîn
Da ku em dîne Muḥemmed nû bikin qesd û meram
Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
3. Serf û nehwe em ji bo çî pur dîkin guhdanê wan
Da li ber me bête rayê her 'ulûmê pur giran
Da ku em dîne Muḥemmed nû bikin qesd û meram
Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
4. 'Ilmê şer'ê em dizanin yê huqûqê her kesî
'Ilmê 'ama xwendina wî ferz e bona her kesî
Da ku em dîne Muḥemmed nû bikin qesd û meram
Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
5. Em 'eqîdê dikne tekrar da neçê ewna jibîr

¹⁴⁷ Xwêşxwên, kesên ku xweş dixwînin.

Hem qewîn bê dîn û îmana me der Rebbê Qedîr
 Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
 Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
 [r. 33]

6. Ew hedîsa ku kalamê efzelê xelqa ye ew
 Pê helal û pê heramî em dizanin bê derew
 Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
 Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
7. Istî‘are w mentiqê de ku fesahet çêbibê
 ‘İlmê tîbbê siḥḥeta cismê bedî‘ pê çêbibê
 Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
 Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
8. Ewwelê Quranê (Iqre‘)¹⁴⁸ gotina Rebbê me ye
 Lew dizanin xwendin û zanîn ji bo me feyde ye
 Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
 Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
9. Ger nebê ‘ilmê şerîf insan ne hêja mûyekî
 Qenciya Adem li ser cumle melek bo vê yekî
 Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
 Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
10. Ma bi çi insan û heywan têne ferqê ey bira
 Her bi vê nutqa zimanî nasiya Rabbê wera
 Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
 Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
11. Qenciya zanînê der Qur‘anê ku:¹⁴⁹ “Hel yestewî¹⁵⁰
 Ellezîne ye‘lemûne”¹⁵¹ w xeyrê wan ma “Yestewî”¹⁵²
 Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
 Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
12. Her kesê ‘ilmê bixwêne xas ji bo dînê Xuda
 Da melek herdû piyê wî danî ser çengê xwe da
 Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
 Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
13. Ger ji me yek rabê ‘alim ew di hêja ‘alemek
 Hem bi ‘eql û hem feraset wek wî nîn e qet kesek

¹⁴⁸ “Bixwîne” (Sûretê Eleq, peyva pêşî ya Ayeta pêşî). Di heman demê de ev emrê Islamê yê pêşî ye.

¹⁴⁹ Di van herdu rêzên pêşiyê de ayeteke Quranê îqtîbas kiriye. Lê belê Kurdî û ‘Erebî tevlihev kiriye. Ayet wiha ye: Qey kesên zane û nezan dibin wekhev. Ev ji Sûretê Zumer ayeta 9an e.

¹⁵⁰ Qey dibin wek hev.

¹⁵¹ Kesên ku zane ne.

¹⁵² Ne wek hev in.

Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam

14. ‘İlm û zanîn xaniyê ku bê sutûn ava dikê
Lê cehil wî xaniyê ‘îzz û şeref wêran dikê
Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
[r. 34]
15. Ger ku hibra ‘alima xûna şehîdan bê kişan
Hibrê ‘alim dê girantir bê yeqîn û bê guman
Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
16. Ma bi çi eqtab û ewtad û welî têne wucûd
Ger nebê şer‘ û heqîqet wê fena bin ew ji zûd
Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
17. Ev bes e bona kesê ku ‘ilm dizanê ey cuwan
Bê şek û şubhe ew e her warisê peyxemberan
Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
18. Ya Îlahî merteba seyda û şeyxan ‘ale ke
Zihnê tullab û feqîh û suxteyan pur zêde ke
Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
19. Em qe nakin terkê tehsîl sûnd bi zatê Ehmeda
Ta ku em bimrin di van mizgevt û van hucrê xwe da
Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
20. **Sîn û Cîm’a** pur gunehkar hêvîkarê rehmetê
Ya Îlahî me w hevala tevde bêxê cennetê
Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam
21. Ewwel û axir bibarin selewat û hem selam
Ser Muḥemmed al û eşhab ehlê îman bittemam
Da ku em dînê Muḥemmed nû bikin qesd û meram
Paşî bêjin ser Muḥemmed sed şelat û sed selam

Adar-2 – 1365 (Mld. 1946)

Fa 'ilatun fa 'ilatun fa 'ilatun fa 'ilatun

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · - -

1. Ey dilo rabe binêre ev dinê bûye gerav
Nû li wê bû şubhê şêr e te li wî hatî zirav
2. Tu tefekkur ke ji zû ve ê berê çûne bi kû ve
Ew kesê ku mewt li dûv e çi bikê j'zêr û dirav
3. Her mirin tû bêne bîrê l'pey te tê teşbîhê tîrê
Yan te cih wê çê se'îrê yan buhuştâ bûgulav
[r. 35]
4. Pal nede rengê emîra kû dirûnin ser herîra
Lê bibe mislê feqîra rûne ser merş û kulav
5. Ger çîqa malê te pur bê hin ji zêr û hin ji durr bê
Kû mirin teşbîhê gur bê heyf e tu berdiyyê çav
6. Bike tewbe j'gunehê xwe bike emrê xaliqê xwe
Ser bide l'ehl û kesê xwe bigre qedrê dê yû bav
7. Guh nede şeytan û nefse her divin kû tu bitehsê
Bi ser û pa herê hepsê divedin pêşya te dav
8. Geh ewê bêjin tu têr î geh ewê bêjin tu mêr î
Wê li te ser kine gêrî paşî wê sojin hinav
9. Pur gelek şeytan le'în e ji me re her dem bi kîn e
Hiş ji insana re nîn e xwariye lew şîrê xav
10. Mekrê şeytên pur giran in hîlê nefse pur gedar in
Ji dinê re her du yar in qet neke ser wan silav
11. Le'neta heq lê bibarê sibeh û danê êvarê
Şubhê barana biharê kû dibarê tav bi tav
12. Ger tu têr bê xudîdewlet bike şukrê Rebbê 'îzzet
Da bidê bona te cennet jê bike hêvî û lav
13. Wer feqîr bê bibe sabir bi zimên her bibe zâkir
Te xilas kê Rabbê Qadîr ji pira tûj û zirav
14. Nexwe malê 'ebd û insan neke xeyba kes û ixwan
Ê neqenc qet neçe rex wan bêhnek û kêlik û gav

15. Şîreta min her bi guh ke emrê Xaliq tu bi cih ke
Tu li nefsa xwe gilih ke ma te nîn e çav û gav?
16. Here nik xasê Xudayî ê di weqtê te de dayî
Da li qelbî kî dewaî şu'ledar bê şubhê tav
17. Şubhetê murşidê Seyda bû di weqtê me de peyda
Da ji wî bigrê tu feyda j' dest vexwe şerbet û av
18. Soz bide ku tu tu cara bi diziyy û aşîkara
D'xizmeta Rebbê kubara neşkênê nîr û kilav
19. Xweziya me b'wî kesî bê koleê dergahê wî bê
Şêx çî bêjê weke wî bê nakevê teqn û çirav
20. Ey **Sîrac** ma vî zemanî şubhetê Seydaî kanî?
Her du 'ilman ew dizanî lewra Seyda bûye nav
21. Reb li wî 'umrî dirêj kê Munkirê wî lal û gêj kê
Muhbeta wî li me hiş kê ger çî min vala ye nav
[r. 36]

18

Adar 2 – 1365 (Mîd. 1946)

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · -

1. Ey gelî ehl û hevalan bes bibin sewda û gêj
Pur nekin huzn û mitalan zîkrê Rebbê xwe bibêj
2. Zanibin dunya fena ye qey li wê kî pal vedaye
J'hakim û şah û geda ye kî bihistî j'we ji mêj?
3. Hiz nekin hun ji dinê qet ger çîqa pur bê wekî şet
Nêv de noq bin şubhetê bet li dinê nekin 'inêj
4. Nebe 'aşîq tu li pîrê ê ku wê bînê li bîrê
Dê ewan wer kê dî bîrê ev dina kevn û kelêj
5. Bê hesab şubhê te rabûn ew jî wek te canfida bûn
Pur neçû ewna zi'a bûn hiştibûn mal û qirêj
6. Çawa ku geyrî du gaza nebirin wan ji mixaza
Çûne gur bê find û gaza his ji wan dernayê hêj
7. Tu li şûnwara yî îro bi dinê ve dibê zîro
Reben û 'ebd û feqîro rûn xilas bû ma dewêj

8. Ê berê ‘umrî hezar bûn qametê wan wek çinar bûn
B’quwwetî l’şêra suwar bûn navê wan kanî tu bêj
9. Zanibe dunya ne mal e genî yû pûç û betal e
Her bike bo Zilcelal e hecc û rojî yû limêj
10. Emrê heq cih bêne her dem ‘aşiqê wî be wekî Mem
Ji dinê qetî mereq û xem nexwe ‘umrê te dirêj
11. Çiqa bêjê bibilênê **Sîraco** ma tu dibînê?
Melhema derd û birînê durr û mercan bes birêj
12. Te ‘umur çû nîvî muxtar hê nebû tu j’xewê hişyar
Ev tenûra dinê bû sar va du nanan lê nepêj

19

Nîsan -28 – 1373 (Mld. 1954)

Mustefîlatun mustefîlatun

Recez: -- · -- / -- · --

1. Ey dil eger tu l’halê dipursê
Min dil sedirye wek cils û kilsê
Dunya li min bû teşbîhê hebsê
Jana me dîtî jê nayê behsê
Ha ev me kir bû wek dewr û dersê
Hawar ji destê dunya û nefsê
[r. 37]
2. Nefsa me jar e qencî hilanî
Emrê Xudaî wê pêk neanî
Meyzê çî zûka wê şer deranî
Der heq me hewqa bûye nezanî
Mîna ji keskî qetî nakê tirsê
Hawar ji destê dunya û nefsê
3. Wellahî zanim dunya betal e
Tellahî zanim gorin me mal e
Ewna cih e bo her can û kal e
Ê vê nizanê ew kor û lal e
Paşî Muheqqeq ew dê bi tehsê
Hawar ji destê dunya û nefsê...
4. Nefsa me bulbul dunya gula sor
Gava dinê dît pê bûye mexror
Pîra hezar sal pê bûye wek hor
Zahir bi çav e nefsa e di xef kor

Yan ‘Enter e yan ew lawê Qeysê
Hawar ji destê dunya û nefsê...

5. Dunya eger ku xweşyê bidê te
Paşî Muheqqeq reşyê didê te
Paşatiyê ger ewna bidê te
Reş dê girêdê ew ser serê te
Kes nîn e ku lê naêne keysê
Hawar ji destê dunya û nefsê...
6. Nefsa me hişk e yara le‘în e
Şeytan werê min jê re mu‘în e
Mestîr ji nefsê dijmin me nîn e
Ne muşrik û ne j’agir hebîne
[r. 38]
B’gurzê hesûdê yan kibr û hîrsê
Hawar ji destê dunya û nefsê...
7. Dunya fena ye dil lê nerûnên
Meznatiya wê halo bihesbên
Wek tu ji hewşê çûyî serê bên
Ku rojê avêt bar kirye karwên
Meydan kin e b’vê pîvan û qeysê
Hawar ji destê dunya û nefsê...
8. Nefsam ze‘îf e teşbihê zarok
Tîrsê qe nakê j’engî yû tehlok
Şeytan e kaş û ewna wekî gok
Naçê hilê ger xalek nekê lok
Wek şevşevokê nabînê şemsê
Hawar ji destê dunya û nefsê...
9. Dunya ji bo me otêl û xan e
Qey roj û danek em tê de mane
Lê bûye êvar axîrzeman e
Dunya gelo kî lê kir demane
Teşbihê leyland j’dûr ve ditîsê
Hawar ji destê dunya û nefsê...
10. Nefsa me îro bûye emîrek
Şeytan ji wê re bûye wezîrek
‘Aqil melik bû bûye esîrek
Şer tev civandî wîna bi qîrek
Ez yek tenê me dijmin me her sê
Hawar ji destê dunya û nefsê...
[r. 39]
11. **Sîrac**o ger tu d’xwazê hîdayet

J'dunya û nefse bigrê selamet
 J'qelbek selîm bik tewbe w nedamet
 Hêvî heye heq bid te 'inayet
 Hingî jibîr ke vê dewr û dersê
 Hawar ji destê dunya û nefse...

20

Hezîran - 14 – 1373 (Mld. 1954)

Mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. Hawar ji dest ehlê zemên cumle me cerbandin henoz
 Qet min nedît rastî ji wan ger ser sipî bê kak û boz
2. Nîsana qencî bû mehel reyhan û sunbul hişkî bûn
 Germa şerê havînê hat ku derketî roja temûz
3. Tu l'wan dinêrê şaş û reh tizbeh dîkin şeqşeq belê
 Yek car bi cerbên meyzeke kakil xuya nakê ji gûz
4. Pur zaneyê dunya xwe ne bo axiret tev ebleh in
 Îşe Xuda ma niv tamam şuxlê dinê kirne tekûz
5. Çiqqa civata du kesan yan geybet û behsa hinan
 Yan cot û cobar û pez in valayî nîn e rengê koz
6. Xayînî yû bêbextî yû ixbarî yû sûndê bi vir
 Pur bûn ji lewra meş dîkin ser wê riya xwehr û nedûz
 [r. 40]
7. Dunya tamam bû rûmet û kibr û 'eceb bitr û hesed
 Lê bû buhara makera ku wan pere kirne kirûz¹⁵³
8. Ehlê neqencî bûne pur bêhtir ji mêş û pêşyan
 Qencê Xudê kêmbûn li me wek sîmur û yan şubhê qûz¹⁵⁴
9. Çiqqa ku rojek derkevê pîstir ji ya dîtir dibê
 Çiqqa dibê heqqê di dest baîl dikêtin kûzekûz¹⁵⁵
10. Meyzê çîqa qedr û şeref bûye bi mal û mulkê pur
 Çiqqa xuyayî tev ketin pîs û geda girtin debûz¹⁵⁶

¹⁵³ Taxe.

¹⁵⁴ Ev peyv em bawer dîkin ku kurtkirina peyva "qûzik" e. Qûzik heywanekî dirinde û hûrik e, weke kurbeş.

¹⁵⁵ Girîn, nalenal. Bêhtir ji bo kûçikan tê bikaranîn.

¹⁵⁶ Hesinê di şeklê doqîk de.

11. **Sîrac** ma hê tu dixwazê ku bibê bûk pîrebî
Pîra li talî şixr e ev şubbat e ma kanî temûz?

21

Temûz - 21 – 1373 (Mld. 1954)

Mefa 'ilun fe 'ûlun mefa 'ilun fa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - -

1. Were ey birayê min li min guh bide dîsa
Ji bo pend û we'zê min dilê xwe bike lîsa
2. Dilê xwe neke xweş tu bi dunyâê wellahî
Nema pur bibê nazil ji jorê nebî 'Îsa
3. Zemanê me ye axir zeman ma tu nabînê?
Dilê me ji bo tem'a dinê bûye nawîsa
4. Ji bîra me çû axret dinê tê li xewna me
Çi îşê Xudê nakin ji bo xatrê iblîsa
5. Binêre eger pezkî me wunda bibê carek
Li wê em dikin pursê heta Mûş û Bidlîsa
6. Belê ger limêja me herê guh me lê nîn e
Weke mêşekî fîrda ji pozê kerê pîsa
7. Eger yek bikê zulmê li me nîn e bûrandin
Weger ku bikê mehder li wî Nûh û Idrîsa
[r. 41]
8. Belê ger li wîna em nikarin bikin heyfê
Efû kirye min da xatirê Gebro serkîsa
9. Çi bêjim me qenc nîn e miqdarê du qurûşa
Belê seb tenê îro biha bû bi sed kîsa
10. Şev û roj dikuddênin¹⁵⁷ li dunyâê naê dest
Behar û zivistana temûz û dî mayîsa
11. Gelo axretê çawa werê destê me ku qet
Li wê nagirin hêja ne ristî li wî rîsa
12. Di nav hev de em tev zikreş in şubhetê masî
Belê zahirî me şaş û per wek tewawîsa¹⁵⁸

¹⁵⁷ Hewl didin.

¹⁵⁸ Teyrê tawis.

13. **Sîraco** me qurbano bibe nobedarê xwe
Li her çar teref bûn eskerê nefis û iblîsa

14. Bi ker tu nekarî ma nikarî bi kurtanî
Tu şûnmayiya Qarûn ji nû ve nealîsa

22

A - 18 – 1373 (Mld. 1954)

Mefa 'ilun mefa 'ilun fe 'ulun

Hezec · - - - / · - - - / · - -

1. Birano hun ji xwarê werne banî
Bizan bê şek ku ev dunya me fanî
2. Gelo ma hê ne bes ev gefleta we
Çîqa ev xew li we bûye giranî
3. Weke zarokekî razê di dergûş
Bibêje raze jinbava kebanî
4. Tu cara navê ew rabê bikê ken
Çikû jinbav ji wan xelkê biyanî
5. Diya wî dûredest e çûye malbav
Bûye poşman çewa gel xwe neanî
6. Pepûko dê kî ye kîjan e jinbav
Hişê te çûye kû 'eqlê te kanî?
7. Diya te axret e sekna te cennet
Te ava ne li wê pur qesr û xanî
8. Şev û rojê diya kê ey kurê min
Were nik min ji nik ya îş xiyânî
9. Dinê hewya min e qeş guh nede wê
Ewê paşî te kê destê zebanî
10. Emê êdî ji hev qut bin xwelîser
Ku da hingî nebê min ev çi zanî
[r. 42]
11. Gelek qasid Xuda bo te şiyandin
Gelo qey tu ji wana bê guman î?
12. Hemî zahir yekî xef tê de nîn e
Dikin guşguş diherkin şubhê kanî

13. Nema kes pê nehesya yan nedîtin
Ji zarok û jin û pîr û cuwanî
14. Eva Peyxember û Quran û cibrîl
Eva heyv û stêrê asîmanî
15. Eva roj û şev û baê bi dimdim
Eva mir'n û heyata pur giranî
16. Temam hatin ji bona te digotin
Ji geyrî heq heçî tiştê dî fanî
17. Ewî 'eqî û mejî kirne serê te
Ji bo xeyr û şeran tu pê bizanî
18. Gelo ma kanî bav û kalikê me
Gelo ka ê ku dil kir şadimanî?
19. Gelo ka hakim û paşa û begler
Ewê ku pur li te kir bûn şivanî?
20. Gelo ka ê dinê cumle vegirtin
Gelo ka Qasidê axir zemanî?
21. Gelo koma sehaba kanî etba'
Neqîl bûn çûne Ridwan û Cinanî
22. Tu nabêjê wekî wan ez li rê me
Nema pur ku bikim wî kariwanî
23. Ruhê min rabe qenciyyê 'emel ke
Riya te dûr e û çolek beranî
24. Dixum sûndê bi Zatê Lemyezel ez
Eger wek wan bikê qencî ji canî
25. Tu dê bighê ewan wek sewqiyatê
Li qonaxa Diyarbekrê ku danî
26. Hemî tevde herin baxê buhuştan
Vekirne der hemî wî dergevanî
27. Ewa ku lê diherkin hingiv û şîr
Şerab û av wekî rûbar û kanî
28. Kî ye ku karibê wek wî wesif dê
Ew e Rebbê mezin lê bûye banî

[r. 43]

29. Weger ku guh bidê dunya û nefse
Bi şewra wî le'înê wî qiranî
30. Digel Qarûn û Haman û Fera'în
Biçe dozex bi qamçiyê zebanî
31. Ewa ku şij 'edab û zûx û zeqqûm
Ji bo wan av e hin jî şubhê nanî
32. Gelo kî karê wesfê wî tamam kê
Ew a qehra xwe Qehhar tê de danî
33. Ev a heq her du rê dan pêşiya te
Li ser ya çê bimeş wek pehlewani
34. Nebe wek korekî kopal şikestî
Dihilteplê çep û rast jev nezani
35. Xera mek mala xwe gel ya hevalan
Di berfê de bi rengê tûreşani
36. Îlahî her dikim hêvî tu **Sîrac**
Bikê ser wê riya rast û xuyani
37. Heta karê şelat û pur selaman
Bide ser ê ku mehder bo me ani

23

A - 21 – 1373 (Mld. 1954)

Mefa 'ilun fe 'ulun mefa 'ilun fe 'ulun

Hezec · — — — / · — — / · — — — / · — —

1. Gelî heval û cîran bikin tewbe ji 'isyan
Berî ku biçne goran bibînin bo xwe derman
2. Bila aqil di ser bê zîkrê Xudê jiber bê
Behsa mirin xeber bê da heq bidê we Ridwan
3. Bêj kanî bav û kalik ruhê çû de kanî qalik
Tirba xwe kirne malik xira bûn qesr û eywan
4. Bê şek bizan wekî wan vexwê şerab û fincan
Paşî tu wê gihê wan yek gaz û nîv e meydan
5. Dinê gelek civandin hespê xwe lê bezandin

Bi gurrî ve gihandin bi sêrî çûne tirban

6. Gelek rabûn xwedî mal gelek rabûne ‘ebdal
Hinek law û hinek kal di tirbê bûne yeksan
7. Va hat dora te îro nakê te qeṭ jibîro
Ka tê çî kê feqîro dema xwestin rûh û can
8. Ezê bimrim bi heşret li malê yan li gurbet
Man mal û zar û hermet destê xwe ser me lev dan
[r. 44]
9. Piştî danîm ser şûwar ez ê şuştim du sê car
Bi ava germ û ya sar sabûn ketî du çavan
10. Kefen kirin li min cil hildam bi destî ser mil
Şewtî ewan bi min dil berê me dane tirban
11. Ezê danîme çar dar li çar alî me hawar
Kirim qebra reş û tar gorin li min kirin xan
12. Danîn li ser hed û kêl ne bertîl e ne berdêl
Çîqa bidin zêr û mêl ji wê kes naê berdan
13. Çî gorekî teng û tal tê de bûyim pîr û kal
Ne hogir e ne haval ne sohbet e ne serdan
14. ‘Emel tenê heval e yan baş e yan beṭal e
Li gor wê gor te mal e yan nar e yan jî Ridwan
15. Ê qencî kir libas e ji cinn û yan ji nas e
Di gorê de xilas e j’guvaştin û ji lêdan
16. Kesê ku pîs ‘emel bê wê kor û şeṭt û şel bê
Gorin teji ji pel bê wer baş e rûh û reyhan
17. Ji geyrî xeyr û qencî nadê feyda te gêncî
Li vir ew e birincî wê pur bike bi heyran
18. Ya Reb bi Mustefa kê me j’gunha bê wefa kê
Ji êşa wan şefa kê tu wî Geffar û Rehman
19. Li vê dunyâ ni‘met li wê dunyâ cennet
Me dûr bike ji hirqet çîqa kesê bi îman
20. Madem ku te d’hebênin bi te îmanê tînin
Yeqîn xudî yeqîn in bi rehme çav me kil dan

21. Bê hed şelat bi teslîm li ser nebî bi te'zîm
Digel ala bi tekrîm **Sîrac** mehder giha wan

24

Adar - 28 – 1375 (Mld. 1956)

Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl

Muteqarib · – – / · – – / · – – / · –

1. Li ser vê dinê ku me dî bûye şer
Hemî şûr û mertal bi tîr û teber¹⁵⁹
2. Çîqa ku me nêrî me qeṭ kes nedî
Ku destê wî vala welew dar û ber
3. Hemî Rustemê Zal û hin 'Enter in
Çîqa hîlê herbê temaman jiber
4. Bi 'umrê xwe sundê dixum sed hezar
Bi Rebbê semawat û şems û qemer
[r. 45]
5. Wekî vî şerî qeṭ kesî seh nekir
Tu cara di weqtê 'Eliyy û 'Umer
6. Hemî bûn Mem û hin jî Mecnûnê dîn
Dinê Zîn û Leyla ye kul kir ceger
7. Çîqa tiştê zanin dilê wan me dî
Dî 'ilmê dinê de kitaba Meher
8. Dema ku me dît ev şerê pur xerîb
Weha lê civîn pîsek û mu'teber
9. Me rahîjtî gurzê xwe ê Rustemî
Bi min şer dibû şubhê şîr û şeker
10. Me qesda şerî kir hucûm daye lê
Ji her çar teref min vegirtî çeper
11. Dirahiştî min "bernowa" destebaş¹⁶⁰
Êmintî me qulband fişek birye ber
12. Heme çok veda min dirêj kir tîfek
Me sêhrik¹⁶¹ kirî rast libik¹⁶² kor û ker

¹⁵⁹ Bivîr.

¹⁶⁰ Cureyekî tîfîngan.

¹⁶¹ Pareçeyekî sîlehan yê ji bo nîşangirtinê.

¹⁶² Pareçeyekî sîlehan yê ji bo nîşangirtinê ya di serê lûleyê de.

13. Li dora xwe çiqqa ku min meyze kir
Dinêrim xuya nakê qeṭ yek eser
14. Gelek mam te‘eccub gelo kanî şer
Weya xewn e ev yan xeyala xeter
15. ‘Inayet ji Rebbê me hat gote min
Çira maye şaş tu eya bê xeber
16. De ka rehje fikrê xwe yê dûrebîn
Ji nûka li şer kûr bike tû nezer
17. Tuwê hingî bînê şerê me‘newî
Çi qewmî çi ceryaye tev ser bi ser
18. Me rahijte fikrê bi destê ‘eqil
Bi qelb û besîret me da ber beser
19. Dinêrim ku va ye kelaşek genî
Ji her çar teref seh dîkin ker bi ker
20. Dema ku dixun hin ji wan gêj dibin
Dibin har hinek jê qe nîn e meqer
21. Hinek jê dizûrin bi mislê guran
Hinek rûvî d’alîsê ax û hecer
22. Heçî şêr dilê wî diçê gurçikê
Pisîkê ji nêza du çav bûne zer
[r. 46]
23. Hinek kurd û dubrak û hin sîsiyark
Li birhanê hatin bi çeng û bi per
24. Ji nû kurmik û kêz ji xew radibûn
Ku hasil giha Mûsilê sed keder
25. Digirtin demûşa kelaşê mirî
Digel mêş û mîro digel zîvûzer
26. Heçî şêx li gunda dibûn muşterî
Mela çûn melatî hetanî Keper
27. Heçî haciyê me diçin ber pezî
Tewil da şevînê heta bû seher
28. Heçî sofîyê me bi nextê keçan
Zikê xwe tejî kir bi mislê ceher

29. Heçî wa'izê me weke korekî
Bi şev nêv civatê ku rehjê fener
30. Heçî seyyidê me ticaret kirin
Bi qaçaxî hatin girêdane ker
31. Ji van her dibin em zena qencyê
Wekî ev nebin yar û eynel mefer
32. Wekî ev wehan e j'sedî nîn e yek
Ku dunya ji qelbê xwe bavêje der
33. Eva rehetullah li van cahila
'Eceb nîn e zirzir bikin şubhê ker
34. Digel vê yekê em dibê hun hemî
Herîsê dinê ne wecih bû seker
35. Belê halbûkî em ji wan zêdetir
Dilê xwe j'dinê re dîkin musteqer
36. Sebeb vê yekê ku me nîn e 'emel
Guhê wan di we'zê de bû summ û kerr
37. Gelo qey negotî Resûlê kerîm
'Eleyhî-sşelatu bi'eddîlmeder¹⁶³
38. “Serê her gunaha ye hubba dinê ”
Li dostê xwe dunya dikê her geder
39. Hebe tu li dunya xerîbî weten
Weya rêwiyê ku dikê rehguzer
40. Dinê kuprî ye têve derbas bibe
Qe ava nekin ya kesî mu'teber
[r. 47]
41. Belê şûvek e başe bo wê dinê
Bitemrêne wê tu bi qencyyê her
42. Te neb'hîstî Peyxemberê ummetê
Hesîrek hebû rokî raze li ser
43. Îmamê 'Umer dît ku fetlê hesîr

¹⁶³ Bi qasî baranê, selat li serê bin. Li vê derê di metnê de peyva “meder” hatiye nivîsîn. Ku ev peyv “meter” be, tê me'neya “baranê”. Êdî bi xeletî wisa hatiye nivîsîn an jî me'neyeke din heye em vê baş nizanin.

Di laşê ewî de xuya bûn eser

44. ‘Umer pur giriyy û digo ya hebîb
Te ez sohtim û pêtê daye ceger
45. Dinêrim li Kisra û wek Qeyserî
Evan dînbetalê cihê wan seqer
46. Li ser doşekê dîbû çox û qedîf
Dirûnin vexwarin şerab û şeker
47. Emir ger hebê bo te yek doşekî
Emê çêbikin da tu rûnê li ser
48. Tu wî efzel û çêtirê ‘alemê
Tu wî ku pesin bêhisab û qeder
49. Dema ku bihîstî ‘eleyhîssalam
Şeker wî şikand gotiyê ya ‘Umer
50. Tu negrî eger min bivê ku çiya
Ji bo min bibin zêr dibin zêrê zer
51. Dinê ger bi hêja perê mêşekî
Li cem Xaliqê ‘erş û Ferş û beşer
52. Qe ned’da ji wê wî bi yek kafîrî
Tu tişteke welew qasî misqalê zer
53. Gelo qey te navê ku dunya betal
Ji bo wan bibê mesken û musteqer
54. Ji bo me hebê cenneta baqî ye
Me lezzet herê wî cihê bê keder
55. Gelo qey Nebiyyê me dunya heband
Weya wan sehabbiyyê sahib huner?
56. Weya Malik û Şafî ‘ û Ehmedî
Henîfî nebû guh li zêr û zeger
57. Gelo em li pey wan çira nameşin?
Weya bêmejî ne me vala ye ser
58. Weyan jî ‘eqîda me nuqsan e kêr
Ruyê dînê me bû beş û hem kever
[r. 48]

59. Nekir min fedî wey gidî min çi dî!
Ji mala xwe ez hatime vê sefer
60. Heta ku j'dinê min xwe jê naskirî
Xelas kir me 'umrê xwe ev çend qeder
61. Belê ew nepoşman e dîsa kesê
Ji nîvê riya xwe dema ku veger
62. Dinê wek hewiyy e ji bo axretê
Tu kîjanê bigrê heval kirye der
63. Ji vê mes'elê va du rê jê diçin
Yekî rast û pîs e yekî çep guzer
64. Yekî ce'de ye yek şevîla çiya
Yekî tarî yek rehniyy û qozeqer
65. Bi keyfa xwe yî her du rê l'ber te ne
Diçê yek buhuştê diçê yek seqer
66. Xwezî me b'ewî ku ji vê gotinê
Bikê guh de cotek guharê gewher
67. Heta rabê rûnê bikin zengezeng
Li al û mirariyy û zer guhê zer
68. Xuda tu bi heqqê Kelamê xwe kê
Bi 'erş û bi Lewhê bi sirra qeder
69. Ji vê xefletê min tu hişyar bike
Ku her hîkmetê te li min kin eser
70. Xuda min hifîz ke ji dunya genî
Ewa tole û sa li ser qal û şer
71. Bixefrêne gunhê me gel da û bav
Digel her musulman hemî ser te ser
72. Di herdu dina de me keyfxweş bike
Ji agir me êmin bike ba digel
73. Ziman pur dirêj e **Sîracê** heqîr
Siyah e ewî qelb û bilcumle qer
74. Eva ez bi gunhê xwe iqrar dikim
Me qencî nekîr yek dem û yek sefer

75. Belê min heye husnûzennek tamam
Bi Rebbê xwe pušta xwe da sexr û ber
76. Dilê min bi rehma te bê hed xweş e
Ku em kirne Islam ne başqe ji der
[r. 49]
77. Di pey vê şelat û selamê gelek
Bi qasî çiya û giya û we ber
78. Bi qasî tijîbûna erd û sema
Bi qasî tijîbûna her behr û ber
79. Ji hev qet nebin ser şefî'ê me bin
Digel al û eşhabiyê mu'teber

25

Gulan - 4 – 1374 (Mld. 1955)

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

Remel - · - - / - · - - / - · -

1. Ehlê fezlê çûn û qet yek jê nema
Çeyrî bê 'esl û we pîsê bi'esil
2. Qet nebêje 'esl û fêslê min ev e
'Eslê her kes ev e ya kir dev û dil
3. Hem digel vê hemdulillah nesebam
Bi Ebîbekrê Sidîq ve diwesil¹⁶⁴
4. Ger bi 'eslî hin gihabane Xudê
Şubhê Qabîl ku ji Adem ra necil
5. Hem Ebû Cehl û kurê Nûhê nebî
Dê biban ehlê Xudê ê bêmisil
6. Ê wekî 'Emmar û Selman û Bilal
Nedibûn ehlê kerem ehlê fezil
7. Lê belê her kes bi teqwaya Xudê
Digihê baxê buhušta wî ji dil
8. Ekremê we l'cem Xuda teqwatirê
We ye belkî ne bi 'esl û ne nesil

¹⁶⁴ Ev jêrenota ku niha em ê binivîsin ji aliyê helbestvan ve hatiye nivîsîn. Jêrenot bi vî rengî ye: Ev her sê beyt tercûmekirina qesîda Umer îbni-l werdî, ewa serê wê ev e (e'tezel zikrul eġanî wel ġezel).
والغزل الأغاني ذكر اعتزل. 'Erebiya wê jî bi vî rengî ye:

9. Nîn e fezla 'Ereba ser 'Ecema
Ne bi teqwaya Xudê ba mil û hil
10. Hun tamam cumle ji Adem welidîn
Da bizan Ademî wî ax e 'esil
11. Ê mutî' qenc e ji 'ebdê Hebeşî
Wer ne bed ger çi Qureyşê bê fesil
12. Nîn e fexra kes bi hestiyyê rizî
Lê belê ew fexr e ê xalî ji gîl
13. Kesê fexra xwe bikê b'laşê mirî
Şubhê çavê korî dagirtî ji kil
[r. 50]
14. Ger bibêjê çi ye teqwa ev e lo
Ew e pêk bînê çiya hatî neqil
15. Eynî şer'ê bikê her weqt û zeman
Dî fî'al û di hewal û di qîwal
16. Çi di emr û çi di nehyê wî de bê
Qet nekê kêmiyy û zêde qasî zil
17. Ne ku ew 'ilmê tu pê nakê 'emel
Ne ku tûrê kutûba hildê li mil
18. Ne ku teşbîh û ne wek şaş û riha
Ku bi wan re nebê qet çavê te şil
19. Heykela resmê melik nabê melik
'Abidê xalî çi qîmet bi şekil
20. Heq te'ala nanerê l'şeklê kesî
Lêbelê meyze dikê l'fî'l û li dil
21. Çi kesê ku bi 'emel pêş nekevê
Bi neseb nagihê dam nabirê hil
22. Xweziya me b'wî kesî jêre hebê
'Emelek wî vedê ser teqn û wehil
23. Ya Îlahî bide **Sîrac** kesekî
Wî şiyar kê ji xewê şubhê nemil

Mefa 'ilun fe 'ûlun mefa 'ilun fe 'ûlun

Hezec · - - - / · - - / · - - - / · - -

1. Ji ehlê zemanê xwe bibe dûr bi hişyarî
Neçe nîv civata wan neyar in weke marî
2. Hemî xeflet û lehw û tinaz û seb û kizb in
Tu jî dê wekî wan bê çi qa'îl çi guhdarî
3. Nebêje me xem nîn e we ger ku herim ba wan
Bi lingê xwe ve tê daleqandin mî yû karî
4. Here nik heddada ku dikin çingeçinga xwe
Muheqqeq birûskê agirî bên te sed carî
5. Civata zemanê me gelek pîstir e j'korî
Ji wê her çirawîskek dibê mezrebek narî
6. Wekî ku civatê baş nebin tu here çolê
Tu rûne l'civata hikmet û sin'etê Barî
7. Hene kurmik û kêzik giya û nebat û ber
Tefekkur bike her yek mijûlin bi yek zarî
[r. 51]
8. Bi teqdîs û tehlîlî te'ala heleq girtin
Ketin cezbe û hâlê bi nal û bi zarzarî
9. Belê ehlê vî wextî ketin xefleta dunya
Dî emrê Xudayê xwe hemî bûne sersarî
10. Çikû 'umrê xwe tev wan bi heywên re bûrandin
Ji heywên jî 'elmîn teb'etê ku neguhdarî
11. Ji rojê şixul zanin ji şêvê dizanin xew
Ji havînê germ û hem zivistan sirr û sarî
12. Çi zanin ku roj dunya ye şev axreta baqî
Niha ger nebînê cih siba wê kevê tarî
13. Zivistan e ev dunya dina dî kû havîn e
Li vê ger nekê cotî li wê nîn e yek parî
14. Zivistanê tovê xwe tu bavêje şûva baş
Ku havîn werê da dagirê çal û 'embarî

15. Bizan ev dinê pûç e ne bû cih ji bo keskî
Ji bo wê dina dî deyne vî rukn û dîwarî
16. Bi cih bêne emrê wî birev tu ji ber nehyê
Bi rehma Ewî re her bike dostiyy û yarî
17. Eger bo te heval bê bila tev bibin dijmin
Dî nav holika 'esker qumandar û serdarî
18. **Sîraco** de ka bes ke di vê meclisa şîrîn
Te sohtim di vê sohbet bi lêvên şeker barî

27

Nîsan - 12 – 1375 (Mld. 1956)

Mefa 'ilun fe 'ûlun mefa 'ilun fe 'ûlun

Hezec · - - - - / · - - - / · - - - - / · - - -

1. Ya Reb ji rehm û fezlê her ji te hêvîkar im
Zanim ku ez neqenc im bi gazî yû bi zar im
2. Efwê bide me Rehma lê ez ketim belayê
Dunya û nefs û şeytan çawa bi wan bikarim
3. Dijmin li min bûyin kom tev Rustem û 'egîd in
Bi şûr û top û mayîn ez bêçek im neçar im
4. Mertalê hîfzê bid min digel tanga yeqînî
Da xwe ji wan bistrênim di pişt şûr û dîwar im
5. Wellahî ya Îlahî Tu nebê pişt û heval
Li ber wan pur zeî'f im wek hilm û wek buxar im
6. Lêbelê her dibêjim (Îyyake Neste'înû)¹⁶⁵
Weqtê hevalê min bê ez betlekî xedar im
[r. 52]
7. Ya Reb Te çekirim hem di min de nefs û şeytan
Terkîb kirin di laşê ji wan re ez qerar im
8. Hem ez danîm dinê de dijwar e wek tenûrê
Çawa bikim tebatê ger Tu newê hewarim
9. Em jevre kirne dijmin ka kî bi kî dikarê
Bi cuz'ek ixtiyarî Te ez bi wan siparim

¹⁶⁵ Di sûretê fatîhayê de qismekî ayeta 5an e. Me'neya wê ev e: Em, tenê ji te alîkariyê dixwazin.

10. Cuz'ê me wek zilamek bê çek herê berazî
Mertal nebê 'inayet ka fêde ixtiyar im
11. Madem te çêkirin em quwwet bide me wek wan
Da pîs bikim le'înî li nefsa hêç suwarim
12. Ger bi nezaniya min ber bikevê xusarî
Bi fezlê zîvirêne ber bide feyd û karim
13. Ya Reb bi cahê Ehmed ser bê şelat û rehmet
Sîraceddîn 'efû ke Te gotî ez Ğeffar im

28

Nîsan - 29 – 1379 (Mld. 1960)

Mustef'ilun fe'ûlun mustef'ilun fe'ûlun
Munserih - - . - / . - - / - - . - / . - -

1. Her kes heye heqqek lê kes nagihê heqqê xwe
Me heq berda dîkin em tîştê ne laiqê xwe
2. Heqqê 'alim 'emel bû belê gihaye cahil
Heqqê hâkim 'edalet belê gihaye gafil
3. Selm e heqqê musluman belê giha kuffara
Înşaf heqqê kesê heq belê giha neyara
4. Eqil heqqê kesê pîr belê giha ciwana
Merdî heqqê kesê tîr belê giha xezana
5. Selah e heqqê dewlet belê gihaye millet
Tedbîr e heqqê malxwê belê gihaye hermet
6. Îta' e heqqê Me'bûd belê gihaye 'ebda
Dijmintî heqqê şeytan belê giha dubenda
7. We'z e heqqê 'emeldar belê gihaye fasiq
Serdarî heqqê eşref belê giha nelaiq
8. Şeref heqqê 'ilim bû belê gihaye meyla
Kurtan e heqqê bergîl belê giha kihêla
9. Sual heqqê feqîra belê gihaye ağa
Zuhd e heqqê meşâix belê giha nesâga
10. Tifaq e heqqê mu'min belê giha ecanîb
Bawerî heqqê rasta belê gihaye kazîb

[r. 53]

11. Huzun heqqê 'uşşaq belê gihaye **Sîrac**
Rehma Xudê heqqê heq bilanî bighê muhtac

29

Êlûn - 27 – 1376 (Mld. 1957)

Mefa 'îlun fe 'ûlun mefa 'îlun fe 'ûlun

Hezec · - - - / · - - / · - - - / · - -

1. Ê bêjê rastî tehl e yeqîn ew bêfikir bû
Dilgirtî titm¹⁶⁶ e te'ma devê wî wek jehir bû
2. Bi xwe ez ketme jehrî anîn ji bo me hingiv
Dûbn we şaf û taze wekî ziravê mir bû
3. Ava zelal û şîrîn her sebebê heyatê
Binhêre tawiyê jar li cem wî qurreder bû
4. De ka rabe gula sor bêne ji bo kerê reş
Qîmet ji wê re nîn e ne kerbeşa kever bû
5. Ma qey zeman xerab e em jî dîkin şikayet
Ev roj û şev zeman in kî dî ji cih bi der bû
6. Binhêre ew kesê ku li wîna roj digêrê
Ne ku roj çûye ava lê ew ji 'eqî der bû
7. Tu cara xwedyê xêra nebû pepûkê dêra
Belê dana me daî ne j'bo Xudê bi vir bû
8. Xêra bike li masî welew masî nizanê
Belê Xuda dizanê heyfa te wê li ser bû
9. Xeyrker ew e dibêjê me da bo wechê Xaliq
Me navên şîkr û minnet ji sail bêxeber bû
10. Belê xêrê me daim betal in bêcezan e
Bi minnet em didin rû feqîr lew dil keser bû
11. Felek xayîn e pûç e çî soz bi kê re daye
Ku dom bikê li ser wan her dem bi wê re şer bû
12. Felek çerx e digêrê di bin emrê Xudê de
Ji bo nef'a wucûdê lê hiş me ney li ser bû

¹⁶⁶ Tîştê tehl, te'mnexweş, zilindar.

13. Li me we‘ zê dikê her da derkevin ji xeflet
Dewran e dom tunîn e ê zanê mu‘teber bû
14. Dunya ne ku betal e lê em betalê wê ne
Xebatê tê de nakin destê me lew sifir bû
15. Ka rabe lê binêre çi xweş bazar û sûk e
Dukkan hemî tejî ne “fatore” tev li ser bû
16. Tuccar di wê de digrin feydê ji destê petron
Serê sedî hezarî rast mal ne ser bi ser bû
[r. 54]
17. Lê muflisê ‘emel boş tembel û vala berdoş
Nekir feyda bi du qroş jê çû xwelî li ser bû
18. Ê gotî nabê dil pîr her dem can û cuwan e
Ku her tiştî dixwazê ji hikmet bê xeber bû
19. Dil e serdarê laşî bi wî tev jan û jîn in
Hemî e‘da da‘îf in dema dil bê huner bû
20. Çiqqa eḫwal bi wî ne çi şîn û şahiyê te
Bi te‘sîra ewî laş xwedî ah û keser bû
21. Li tîbbê ka binêre dema deqqa tê qelbî
Ketin kêmbûnî va laş ji ber wî kor û ker bû
22. Hewasê zahir û xef dibin pîr û nekarî
Dema dil ketye neqsê bi cir bû geh bi ser bû
23. Çavê me ê çîlê ne li ber roja heqîqet
Qeṭ nahilin ji lew şev daim me tê de ger bû
24. Ê diz dibêjê her kes diz e bi dilxerabî
‘Ettar ji hûremûrê xwe re xwedî xeber bû
25. Gotin hekîmê zana te ev dinê çilo dît
Got wek dilê xwe min dît ne kê m û zêdetir bû
26. Behlûl digotî ez çûm bo dîtina cehennem
Va cehnemek sir û sar bê pêtiyy û şerer bû
27. Belê çiqqa kesê ku tanîn ku bikne tê de
Agir ji paşîla wî pêket bi firrefir bû
28. Em ehlê vî zemanî bûne neyarê waqî‘

Lewra heqîqetê cih nemaye bê meqer bû

29. Meyzê kumê heqîqet qetya ji kulmê baîl
Ji bo sola xwe bû diz rastî hukum li ser bû
30. Bi rotka tecrûba xwe me nasîn derdê wextî
Loqman ji wî re ma ka **Sîrac** her ev keder bû

30

Teşrînî ewwel - 1 – 1382 (Mld. 1961)

Mefa 'ilun mefa 'ilun fe 'ûlun

Hezec · - - - / · - - - / · - - -

1. Dilo hey ez bi qurbano tû rabe
Xewa vê xefletê gelkî xerab e
2. Li te roj derketî hat hewlê nîro
Nedî min rengê razana te îro
3. Şuxul ger tevde çûn ser 'emelê xwe
Sivik rabe bişo dest û devê xwe
[r. 55]
4. Binêr her kes dikê bo xwe xebatê
Ji bo paşî bibînê ew felatê
5. Kesê îro neçênê darê zehmet
Siba kengî dixwê fêkiyyê ni'met
6. Bi va te'na heta min dil şiyar kir
Ji xew rabû bi nalînê hewar kir
7. Digot wey ax çima kirme ez hişyar
Çi xew xweş bû nexasim subhê adar
8. Çi xewnek xweş niha min bo xwe dîtî
De ka te'bîr bike tiştê me dîtî
9. Didî go min va ez çûme 'erdek
Hemî dehl û rez buxçe bi carek
10. Dîbû milkê me ew der tev seranser
Li ser ehlê ewê tev bûme serwer
11. Me qesr û koçik û rez tede danîn
Jin û zarok gelek min tede anîn

12. Were xezn û defînê zêr û zîvî
Ji me ‘ebd û ğulama dikne hêvî
13. Were van nî‘metê nayên hesêbê
Bi hejmar û nivîsana kitêbê
14. Ji dil gava me ev gotin bihîstin
Bi tilbêr¹⁶⁷ re me her du lêv digeztin
15. Me jêre got dilo jaro melûlo
Nexirhe tû bi vê xewnê kuro lo
16. Yeqîn xewna te dîtî xewnerojk e
Xeyal in tên ji nefsa ta¹⁶⁸ kunojk e
17. Dilo qey min negotî zû tû rabe
Newalê kûr cihê xewnê xirab e
18. Bizan tişta te dîtî bes xeyal e
Xwe kir têba li te dunya betal e
19. Vekirye wî li ber te sînema xwe
Bi te daye vexwarin îçkiya xwe
20. Tû jî girtî bi xefk û teliy û davik
Xera kir wî li te eywan û malik
21. Gelek rabûn û ev xewna te dîtin
Ji te bêhtir li ser wê kul didîtin
[r. 56]
22. Di deşta wê de tî bûn mane heyran
Li wan bû gul dema wan dîtî leylan
23. Heçî merzâl¹⁶⁹ bixapa çûn û hey çûn
Heçî qencê Xudê jê gelkî dûr bûn
24. Bi ‘umrê pur Nebî Nûh têde rabû
Suleyman jî hukumdarê cina bû
25. Sikender şerq û xerbê wî hejandin
Binêre vê dinê cumle tefandin
26. Hemî tî berda ser avê û anîn

¹⁶⁷ Dostik.

¹⁶⁸ Li vê derê peya “ta” hatiye bikaranîn. Me’neya wê “te ya” ye. Yanî ji bedêla bêje “nefsa te ya kunojk”, gotiye “nefsa ta kunojk”.

¹⁶⁹ Tişta ku bi şeklê xwe xweşik, lê di heqîqetê de nexweşik.

Ji wî tişteke ne' elmîn û nezanîn

27. Ji wî mûyek nedîtin rubh û feyda
Di piştî merheba wî j'wa bixeyda
28. Ji geyrî ta'etê rebbê mezintir
Ew e bo te didê feydê bike pur
29. Şev û rojê bi ya emrê ewî ke
Ji ber nehyê birev nefsê berî ke
30. Ji dergahê rica ke belkî Rehman
Xelat kê te û **Sîracî** bi ridwan

31

Teşrînî ewwel – 1382 (Mld. 1963)

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

Remel – · – – / – · – – / – · – – / – · –

1. Ğafil in em di dinê de bêhisab û xeber in
Mislê heywanê berî her tim û daîm digerin
2. Lewra her dem me mereq şehwet û rizq û xwarin in
Kî bi kê karibê dê pirça kesê kê m vedirin
3. Hin wekî rovî bi xap û fen û hîlan dimeşin
Hin peza mêşin revandin di sibatê de gur in
4. Hin wekî marê di tûr in digezin nas û nenas
Hin bi dev fehş in wekî kûçikê xelqê didirin
5. Hin sipîk in bi melaqî ji hevalê xwe dixwun
Hin bexîl in wek qijakê berûwa bin kevir in
6. Hin wekî mêşê herîs in dibezin şûna demûş
Hin di'elmêne girîşa cehiyê şubhê ker in
7. Hin wekî mişk û beraz in kû dibin palê xusar
Hin wekî cûbirrî rahê derematan dibirin
8. Hin coyê avê dîkin kun bûne kêvjalê xweher
Hin ji hinka re dibin tajî xezala digirin
[r. 57]
9. Hin wekî hespê te nîn in jêre êmintiyy û bext
Hin wekî teryikê masî ku ji nêza dimirin

10. Hin bi mislê gornebaşî vedikin gor û mezel
Bi nepuşkê xwe yê tûj teşbihê tevr û bivir in
11. Hin wekî marmij û zîro dimijin xuna hinan
Hin tilûrê bil ji fexrê xwe li kes nazewirin
12. Hin wekî masiyê zikreş ne li xêra tû heval
Hin wekî bûm û pepûk xirbe mekan û meqer in
13. Hin wekî kurdê kilaşa kû bi burhanê gihan
Hin kewan nêçîr dikin cinsê xwe tovê xwexur in
14. Her wuha her yek bi yek fê'lekî pur pîs û nebaş
Hate nasîn çikû ewna ne li teb'ê beşer in
15. Gerçî zahir dimeşin şubhê beşer ser du piyan
Lê di batin çarepî ne di şefa caniwêr in
16. Çimkû her yek muttesif bû siffetê heywanekî
Têde cih girtiye her du bi yeqîn cot û fer in
17. Wê di heşrê de mesix bin şubhê heywanê xwe ew
Da ceza mislê 'emel bête kirin hev bigirin
18. Ma çira insan bi insan hatî navdanî gelo?
Lew kû jevre bi muhebbet her heval û hogir in
19. Cumleê insan ji Hewwa û ji Adem welidîn
Hem ji Adem xuluqî Hewwa li hev pişt û ber in
20. Ê ji wan wê wekî wan bê ew bi şekl û bi siffet
Kû ji hemcinsê xwe re her demê hem xêr û şer in
21. Hingî pîroz e li wî navê (benî ademiyan)
Her ji bo xatirê wî çerx û felek lev digerin
22. Ew bi şeklê xwe yê wek navê Muhemmed xuluqîn
Şubhê hewyan siffetê ew bi mesix naguherin
23. Her ew in ê kû selama divedin ser wan melek
Hem kerem kin vê buhuştê kû qesrê zîv û zer in
24. Her ew in dîna cemala heq xuda mift û belaş
Ta ebed nêv efw û ridwana Îlahê Ekber in
25. Sed hezar bar selewat ser Ehmed û şehba bibin
Ey **Sîrac** meş ke li pey wan ji te re mehder kirin

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

[r. 58]

1. Gelî ehlê 'ilim rabin li ser hevdû hemî bigrîn
Zemanê me giha axir ji lew bûye xerîb ev dîn
2. 'Ilim rûmet nema lewra 'ilimdara nema qîmet
Yeqîn xwedyê mirî kor e li dermanê ewî pirsîn
3. Binêrin qîmetê 'alim ne hêja muṭrib û qewwal
Civatê wan lev û lêv in kû dîtin dane hev mizgîn
4. Belê 'alim eger carek bidê we'zê di cum'ê de
Li ber we'zê hemî razan dibînin wî melayê dîn
5. Dibêjin îşê min zehf e sivik xutbê bixwîne tû
Weza'ê min li çolê ne çiqra reht im gelek gëmgîn
6. De ka zûka limêj kin ma we em kirne di vê hebsê
Nema îdî werim cum'ê bi vî rengî dîkin nefrîn
7. Wekî paşî selam dane limêjê garis û pij bû
Xwezî bi wî derkevê hêja nexwendî ji fatihê amîn
8. (Di cam'ê de munafiq her wekî masî di torê de)
Di heqqê wî de ev hatî hedîsa nazik û şîrîn
9. Şuxul nîn e j'betalî kom dibin ber hêt û dîwara
Belê îş tev ketin ser hev dema nişkê ve hatî in
10. Mela rabû ezan xwendî ji wê mabûn 'ecêbmayî
Digotin cumû'e nabê ma çira halo dikê qîrîn
11. Wekî qewmê Nebî Nûh lêbelê şeytan teliyyê xwe
Kirin nivê guhê wan de ji lew banga wî nebhîstin
12. Mela jî şubhê Harûnî digo ya Reb ji geyrê xwe
Nikarim ez bi kes me b'heq cuda ke j'qewmê bê zanîn
13. Heta kengî em ê halo bi hevdû mubtela bin lew
Eva bûrî ji sedî yek bû heme mîsal me pê anîn
14. Hedîsa efxerê 'alem dibê (axir zeman kû hat
Bila her kes tenê bo xwe du'açî bê) bibê gëmgîn

15. **Sîrac** bê şek me ew çax e ji kes re em nebin devjev
Belê nefse tenê geh şad bikin geh ser girêdin şîn

33

Teşrînî ewwel - 2 – 1372 (Mld. 1953)

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Eger kû yek bibê îro musulmanî me bû zêde
Çikû rojîgir in em tev dîkin mêja di weqtê de
2. Zekata xwe didin ger rê hebê dê em biçin heccê
Tû car malê heram naxûn me kir tewbe ji vir pê de
[r. 59]
3. Çîqa ef' al û 'îşê pîs qe nakin em dizî qeşbî
Musulmanî ev e kû em di vî weqtî ketin tê de
4. Ez ê bêjim de ka kin ke zimanê qasî yek gazê
Di behsa ehlê vî weqtî me îro yek qelem lê da
5. Ji qehrê ehlê vî weqtî me dengê nalê çû 'erşan
Jihê¹⁷⁰ çiqqa tû bişdênê kevan zimmên dikê zêde
6. Çikû dîzê digot ez tev ji zêr im min biha nîn e
Belê heskê digot gerham li binka zêr di dîzê de
7. Weha ne eglebê ehlê zemanê me bi dev zêr in
Belê batin xûya paxir me zanîbû di fi' lê de
8. Limêja tû dikê wek dîk du sê nikla li 'erdê dê
Bi rojê re dikê subhê dikê nîvro di 'esrê de
9. Limêjê pa tû çi limêj î ne tirs û heybet û fikr e
Diçin aş û diçin bajar dixûm bo zû di secdê de
10. Ji geyrî wê xeletbûna di fatîha û tehyatê
Ji geyrî peşkê rîxa lê di kozê yan di govê de
11. Eva rastî şerî'et vê qebûl nakê dibêjê min
Ez ê halo bikim rehma Xudê zehf e di heşrê de
12. Çira ger tû nemêjîni ewê kehra kû nû zayî
Dibêjê maye bê firşik tebat na'ê d'nivînê de

¹⁷⁰ Tayê ku pê kevan tê jidandin.

13. De ka kahrê tû bispêre Ewî rezzaqê mexlûqan
Bila wê kehrikê bê şîr xwedî kê da bibin zêde
14. Çira halet te naşuxlê zeqif¹⁷¹ bê yan kû şêpil¹⁷² bê
Wekî toq û pirik¹⁷³ kê bin xwe naberde bi 'erdê de
15. Çikû her tişteki şertek he ye heşta şuxul çêbê
Li 'erda bej gemî kê dît kû herkîbû bi ce' dê de
16. Ji bona şuxlê dunyayê weha puspor û pur pêş e
Ji bo ferz û huqûqê heq weke korê di çolê de
17. Erê rojîgir e emma di heqqê xwarin û avê
Belê geyb û seb û kizbê şev û rojê dikê zêde
18. Çikû meqsed ev e rojî hemî e'za bi rojî bin
Ne kû zad û vexwarin bes weke ê kû di hebsê de
19. Ev e men'ê bikê e'za ji çiqqa tiştê bê şer'î
Dev û dest û guh û çavan bihêlê wan di qeydê de
20. Eva ev rojiya halo ji bo te dê bibê sûreh
Nikarin qet bi te şeytan heşta salek di kelhê de
[r. 60]
21. Em ê behsa zekatê kin çi derxist malxweyê bêje
Ji xeyrî wê 'efara kû pekî gava kû ba lê da
22. Weya wek wê peza dayî melayê gund û cotarî
Dixum sûndê tû nadê ya nebê 'eybek di navê de
23. Muheqqeq yan şel û şehî e weya bapêş û bê purt e
Eceb çawa te ev zanî kû naçêrê di kozê de
24. Di pênc weqtê limêjê de dixwênê ettehiyyatû
Kû teyyîbatû lillahî te berdabû bi avê de
25. Çi bêjim macera dûr e bipirse tû j'pîrfisorî
Filîmê wan me tev girtin xuya mîqrob di camê de
26. Dikin kara rêya heccê ew ê nanê xwe hazir kin
Ji wan mizgeft du sê gav in limêj nakin tu car tê de
27. Eger xeyrek ketî 'erdê hinek bêjin çira nakê

¹⁷¹ Wextê ku gêsîna zêde kete nava axê de, erdê nakole.

¹⁷² Wextê ku gêsîna hindik dikeve nava axê de û sere sere axê dikole.

¹⁷³ Di hêletê de perçeyê ku şûrek û birkeyê peve dike û nahêle leq bibe.

Dibêjê wey heram bê min qurûş nîn e di mistê de

28. Nizanê kû çî ye meqsûd ji çûna beyt û îhramê
Ew e 'efwa gunahan yan li wir yan jî di malê de
29. Dema çû paşî hatî ve gelek çil roj li bîrê bê
Ji nû tem' û bexîlî wek berê çêbûn deha zêde
30. 'Eceb çawa te ew qa' zêr didan şofêr û sellahan
Niha kû yek qurûş nadê evê xeyra ketî rê de
31. Xuya ye ev heca halo ji bo keyf û ticaret bû
Weya da kû werê gotin bi hecca tû çûyî têde
32. Heramî rast eger naxwê nikarê tû biçê dizyê
Çira naxwe peza havi¹⁷⁴ te hiştî hem di ruflê de
33. Tû yê nexta keçê bêjê bilanê çar hezar bin lê
Herin bêjin birayê wê me 'îş nîn e ji vir pê de
34. Dixwê malê yetîman qet tû natirsê ji vê gunhê
Belê ger kû seyyîd bê qet newêrê dest bikê zêde
35. Hinek jê dê bibin muxtar dema girtî serana¹⁷⁵ gund
Dibêjê yek qurûşî jê qe nakim tevî malê de
36. Ev e yanî heram naxwê weke ê kû dizîbû pez
Digotî goştî naxwum lê me parî kir di avê de
37. Neqencî ger tû nakê lê bi çavan tû zinêkar î
Dinêrê kûr li ya fîstan kû berdabû bi bejnê de
38. Tûyê kara rêya şêx kê çî qa' libsê xweşik ber kê
Tûyê gulk û gula benda wilo berdê bi hespê de
[r. 61]
39. Ji vir behsa hevala tê bibê ev kes çîqa kund e
Çira bedlek girênadê di îrşad û di eydê da
40. Dikin qesda derê tobê jin û mêr tev de pêk hatin
Di şêklê dawet û seyran ew ê meş kin di yek rê da
41. Ji wir ve dê yekê bêjê şevê dî mame bêxwarin
Yekê bêjê nivîn peyda nebû kû rakevim tê da
42. Heta malê evê behsê dikin gava gihan xênî

¹⁷⁴ Peza havi: Peza ku ji keriyê xwe diveqete û diçe nav keriyekî dî û xwediyê wî keriyê wê dixwe.

¹⁷⁵ Di salên destpêka Komara Tirkiyê de cureyekî bacê. Ev bace ji aliyê muxtêr ve dihate standin.

Mera heft car heram bê tewbe qet nayê di bîrê da

43. Muruwwet bext û însaf û yeqîn winda bû vî wextî
Heçî karê bi yê dî wî lepek hilda şe‘il¹⁷⁶ lê da
44. Li hev em tev dikin keysê ji bo tiştê bi kir¹⁷⁷ çêbê
Çîqa roj hin diçê ser wê weke kaya di berfê da
45. Eger kû ez niha bêjim hefta salek dî vî çaxî
Hema ya min tenê dîtî xilas nakim di meşqê¹⁷⁸ da
46. Çî bêjim ka zîlamê baş kû guhdarê xwe bû îro
Çîkû ev wext gurê har e dinan kir zengelorê da
47. Musulmanî weke wê berxika mêşin şivanê wê
Yeqîn pix kir xewa şîrîn ji çar alî de gur lê da
48. Ji wan yek nefis û yek şeytan hevalê pîs û dunya ye
Sîraco ker li bor derbas ke lê xenqî di gêrê da

34

Adar - 2 – 1375 (Mld. 1956)

Mefa ‘ilun fe ‘ûlun mefa ‘ilun fe ‘ûlun

Hezec · - - - / · - - / · - - - / · - -

1. Gelo çima hemû kes zêr û pera dixwazê
Hemî ecnasê insan xebat kirin ji bo wan
2. Qet min nedît ji şêx û pîr û ciwan û ‘alim
Ji şahan ta bi gavan ji her xass û ‘ewaman
3. Kû yek hebê nexwazê pera li darê dunya
Kesê pera nexwazê heywan e şîklê insan
4. Çîkû pere per in lew her kes didin firrînê
Pere çeng in ne pirtik insan teyr e ne perwan
5. Sed ax ji bo we para ka hûn he ne li kû dê
Xwezyam bi wî kesî bê bibînê şalgihê wan
6. Dera hebin perê wê ava bê xan xuda ye
Cihê nebin di wê de wîrane koxê hewyan
7. Pere ji bo kesê pîs nav û şeref didêrin

¹⁷⁶ Bişid, sert, hişk.

¹⁷⁷ Kîn, nefret.

¹⁷⁸ ‘Elimandina nivîsa xweşik.

Ji bo lal û nezana dibin zanîn û 'ezman
[r. 62]

8. Ji bona bêzirava wekî çek û sîlah in
Çi xweş çox û qedîf in ji bo geda û 'uryan
9. Belê her kes bi şeklek divê hebin perê wî
Galib ji bo dunya pîs kêr in ji bona xêran
10. Zahid he ne viroker divin nebin perê wan
Ê rast ew e bixwazê pera ji bo feqîran
11. Eger pere nebana ma kî diçû cîhadê
Hecc û zekat û merdî bi wan têtin girêdan
12. Hatem bi merdiya xwe ji agirî emîn bû
Dewlet serê pere w mal bûye mesel di dewran
13. Nêzik e kû feqîrî bibê kufur hebîb (s.e.w.) got
Bêrûmet û hesûd in çikû nîn in perê wan
14. Pere hûn wek zemên in geh roj e geh şevê tar
Hin we didin bi dojê hin bi bihişt û rudwan
15. Yan hûn wekî buzot in hina bi xwe disojin
Didin feydê ji bo hin ji bo nan û zivistan
16. (Malê şaliş çî baş e ji bo zîlamê şaliş)
Ferza bi wî eda kê bibê kefilê heyran
17. Belê ka ew kesê jîr pera bikê turumpêl
Bi wan bighê geracê sivik derbas kê bêlan
18. Barê wa yî risasî nehilgirê kû paşî
Rû û tenişt û piştênîyê wan bêne dagdan
19. Ya Reb pera dixwazê ji bo islahê halî
Sîrac li darê dunya li wê dunyayê îman

35

Temûz -1- 1379 (Mld. 1960)

Mefa 'îlun fe 'ûlun mefa 'îlun fe 'ûlun

Hezec · — — — / · — — / · — — — / · — —

1. Enes j'ewladê Malik ji bo me kir riwayet
Tiştê kû gotî 'erdê ewî kirî hikayet

2. Gotî her roj dibakê ev 'erd bide kelaman
Gelî ewladê Adem li xwe bikin himayet
3. Tû l'ser piştam diçê tê paşî te cih zikê min
Gunha dikê li ser min di min de bê heraqet
4. Li ser min tû dikê ken di min de tê b'girî bê
Li ser min pur bi keyfî di min de her xecalet
5. Li ser min mêl didê hev di min de poşiman bê
Hêram xwarî li ser min dixun te kurm û faret
[r. 63]
6. Dikê hîla li ser min dibê pîs tû di zikê min
Li ser min tû bi me'dî di min de ka yeşaset
7. Di nûrhê de d'meşê tû li ser min lê di min de
Dirûnê tû di tarî xuya nakê zîya'et
8. Li nav kom û civatan li ser min tû digêrhê
Di min de tê tenê bê qe nîn e xal û xalet
9. Gelî dost û hevalan bibin hişyar ji xeflet
Nebûrênin 'umur her di vê şefe w cehalet
10. Xuda bînin di bîrê ji wî rehîmê bixwazin
He ye hêvî 'efû kê **Sîrac** û ehlê ta'et

36

Hezîran -8-1373 (Mld. 1954)

Mefa 'ilun fe 'ûlun mefa 'ilun fe 'ûlun

Hezec · - - - / · - - / · - - - / · - -

1. Ev tişteki muhîmm e guh bidê da bizanê
'Elqeme rawiyê wê ye'nî kurê Şefwanî
2. Gotiye gotî Ehmed kurê Yehya delalo
Merfû'e ev hedîs hat ji Seyyîdê 'Ednanî
3. Gotî xwe bistirênin ji salê dozdeh roja
Ew roj dibin sitarê malê dîkin talanî
4. Got wî me ya hebîbî wana jî bo me bêje
Da kû di wan de em qet dernekevin ji xanî
5. Got dozdehê muherrem heyva sefer dehê wê
Çardê rebî'ê ewwel dozdehê rebî'ê sanî

6. Hejde cemadê ula dozdê cemadê axîr
Dozdê receb ji şe‘ban şazde di bîrê danî
7. Tû ji remezanê çardeh bigre diduwê şewwal
Zîlqe‘de dozdehê wê heştê zîlhîcce kanî
8. Neqlê eger bixwazê binhêr heyatê heywan
Cildê ewwel di behsa Welîd kurê Merwanî
9. **Sîrac** e naqilê wî ya reb bidê wî gufran
Şelat li ser Muḥemmed ji ê li banî banî

37

Adar -7- 1375 (Mld. 1956)

Mustef‘ilun mustef‘ilun

Recez ---·-/----·-

1. Dunya xweş e dîn pê re bê
Dostî xweş e vîn pê re bê
Sağî xweş e jîn pê re bê
Qet nîn e feydaya tenê
[r. 64]
2. Sohbet xweş e çay pê re bê
Seyran kû selwa pê re bê
Bênder xweş e ba pê re bê
Wer guh de guft û gotinê
3. Merdî xweş e mal pê re bê
Rêwî kû heval pê re bê
Ḥakim kû kopal pê re bê
Yek çav e yek wek dîtinê
4. ‘Ilim ‘emeldar pê re bê
Wa‘iz kû guhdar pê re bê
Malê kû gemxwar pê re bê
Çi b’kim ji wê êka tenê
5. Mêrî pirranî pê re bê
Avayî kehnî pê re bê
Malxwê kebanî pê re bê
Yek bo ‘emel yek gotinê
6. Sultan siyaset pê re bê
Serdar seca‘et pê re bê
Millet îta‘et pê re bê

Da b'jin bi qîmetgirtinê

7. Ta'et bila îxlas hebê
Ennas bila lîbas hebê
Darbîr bilanî das hebê
Tiştêk li rê naçê tenê
8. Heddad bila fehim hebê
Katib bila qelem hebê
Cotarî gayî cem hebê
Da kû nekin dest geztinê
9. 'Emel niyyet da pê re bê
Limêj zekat da pê re bê
Îman fihêti pê re bê
Da dûr kevê tû j'sotinê
10. Dewran bila çerxek hebê
Her qelbekî derdek hebê
Sîrac tenê 'îşqek hebê
Bêşek he ye ne b'xwestinê
[r. 65]
11. Roj û şevan wê pê re bê
Bêserf û tesrîf pê re bê
Cih girtiye jê navebê
Ne b'sûştin û maliştinê

38

Eylûl -2-1378 (Mld. 1959)

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. Ğemhilgiro ka rabe zû barê geman bes hilgire
Barê giran barê te ye te j'nav heval û hogira
2. Te divê gema berhev bikê ya kû tu ca keskî nekir
Ka kê kul û gem kirne yek bar kir li fil û qatira
3. Ne j'hakima ne j'padîşah ne j'dewlemend û bêkesa
Ê kû bibê min dane hev wellahî zanim kû vir e
4. Ka çi j'gemê bêhtir he ye derket ji mîat û ulûf
Çi j'wî girantir tê kişan kû j'ton û qentar mestir e
5. Kîlometir mîl û berîd nakit mesahet vê gemê
Coğrafiya hey'et muhendîs heyîrîn lê mexber e

6. Çi j'wê dirêjtir kî bihîst gaz û metir nakin qiyas
Kê dîtiye dewr û zeman ka rabe tû bêje j'mi re
7. Behra gemê nîn in kefê bapor li wê nayên qefê
Çola ewê deşta mezin cîb nagihêtin ogir e
8. Sarox û peykê Êrisî gel ê Emîrka fir bidin
Qeṭ nagihin ewc û medar gem kewkebek hê dûrtir e
9. Çavê mino gemhilgiro dil bernede malê xeman
Bêqîmet in polê kula me' den ji qelbê paxir e
10. Heta tû wan berhev bikê paşî tûwê palê xusar
Dellal mezad nakin bikir nînin di sûka tacira
11. Ya qenc ew e wer guh de min şêrê gema ehlî neke
Sayîs neke zarokê dil ev şêrekî Adem dir e
12. Her ser çemê sebra zelal dagir kun¹⁷⁹ û cêr û zerik
Gem xenzîrand¹⁸⁰ lew da hinav diwarekî sor agir e
13. Derman bike deḡla dila tu bide ta sebra 'esîl
Da qut nekê rayê riḡan û sunbula gem cûbir e
14. Bajarê laş asê bike tu b'ordiya sebr û tebat
Lê partiya gem înkîlab ser şahê dil êxin were
15. Çavê mino îman he ye tû b'xaliqê xêr û şerî
Roja ezel danî qeder tişta bibê wî çêkire
16. Bêfeyde te qeḡr û keser madem te îman pê hebê
Em tev de mulk in bo Xuda tişta bikê nîn in çire
[r. 66]
17. Çêkir qeder da em nekin ḡuznê li ser tişta çûyî
Hem keyf û bitrî ser ewa hatî bi dest çiqqa pur e
18. Hişyar be **Sîrac** (yef' elullahû)¹⁸¹ çiqqa tiştê bivê
(Qul len yusîbna)¹⁸² ḡeyrî Ya Ellah nivîsandî j'me re

¹⁷⁹ 'Eyarê heywanan ku mirov avê dixiyê.

¹⁸⁰ Ev tê wê me'neyê ku mirov darekî bavêje nav êgir de û baş neşewite û bibe xisar mirov jê feydê nebîne.

¹⁸¹ Xwudê, wê bike.

¹⁸² Mûsîbet bi ser me de nayên.

Teşrînî ewwel -2- 1378 (Mld. 1959)

Mefa 'ilun fe 'ûlun mefa 'ilun fe 'ûlun

Hezec · - - - - / · - - - / · - - - - / · - - -

1. Nexirxe b' 'umrê pur çiqqa kû 'umur zehf e
Şev û roj ji du alî didîn ber kil û tehf a
2. Dibizdênin û badênin 'umur geh ev û geh ev
Gelo ka ji wan kî wê sitênê ji te heyfa
3. Li dunya gelek rabûn 'umur çûn hezarî lê
Bi germa xwe vê rojê helandî wekî berfa
4. Pepûko çiqqa dom kê gelek tû herê notî
Mirin kû werê bîrê dikê tû ji wê xewfa
5. Te nebhîstî kû qencê berê gotine canim
Felek wek siha darê diçê pêşî û xelfa
6. Gelo ma li ser kê dom kirî çerxê dewranê
Ji bil ta 'etê xaliq ji wî kê kirî nehf a
7. Bizane heçî insan weke puşekî şîn e
Ji nû hişk dibê hefta kû paşî dibê qerfa
8. Ji nû wê rizê vêce bibê ax di tirbê de
Çi ya kû kirî defter kiriye bi her herfa
9. Ji bo xaliqê xwe tû bike qency û xêrê
Dî darê beqa'ê tê kevê nî' met û keyfa
10. Tû daw û dehêl hilke bibe rênçberê axret
Qe texîr neke tewbê bi sîn û şef û sewfa
11. Di 'erda Xudê de cotê emrê wî pêk bîne
Belê haletê e 'za' neke şêpil û zeqfa
12. Xeta rast bibe hem tû seda¹⁸³ xwe bibe sêrî
Ji tovê xwe zîwanê¹⁸⁴ biçin da bibê sirfa
13. Kû şîn bû şukur ke tû ji wê xêr û wê bêrê
Negîrhe bi zadê pur nebêje çiqqa zehf e

¹⁸³ Di cotkariyê de cihê ku ga lê têne veğerandin.

¹⁸⁴ Giyayekî ku di nava dexlê de çêdibe û zerarê didiyê.

14. Îlahî tereqtu babe eknanî 'efwîkum¹⁸⁵
Te'emmeltu weşlen la meredde ewwela weqfa¹⁸⁶

15. **Sîracî** xelat ke texliya wî tû îmza ke
Bi fezlê muhur ke hem qebûl ke ji wî zerfa
[r. 67]

40

Ab¹⁸⁷ - 24-1373 (Mld. 1954)

Mefa 'ilun fe 'ûlun mefa 'ilun fe 'ûlun

Hezec · - - - / · - - / · - - - / · - -

1. Ehlê civata hâzir bêjin hemî tamamî
Li ser nebî selewat hebin 'eled dewamî¹⁸⁸
2. Di gel al û şehaban ehlê beyta muṭehher
Hawar bikin Muḥemmed ew nebiyyê tîhamî
3. Hêja ne em ji lewre bo me tû bûyî qasid
Zanim Xuda tû rêkir bo ummiyan îmam î
4. Gerçî ze'îf û jar in geda û bêxwedî ne
Madem tû yî serê me em bûn ji qencê 'amî
5. Bi Quran û bi hîkmet şekir barî ji lêvan
Şahê Kîsra û Qeyser bo te kirin gulamî
6. Dijmin te bêqedir bûn lewre kû çûne dozex
Dosta yeqîn xelas kê ji agir û zêlamî
7. Ye qîn dikim bi dil ez bi dev me kirye îqrar
Nîn in ji geyrê heq reb tû qasidê selam î
8. Navê te avê heywan dilê mirî dikê sag
Mehderkerê neqencan di roja îzdîhamê
9. Em rûreş in li ser me guneh gemam û mij bûn
Nûra şefa'eta te rû kir ji 'eyn û camê
10. Xuda ceza bidê te ji ber me ve hebîbî
Bi wê tiştê tû ehl î tû Mehmûd'ul meqam î
11. Bêhed şelat li ser te digel selam bibarin

¹⁸⁵ Xudayê min, min li deriyên 'efûkirinê xist.

¹⁸⁶ Min bînavber û dûr û dirêj lê temaşe kir.

¹⁸⁷ Tebağ.

¹⁸⁸ Bi berdewamî.

Her şevê î n û cum‘a ya Seyyîdê Enam î

12. Qedrê te pur bulund e xweska bi ê tû dîtî
Bêje **Sîracê** dîkul çi b‘kim ji vî heyamî

41

Adar - 6 – 1375 (Mld. 1956)

Mefa ‘ilun mefa ‘ilun mefa ‘ilun mefa ‘ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Çîqa zehf in ji bo min yar heta ku min hebîtin pirç
Dibin dostê me mişk û mar kedî bûn ev gur û ev hirç
2. Dema dîtî ji min feyda li mala min hero ‘eyda
Dibêjin merheba seyda bezîn desta bi maç û mirç
3. Digotî min tu pur baş î ji min re qenc î qerdaş î
Xelet bûm nedgo tî şaş î çikû ew hingî mayî birç
4. Bi dev xêrxwaz û dilsoj in beşaş in wek gul û roj in
Hinek xaltîk û amojin bi dil port hilgîrin go zirç
[r. 68]
5. Dema ez ketme yek tengî bikim hawar bide dengî
Me nîne dost bi yek rengî ji nûka feyde nakê nirç
6. Me got yek ev çilo çêbû berê dostê me pur çêbû
Gelo yan dostî birçî bû niha lew dar me bû go qirç
7. Heştî min xwe j‘ewa nas kir ji nû piçkî kepîlas¹⁸⁹ kir
Sîrac ‘umrê xwe derbas kir di destê wan de nabê ‘irç¹⁹⁰

42

Adar - 25 – 1375 (Mld. 1956)

Mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun

Recez - - · - - / - - · - - / - - · - - / - - · - -

1. Sed ah û nalîn tîn ji min roj û şevan wek bilbula
Dûr im ji yara nazenîn ka tê gelo buxçê gula
2. Mehrûm ji dîdarê ketim tev gurbet û nîv hîcret im
Destê ji ta û ba vebû wer bûm di nav behra kula
3. Xwezyê dixwazim her zeman car dî bibînim dilberan

¹⁸⁹ Kepîlaskirin bi me‘neya xwe ‘edilandinê ye.

¹⁹⁰ Êsîr.

Çi b'kim xwezî bê feyde ye lew ya dila nayê mila

4. Wê horiya teb'et melek awir ji wan çavê belek
Berdane dil lew dînî bûm aqil nema qasî zila
5. Ger çi ku weşlet ey heval min bo xwe zanî pur mecal
Lê dîtina çava yeqîn xweş bûye qinyata dila
6. Min soz li ber dilber hebê heştta muwek ruh min hebê
Hubba ewê qet bernedim ger min bikin qeydûlela
7. Çiqqa ji min 'ernê bikê cewr û eziyet pur bikê
Bêhtir me 'îşq ê zêde bê e'l'dilberê bûme bela
8. 'Îşqa me çengê rastî ye pur şiddet û bê sistî ye
J'parsa wisalê nagirim çiqqa cewab bê bo me la
9. Çiqqa ji min razî nebê her dem li min gâzibe bê
Nakim li wê yek i'tiraz ew nîn e şeyx nabim mela
10. Şeyx û mela her hal ev e geh mu'teriz ev geh ev e
Şeyxê bibê ew munkir e ew dê bibê şeyx muzlîla
11. Sofî dibêjin ev mela nekê 'emel 'ilmê 'ula
Feqî dibê sofî ji dîn tiştekan nizanê cahil a
12. Seyyid dibê Kurmanc bi şûr bûne musulman hê ji dûr
Kurmanc dibê hun xeyyibîn naçin li pê xeyril mela
13. Hacı dibêjin têr e ev wî malheram e neçne dev
Ew di yê haciyê li mal kêr bû, bû dasa sunbula
14. Kalo dibê xorta we kir çiqqa neqencî her we kir
Xorto dibê hew ji te hat nûka dibê Ellah ela
[r. 69]
15. Bav go kurê min 'asî ye bo min dikê bê emriya
Kur derketî j'qalka berû go dev ewê fehşa qula
16. Hasil ji mêr heştta jinan tu j'padişah heştta şivan
Bigre tu nabîne du kes pev xweş bi ne'em yan bila
17. Her kes dibê ez ho me ez dirha reşik go bûme rez
Dîk go ez im bazê sipî çeng lev kutan deng çû mila
18. Jiyo dimalin herdu dest ser çeliyê pur xêşt û zîşt
Gotî çi nerm û nazik in ê gij ew in çelyê çila

19. Herkes me dî j' 'eybê xwe kor l' 'eybê heval dûrbîn e zor
Gêsin di çavê xwe nedît dît şûjina çavê j'kila
20. Nav ji dîdar mestîr nebê qewl ji 'emel bêhtir nebê
Dê ez li kû peyda bikim lê qalikek bêkakil a
21. Ka 'alimê 'ilmê Xuda mîratxwerê Muħemmeda (s.e.w.)
Icb û hesed jêre nebê b'ilmê şerîf her 'amil e?
22. Kanî gelo şêxê neqî j' 'îşqa dinê her mutteqî
Wek hev bibin cem zêr û ber mislê 'Umer pîne l'cila?
23. Ka sofîyê şafî zelal zîkrê Xudê daîm li bal
Nefsê bikê êsîr û jar hingî eva ew 'aqil a?
[r. 70]
24. Ka hacıyê dil ke'be bê her dem bi se'y û newbe bê
Tem' û buxul j'qelbî derên j'dunya weşên dest û mila?
25. Ka seyyidê tahîr nezîf bigrê riya ceddê şerîf
Bê şer'î jê zahir nebin da ew kevê nav fazîla?
26. Ka cahilê mutî' û jîr we'za di guh de bînê bîr
Xwe b'kê şerîkê 'alima j'dîn fêhm bikê çend mes'ela?
27. Ka ixtiyarê kal bûyî l' 'umrê çuyî poşman bûyî
Ta'et şev û roj zêde kê meşgûl nebê b'yek şagîla?
28. Ka xortê can î tobedar xwezgîniyê horê kubar
Xweş 'eskerê Hesen Huseyn nîv cennet û bagê gula?
29. Ka dewlemendê şakirî malê helal lê êwirî¹⁹¹
Bavê feqîr û sêwiya bûne buhuştî qabila?
30. Ka ew feqîrê sebrêdar qanî' bibê b'rizqê ku xwar
Heşîr bibê nêv enbiya 'ibret ku bigrê j'bulbula?
31. Lê tev me dîn yarê dinê ev girtin berdan ya dinê
Her sinfekî j'seda yek pur e b'vê faniyê nebê muhtela
32. Me j'geyrî 'uşşaqê hebîb ê rast nedîtin dil kebîb
Bes ew dibin razî ji yar çendan ku cergan pelpela
[r. 71]
33. 'Îşqa giran wek findekî çiqqa ku êgir pêve kî
Bêhtir didê şewq û beraq me'lûm li nik ehlê dila

¹⁹¹ Topkirin, civandin.

34. Xwezya bi wî va çendî roz bo kes nebêtin kî ne doz
Xwe j'her kesî kêmtir bibîn ta wergirê cawê şila
35. Belkî Xuda wî 'ef bikê nav şafiya wî şef bikê
Rehmê li wî kê bêhesêb ew hakekek pur 'adil a
36. Ya Reb bi heqqê enbiya me l'ber derî ev hêvî ye
Razî bibe j' **Sîracedîn** halê ewî pur muşkul a
37. Wî ta 'etê mewla nekir xeyb û seba 'ebdê te kir
J'bîra kirin 'eybîn di xew bûran 'umur sebehlela
38. Çumkû te rehmîet pur hebû tem'a me jê lê zêde bû
Şabaş û hemd her bo te bin te j'vê nekir me j'gafila
39. Bêhed şelat û pur selam ser Ehmedê şêrînkela
Bid hem li sehb û alê wî me b'wan 'efû ke ox bila

43¹⁹²

Temûz – 18-1377 (Mld. 1958)

Mefa 'lîun mefa 'lîun fe 'ûlun

Hezec · - - - / · - - - / · - - -

1. Der îd donya kesê bî gem nebaşed
Weger başed benî-adem nebaşed¹⁹³
2. Yekî ra ba gemê îd darê fanî
Kê ûra meylê an donya nebaşed¹⁹⁴
3. Dêger gerq est şuda ez fikrê 'oqba
Kê îd donya çê der fêkreş nebaşed¹⁹⁵
[r. 72]
4. Yekî ez 'êşqê Leylî suxtê-can bûd
Dêger ez mêy xebardarî nebaşed¹⁹⁶
5. Yekî çon bulbulê şeyda bênalend
Yekî çon sûr golî 'ehdî nebaşed¹⁹⁷
6. Yekî ba can û ten merdê Xoda est

¹⁹² Ev helbest bi Farisî ye. Di jêrenotan de me Kurdiya wê daye.

¹⁹³ Li vê dinyayê kesî bêgem nîn e/Heke hebê jî ew benî adam nîn e

¹⁹⁴ Yek di vê xema vê dinyaya fanî de ye/Ku ew kes meyl û daxwaz ji dinyaya din çinîne

¹⁹⁵ Yekî di daim di fikra 'uqbayê de gerq bûye/Û guh nade û nafikire ku ev دنیا çî ye

¹⁹⁶ Yek ji 'êşqa Leylayê canê xwe dişewitîne/Yekî di ew qas meyl vexwariye ku xebere wî jê nîne

¹⁹⁷ Yek weke bulbulê Şeyda dinale/Yekî di weke sorgulê çî ehda wî nîne

Yekî donya perest ‘eqlî nebaşed¹⁹⁸

7. Ser an kez do ‘alem bî xeber bûm
Kê ora karî ba yekra nebaşed¹⁹⁹
8. Bimezguman ki o ferzendeyî adem
Ki çendan sûretê heywan nebaşed²⁰⁰
9. Welî danî kê û ba xûyê heywan
Mîyanê în o an ferqî nebaşed²⁰¹
10. Boro ender cehanî ba êmtêhaneş
Gêrêftarem xelaf ender nebaşed²⁰²
11. Benî-adem kê şah û wer gêda baş
Kesî ra ez geman xalî nebaşed²⁰³
12. **Sîraceddîn** gemet bêsiyar lîkin
Bê coş gem aferîn dadet nebaşed²⁰⁴

44²⁰⁵

Kanuni Sanî 14 – 1375 (Mld. 1956)

Fa ‘ilatun fa ‘ilatun fa ‘ilatun fa ‘ilun

Remel – · – – / – · – – / – · – – / – · –

1. Êy berader hîç ber în donya nêmi'efkendê dêl
Çon nêmiyabî ez an yêk lehzê'î asûdê del²⁰⁶
2. Çon to ba malet mîbayed borûn xêdmet konî
Rûz o şeb der hêfzê wêy kêy mîpesended şadê dêl²⁰⁷
3. Wer feqîr est hewceyî nanî o madem der teleb
Nîz der do haletê bîçarê o pabendê dêl²⁰⁸

¹⁹⁸ Yek bi can û dil ji bo Xwedê ye/Yek dinyaperest e û hiş û aqil nîn e

¹⁹⁹ Yek bi can û dil ji bo Xwedê ye/Yek dinyaperest e û hiş û aqil nîn e

²⁰⁰ Tu guman neke ku ew zarokê Adem e/Lê bi rastî ew ne sûretê heywana ye jî

²⁰¹ Lê tu dizanî ku ev bi exlaqê heywaniye xwe/Di neqeba vê û wê de ferq nîn e

²⁰² Bi îmtîhana Xwedê tê bikevê nav cihanê/Wê demê tê bizanî ku giriftariya min karek xilaf nîn e

²⁰³ Insan şah û kole be jî/Ti kes ji derd û xema ne xalî ye

²⁰⁴ Ey **sîraceddîn** derd û xemên te gelekî zêde ne/Ji xeynî kesê ku gem afirandine ti kes nagihê hewara te

²⁰⁵ Ev helbest bi Farisî ye. Di jêrenotan de me Kurdiya wê daye.

²⁰⁶ Ey bira qet ti carî dilê xwe bi vê dinyayê ve xweş neke/Ji ber ku tu ê qet demekê jî ji vê asûdetî û rihetiyê nebînî

²⁰⁷ Dibe tu bi malê xwe xizmetê bikî, ma heger roj û şevan di hilgirtin/Û parastina malê dinê de tê bikoşî dil kengî yê şad be

²⁰⁸ Yê ku feqîr e û hewceyê nanekî ye/Û tim di teleb û xwestinê de ye û her wesa bêçare û dil giriftar e

4. Hiç nêmiyabed ez î n rûhê cehan şah ver gêda
Bî goman der moddetê omreş goşad o sadê dêl²⁰⁹
5. Hêyfê ger bînem şodê î n omrê ezîz mî bogzerend
Ez bêbîkarî bêxaned çon kesî bîxordê dêl²¹⁰
6. Danê'î ez omrê to kêy mîsetanîd ba esrar
Parê'î ez dorr o le'il êsm berîneş serdê dêl²¹¹
7. To meber goman kê êmrûzem derûnî nîstem
Ta ebed şayed kê ferda sextê şod çon mordê dêl²¹²
8. Karî ba andarî baqî cennetê mewla ye soxen
Pes deran mîyabî rahet ta ebed exradê dêl²¹³
[r. 73]
9. Êy sêraceddîn bê goftaret to çon merdî hekîm
Pes emel kerd o neşod çon merdoman ferxondê dêl²¹⁴
10. Rûz o şeb êy xodaya ber gonahem efwî kon
Adetî şahan bîbexşend kû lêra şod zêndêdêl²¹⁵

45²¹⁶

Adar - 1 – 1372 (Mîd. 1953)

Mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. Ey hemşerim dinle beni söyleyelim dinle beni
Çok dertliyim dinle beni dinle beni dinle beni²¹⁷
2. Dünyayı gezdim çok zaman hiç bulmadım birden aman
Çogaldı bu fisk û ziyan dinle beni dinle beni²¹⁸

²⁰⁹ Di vê cîhanê ne şah û ne jî geda qet çi tiştî nebin/Bêguman di emrê xwe de baş ew e ku dilgeş û dilfireh be

²¹⁰ Ey heyf û mixabin e gawa dibînim ev umrê ezîz bû betlane xusar dibe/Û hin kes li bîkariyê wek kesên ku dilê wan bîxîret e dikenin

²¹¹ Ma her qas lahî û lavan bikî qet dikarî zerreyek umrê xwe zêde bikî/Bes dibe em umr wek parek jî durr le'lê nas bikin

²¹² Tu wisa nefikire ku ez jî îroyî me û derûnî nînim/Heya ebed jî dê wisa bim belkî dibe sibê ez bimirim

²¹³ Te kar bi wê heye! Û gotina ku dimîne cenneta mewla ye/Bes tu ê tê de heya ebedê bi dilek agah û zaniyar bijî

²¹⁴ Ey seraceddîn tu di gotarên xwe de wek mirovek hekîm û zaniyar î/Bes te emel kir û nebûyî wek mirovên dilşad

²¹⁵ Ey xwedê tu roj û şevan li gunehên min bibore/Ew adeta şahan e ku kesên zindîdil bibexşînin

²¹⁶ Ev helbest bi Tirkî ye. Me di jêrenotan de Kurdiya wê nivîsiye.

²¹⁷ Ey hemşeriyê min guhdarî bike li min, em bêjin guhdarî ke li min/Derdê min pir in guhdarî bike li min guhdarî bike li min

²¹⁸ Ez gelekî li dinyayê geriyan lê min ti derman nedî/Fitne û fesaî zêde bû guhdarî bike li min

3. Her nerde gitsem görmişem tem‘ ve hesed can pişmişem
.....²¹⁹ dünya demişem dinle beni dinle beni²²⁰
4. Hayrane kaldım kuş gibi sevdasız bir sarhoş gibi
Bir hane maldan boş gibi dinle beni dinle beni²²¹
5. Hadsiz günahım var aman ben bilirim Allah’ıma
Rahmin doludur ta sema dinle beni dinle beni²²²
6. Ben kıymetsiz bir köleyim ona ibadet eyleyim
İtaesinden dinleyim dinle beni dinle beni²²³
7. Dünya içinden hiç hayır miskal-i zerre var mıdır?
Yok gayrı Allah’ın zikir dinle beni dinle beni²²⁴
[r. 74]
8. Er bir şere bir çağırın bin arkadaş var, ver hayır
İse bulunmaz basabır dinle beni dinle beni²²⁵
9. Ukba işinden gafiliz dünyada biz göz açığız
Bu nushemi tutar mınız dinle beni dinle beni²²⁶
10. Dünyaya sevmez sevdiğim dibin denizden balığım
Bol suda doymaz yüreğim dinle beni dinle beni²²⁷
11. Dayan sen Hüda’nın kapısı et tevbe hiç isyanısı
Etmem ki ölmek gelmesi dinle beni dinle beni²²⁸
12. Kılma hesabsız ah û zar **Sîrac Ataç** Allah Geffar
Sen kölesin o handekar dinle beni dinle beni²²⁹

²¹⁹ Ev der nehatiye xwendin.

²²⁰ Ez bi kû ve çûme, her fitne û hesed min dît/.....dinya guhdarî bike li min

²²¹ Ez wekî çûkekî heyram mam, wekî serxweşekî bê sewda/Wekî xaniyekî bê milk û mal guhdarî bike li min

²²² Bi nave Xudê gunehên min pir in ez vê dizanim/Rehma zêde ye heta asîmana guhdarî bike li min

²²³ Ez koleyekî bêqedr im, ez ê jêre îbadetan bikim/Ez ê jêre îtaatê bikim, guhdarî bike li min

²²⁴ Qey li vê dinyayê bi zerreyekê xêr heye/Ji zikrê Xudê pê ve, guhdarî bike li min

²²⁵ Ku ji bo şer bê bi hezaran miştirî hene/Lê ji bo xêrê kes nîn e guhdarî bike li min

²²⁶ Ji karê uqbayê re em xafil in û cave me ji bo dinyayê vekirî ne/Hûn gun bidin vê şîreta min guhdarî bike li min

²²⁷ Ez ji dinyayê hez nakim, masiyê di binê behrê de me/Ez ji ava zêde têr nabim guhdarî bike li min

²²⁸ Li ber deriyê Xudê tobe bike û li ber xwe bide/Ez isyan nakim lewra mirin heye guhdarî bike li min

²²⁹ **Sîrac Ataç**, bêhesab neke ax û nalîn, Xudê Xeffar e/Tu kole yî ew Xwedî ye, guhdarî bike li min

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

Recez - - . - / - - . - / - - . - / - - . -

1. **Sîrac** li bor derbas bike ker da nexenqê li vî çemî
Fetl û guropîl bûn girav kesî nedît wey vê demê
2. Borek²³⁰ neqam û bêbinî rêzan li wî wunda dibin
Destê xwe tê de med kesî madem şikestî ev gemî
3. Qetî tû nebêj soba ye ev borê çîqa kûr qam dikê
B'xwe d'gerihê aşê nezan soba dixenqîn her demê
[r. 75]
4. Xwe j'ehlê vî weqtî veçin piştê emanet med kesî
Piştî û berê wan nîn e qetî cumle me dîtî dem demê
5. Zahir melaq in wek pîsik batin wekî marê di tûr
Binhêr devê wan cennet e dil bû bizotê cehnemê
6. Dostaniya ehlê zemên wek ya qulung û rovî ye
Xweska bi yê hîla li yê dîtîr bikê yek dirhemê
7. Tiştê ji kes bawer neke heta 'emel zahir nebê
('ilmulyeqîn²³¹ 'eynulyeqîn²³²) dûr in ji hev nik ademî
8. Vî weqtî ger yek serbiard bêtê niha hatim ji êş
Ger ez ji wî bawer nekim ser min nexwe qehr û xemê
9. Rast û durustî nav he ye wek sîmirê wî nîn e laş
Ev hewl û meydan ya vira ye vî çemî kir lemlemê
10. Me' dê virê rengê kulê çiqqa geş e sor û spî
Binhêre rastî wek biha hatî biraştin zer hemî
11. Xayînî û vir bûne cot teşbîhê başok hatî çok
Lew rastî û êmintî çûn sorî ne hin hin jî memê
12. Vî wextî xweska min bi bûm kotek tenê mabê heval
Wî dil ji kes nabê birîn her dem dijî bê melhemê

²³⁰ Çem, best.

²³¹ Zanîna ilmî.

²³² Zanîna bi dîtîne.

[r. 76]

47

Kanûna Ewil 11- 1375 (Mld. 1956)

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Eger mamik werê daran bibêjin çi l'dinê pîs e
Ez ê bêjim weke golê li garanê jina pîs e
2. Eger bêjin çi ye bêhna kelaş û serkil û rîxa
Ez ê bêjim ewe me'd û mirûsdanê jina pîs e
3. Eger bêjin çi ye ya kû zilamî sağ dikê jehrî
Ez ê bêjim ji lêv û dev xebirdanê jina pîs e
4. Eger bêjin çi ye ya şubhê tûrê gû l'milê mêrik
Ez ê bêjim difûrê bêhn bi tevdanê jina pîs e
5. Eger bêjin çi ye ya kû 'eşîra pev didê kuştin
Ez ê bêjim kû herdû kirne nîşanê jina pîs e
6. Eger bêjin çi ye ya ew nekin wêran fena nîn e
Ez ê bêjim di emsala de min zanî jina pîs e
7. Eger bêjin çi ye ya exlebê ehlê cehennem de
Ez ê bêjim Resûlî got kû çû banî jina pîs e
8. Eger bêjin çi ye ya kû hemildarin bi şeytana
Ez ê bêjim kifiş bûne dema zanî jina pîs e
9. Eger bêjin çi ye ya kû di qûna wan de aqlê wan
Ez ê bêjim ji 'işqa mêr û tevdanê jina pîs e
10. Eger bêjin çi ye ya kû ji mêra têr nebê carek
Ez ê bêjim ew e yanî ji bûkanî jina pîs e
11. Eger bêjin çi ye ya 'eqî û dîn wê her zeman kêr e
Ez ê bêjim hedîs min dît bi Quranê jina pîs e
12. Eger bêjin çi ye ya yek neqencî qet ji bîr naçê
Ez ê bêjim dused qencî li bîr nanî jina pîs e
13. Eger bêjin çi ye ya kû serê bavê nizimtir kir
Ez ê bêjim dema çûn mehkemê banî jina pîs e
14. Eger bêjin çi ye ya soz bi kes re qet nebîr sêrî

- Ez ê bêjim gelek girhan bi peymanê jina pîs e
15. Eger bêjin çi ye ya devbiken şubhê ziha jev kir
Ez ê bêjim bi dil jehra silêmanî jina pîs e
 16. Eger bêjin çi ye masî ji şûva sor derêxistî
Ez ê bêjim girêda mêr bi dîwanî jina pîs e
 17. Eger bêjin çi ye ger hej te kê wê te bixwê ger ne
Ez ê bêjim te wunda kir bi dilmanî jina pîs e
[r. 77]
 18. Eger bêjin çi ye ya wek werîsê rîx di qirka mêr
Ez ê bêjim ku sê car hat grêdanî jina pîs e
 19. Eger bêjin çi ye dost in ji bona dasimê mel'ûn
Ez ê bêjim di malê de xefik danî jina pîs e
 20. Eger bêjin çi ye ya kû bi Nûh û Lût re xayîn bûn
Ez ê bêjim kufur bûn piştî îmanê jina pîs e
 21. Eger bêjin çi ye şeytên xiyamet tev firofî wan
Ez ê bêjim digotin wey he qurbanê jina pîs e
 22. Eger bêjin çi ye ya kû bi mekrê wan çiya hûr bûn
Ez ê bêjim binêre tu li Furqanê jina pîs e
 23. Eger bêjin çi ye Harût û Marût seb ewan girtî
Ez ê bêjim nema firdin biçin banî jina pîs e
 24. Eger bêjin çi ye ya bêheyaî bûye nîşanek
Ez ê bêjim ji bona dunya wêranî jina pîs e
 25. Eger bêjin çi ye ya hê pepik çar in²³³ di avê de
Ez ê bêjim dixenqê rastî dernanî jina pîs e
 26. Eger bêjin çi ye ya qet 'esil bo wan xuya nabê
Ez ê bêjim ewan 'esl e çiya zanê jina pîs e
 27. Eger bêjin çi ye ya gotine wê 'alema me'kûs
Ez ê bêjim çiqatîst 'eksê mêranî jina pîs e
 28. Eger bêjin çi ye çiqqa mezin bûbê serî vala
Ez ê bêjim di bûkanî û pîranî jina pîs e
 29. Eger bêjin çi ye ya parsuwa wan xwahr gelek hişk e

²³³ Pepik çar in: Ev biwêjeke Kurdî ye û me'neya wê ev e: Ku kesek di rewşeke xirab de jî be û hê jî ji xwe qayîl be. Me'neya qurebûnê jî tê de heye.

Ez ê bêjim nebê rast geyrî berdanê jina pîs e

30. Eger bêjin çi ye ya kû dido rûnin li cem hevdu
Ez ê bêjim xeberdan şubhê karwanê jina pîs e
31. Eger bêjin çi ye ya pê bişêwre lê neke ya wê
Ez ê bêjim di şêwra wê de poşmanî jina pîs e
32. Eger bêjin çi ye ger vir bikê bo wan guneh nîn e
Ez ê bêjim çikû rastî beha nanî jina pîs e
33. Eger bêjin çi ye ger keyf bikê karê hemî betlan
Ez ê bêjim ewan çekkê li meydanê jina pîs e
34. Eger bêjin çi ye bê wan negerha yek mesel qet'e
Ez ê bêjim çîqa qewmê di dewranê jina pîs e
35. Eger bêjin çi ye Behlûl digo ew kes xwelîser bê
Ez ê bêjim ketî bin emr û iz'anê jina pîs e
[r. 78]
36. Eger bêjin çi ye ya mekr û 'hîle qet xilas nayê
Ez ê bêjim **Sîraco** te j'kû ev zanî jina pîs e

48²³⁴

Şubat-22-1374 (Mld. 1955)

مفاعلٌ فَعِيلٌ (فاعلٌ) مفاعلٌ فَعِيلٌ (فاعلٌ)
Mefa 'ilu fa 'ilun mefa 'ilun fa 'ilun
Hezec · - - - / - - - / · - - - / - - -

بِسْمِ اللَّهِ إِنَّ اللَّهَ هُوَ الرَّحْمَنُ الرَّحِيمُ
235 جميعُ الحمدِ لله في الإبتداءِ والتَّتميمِ

و الصَّلوةُ و السَّلَامُ على خير البرية
236 محمّدٍ والآلِ والأصحابِ و النَّدِيمِ

عدّ النَّباتاتِ والجامداتِ والحيوانِ
237 والرَّطبِ واليابسِ وحرٌّ و برد الاليمِ

والماءِ والنَّارِ و التُّرابِ والهواءِ
238 وبلغمٍ والسُّودا صفرا و الدَّمِ الاليمِ

²³⁴ Ev helbest bi Erebî ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nîşan daye.

²³⁵ Bi navê wî Xudayî ku Rehîm û Rehman e/Hemî hemd û sena di destpêk û dawiyê de jêre ne

²³⁶ Şelat û selam li ser aferîdeyê bixêrtirîn be/Li ser malbata wî, eshab û hevalên wî be

²³⁷ Bi qasî hijmara dar û deviyan riwek û giyayan/Hişk û bi can û sar û germ hemiyan

²³⁸ Av û agir û ax û hewa/Belxem û reş û zer û xwîn

والتَّوَرُّ والظَّلَامِ واللَّيْلِ والنَّهَارِ
ربيعٍ صيفٍ خريفٍ والشتاءِ الصَّمِيمِ²³⁹

والشَّرْقِ والشمَالِ والغَرْبِ والجنوبِ
واليمينِ واليسارِ خلفِ أُمَامٍ يودِيمِ²⁴⁰

والأنجمِ السَّعْيِ والأَيَّامِ والبحارِ
والأَرْضَيْنِ والسَّمَاءِ ذِي البرَجِ والتَّنْظِيمِ²⁴¹

والذَّهْرِ والزَّمانِ والحَقْبِ والقُرُونِ
وساعةٍ وحينٍ أَنْ بغيرِ تَتَمِيمِ²⁴²

والحالِ والمضارِغِ والماضِي والمستَقْبَلِ
بالأَمْسِ والغَدَاةِ والتَّأخِيرِ والتَّقْدِيمِ²⁴³

والبَعْدِ والقُرْبِ والامْيَالِ والبرِيدِ
والفرَسِخِ والمرحَلِ والسَّافِرِ والمَقِيمِ²⁴⁴

والباعِ والذَّراعِ والموزُونِ والمَكِيلِ
والدَّرْهِمِ والمِثْقَالِ والذَّانِقِ يا كَرِيمِ²⁴⁵

والصَّنَاعِ والوَثْقِ والارطالِ والإِمْدَادِ
والأَرْدَبِ والأَقْدَاخِ والحَسَابِ والتَّقْسِيمِ²⁴⁶

والجَمْعِ والضَّرْبِ والمَطْرُوحِ والمَكْسُورِ
وواحدٍ وعَشْرٍ بلا انْتِها يا عَلِيمِ²⁴⁷

والصِّغَرِ والكِبَرِ والنَّقْلَةِ والخَفِيفِ
والْقِصَرِ والطَّوْلِ والتَّنْذِيقِ ثُمَّ التَّضْخِيمِ²⁴⁸

والحَرْفِ والأَلْفَاظِ والخَطِّ والتَّرْتِمِ
والصَّوْتِ والتَّغَرُّدِ والأنِينِ والتَّكْلِيمِ²⁴⁹

والخَطَاةِ والصَّوَابِ والمَرِّ والحُلُوقِ
والمالِحِ الحامِضِ والتَّخْصِيسِ واللَّهْ سِيمِ²⁵⁰

[r. 79]

²³⁹ Ronahî û tarî û şev û roj/Bihar û havîn û payîz û çileyê zivistanê

²⁴⁰ Rojhilat û bakur û rojava û başûr/Rast û çep û paş û pêşiya berdewam

²⁴¹ Heft stêrik û roj û behr/‘Erd û asîmanên xwedî heft birc

²⁴² Heta ku wext, zeman, serdem û sedsal/Se‘et û wext temam nebûyî

²⁴³ Dema niha û fireh û dema bûrî/Duh nîvro û bi derengîxistin û bi pêşdeanîn

²⁴⁴ Dûrbûn û nêzikî meyl û poste/Fersex û merhel rêwî niştecih

²⁴⁵ Bi qelac û çengan pîvandî/Bi elban wezinandin

²⁴⁶ ‘Elb mêzîn ritl îmdad/Erdeb eqdah hesab veqetandin

²⁴⁷ Civandin, lêkdan, metruh/Û yeka bêhidûd û dihe ‘elimê zane

²⁴⁸ Piçûk mezin giranî û sivik/Kurt dirêj lêkolîn û paşî mezinkirin

²⁴⁹ Herf peyv û xet û newa/Deng û çîwçîw û axkîrîn û axivîn

²⁵⁰ Û xeta rast tehl û şîrîn/Û şor û tîrş teksîskîrîn û tehsîm

والزَّيْنِ والشَّيْنِ والحياة والممات
والسَّعْدِ والشَّقَاءِ والنَّعْمَةِ والتَّنْقِيمِ²⁵¹

والكلِّ والبعض والأجزاء والهيولى²⁵²
والفرد والجموع والأعطاء والتسليم

والأديان والأذهان والأبدان والعقول²⁵³
والسماع والدَّليل والقياس يا قديم

عدّ المذاهب والعقائد والمشرب²⁵⁴
واللغة والالحن يا ذالعرِّ يا عظيم

والكتاب والسنة والإجماع والقياس²⁵⁵
والمندوب والمباح والتحليل والتحرير

والفقه والطهارة والصوم والصلاة²⁵⁶
والحج والزكاة ولبس خُفِّ المقيم

والبيع والشراء والربا والدَّيون²⁵⁷
والجبر والحوالة والضمان والغريم

والشركة والحقوق والشفعة والخلطة²⁵⁸
وإحياء الموات والوقف ثم التحكيم

والفرض والوصايا والمهر والقضايا²⁵⁹
والعرس والوليمة والخلعة والتحرير

والقتل والجناية والعقود والقصاص²⁶⁰
والدية والحدود واختلاس الحريم

والغزو والغنيمَةُ والفِيءُ ثم الجزية²⁶¹
والصَّيد والعقيقة والشركة والتقسيم

والحديث النَّاسِخِ والمنسوخ والصَّحيح²⁶²
والمرفوع والمسند والمعضل يا عليم

²⁵¹ Zeyn şîn jiyan û mirin/Dilşadî eşqiyatî nî' met bela

²⁵² Û hemî û hinek û perçe perçe û heyûlî/Kit û pirane û dan û teslîmkirin

²⁵³ Û dîn û hiş û beden û aqîl/Û bihîstin û delîl û qiyas ey kesê Qedîm

²⁵⁴ Bî qasî hijmara mezheb û bawerî û meşreban/Û bî qasî hijmara ziman û besteyan ey mezinê xwedî
'izzet

²⁵⁵ Û kitab û sunnet û îcma' û qiyas/Û mendub û mubah û helalkirin û heramkirin

²⁵⁶ Û fiqh û paqijî û rojî û nimêj/Û hec û zekat û cil û sola kesê muqîm

²⁵⁷ Û firotin û kirîn û faîz û deyn/Hicr û hewale û xerentî

²⁵⁸ Û şîrîkatî û heq û cîrantî û têtîlî/Vejîn û mirin û sekn û hukûmdan

²⁵⁹ Û ferz û wesiyyet û mehr û mesele/Û zewac û ziyafet û berdan û heramkirin

²⁶⁰ Û kuştin û qetilkirin û levhatin û qîsas/Û diyet û hed û xirandin û kuflet

²⁶¹ Û şer û xenîmet û sih û gîşt û bêş/Û nêçîr û qurban û şîrîkatî û levakirin

²⁶² Û hedîs û nasîx û mensûx û şehîh/Û merfu' û musned û muaddel ey yê Zana

والمرسل والغريب والضعيف والموضوع
والمنكر والباطل وما في الاصل عد يم²⁶³

والنفسير والآية والنسخ والمنسوخ
والعبرة والقصص وما في الحكم حكيم²⁶⁴

والوعد والوعيد والإنذار والتبشير
والمشبه والأمر ونهي فعل الذم²⁶⁵

والنحو والأسامي والفعل والحروف
والمفرد والجملة والمعرّب والتّرخيم²⁶⁶

والمصروف والمبني والصفة والحال
والتّركيب والموصول وهاؤ لاء اليتيم²⁶⁷

والصرف والبناء والاصل ثم التّحويل
والمهموز والاجوف والصّحيح والسّقيم²⁶⁸

والغيف المفروق والمقرون والنّاقص
والمثال والمزيد والمعتلّ والسّليم²⁶⁹
[r. 80]

والتّجويد والوقف والوصل والإمالة
والغنة والإخفاء والتّريق والتّفخيم²⁷⁰

والإسهال والإدغام والزّوم واللاظهار
والمذ والقلب والإبدال ثمّ التّشهير²⁷¹

والمنطق والبديع والعروض والبيان
والحرف والأوافق والعد ذى التّنظيم²⁷²

والطبّ والتّشريح والبيطرة والتّشخيص
والبرّذرة والهيئة والحساب والتّعليم²⁷³

والجُغرافيّة والرّياضة والجُفر
والسّيمياء والرّؤيا والكيمياء والتّرخيم²⁷⁴

²⁶³ Ū Muršel ū ġerīb ze ‘īf ū mewzū/Ū munker ū baṭil ū ya ku di ešlê xwe de nîn e

²⁶⁴ Ū tefsîr ū ayet ū nesx ū mensûx/Ū ‘ibret qisseyên qur’anê ū hekîm

²⁶⁵ Ū peyman ū yê ku ehd dike hişyarkirin ū mizgînkirin/Ū yê ku pê tê şibandin ū emir ū qedexekirin ū tevgerên xirab

²⁶⁶ Ū neḥiv ū fi ‘l ū nav ū herf/Ū tekane ū pirane hêmanên hevokê ū texîm

²⁶⁷ Ū mesrûf ū mebnî ū rengdêr ū dema niha/Ū terkîb ū mewşûl ū ev sêwî ū yetîm

²⁶⁸ Ū serf ū bîna ū ya esil ū paşî nûjenkirin/Ū mehmûz ecwef ū sehîh seqîm

²⁶⁹ Ū xeyfuk nefruq ū meqrûn ū qels/Ū mînak ū zêde ū muattel ū saxlem

²⁷⁰ Ū tecwîd ū sekin ū wesil ū îmale/Ū ġunne ū îxfa ū terqîq ū tefxîm

²⁷¹ Ū îshal ū idġam ū rewm ū izhar/Ū med ū qelb ū ibdal ū teşhîm

²⁷² Ū mentiq ū bedî ‘ ū erûz/Ū herf ū sekn ū hijmarên bi rêzê

²⁷³ Ū tîbb ū otopsi ū beytarî ū teşxîs/Ū bezdere ū heyeta insên ū hesab ū perwerdehî

²⁷⁴ Ū coxrafya ū werziş ū cifîr/Ū simya ū xewn ū kîmya ū tewxîm

والسَّحَرِ وَالطَّلَاسِمِ وَالنَّجْمِ وَالطَّبِيعَةِ
275 والفلسفه والحكمة والتَّخْيِيلِ والتَّوْهِيمِ

والعشق والشَّعر والمنظوم والموزون
276 والنثر والألغاز والرَّصد ثمَّ التَّقْوِيمِ

والزَّمَلِ والفَالِ والاحكام والدَّليل
277 والملحمة والطَّالع والرَّقِية للسَّقِيمِ

وعَدَّ ما كان في الأكوان والعوالم
278 مايكون وما كان من صحيح او رميم

يا رَبِّ صَلِّ عَلَيْهِ وَالسَّلَامُ عَلَى
279 مَنْ أَرْسَلَ رَحْمَةً لِلْكَرِيمِ وَاللَّئِيمِ

وَاعْفُ الْهَى لِعَبْدِكَ الْفَقِيرِ الزَّנוْبِ
280 بِحَقِّ مَنْ نَطَقْتُ لِأَجْلِهِ الظُّلُمِ

مَحَمَّدُ أَحْمَدُ وَ مَحْمُودُ حَامِدُ
281 حَمِيدُ قَلِّ حَبِيبِي سِرَاجُ أَنْتَ الْخَدِيمِ

49.

Adar 7-1373 (Mld. 1954)

Mefa 'ilun fa 'ilun mefa 'ilun fa 'ilun

Hezec · · · · - / - - - - / · · · · - / - - - -

1. Sebir kir me zanîbû gelek paşıya sebrê
Bes e kû Xudayê me pesindar e bo sebrê
2. Sebir dê bikêşim ka Xuda wê çi hukmî kê
Gelo paşıya sebrê diçê 'usrê yan yusrê²⁸²
3. Sebir qenc e bo her kes nexasim ji bo 'aşiq
Dema kû dikê nalîn di wê qehr û wê zecrê
4. Çiqa min dipursî çarekê bo birînê xwe
Me peyda nekir derman di çol û bej û behrê
[r. 81]

²⁷⁵ Û sêhr û tilsim û stêrik û sirûşt/Û felsefe û hîkmet û xeyal û wehmkirin

²⁷⁶ Û eşq û helbest û menzûm û biwezî/Û pexşan û elgaz û rasd û teqwîm

²⁷⁷ Û qûm û fal û hikûm û delîl/Û destan û si'ûd û ji nexweşan re nazik

²⁷⁸ Li kaînat û dinyayê çi hebe hijmart/Saxlem û rizî tişta dibe û tişta ku heye

²⁷⁹ Selat û selam li ser wî kesî bin ku/Ji neqencan re wekî rahmet hatiye rêkirin

²⁸⁰ Xudayê min vî 'ebdê xwe yên gunehkar jî 'efû bike/Ji bo xatirê wî kesî ku deveh ji bo wî şitexilîbû

²⁸¹ Muḥemmed Eḥmed û Meḥmûd û Ḥamîd/Ḥemîd ey dildarê min bibêje ey *Sîrac* tu xizmetkar î

²⁸² Zahmetî an jî hêsantî.

5. Ji geyrî sebirkirna dema hatî êş û jan
Bi sebrê dilê min nakevê bin hedê qebrê
6. Sebir gerçî pur tehl e belê wê berek girtî
Ji hinguv bixwe şîrîntir e darûwê jehrê
7. Me rabû qedeh dagirt ji wê qehweya sebrê
Piçopiç vexwarî min kirim gêj wekî xemrê
8. Ketim bêhiş û sewda dilê min li min bûrî
'Ecêbek me dîtî kes nedîbû bi vê tewrê
9. Ji nû ser xwe ve rabûm kû yek gem xuya nakê
Miçalê me yê jehrê li ber xwe birin nehrê
10. Ji nava ciha rabûm **Sîrac** gote hevalan
Yeqîn şerbeta sebrê bû derman ji bo qehrê

50

Ab- 27- 1372 (Mld. 1953)

-Teştîr Muḥemmed Sîrac 'ela qesîdeyî Şeyx Ehmedê Cezerî-

²⁸³ تشطير محمد سراج على قصيدة الشيخ أحمد الجزري

Mufte 'ilun mufte 'ilun fa 'ilun

Recez - . . - / - . . - / - . . -

مفتعل مفتعل فاعل

پُرْمَكَه إِسْرَافِي دِ قَتْلَى مُبَاخٍ
يا نور عيني مضي عمري وراخ
Pir meke israfê di qetlê mubah
Ya nûre 'eynî meza 'emrî werah²⁸⁴
في كل وقت لك قتل العشيق
سفك دم العاشق ما لا يباح²⁸⁵

سینه بَدَسْتَنی خوه مُبَارَك فَكَه
وَالله دِل زَر بُوِيَه رَنگِي تَفَاح²⁸⁶

فا نظر حبيبي الى كبد الجريح
²⁸⁷ تعرف كم في كبدى من جراح

²⁸³ Helbesta Şêx Ehmedê Cizîrî ku Muhemmed Sîraceddîn teştîr kiriye. Êdî ji ber ku Erebi tê de zêde bû, me bi tîpên Erebi jî nivîsandiye. Yanî esliya wê.

²⁸⁴ Ey nûra çavê min, emrê te çû derbas bû.

²⁸⁵ Her wextî mirina aşiq ji te re ye/Rijandina xwîna aşiqî ne rast e.

²⁸⁶ Sîne bi destê xwe mubarek veke /Wellahi dil zer bûye rengê tufah

²⁸⁷ Ey dilbera min li kezeba birîndar binêre/Tê fêhm bikî bê çend birîn di kezeba min de ne.

دِل ژ هَوَايَا تَه د فِكْرِيْن د هُوْر
 قَطُّ نَه بِي سَاكِنْ نَه مَسَاوُ صَبَاخُ
 Dil ji hewayaya te difikrên di hûr
 Qeṭ nebê sakin ne mesa²⁸⁸ û sebah²⁸⁹
 كَيْفَ لَهُ السَّكَنُ إِلَّا مِثْلُ مَا
 فِي لَحَجِّ بَيْنِ حُبُوبِ الرِّيَّاحِ²⁹⁰

عِشْقُ كُو گَهَا كِي وَ لِعَقْلِي خُوَه مَا
 لَوْرَه دِزَارِنْ بِأَنْيُنْ وَ صِيَاخُ
 'Îşq ku geha kê û li 'eqlê xwe ma
 Lewre dizarin bi enîn û siyah
 اِذَا كَانَ مَحْبُوبِي كَنَجْمَ السَّمَاءِ
 يَفْتِكُكَ بِالْعَاشِقِ حَسَنَ الْمَلَاخِ²⁹¹

دِي دُو سِيَّه سُرْمَه بِي جَهْفِيْن خُوَه كِتْ
 دَا تُو بِي صَاجَبِي فُوْرُو فَلَاحُ
 Dê du siyeh surmeyê çehvên xwe kit
 Da tu bibê sahibê fewz û felah

هَمْ دِيْدَه پُر نُوْر وَ شَفَقْدَارِ بِيْنِ
 خَاكِي رَهِي يَارِي صَبَا هَرُ صَبَاخُ
 Hem dîde purnûr û şefeqdar bibin
 Xakê rehê yarê seba her sebah
 [r. 82]

تُوْر وَ غُبَارَا سَحْرِي بَرِ جِمْنِ
 تِيْنَه تَمَاشَايِي مَلَاخُ وَ قُبَاخُ
 Toz û gubara seherê ber çimen
 Têne temaşayê melaḥ û qubah

اِذَا بِمَحْبُوبِي بِقَدِّ كَمَالِ
 قَدْ نَشَرَ الطَّيِّبِ وَبِالْمَسْكِ فَاخُ²⁹²

فِيْرِسْ وَ رِمْبَازِ گَهَا نْ يَكْ بِيْتِيْرْ
 پِيْشْتِي كِيْرِنْ حَرْبْ وَ شَرِي هَرُ سِلَاحُ
 Fêris û rimbazi geħan yek bi tîr
 Piştî kirin herîb û şerê her silah

عَلَايِهِمْ صَوْتُ الْبَكَاءِ وَقِيلَ
 اَحْمَدُ فِي الْبَيْنِ قَتِيلُ الرِّمَاحِ²⁹³

²⁸⁸ Êvar.

²⁸⁹ Sibeh.

²⁹⁰ Ma wê çawa bisekinin/wekî libên di nava pêlên behrê de.

²⁹¹ Dilbera min wekî stêrikên ezmana/Bi spehîbûna xwe aşiqan dikuje.

²⁹² Dilbera min wekî stêrikên ezmana/Bi spehîbûna xwe aşiqan dikuje.

²⁹³ Dengê giriyê bi ser wan ket hat gotin ku/Ehmed di nava kesên ku bi rîman hatiye kuştin de ye

بُوسَه زَنانِ هَرِ كِي بِرَ أَنْ أَسَتانُ
نَما دِیدِلْدَه مَه هَوارِ و نِیاخِ
Bûse zenan her kê ber an asêtan²⁹⁴
Nema di dil de me hewar û niyah

ضاقوا بِنا الدِّنيا بِوَسْعَتِها
مَكَنَّ مِنْ جِبْهَتِه لا بِراخِ²⁹⁵

حَلَّ لَه القَتْل بِشَرعِ الهوى
لأنَّه قَدْ نَظرَ الذِّى لاخِ²⁹⁶

و شَاهدِ الجَنبَةِ ذا اهلِ سِرِّ
مَنْ كَشَفَ السِّرَّ و بالسِّرِّ باخِ
We şahede l-cenbete za-ehle sirr
Men keşefe s-sirre we bis-sirri bah
Li aliyê ku xef e temaşe kir
Kî xefîyan eşkere bike û bi sirrê derkeve holê

حُسنُ و أَدایا تَه مَلا هَرِ كِرى
سِراجَه شَاهدُ كو تو أَهلى صَلاخِ
Husn û edaya te Mela her kirî
Sîrac e şahid ku tu ehlê selah

ما كادَ أَنْ يُسَمَّعَ بِمِسلِكَ قَطْ
صَحَّ لَه ائَاكَ عینِ الفِصاحِ²⁹⁷

51²⁹⁸

Eylûl-1-1373 (Mîd. 1954)

Texmîs 'ela munacat Îmam Zeynel'abîdîn r. e.

²⁹⁹ تخمیس علی مناجات الإمام زین العابدین (رض)

Mefa 'lîun mefa 'lîun fe 'ûlun
Hezec · - - - / · - - - / · - - -

مفاعیلُ مفاعیلُ فعولُ

²⁹⁴ Ev rêz bi Farisî ye: (Her kesê ku wê dergehê radimîse.)

²⁹⁵ Dinya bi hemî firehiya xwe li me teng hat/Ew bi cih kir li cihekî bêrehetî

²⁹⁶ Mîrîn jêre bû heq bi şerîeta gunehê/Lewra wî li wê tiştê ku xuya kir nerî

²⁹⁷ Hindik mabû wekî nehata bihîstin/Bûye cihê baweriyê ku yê herî fesîh î

²⁹⁸ Ev texmîs li ser helbesta Zeynelabîdîn (r.e.) hatiye nivîsîn. Êdî me me'neya wê ya bi Kurdî di jêrenotan de nivîsiye.

²⁹⁹ Texmîsa li ser Munacaata Îmam Zeynelabîdîn (r.e.)

إلهي أنت بالعبد تبالي
رجائي منك في كلّ الليالي
تفضل لي بعفو إذ بدا لي
ذنوبي مثل أعداد الرّمالي
فهب لي توبة يا ذا الجلال³⁰⁰

وإني عاصي من بين قومي
ولا أخلّي أنا عن كلّ لوم
وريحى أكره من كلّ ثوم
وعمرى ناقص في كلّ يوم
وذنبى زائد كيف احتمالي³⁰¹

إذا ما جاء في الأيام صوتي
وعيني باكي من أجل فوتي
فقدت الصبر يا رباً لبيتي
ولا أدري أحوالي بعد موتي
نجاه أم نكال أم نكال³⁰²
[r. 83]

أيا نفس زدى التقوى وأبدء
بزاو للرحيل يوم تملأ
صحائفك من الأوزار فادراً
إذا نوديت قم للعرض فاقراً
فقد لاح الخطايا في كتابي³⁰³

فما المال لك إلا عذاباً
سيسئل عنك أبلغهم جواباً
فهل هو ليتني كنت تراباً
وكم شاب ينادى واشباباً
وكم شيخ ينوح على المشيب³⁰⁴

وتبلى بعد ما قد كنت نجماً
تصير تربة الأرض و سهماً
لدودها إذا ما جئت رحماً
وكم وجه صبيحي صار فحماً
فيبقى بين ألوان العذاب³⁰⁵

³⁰⁰ Ya rebbî tu ebdên xwe difikirî/Ez her şev ji te rica dikim/Efuya xwe ji min re kerem ke/Gunehê min ê bi qasî qûmê wextê ku li min xuya kir/Tewbê bike nesîbê min ey xwediyê celalê

³⁰¹ Ez asî me di nava qewma xwe de/Ez lewma vala namînim/Bêhna min ji ya sire xirabtir e/Emrê min her roj kêr e/Gunehê min pir in ka îhtîmala min wê çawa be

³⁰² Roja ku dengê min were û çavên min bi girî ye/Ji ber ku ji destê min derketiye/Min sebir winda kir ey xwediyê Beytul Hiramê /Ez nizanim halê xwe yê piştî mirinê/Ev xilasbûn e an ezab û îşkence ye

³⁰³ Ey nefs teqwayê zêde bike û ji bo rêwitiyê/Dest bi hazirkirina qûtê xwe bike/Di roja ku sahîfeyên te bi gunehan tijî dibin de/Wextê ku ji nişka ve bangî te kirin rabe û bixwîne/Bêşek xeta di kitêba min de xuya bûn

³⁰⁴ Ji ezêb pêve mal ji bo te nîn e/Ku ji te hate pirsîn tu jî bersiv bide/Gelo ew ê bibêje xwezî ez bûbana ax/Çend ciwanên ku tene bangkirin hene/Çend pîr hene ku li ser hale xwe digirîn

³⁰⁵ Tu stêrikek bûyî, lê tê vemirê/Û tê bibe ax û perçe perçe bibî/Ji kurmê wê re rehmê bike/Wextê ku tu wekî rehmê hatî/Gelek wechên sebîh bûne komir/Û paşî tê di nava ezaban de bimînî

فكم عبد مضي عمره ظلماً
ويغصب مال عبد الله إثماً
ومنهم من يضيع العلم علماً
وكم من ناطق قد صار بكماً
فلا يقوى على ردّ الجواب³⁰⁶

ومنهم جائه الحق فأنسى
ولا يمشى إلى الرحمن قوساً
من الثقلين ام جنأ و إنساً
سرايل من القطران تكسي
فيبلى الجسم من كرب الثياب³⁰⁷

لهم عمر طویل ليس يفنى
وجسم كالمرارة فهبي تدنى
وبالله أعود بها أجرنا
طعام من ضريع ليس يغني
شراب من حميم أو سراب³⁰⁸

ومن يحسن كان الحسن جزاءً
وذنبى علّة أرجود وآء
إذا ما كانت الدنيا هباءً
ومن يرجو من الدنيا وفاءً
كمن يرجو شراباً من سراب³⁰⁹

52³¹⁰

1371 (Mld. 1952)

تخميس على قصيدة حسان بن ثابت مادم النبي صلى الله عليه وسلم³¹¹

مفاعل فاعل مفاعل فاعل

Mefa 'ilun fa 'ilun mefa 'ilun fa 'ilun

Hezec 0-0-0-/-0-0-0-/-0-0-0-/-0-0-0-/-

لأنت حبيبي إن قومك عرعر
وخذك من كل اليواقبت أحمر
وضوء ثنایاک من الدهر أشهر
شبيهك بدر اللیل بل أنت أنور

[r. 84]

³⁰⁶ Gelek ebd hene ku emrê xwe di zilmê de derbas kirin/Gelekan malê ebdê Xwedê bi zorê ji wan destine/Hinek ilim bi zanîn winda dikin/Gelek kesên bi ziman jî lal bûn/Nikare bersiva pirsan bide

³⁰⁷ Hinekan ji wan heq giha wan lê jibîr kirin/Bi qasî kevanekê jî bi baskî Xudê ve naçin/Hem ji insanên û hem ji cinan/Cilên ji qetranê li wan tene kirin/Ji kerbê wan cilan laşê wan xira dibin

³⁰⁸ Emrê wan yê dirêj û ebedî ye/Cesed dirize û diçe/Wellahî em xwe bi Xudê dispêrin/Ji xwarina derîê ku ti kes jê tîr naxwe/Û ji vexwarina hemîm û serabê

³⁰⁹ Kî qenciye bike, ew ê qenciye bibîne/Gunehên min derdê min in ez li dermanê wan digirim/Heke dinya, cihekî pûç û vala be/Kî ji dinya hêviya wefayê bike/Wekî ku serbabê wekî vexwarinê bibîne

³¹⁰ Ev helbest bi Erebi ye. Êdî me Kurdiya wê jî di jêrenotan de nîşan daye.

³¹¹ Texmîsa li ser qesîdeya pesindarê Pêxember (e.s.w.) Hesan bîn Sabit.

ووجهك من ماء الملاحه أزهر³¹²

فلا صير لي من حب وجهك ما أنا
كبلاد هند أو كألماس معدنا
خرقت بلا نار تعبت من العنا
فيا زينة الدنيا ويا غاية المنى
فمن ذا الذي عن حسن وجهك يبصر³¹³

لأنت حبيب الله مبعوث أنور
مقامك محمود وحوضك كوثر
ولا شك شؤامك محروم أبتر
فتلك كافور وربك عنبر
وخمسك ياقوت وباقيك جوهر³¹⁴

فما كتبت إسمك كإسمك راقماً
وما قرئت ككتب كناطقك عالماً
وما قد رأيت عين بمثلك أكرماً
فما ولدت حواء من طلب آدم
ولا بجنان الخلد مثلك آخر³¹⁵

فصبري يزول وهوأني لقد نما
وإن نهاري كالدجى ضار مظلماً
وأنى أرى ضوءاً بمثلك قد جما
ثلثة أضواء تضیی من السما
وفى سر قلبك مثلهن مصور³¹⁶

عجبت لحسنهن اذ هن اقرب
الى حسن انوارك بل هن اعجب
فوالله ما فى ضوء وجهك اغرب
فأوله شمس وثانيه كوكب
وثالثه بدر منير مدور³¹⁷

³¹² Ey hebîbê min qewmê te er'er e/Lamika te ji hemî yaqûtan sortir e/Pesnê ronahiya te ji rojê meşhûrtir e/Heyva çardehê dişibe te, lê tê jê binûrtir i/Wechê te ji ava şîrîn spîtir e

³¹³ Ji bo wechê te yê spehî sebra min nîn e/Ez ne polayê Hindê an jî me'dena elmasî me/Ez bê agir şewitîm ji derd û kulê te/Û ey xemla dinyayê û aramaca heta hetayê/Ew kesê ku li xweşikatiya wechê te dinêre

³¹⁴ Tu hebîbê Xudê yî û yê hatî rêkirin ê herî bi nûr i/Meqamê te, mehmûd e û hewdê te kewser e/Bêşek dijminê te mehrûm e û bêwêrt e/Mirêbayiya te kafûr e û çarêka te enber e/Û ji pêncan yekê te yaqût e û ya mayî jî cewher e

³¹⁵ Katiban bi qasî nave te ti nav nenivîsîn/Bi qasî nutqa te bi zanîn tiştek nehate xwendin/Çavan comerdên wekî te nedîtîn/Hewwa jî ji sulbê Adem ti kesî weke te neanî dinyayê/Cennetên bêdawî kesên weke te nedîtine

³¹⁶ Sebra min xilas bû û muheqqeq hewayaya min zêde bû/Û muheqqeq roja min reş û tarî bû/Bêşek ez ronahiyekê dibînim wekî te zêde bû/Sê ronahî ji asîmana ronî dîkin/Di sire dilê te de, weke wan hatiye teswîrkirin

³¹⁷ Ez di spehîtayiya wan de heyîrî mam wextê ku ez nêzîk bûn/Ji xweşikatiya nûra te ew hê jî ecêbtir e/Wellahî ji nûra li ser wechê te tiştekî ecêbtir nîn e/Pêşiyê roj e û ya duduyan gerstêrk in/Û ya sisêyan heyva çardehşevî ya bi nûr û grover e

فألله ربّي حسبي في كلّ وجهتي
محمّد حبيبي وهو فخرى و عزّتي
وافدى له روحى ونفسي ومقلتي
امامى كتاب الله والبيت قبلتي

[r. 85]

وديني من الأديان أعلى و افخر³¹⁸

وذنبي كثير ربّي والنفس كاسرى
فأرجوك بالقرآن ادعوك ناصرى
غفار لسراج وللعيب ساترى
شفيعى رسول الله والله غافرى
ولا ربّ إلا الله والله اكبر³¹⁹

53

1371 (Mld. 1952)

(Benda duduwê) di gelek munasebeta de hatiye gotin li ser şêxê zemîn şêx
Muhammed Se'îd Seydayê Cezerî³²⁰

Mustef'îlun fe 'ûlun mustef'îlun fe 'ûlun

Medîd - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. Ya Seydayê Cizîrî l'bextê te me l'meşerê
Li ber sekrata mewtê gava biçme meqberê
2. Li te îro hewar e ya murşîdê zemanî
Weqtê mîzan bê danîn bo min bike mehderê
3. Çawa distînê îmdad tû j'Ehmedê nûranî
Xwudyê tac û buraqê xwedyê hewzê kewserê
4. Wilo ez dikme hêvî dikim lav û ricayê
Bo wî şahê Medînê li hewar im hingî werê
5. Kû tû li min bikê purs min ser guh ve neavêj
Kû kar bikim bar bikim gava ruhê min herê
6. Ger çî mirîdiya te bi rastiye ez nakim
Kolê dergahê te me ji Şamê ta Heblerê
7. Çikû mijûl bûme ez bi vê dinyaya xedar
Nefsa ma hişk û dinya dil kir mîslê mecmerê

³¹⁸ Xuda rebbê min e li her aliyê min hesîbê min e/Muhammed evîna min e û şanaziya min e/Ez ruhê
xwe û nefsa xwe û çavê xwe jêre feda dikim/Kitaba Xudê rêberê min e beyta wî qibla min e/Dinê ji
hemî dînan bilindtir û şanaztir e

³¹⁹ Rebbê min gunehên min zêde ne û nefas min, min têk dibe/Ez bi Quranê ji te hêvî dikim, ji te dua
dikim (alîkarê min)/Ji **Sîrac** re Xeffar e ji eybê re jî Settâr e/Şefaetkarê min Resûlullah e Xudê ji
Xeffar e/Ji xeynî Xudê ti reb tune ne, Xudê yê herî mezin e

³²⁰ Ev not di nusxeyê de hebû. Ji aliyê nivîskarî ve hatiye nivîsîn.

8. Lêbelê sûndê dixum bi wan dêmê gul'îzar
Meşûb û dostê te me heta sağ im wek berê
9. Tû jî min qebûl bike bi kolê derîzanê
Ya Seydawo navê min tû bînvîse l'deferê
10. Rehîma Xwedê Te'ala weke tavê baranê
Li dê w bava bibarê birano bêjin erê
11. Rêzanê wek te nîn in ma kê bihîstî îro
Xwezîya me bi wî kesî bê li pey te daîm herê
12. Muheqqeq şubhe nîn e bi îzna rebbê banî
Ew kes nabîne yar û nar û pêta seqerê
[r. 86]
13. Ji dil bibê murîdek şafî bibê ji rîyayê
Qelbê xwe sîqal bikê bikê mislê cewherê
14. Zahir de pêk bîne ew emr û îşê xudayî
Batin de ef'alê pîs nekê l'mal û seferê
15. Nebê weke xalibê ehlê qernê çardehê
Kû dîne xwe difiroşin bi te'le û serzerê
16. Her pênc limêjê xwe ferz nakin kû çûne ber pez
Dixun rojiyê gava hat paleyiya kû derê
17. Zekata xwe ew didin şalkêş û suxrevana
Yan kotika gêris yan peza li pey pez nerê
18. Nakin limêjê cum'et hezara distênin next
Dibê emê çin hecê namênê gunhê berê
19. Wên pur xusara xwe kin berê reş tewaf bikin
Li mala xwe kêrik bû bû cûzan gava werê
20. Hin jê nizanin bigrin destlimêja limêjê
J'xelqê re fetwa didin ji fetwa Îbnul Hecerê³²¹
21. Hin jî dîkin melatî dîkin we'zê li 'amê
Wek min bi ya we'za xwe nakin li pey naheerê
22. Hinek spî dîkin şaşik û riha şehkirî
Dil wa reş û zengûrî weke tehtê 'Eynserê³²²

³²¹ 'Alimekî sunnet û fiqhê yê Şafî'î ye. Di navbera salên 1372-1449an de jiyana xwe derbas kiriye.

³²² 'Eynserê gundekî Hezexê ye. Bi Tirkî navê wî Pınarbaşı ye.

23. Tu cara şafî nabin ji ‘ucb û rûmetiyyê
Bi zimanê xwe yê tûj dibin mîna xencerê
24. Hinek pîrek kû pîr bûn dîkin ristîk tîzbiha
Tavê teyroka sebê j’ewrê lêvan diwerê
25. Heta xwert in dibêjin em cêhil in nezan in
Kû pîr bûn nû bila şêx ser îrşadê bigerê
26. Na na tor³²³ ez xelet bûm vî weqtê xwurtî cahil
Gelek ferqê dikê ser wan kal û pîrê berê
27. Emma her du ne kifş in her yek he ye setarek
Cêhil qencî wunda ye weke şêxê bin berê
28. Neqenciya pîran jî ketiye di bin şaşîkê
Ka herduwan bicerbên wek kifrît û ‘enberê
29. Ev qa kesê me gotin ne kû her kes wîlo ye
Ji deh tilyan tiliyek şehdê didê li her derê
30. Eya pîrê rih spî heyf e tû van mûwê xwe
Bi guneha reş bikê mislê tenya Êwerê
[r. 87]
31. Xuda heya dikê kû te bi wan mûwê spî ve
Bavêjê cehennemê de teşbîhê keremperê
32. Çawa fihêt dikê ew sed heyf û sed xebînet
Kû tû jê fihêt nakê j’wî rebbê behr û berê
33. Tîştê çû jê tewbe ke ‘umrê te yê kû mayî
Bi qencyê derbas ke da nebînê kederê
34. Gelî xortê nû hatî ez vê j’we re dibêjim
Pîra weqtê xwe bûrand dor hate we l’vê derê
35. Bikin tewbe ji dil û can da heq bidê we îman
Li emrê wî guhdar bin heta j’canê we werê
36. Lawîniyê telef kin di ber emrê xudê de
Dî cennetê de hûn ê rûnin li ser mînderê
37. Hûn ê bin hogir û hem bin beyreqa Muḥemmed
Selat li ser bê daîm li ber heşr û neşerê

³²³ Tewr, guya.

38. Hûn ê pêre derbas bin li ser pira cehennem
Ji dest wî dê têr vexwun wê şerbeta kewserê
39. Wellahî summe wellah ger hûn ji dil tewbe kin
Bikin e' malê şaliş riya wî hûn bikne rê
40. Hûn ê pêre heval bin tev wê we lev civînê
Hûn ê biçne buhuşta qesrê wê zêr û zerê
41. Ewa çemê wî şîr û av û şerab û hinguv
Giya wê ze'feran e ax ji miska ezferê
42. Zuxrê wê le' l û mircan tejî horî û gîlman
Razîbûna Xudayê nî' met nayên berberê
43. Heyf e vî 'umrê 'ezîz belaş hûn wî dibûrên
Ma qey hûn pê nizanin her carekê wê herê
44. Ger qencî ger neqencî tê paşî poşman bibê
Lêbelê feyde nakê kû çû kengî d'vegerê
45. Heta sağ im tu cara wesfê Seyda kû bêjim
Xilas nakim lew zehf in hinga mûwê l'şîzerê
46. **Sîraco** tû kin bibir tû gelkî di xew de mayî
Hêvî he ye hişyar bê bi sira bayê seherê
47. Hêvî he ye kû çavê qelbê te rehnî bibin
Bi dîtina kirasê we'za j'Serdehlê³²⁴ werê
48. Efû bike Îlahî gunhê min û guhdêra
Bêhed şelat û selam bid ser xwedyê mehderê
[r. 88]

54

Nîsan 1- 1373 (Mld. 1954)

Dîsa li ser Şêx Muhemmed Se'îd Seyda r. h.

Mefa 'ilûn fa 'ilûn mefa 'ilûn fa 'ilûn

Hezec · · · - / - - - / · - · - / - - -

1. Gelî ehlê welatî ji bo me hatî mizgîn
Xuda me tev 'efû kê bi rehmeta xwe amîn
2. Her bo Xuda şukur kin em kirne ehlê îman
Kanî ji vê bihatir ne ji durr û le' l û zêrîn

³²⁴ Gundekî Cizîrê ye û mala Şêx Seyda li wir bû demekê.

3. Wî da me murşîdek pak hîmmet bulundê Seyda
Ya rebb bi îsmê e' zem ' umrê wî pur bidomîn
4. Serkanî ' ilm û fetwa pîrê terîqê bêşik
Serdehlê kirye Beğdad yeqîn cîhan hemî dîn
5. Welat kir baxê cennet Serdehl e nîvê merkez
Bo vê yekê dibêjin Serdehlê bexçê rengîn
6. Cihê şerqê xusûsen lê şîn kirin gul û sêv
Çi 'Entab û Sîlîva çi Mardîn û çi Behdîn
7. Xortê devrû nehatî temam kirin bi tizbeh
Şifrê şefar nedîtî spî kir şubhê ayîn
8. Nezer berda cihê me bi îzna zilcelalî
Murîd lew ketne cezbê ji heftan ta bi notîn
9. Dirahiştî şimamok beha wê bûye pênc sed
Bi çar sed yek çigare me di j' dest hev hilanîn
10. Nezer berda perek da bi zêrê zer guher tîn
Wekî van pur me dîtîn dixum sûndê bi Ya Sîn
11. Çiqa hişk û cemat dibin cewher dibin dur
Çiqa şêr û gurê har pisîk in kû nezer dîn
12. Keramet kirne erzan kesek nabê ' ecêb e
Eva ha yan eva ha ji hev mestîr me tev dîn
13. Kesê tesdîq nekê wî yeqîn lê nayê girtin
Pepûkê kor çi zanê ji rojê rehîjê dûrbîn
14. Kerê bar ke ji kitêban gelo çi ji wa dizanê
Çi zanê gul çi reng e dixwazê kerbeşa şîn
15. Du kes beyhûde min dîn yekî munkîr yekî ez
Bi min tû naçê banî bi munkîr nayê danîn
16. Weke ya av dianî ji Îbrahîm Xelîl re
Weke ya pif kirî agirê wî zatê nûrîn
[r. 89]
17. Ricakar im ji xaliq bidê fethê ji bo te
Bilind kê beyreqa te ji Misrê ta bi Qezwîn

18. Tû mensûrê bi nesra (îza ca' e)³²⁵ Muheqqeq
Bi wê (inna feteħna leke fethen)³²⁶ ji bo dîn
19. Ji te razî bibê heq te jî razî bikê her
Bi heqqê Eħmedê xwe ecîb ya Rebbî Amîn
20. **Sîraceddîn** 'elîl e birîn axiftine tev
Tû loqman î dewa ke bi wî dermanê nûrîn

55

Ab (Tebax)- 19- 1373 (Mld. 1954)

(Dîsa di heqqê munkirê şêxê min da)

Fa 'ilatûn fa 'ilatûn fa 'ilatûn fa 'ilûn

Remel - . - - / - . - - / - . - - / - . -

1. Ey gelî ehlê 'eqil da em bikin purs û su'al
Ev zemanek bê ser û ba ye tejî ehlê żelal
2. Gerçî navê me musulman e belê batîne me
Dil gerav bûne tejî bûye ji efkarê beçal
3. Her divê mu'mîn hemî teşbîhê yek xanî bibin
Hin hina bigrin çewan got Eħmedê nûrîn cemal
4. Lê bi dev em didirin namûs û 'erza xwe bi xwe
Hem bi dil tohma fesadî didine ehlê kemal
5. Me 'eqîdek he ye kê mîn e ji ya filh û cihû
Ev dibê ew dîn beçal e ew dibê ev jî mîsal
6. Hin ji me de'wê dîkin de'wakî pîs lubs û kiras
Kû Museylemetê Kezzab³²⁷ nekirî wek wî dîbal
7. Çaxê mektûb wî şiyand bo serokê ins û melek
Gotî 'erd nîvî ji mîn ra ji te ra nîvî heval
8. Hin ji me hinka dîkin pîrê terîqê hinê dî
Dê finîş kin ji wezîfê lew bi destê wa ye ħal
9. Qey ev in kezzabê halo katibê wehyê weya
Lewh û mehfuzê dibînin bûn şerîkê zilcelal
10. Haşê sed car dî jî haşa ger dizanin tiştêkî
Belkî mexrûrê le'în in mudde'în e wek decal

³²⁵ Wextê ku hat..., (Sûretê Nesrê, Qismekî ayeta pêşî)

³²⁶ Bêşek me fetheke eşkere da te, (Sûretê Fethê, ayeta pêşî).

³²⁷ Kesekî di dema Resûlê Ekrem Muhemmed Mustefa de jiyaye û îddaya pêxembertiyê kiriye.

11. Lew dibêjin we genim çandiy û nû zîwan çinî
Polê destê we sulûk e ê me tûr lê da (Kemal)
12. Ger di islamê de ev de'wa hebana hey bira
Yek ji her çar mezheba heq bû ewê dî tev beçal
[r. 90]
13. Ma çi ferq e hin henîfî hin bi mezheb şafi'î
Neqşebendî bin hinek jî qadiriyyê sir zelal
14. Îxtîlafa va îmama bûye rehîma ummetê
Lê nebû bend û 'edawet qeş nebûye qîl û qal
15. Qurmê darê her yek e çiqqa çiqil pur pêve bin
Nabê kû hin sêv û bih bin hin zilindar bidne pal
16. Ev şîqaq û tefrîqa ha kû dîkin nav şalihan
Pa çi tû eqwa delîle bo nezana di cidal
17. Munkirê ehlê terîqê wê bibê va şek nema
Ev terîqa ha virr e lew jev dîkin curm û qepal
18. Çawa dîn bûye bi dev bes ev terîqa ha weha
Bû bi xewnê pîrefatê di sibatê ket xeyal
19. Pur nemaye hin ji me hinka keşif kin bo buhuşt
Hinkê dî bavêne dojex lew dizanin her du hal
20. Dabbetul 'erdê zemîn in xel ji wan tirsê dîkin
Me'neya muslim muzîr danîn ewan dal kirne zal
21. Ey ulul emrê diyanet ya xelîfê dawûdî
Hukmê heqqî heşkera ke ji te tê xwestin webal
22. Lê xudanê not û neh de'wê li ê yek pez dikê³²⁸
Ma 'edalet vê dixwazê hel bike purs û su'al
23. Ger bi cehla me me bispêrê em ê çekin senem
Rêz û resma dînê Tahir dê bikin kevne şekal
24. Çîtika 'ezmanê halî me bi hîbra lel esef
Kaxeda dil reş kir û min aniye ev 'erzeçal

³²⁸ Li gorî rîwayetekê (lê tê gotin ku ev rîwayet ji Îsraîliyâtê ye) tê gotin ku not û neh jinê Hz. Dawud hebûn û dilê wî di jina leşkerekî wî de hebû û ji bo ku jina wî jî jêre bimîne ew leşker rêdikire şer. Di hinek rîwayetan de jî tê gotin ku not û neh bizinên yekî hebûn; lê çavê wî li ya cîranê wî bû. Êdî li vir telmîha wê kiriye.

25. Çawa îslam lazim e yek bê wekî apartuman
Hem divê sahib qewî bê da nebê kavil di sal
26. Lew Nebî Mûsa ne hâzîr bû îlahek çêkirî
Gulkê zêr aniye reqsê Samiriyê bed fi'al
27. Çawa cahil bêhtir in halo cehalet zêde bû
Lew (piranî birye mêranî) 'îlim reş bûye qal
28. Gotina kizb û melaqî jê revîn cumle mela
Gotina heq jî tu bêjê tirş û tûj e gelkî tal
29. Wer tû derbas ke li vî borî kerê reş hey hewar
Ma **Sîraceddîn** tenê dît ev 'ecêb yan her heval
[r. 91]

56

Tişrîna ewwel- 25 – 1381 (Mîd. 1962)

Bî munasebeta wefata Şêx Muhemmed Se'îd Seyda û xilafeta kurê wî
Muhemmed Nûrullah

Fa 'ilatûn fa 'ilatûn fa 'ilatûn fa 'ilûn

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · -

1. Ax felek dîsa te kul kir dilê min kirye qedîd
Taviya huzn û xema barandiye ser min şedîd
Ez kirim 'ebdal û kole te li dergah û wesîd
Em ji seydayê me dûr kirne bi sed menzîl be'îd
Bilbilê dil hû dixwênê neğme û nezm û neşîd
2. Ma gelo kengî dibê xweş ser dilê min ev birîn
Ger li gor huznê sebir çêkirye rebbu-l'alemîn
Fîrqeta Seyda ji bîr bir bîl'umûm kovan û şîn
Qet bi huzna wî guhertin nîn e bo qelbê yeqîn
Serwer û pîrê terîqa neqşîya şêxê se'îd
3. Zahir û xef bo murîd û sofîyan bû elmeded
Sirr û ehwâl û teweccuh remz û nîşan bê 'eded
Ma dikarim kû hebîb kim pesnê wî min geyrî hed
Ew ji bo koma murîda minzila bav û weled
Rehmet û şefqet ji bo wan *kullu yewmun fî mezîd*³²⁹
4. Banê mizgeft û xulûwan bê şivanê ewliya
Muslîhê kîna 'eşîra j'zaliman re mehdiya
Cezbeya dostê xwe kir wîna ji orta asiya
Nekbeta Îslamê tev bû ne tenê bo Turkiya

³²⁹ Her roj zêde dibe.

Şêx Se'îd hatî Se'îd mayî neqil bûye şehîd

5. Bû şeva heftê şewalê keskî ev guman nekir
Paş hezar û sê sed û heştê û heftê hat emir
Ser Cizîra Botiyan kir helqeyek tarî 'ewir
Heq te'ala dergehê bagê buhuştê lê vekir
Rehmet û ridwan bidê wî sahibê 'ersê mecîd
6. Hemd ji Rebbê 'alemê re ew hekîmê elemê
Kû bi me wî daye zanîn ayeta tirs û gemê
[r. 92]
Ewliyaullahê (laxewfun 'eleyhîm)³³⁰ yek demê
Ger fîraqa wî welat tev kirye şîn û me'temê
Lê bi dîna Şêx Muhemmed³³¹ rojnuwa³³² min bûye 'îd
7. Lewre Nûrullah di hêja ye li şûna bavê kal
Kû bibê waris ji bo 'ilm û 'emel bânê mecal
Beyreqa îrşadê hildê xelefê ehlê kemal
Pêşrûwê cumle xelîf û sofî û eşhabê hâl
Her ew e lu'lu' Xudê kir sedefa durra ferîd
8. Pa mera Rebbê mezin bo wî bidê fetħa qerîb
Qedr û cahê wî bikê 'alî li nik yar û gerîb
Hîmmeta yabo deha zêde bikê jêre nesîb
Qelb û çavê va murîda ron bike pê ya Mucîb
Tev de amînê bixwazin fatîhe bona feqîd

57

Kanûna ewwel – 28-1382 (Mld. 1963)

Bi munasebeta xilafeta birayê min ê mezin Şeyx Muhemmed Beşîr
rehmetullah

Mefa 'îlun fe 'ûlun mefa 'îlun fe 'ûlun

Hezec · — — — / · — — — / · — — — / · — —

1. Xuda çiqqa Kerîm e hemdê me her ji wî ra
Ni'met rijandî ser me bi nî'metê kebîra
2. Ewwel wî da me îman da kû bidê me ridwan
Mestîr ji vê qe nabin qet wê nekin ji bîra
3. Di vî weqtê me yê teng wî da me şahê gul reng
Seyda şehê Cizîrê bo mu'mîman emîr e
4. Feyda wî roj û şems e mehrûm nehiştî kîmse

³³⁰ Li ser wan tirsek tune ye.

³³¹ Şêx Muhemmed Nûrullah, kurê Şêx Seyda.

³³² Roja nû.

Nefes bi mislê 'Îsa Rûh da gelek esîra

5. Ava kirî cihê pur gava kû rabû bakir
Serdehl kir beyta îrşad bo Heccacê kesîra
6. Her çar teref şiyandin xelife tev neqandin
Bêpar neman ji feyzê ne j'gund û ne j' 'eşîra
7. Xasma di heftêy û şeş sêzdeh sedê gelek xweş
Rakirne çend xelife roja 'eyda kebîra
8. Mîna tû wek Xelîlî³³³ bi mujdeya Celîlî
Bona zebîh feda hat ji bo nef'a feqîra
[r. 93]
9. Yek nav e Hacı Şêxmûs Necla nuzûlê Şêxmûs
Şêx Mustefayê Derêcî Kereş³³⁴ cih e ji wî re
10. Ji wan yek Necla hukmê nîşandar e bi 'ilmî
Esil Xelîlî wî nav Şêx Muḥemmed Beşîr e
11. Pîroz û sed mubarek li we bê ew xelatek
Amîn ecîb Îlahî bêjin ji can û pîra
12. (Basanî Ferho) mizgîn hat bo te beyreqa dîn
Bi 'ilm û ḥilm û teqwa ev senceqek şehîra
13. Çawan kû bûye faîq Basa³³⁵ ji wî re laîq
Hûn her dû zêr û zîv in fezlek ji nik qedîra
14. 'Ebdulḥekîmê merḥûm nebê ji nav wa ez çûm
Sağ î tû belkî zêde kata³³⁶ te bo me mîra
15. Heq gorina te nûr kir du'a ji te qebûl kir
Durra yetîm giha te sakînetuẓẓemîra
16. **Sîracî** serbilind e bira ji wî re find e
Xuda bidê te neşret wek Mûsa û wezîra

³³³ Peyva Xelîlî ji bo birayê xwe Şêx Muḥemmed Beşîr gotiye.

³³⁴ Kereşa, gundekî Botan e. Bi navçeya Basa/Güçlükönak ve girêdayî ye.

³³⁵ Navçeya Şernex, bi Tirkî navê wê Güçlükönak e.

³³⁶ Kat: Tirh, kelem. Wextê mirov darê ji qurmê wê dibire û piştê di cihê qurm de şîn dibe, ji wan şax û tirhan re "kat" tê gotin.

Bi munasebeta hecc û xilafeta Şeyx Muhemmed kurê Şeyx Ebdullah kurê
Şeyx Muhemmed Nuri

Mefa 'ilun fe 'ulun Mefa 'ilun fe 'ulun

Hezec · - - - / · - - / · - - - / · - -

1. Hezar car şukr û minnet ji bo wî rebbê banî
Li ser me zêdetir kir nî' met qewî giranî
2. Bêşubhe çêtir in em ji qewm û milletê Hûn
Dewlet serê Muhemmed li axirê zemanî
3. Îslam di gel îmanê dan bo me ehlê tewhîd
Meştîr ji vê tunîn in nî' met me pê dizanî
4. Di begçe vî welatê şerqa me de te barand
Bi tavê rehîm û feyzê şîn kir gul û rihanî
5. Xasma ji bo we mizgîn ehlê sirta 'elîka
Paytextê yabo nû bû li Zengilokê³³⁷ danî
6. Tirha gulê heşîn bû bulbul li ser dixwênin
Çiqil durr û zuberced kok 'eslekî nûranî
7. Cowa çemê li Basret³³⁸ av daye vê gula me
Axa Cizîr û Hoser³³⁹ wa şîn kirin hesanî
8. Xweş girtiye berek nû ji sorgulê di nazik
Xweska bi wî kesî bê baqek ji wê hilanî
[r. 94]
9. Bêhnxeş bibê bi we' zê ji bo dunya û dînî
Bêhna fitn û gunahan naçe poz û dehanî
10. Ka carekê werin hûn guh bidne Şêxê Ehemmed
Gotin hemî cewahir didê her kes mecanî
11. Belê van şîretê wî bikin guhar di guh da
Li dunya û li axrê di bin hîfza Xudanî
12. Sala hezar û sê sed heştê û do ji hîcret
Tewaf kir ke' b û rewze ziyaret kir te xanî

³³⁷ Zengilok gundekî Xezeh/Îdil e Bi Kurdî navê wî Akdağ e.

³³⁸ Basret gundekî Cizîrê ye.

³³⁹ Hoser gundekî Hezexê ye. Bi Tirkî Düzova.

13. Di vê rê de te wergirt ji dest (heqê) xîlafet
Pîroz û sed mubarek xelatek bo me anî
14. Sefer xêr û xweşî bû te 'ewdet bû selamet
Li te (nûrun 'ela nûr)³⁴⁰ tefaul bû 'eyanî
15. Dikim hêvî ji Barî bidê te feth û nesret
Li te 'umrî dirêj kê bi hîmmetek nûranî
16. **Sîraceddîn** xedîm e li dergahê te şahî
Xelat ferz e li şahan ji bo xeddamê xanî

59³⁴¹

Hezîran 9-1379 (Mîd. 1960)

Dîsa li ser Şêx Ehmed Şêx 'Ebdullah

Mefa 'îlun mefa 'îlun fe 'îlun

Hezec · — — — / · — — — / · — —

1. Elîf. Ela ey dostê yarê bav û kalan
Temaşa kin binêrin rehîma rehman
2. Nûn. Nikarim şukrê xaliq bênime cih
Bedêla nî' meta dayî me insan
3. Nûn. Niha dîsa li me kirye xelatek
Bi destê şeyxê heqqê şahê zozan
4. Elîf. Ewî jî wek xelîlî agirê dil
Li me berda selama kirye ridwan
5. Lam. Li 'Urfaya welatê me bela kir
Suhûfê xwe bi ezmanê me kurdan
6. Hê. Hemî ehlê me pê hatin girêdan
Bila Nemrûdî tev herne denîran
7. Dal. Dizanim kû hekîm xibret hebê hem
Kemij³⁴² qabil bê bo tedbîr û derman
8. Elîf. Eva helbet ji wîna zêrê xalis
Dikarê çêbikê enwa'ê aman
[r. 95]

³⁴⁰ Nûra li ser nûrê.

³⁴¹ Di vê helbestê de aqrostîş heye. Helbestvan di serê her rêzîkê de bi alfabeya 'Erebî tîpek cuda nivîsandiye. Îfadeya aqrostîşê bi 'Erebî ye û wiha ye: Înnel hedaya 'ela mîqdarî mehdîha.

³⁴² Di çapa TÎD de ev peyv wekî "kevir" hatiye nivîsîn.

9. Yê. Yeqîn heqqê bi xwe eksîre zanim
Xelesa me' denê pak in ji Zengan³⁴³
10. Elîf. Emîn im kû xelîfê wî bi carek
Li ser şer' û terîqê kirne seyran
11. Eyn. 'Umûma hem xusûsa Şeyxê Ehmed
Ewê necle ji bo wî şahê merdan
12. Lam. Li dergahê ewî min pur rica kir
Me bîne bîrê roja tev de heyran
13. Yê. (yewedul-mucrîmu lew yefedî mîn)
'Ezabê heq bi zar û ehl û îxwan³⁴⁴
14. Mîm. Murîdê jê bikê hevî bi dil şaf
Ne wek (bo cehlê) lê teşbîhê (Selman)
15. Qaf. Qerara erzûhalê bêne ber der
Dibîne nûjedara destê Luqman
16. Dal. Dilê mûrd edîbê sağ û selamet
Bi feyda me' newî teşbîhê Seyhan
17. Elîf. Ezî lal im ji pesnê wî çî bêjim
Rûh û canê me her dem jêre qurban
18. Rê. Rêya pêxemberê me lê kirî meş
Li ser wê rê diçê tê an û ezman
19. Mîm. Mera ya Reb bi heqqê nûr Muḥemmed
Şelat û pur selam ser bêne baran
20. Hê. Her û her tû bide şêxê me neşret
Bi destê wî vekê koda dil û can
21. Dal. Du'ayê me ji wî re tû bi tabî'
Muhur ke, ê ewî jî bo me bendan
22. Yê. Yekî bêşek tû yî murîd û fe'al
Bi keyfa xwe dikê tiştê tû pê zan
23. Hê. Hewar û hêviya **Sîrac** e Ellah
Bi şeyxa re me derbas kê ji nîran

³⁴³ Gundekî Kerboran/Dargeçit e, bi Tirkî Karabayır.

³⁴⁴ Gunahkar ji bo ku ji ezêb xilas bibe dixwaze zarok ehl û birayên xwe fîdyê bide, (Sûretê Mearîc, ayeta 11an).

24. Elîf. Îlahî tû qebûl kê vê du‘ayê
Bi Ehmed (sad û sîn)³⁴⁵ ser bikne dûman

(‘eleyhîssalam) ji ber xwe qebûl kir got: Enel hedaya ‘ela mîqdarî mehdîha.³⁴⁶
[r. 96]

60

Teşrînî ewwel – 28-1379 (Mld. 1960)

Dersa misra‘ê şî‘ra xwe de terrennuma mîroya nebî silêman ... bi
munasebeta wefata eydaê min Şêx Muḥemmed Beşîrê ‘Evdikî

Fa ‘ilatun fa ‘ilatun fa ‘ilatun fa ‘ilun

Remel – · – – / – · – – / – · – – / – · –

1. Ax felek rabe ji bo min bêje ya çerxê zemîn
Ehlê kurra ‘erdê cumle bûn ji bo te dil bi kîn
Tev dibêjin ev felek xayîn e soza wê tunîn
Qern û ummet wê veşartin kes bi wê nabê emîn
Ka tû wê sozê bêyan ke da bibim saḥîb yeqîn
2. Çerxê etles her dema seh kir ji min fehwa³⁴⁷ kelam
Wê cewabek daye min qeṭ nîn e tê de yek melam
(Kullu şey‘in ḥalîkun)³⁴⁸ illa îlahî la yenam³⁴⁹
Ma te nebhîstî di quranê de hatî ya ḡulam
Lêbelê gelkî nizanin ḡafil in ê kû me dîn
3. Ma bi kê re soz me daye tê bimênê ebedî
Yan di dinyayê de tê bûrênê bê‘eyb û fedî
Yan çîqa weḥşê berî wê j’te re bibne kedî
Yek ji van tiştê ji kes re min negot û kes nedî
Gotina wan îftîra ye şahid e ‘eqlê qewîn
4. Ez bi xwe me‘mûr û girtî me di bin emrê yekî
Sekn û rahet bo me nîn e mislê sergerdanekî
Bêhiş û hemda‘z³⁵⁰ digerrhim îxtiyara mûyekî
Min di dest nîn e nikarim lê bikim ez emrekî
Em hemû hatin ji nik wî Ew e Rebbul‘alemîn
5. Wî bi ḥîkmet çêkirin em tev ji bo sirrek mezin
Kes nikarê jê xeber dê ev çî ne jîn û mirin
Hin ji dayê nû dibin hin şerbeta mir vedixwun
Hin dîkin keyf û surûrê bigirî hin dikelin

³⁴⁵ “Sad” û “Sîn” du tîpên ‘Erebî ne. Yanî Selat û Selam.

³⁴⁶ Bêşubhe, xelatên ku tên dayîn, bi qasî qedrê kesê ku xelatê distîne ye.

³⁴⁷ Dawî, netîce.

³⁴⁸ Hert tişt wê helak bibe, (Sûretê Qessas, qismek ji ayeta 88an).

³⁴⁹ ji xeynî Wî Xudayê ku naraze.

³⁵⁰ Li vê derê peyva “ez”ê ji ber weznê hatiye kurtkirin û tenê “z” hatiye nivîsîn.

Emr û fermanê Xuda ne da nebê gafil û dîn

6. Min ji çerxa 'alemê gava bihîstin ev meqal
Şek li cem min qet nema gava me zanî sîrr û hal
Kû Muheqqeq her fena ne 'alema neqş û mîsal
Wê ji hevdû paş kevin bav û kur dost û heval
[r. 97]
Hiç û pûç in ev hemî ah û keser şîn û girîn
7. Bilxusûs sala hezar û neh sed û şêst û şeşan
Paşiya heyva tebaxê sêşema roja sihan
Tevlî ridwana Xuda bû b'zîkrê maşa'ellahu kan
Şeyx Beşîr Seyda û şeyxê ehlê tet'a aliyan
Bavê wî 'Ebdusselam em tev de hiştin dîlhezîn
8. Hêret û kerbê dinê ku lev û lev zêde dibin
Şubhê baranê diherkîn diçûn û tîn dimeşin
Ger nekim sebr û tesellî wê bibin behra mezin
Rûh û canê 'alema dîl wê bi yek carê bibin
Lê sebir gemya Nebî Nûh e bi wî bûme emîn
9. Seyyîdê Tahir Bêcirmanî ji nesla Seyd Bilal
'İlm û teqwa hîlm û hîkmet jê re ewşafê kemal
Murşîdê xortê nûhatî bo murîda xweş heval
Meşreba neqşê vexwarî j' destê wî seydayê kal
Sed hezar enwar û rehetmet lê bibarin gav û hîn
10. Ma **Sîraceddîn** tû gêmîr î ji bona men selef
Piştî seydayê te min hêvî he ye qencê xelef
Şeyx Muhemmed rabê nû kê kullun malaqettelef³⁵¹
Lewre ew tirha gulê bo her ew e durra sedef
Ya Îlahî tû qebûl kê hêviyê entelmu'în³⁵²

³⁵¹ Tiştên ku telef nebûne.

³⁵² Tu alîkar î.

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · -

1. Sed hezar ah û fîḡan û ḥesret û nal û enîn
Kerb û qeḥr û ḥuzn û ġem cumle di yek lehze me dîn
Hey hewar lewma nekin ya ew kesê dil bê birîn
Roj li min îro xera bû bû bihara pelweşîn
Lew Cizîrê reş girêda dar û ber şîn û girîn
[r. 98]
2. Ez birîndar û 'elîl im ji mîlak û cegerê
Li me roj bûye şeva tarî bi ḥukmê qederê
Dikelim pêtê ji dil çû şubhê narê seqerê
Çare nîn e ji me re kanî Nesîmê seḥerê
Bi xwe wî berda min û agir gurî kirye yeqîn
3. Cum'eya çarê sibatê nozdê heyva ḥaciya
Not û yek ḥicrî û heftê w do ji tarîx zariya
Daye mizgînî li ridwanê cinan û ḥoriya
Va me anî bo we serdarê murîd û sofîya
Şeyx Nesîmê ḥaşimî ket bin siha 'erşê mubîn
4. Merkeza îrşad û tekya şeyx Ḥusameddînê kal
J'dengê teşbîḥ û ji zîkrê (Ya hû) ma xeyalê val
Postneşînê qadiriyy û neclê Qedriyê delal
Em bi şûnwara de hiştin xwe gihande zulcelal
Çû civata bab û ecdad û peyrewê yarê guzîn
5. Soḥbet û kilma te ya şîrîn jibîr nakim tû car
Şîret û we'z û nesîḥet ji me re bûne guhar
Dergehê sulḥa hemî kes pev dikir bûn dost û yar
Seyyîdê Ṭahir eman em hiştine çara neçar
Reḥm û ridwan lê bibarin rewh û reyḥan hem çunîn
6. Sorgula şeyx û mela bû û şivanê 'abida
Xanedana der mezin rêzan û fexra seyyîda
Bavê Qedrî ḥacî kewser pa çi zûka bû cuda
Hê ji deyndarî nebûm têr neqlî bû piştî xwe da
Em kirin tev sergomergo bi firqeta pur tehl û şîn
7. Ey dilê miskîn tesellî ke bi sebr û bi tebat

³⁵³ Şêxê Terîqa Neqşîyan bû. Bi eslê xwe ji Cîrîzê bû. Di navbera salên 1898 û 1961ê de jiyana xwe derbas kiriye.

Ser ewî şahê Medîne bide her dem selewat
 Ma nizanê bêguman piştî heyatê tê memat
 Ka binêre da bibînê va di quranê de hat
 Kullî şey' in ḥalîkun illa ilahê bêqerîn³⁵⁴
 [r. 99]

8. Ma **Sîraceddîn** dikarê li macera şerhê bidê
 Yan bi qasî ḥuzn û dilsoja xwe îxbarê bidê
 Lê di her emrê xwe de dê em xwe bispêrin xudê
 Her ew e 'ewn û hîdayet kû bi 'ebdê xwe didê
 Ger dişê³⁵⁵ dil xweş bikê rûḥ fatîḥa jê re bixwîn

62

12-1388 (Mîd. 1965)

Bi munasebeta hatina serê meha remezanê

Mefa 'ilun fe 'ulun mefa 'ilun fe 'ulun

Hezec · — — — / · — — / · — — — / · — —

1. Bi xêr hatî bi xêr hat bi xêr hatî remezan
 Bi xêr û sed selamet miha rojî remezan
2. Çi heyvekî mubarek xuda ji bo me rêkir
 Ya reb şukr û sena kû da ummetê remezan
3. Nazil kirin di wê de te kîtab û suhûf tev
 Heyîv tamam kirin kêr serdar kirî remezan
4. Roja yekê remezan suhûf te dan Xelîlî
 Zebûr ji bonî Dawud da hijdehê remezan
5. Roja şeşê remezan Tewrat te daye Mûsa
 Încîl ji bonî 'Îsa da sêzdehê remezan
6. Quran di bîst û çarê te da Muḥemmedê (s.e.w.) xwe
 Bêhed şelat li ser wan ḥeta hebê remezan
7. Roja serê remezan derê cennet vekirye
 Girtî ne dozexê der hemî ewê remezan
8. Derê reḥmê vekiriye Îblîs kû tê girêdan
 Tewbe qebûl dibê her divê mahê remezan

³⁵⁴ Hert tişt wê helak bibe, ji Xudê pê ve, (Sûretê Qessas, ayeta 88an).

³⁵⁵ Heke bixwaze.

9. Şeş sed hezar ji wanê bûn laîqê 'ezabê
Xuda 'efwê didê wan çîqa şevê remezan
10. Bi qasî wan temamê kû tê de bûne azad
Car dî şeva xelasek dan xatirê remezan
11. Ya 'nî çîqa remezan ji mîlyona seh û şeş
Xuda li wan dibûrî bigrin qedrê remezan
12. Rebbê mezin digotî (rojî ji bo min e hem)
Ez im ceza didim ê girtî sihê remezan
13. Gotî Resûlê Ekrem (ger ummeta'm bizanê)
Xêra Xudê şiyandî bo wî divê remezan
[r. 100]
14. Dê ummetê bixwesta bi dilxweş û bi hêvî
Kû sal hemî bi carek jê re bibê remezan
15. 'Erş û kursiyy û eflak gava kû heyv bi nû bû
Dikin qîr û dibêjin şeva yekê remezan
16. Xwezîya me bê ji bo te ya ummeta Muḥemmed (s.e.w.)
Tu l'cem Xudê bi qedr î çîqa kû tê remezan
17. Roj û heyiv stêrik şev û roj teryik û hût
Bo te du'a dikin tev çiqqa şevê remezan
18. Xuda dibê melekno xêra rojiyy û tesbîh
Dibê mihê bidin bo rojîgirê remezan
19. Şeva qedrê di wê de hê çêtir e ji hezar meh
Heştê w sê sal û çar heyv bîst û heftê remezan
20. Ya Reb ji bo remezan miskîn **Sîrac** 'efû ke
Ji me heta kû sağ in qebûl bikê remezan

63

20 gulan -1372 (Mld. 1953)

Di wesfê qelemê de

Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun

Remel · · - - / · · - - / · · - - / - · -

1. Qelema min binivîs bo me murad û meremê
Lê me dil bûye tejî ketme cihê Zîn û Memê
Ji me ka pûrsê bike ḥal û hewalê elemê
Da beyan kim bo te derd û ah û kovan û xemê

Qelesa min qelesa min qelesa min qelemê

2. Qelesa min binivîs rûhê me heyrana te bê
Me li dil bûye gurrî û pêtê nizanîm sebebê
Ne ji ber şewqa rûwê yarê disojîm kezebê
Yan ji tîrêja du birhan yan ji baqê qesebê
Qelesa min qelesa min qelesa min qelemê
3. Qelesa min binivîs pesnê xezal û periyân
Weke dil zanê wilo bêje ji bo muşteriyân
Kaxedê reş bike wek bextê evan berderiyân
Xetekê rast bikişên teşbîhê qama zeriyan
Qelesa min qelesa min qelesa min qelemê
[r. 101]
4. Qelesa min tû li ber qama hebîb meşqê bike
Herf û herf nuqte û nuqt taze tû îmlayê bike
Yekeyek cumle û mufred lê tu î'rabê bike
Weke Camî bike vî namî li ber camê bike
Qelesa min qelesa min qelesa min qelemê
5. Qelesa min binivîs bejna şepala me elîf
Nazika her du kefê wê lêbelê hişk e qedîf
Du burû heyv e bi nû heyv ji guliyê wan bû ze'îf
Xed³⁵⁶ û rûdêm weke camê we zerîf in we letîf
Qelesa min qelesa min qelesa min qelemê
6. Qelesa min binivîs hîbra te herkî ji ceger
Şûbhê cobar û çeman fetlek spî hat me ji ser
Ya ji dil xwe nekê sor ya ji serê mîjî kever
Binivîs 'aşîqê dînê bike pê zîr û zeber
Qelesa min qelesa min qelesa min qelemê
7. Qelesa min binivîs van tiliyan pur bibezi
Li çep û rastê evê reşbelekê wan bigerîn
Tû ji neynok û ji goşt nuqteyê xwînê biwerîn
Xelq û 'alem da werên darî temaşaya qirîn
Qelesa min qelesa min qelesa min qelemê
8. Qelesa min binivîs qet nebe kuh ne bi xwedîya
Me he ye kêreke tûj kû diqusênê seriya
Ger qusûra te hebê xet nekê wesfê zeriya
Bibirim ez li te ser ta bigirê ser seriya
Qelesa min qelesa min qelesa min qelemê
9. Qelesa min binivîs salê çûyî qey me nedî

³⁵⁶ Ev peyv divîbû ku bi şeklê "xet" were nivîsandin; lê belê di hemî tekstê de bi şeklê "xed" hatiye nivîsîn. Em sebeba vê nizanîna mixabin. Ji ber vê yekê me jî peyv neguherand.

Em dinalîn di fîraqê me nebû 'eyb û fedî
Ji birîna me seda dabû ji hût çûbû cedî
Te bi min re diveda ah û keser tû meded î
Qeleta min qeleta min qeleta min qelemê
[r. 102]

10. Qeleta min binivîs îro te nadim bi kesî
Qe nebêj nîn e me qîmet şubehê xar û xesî
Dî şev û roj bê te nayê me tebat û hewesî
Ji çîqa malê dinê min ji rez û pez tû bes î
Qeleta min qeleta min qeleta min qelemê
11. Qeleta min binivîs ez li dinê pur geriham
Me nedît û ne bihîstî di çîqa weqt û heyam
Kû di bin emrê ewan de bigerê çerxê nîzam
Kaxedê yek bibirê wek te di 'efw û di 'îdam
Qeleta min qeleta min qeleta min qelemê
12. Qeleta min binivîs ê nebê 'aşîq ji te re
Ê kû defter qeleta min nekê ber sing û ber e
Gerçî paşa û melîk bê wî hebin mêr û pere
Nîn e ferqa wî di dunyayê ji heywan û ker e
Qeleta min qeleta min qeleta min qelemê
13. Qeleta min bibe ber vekê dilê şahê beden
Her zimanî tû dizanê te diyîn Şam û Yemen
Tû bi dil re bigirî ger bikenê pê re biken
Bê behaya min î min rih ji te re next û qelen
Qeleta min qeleta min qeleta min qelemê
14. Qeleta min binivîs bêje **Sîrac** bes bigirî
Te bi kalîn û hewara serê guhdara birî
Bes bibarên durr û le'lan tû bi lêvên şekirî
Te li min sohtî ceger bo çî serê min jêkirî
Qeleta min qeleta min qeleta min qelemê

64³⁵⁷

Adar - 11- 1375 (Mld. 1956)

Bi Munasebeta Hatina Berfê û Behabûna Kayê³⁵⁸

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

[r. 103]

1. Sala hezar û neh sedî pênciy û neh tarîx de bû
Zistan bi çavan kes nedî qet 'ewr û ba peyda nebû
2. Xelqê digo sala me çû agir li ax û pûş diçû
Hefta sibat pênc roj diçû 'ewrê sipî wek 'eyne bû
3. Berfek dibarî pêsemê wek wê nedît kes vê demê
J'berfa mezin naxwê xemê Xaliq bi fermana Te bû
4. Subhan ji ê çêkir heyat berfê veşartin teht û lat
Deşt kirye Sîpanê Xelat zêde nebê kêmtir nebû
5. Ned'go me sala serhejên hê çêtire j'ya dûvhejên
Hê maye heyva gagurên çêle li me nû peyde bû
6. Zêde me kir êmê bizin çinkû hero hin jê dizin
Hefta nema ka û kizin qet ev li bîra min nebû
7. Barî li me berfa sibat va xweypeza naê tebat
Ê ka heyî pî daye lat xweska bi wî lodek hebû
8. Kayê xilas kirne pere inşaf birî şaşik zer e
Ma nayê weqtê bêndere çaxê te qîmet qet nebû
9. Kayê nehişt yek serpiya ne j'haciya ne j'sofiya
Murwet ji xas û 'amiya wunda kirî tiştê hebû
[r. 104]
10. Hin jê kirin bê bext û soz hin tevî kayê kirne toz
Hin jê bi kakir nadê poz nabêjê ev dostê me bû
11. Dosta gelek dost dakirin hubba berê wunda kirin
Xwe j'bê'eqilmenda kirin çimkû seradek ka hebû
12. Dostê minê bê pût û zad ger pê nedim ez yek serad
Kengî ji bo wî yek murad hasil dikim lew hîle bû
13. Hat berfeka sor û sipî firkand li me l'daran kepî

³⁵⁷ Ev helbste li Danêrê hatiye nivîsîn. Danêr (Duruköy) gundekî Cizîrê ye.

³⁵⁸ Ev not ji aliyê nivîskar ve hatiye nivîsîn.

Binhêr li şopê pî li pî kakir li ser wek ce‘de bû

14. Kakir didane kafiroş teşt û kulav merş û beroş
Piştî nema pol û quroş ka wek heşaşîn feyde bû
15. Ax kayê ma tu l’kû heyî şêrîntirî j’çîta neyî
Xweska bi ê ka wî heyî kî ma bi te muhtac nebû
16. Kakir dibêjê wey li min çawa ku min loda mezin
Tijî nekir bona bizin lê ev ji bêhişya me bû
17. Hatî sibata qirr û qat hişk çû terî qet jê nehat
Nû bariye berfa gulat qût jî xilas bû pût nebû
18. Hefta nebû adar du şev qet qut nebû berfa me jev
Nûka çema dev kirne hev herkîn şev û roj nale bû
[r. 105]
19. Salê hejand dûvê xelek kayê serî bir ber felek
Nalîn ji derdê wê gelek çiqqa kesê heywan hebû
20. Yek kakirî yek heq sitand ku bû subeh heq zîvirand
Ê zêdekê wî ka hiland halo me soz beyhûde bû
21. Hin jê di nav kayê de bûn piştî bi heq lev hatibûn
Got bîst quroş lê zêde bûn ger wan nedê ka b’te nebû
22. Vê kayê madem ev kirî ka çend qroşek kar kirî
Wucdan ji xudyê xwe birî lewre temaî zêde bû
23. Ê ka heyî ew bûye mîr lê ê neyî bûye esîr
Tesbît ewan kirne jibîr nabê me heywan berze bû
24. Xweska heba xernûf³⁵⁹ û dar belkî miyê qer nebne jar
Da wan di sergo nekme xwar laşê miyan bê hemye bû
25. Wer va kelaşê ser birî hin bê kefel hin bê hirî
Dunyahebên dîn ser kirî ‘ibret di qelbê wî nebû
26. Ê pez heyî dil bû kebab dîtî li vê dunyê ‘ezab
Hê mayiye roja hisab ê ku feqîr xem pê nebû
27. Îro wî şalek ka divê hingî xilas nabê bivê³⁶⁰
Gava xuya kir wê bivê³⁶¹ ew mehkeme gava vebû

³⁵⁹ Giyayekî bi strî.

³⁶⁰ Bivê: Yanî bixwazê.

³⁶¹ (Bivê: Di zimanê zarokan de tiştê ku mirov jê bitirsê). Ev jêrenot ji aliyê helbestvan ve hatiye nivîsîn.

[r. 106]

28. Zanê çima hat ev bela pursê bike j'şeyx û mela
Her kes bi hev bûn muhtela ev tev ji ber zulma me bû
29. Herçî ku nanek xwariye wî îş temayî w bitrî ye
Nabê me cîran birçî ye nanek ji destan der nebû
30. Ma qey nizanê ku feqîr ehl in ji bo Rebbê qedîr
Çiqqa kesê wan kê jibîr Xaliq li wî xwey de'we bû
31. Bo wan eger kir xizmetek dî mal xwedî bidnê çi yek
Geyrî peza şehit û kulek yan şîr û yan pûrt lê nebû
32. Şukrê Xudê nakin yeqîn çawa me ê wextê xwe dîn
Çiqqa hebin hesp û mehîl belkî li ferzan guh nebû
33. Lê hê jî rehîma Wî heye ger kuç bibarin ser me ye
Em nagihin heqqê xwe ye dunya me girt axret nebû
34. Wellahî ez pur tirsîyam nişkê ve ku rabê qîyam
Ba jorê Rehman zûriyam rehmet ji niqmet zêde bû
35. Ya Reb bi heqqê esfiya rehîmê bike l'me 'asiya
Seh bid bi xatrê xwedîya **Sîrac** ji kolê derge bû
36. Qasî evê berfa mezin selewat ji Wî Rebbê mezin
Ser Ehmedî hê zêde bin ê ku bi wî rehîme l'me bû

65

20 - Şubat - 1374 - (Mld. 1955)

Derheqê biraderekî de kû qesîda kayê gotibû min gotiye ji nezma min e.

Melaê xemse eşir

Fe 'ilatun fe 'ilatun fe 'ilatun fe 'ilun

Remel . . - - / . . - - / . . - - / - . -

1. Ey birader Haşimo 'ilmê te tev bûye jiber
Te hîfîz kirye fetawa Meher û İbnî Hecer
2. Te bibişkuvê dev û lêvê xwe barandine gul
Te bivê tê bikê sor ger te bivê tê bikê zer
3. Xwe dipesnênê dema rahjê qelem bêjê şî'ir
Ji qesîdên te negotî vedidê pêre keser
4. Te ji bo xwe bi nezanî xwe ji dûrnasa kirî

Lê nizanî bikê ferqê tû di nav şebb û şeker

5. Ev çi hîl û fen û xapên te li xwe kirne xemil
Ji elfibêtkê evînê qe nizanê ser û ber
6. Hê nebû **Sîrac** di şî'rê de wekî Şeyxê Cizîr
Pa çi zûka xwe hesêb kir te (Mela xemse 'eşir)³⁶²
7. Yan tû gîrhayî çi ferq e ev çi Findik³⁶³ çi Finik³⁶⁴
Tû melayê çi li gundik çi konek bo te meqer
8. Ger qesîda Kayê qulbandiye ser navê xwe lê
Ka bi şalê ve me qulbandî li ser navik û ser
9. Tû bixwe kayê ji lewre ji qesîdên me tamam
Ji xwe re ya kayê bir dil li xwe pê kirye cehir
10. Xezela kayê ji ber kir Haşimo ka bi xwe wer kir
Sîn û cîmê pêre şer kir lew ji heddê çûye der

66

Eylûl-26-1379 (Mîd. 1960)

Rista durrê hûnayî di neseba Muḥemmed Mustafayî sellellahû 'aleyhî
wessellem³⁶⁵

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Muḥemmed lawê 'Ebdullah kurê Şeybe kurê Haşim
Kurê 'Ebdîlmenaf e hem Quseyy û hem Kulab canim
2. Kurê Murre û Ke'b û hem Luey û Xalib û hem Fehir û kurê Malik³⁶⁶
Kurê Neẓr e Kenan e hem Xuzeyme ez bi qurban im
[r. 108]
3. Kurê Mudrîk e û Îlyas Muẓer Nizar kurê Me'edd
Kurê 'Ednan e bona wan fîdayê rûh û canan im
4. Kurê Ewden û Elyese' di gel Heyse' selaman hat
Di gel Bebn û Hemel Qeydad Zebîh Îsma'îlê 'alim

³⁶² Melayê gundê Finikê helbesteke Melayê Cizîrî dîziye û lê xwedî derketiye, gotiye ya min e. Melayê Cizîrî jî ew rexne kiriye û di heqê wî de helbestek nivîsandiye û jêre gotiye "Ey mela xemse eşir". Êdî li vir telmîha wê hatiye kirin.

³⁶³ Gundekî bi ser Basa (Güçlûkonak) ve ye. Bi Tirkî navê wî Çevrimli ye.

³⁶⁴ Gundekî bi ser Basa ve ye.

³⁶⁵ Ev not ji aliyê nivîskar ve hatiye nivîsîn.

³⁶⁶ Ev rêz li gorî weznê zêde dirêj e. Dibe ku ji aliyê katib ve xeletiyek çêbûbe.

5. Kurê Îbrahîm û Tarix û Naḥûrîn û Şariğ hem
Digel Erxew kurê Qalî ‘ kurê ‘ Abir bi serqanim
6. Kurê Şalix û Erfexşez kurê Same kurê Nûh e
Kurê Melk û Muteweşlex kurê Îdrîs û hê zanim
7. Kurê Mehlayîl û Qeynan Enûş û hem kurê Furse
Kurê Şîs e kurê Adem ev in tev durr û mircanim
8. Heta ‘Ednan xîlaf nîn e di (rista durrê hûnayî)
Evê dîtir xîlafî ne **Sîrac** ‘ef ke tû xaqanim

67

Şûbat 5-1373 (Mld. 1954)

Tercuma nesîheta Şêyx Se‘îd Seydayê Cizîrî ji bona taliban

Fe ‘ulûn fe ‘ulûn fe ‘ulûn fe ‘ul

Muteqarib · — — / · — — / · — — / · —

1. Mujûl be bi ‘ilmê wî çêtir bigir
Ji cehla hevalan dikê bêqedir
2. Bi wê nûr bike çavê teqwayiyê
Wekî roj bidê xelqê ronayiyê
3. Nebêje yeqîn ehlê wî kes nema
Ewê têr vexwê ê herê ber çema
4. Ji bona ‘emel ‘ilmê kamil bike
Bi qasî dinê xêrê ḥasil bike
[r. 109]
5. Ḥubba geyra bavêj bilind tê bibê
We ger bigrê geyra tê meḥzûn bibê
6. Gelo kanî ê zêr hebûn tev de çûn
Dibêjin hebûn hin dibê qeṭ nebûn
7. Gelo ka şugulkar di êvar û ro
Binêre ewan te‘b tamam çû bi ro
8. Gelo ka ewê zîv hebûn zîvhelên
Mirin çûne wan tîrbê hestîrizên
9. Gelo kanî ew kedkerê vê dinê
Ji wa yek xuya nakê ka qenc binê

10. Gelo kanî heccacê beyta Xudê
Ewan dengê zîkrê gihaba Xudê
11. Gelo ka mezin ê qesir çêkirin
Mirin nû du destê xwe wan gez kirin
12. Gelo ka ev û ev ev û ev gelo
Bela bûn ji hev wek kereng û çilo
13. Tefekkur bike ya 'ezîzê delal
Xusar nîn e ger xwe bidê zilcelal
14. We'iz ke li xwe hem bide guh li vê
Du çavê te rohnê bibin ger bivê
15. Ji bo xêr temam bê tû daîm mudam
Xebatê bike tê gihê her meram
16. Me 'ef ke bigefrên bi fezla mezin
Bi rehîma xwe da em şepirze nebin
17. Me nespêre geyra li hawar werê
Bihiştî ye ê tû li hawar werê
18. Îlahî şelatê bide gel selam
Li ser qencê xelqê heta her heyam
19. Di gel al û eşhabê kamil dibûn
Çikû 'alim û hem jî 'amil dibûn
20. Xelasek me hemdê Xudê bû du'a
Sîraco tû vê şîretê nek zi'a

68

Adar - 5-1375 (Mld. 1956)

Bi munasebeta qadrogirtin û çûna min a Behmûr³⁶⁷ û hesûdiya hesûdiyan

Mustefîlun mustefîlun

Recez - - - - / - - - -

[r. 110]

1. Tarîx hezar û neh sed in
Heftêy û yek salê me bû
Qur'a Nebî Yûnus³⁶⁸ li min
Ketbû yeqîn şensê me bû

³⁶⁷ Behmûr gundekî Cizîrê ye.

³⁶⁸ Di gemiyê de sê caran pişkê dikişînin û her sê caran jî pişk li Nebî Yûnus dikeve û wî ji gemiyê davêjine behrê de. Êdî li vê derê telmîha wê qissetê hatiye kirin.

2. Va'j (Enqere) dîn amirê
Bo –cizre- qadro jê b'girê
Ê îmtîhana wê bidê
Go yek ji îmamê me bû

3. Wek sîsyark³⁶⁹ û dubirak³⁷⁰
Şeş heft melayê naz û pak
Kom bûn li birhana kelaş
Kî bighiyê bazê me bû

4. Girtin qelem kaxed çî têz
Wan (**sîn û cîm**) tev kirne rêz
Muftî (qomîsyon) kom dîkir
Guhdar û serdarê me bû

5. Tali' dema defter vekir
Yek yek li nava meyze kir
Ser şefheyê –not û puwan-
Sîrac Atac navê me bû

6. Binhêre ka wî çî ji me kir
Zahir derê cennet vekir
Cih kir guhê dehşê decal
Batin de lew narê me bû

7. E'j nav hevala çik kirim
Ji derd û bela re pik kirim
Nêv Dicle û dola birok
Noq dam gemîvanê me bû

8. Bêşubhe car dî bêmîsal
Wek Yunûsê hal bûye hal
Ew sahibê hût bûye hût
Gep kir me go rizqê me bû

9. Hûtê di Dicle bo rehim
Go ger evê loqmê nexwum
Çî b'kim ji mar û selhefat³⁷¹
Daxwaz ev e l'bayê me bû
[r. 111]

10. Heta qiyamet ranebê
Wê ev di betnê min de bê
Me'yûs û bêhêvî me hişt

³⁶⁹ Teyrekî dirinde ye. Bi Tirkî “akbaba”.

³⁷⁰ Teyrekî dirinde ye.

³⁷¹ Kîso, kosî.

Yexsîr û mehbûsê me bû

11. Ya rastî hût rastî digot
Nik min nedît pismam û dot
Tarîtiya av û zikê
Reş bîra Ken'anê me bû
12. Bûm gerqê gêra gelkî kûr
Ya kû (ji Behmûrê bibûr)
Lê bo mesel mam tê de lew
Hût talî'ê wextê me bû
13. Kengî – Beko- evna kirî
Men'a jin û mêr jev kirî
Bes gote –Mîr- Zînê mede
Lew Mem ji Kurmancê me bû
14. Wellahû xeyru'l-makirîn³⁷²
Layehdî keyde'l-xaînîn³⁷³
Nedwetgerênê³⁷⁴ roj û şev
Pîlangirê pîlê me bû
15. Çi d'zanê kû rebbê qedîr
Çêkir bi 'usrê re yesîr³⁷⁵
Emr û îrade her ji wî
Ew xaliqê fî'lê me bû
16. Bêşek me zanîbû me kes
Nîn e bi wîna daderes
Îlla Îlahî bê şerîk
Ew hafîz û yarê me bû
17. Bang kirye wî ba zar û ah
(Geyrî te nîn in tû Îlah)
(Subhân ji te E'ji zalima
Me) xalibê emrê me bû
18. Wî l'banê banî his dikir
Qufla derê qehrê vekir
Wek xwe ne wek min çêkirî
'Ebd im çikû rebbê me bû
[r. 112]
19. Wîna heme bang kir melek

³⁷² Xwedê di nava kesên ku xefkan divedin de yê herî bixêr e. (Sûretê Al-î Îmram, ayeta 54emîn).

³⁷³ Xwedê hîleyên xaînan nabe sêrî.

³⁷⁴ Cîvatgerên.

³⁷⁵ Bi zehmetiyê re hêsantî jî çêkir.

Hût bêne ber burca belek
Yûnus ji zik derxêne zû
Lew şalihe 'ebdê me bû

20. Got min xilas kir ew ji gem
Halo çû mu' min dem bi dem
Dê em xilas kin her kesê
Hawar bivê navê me bû

21. Çawa xilasî daye min
Bo her kesê îman he bin
Hawar çi ye xeyrê ewî
Kî kaşifê kerbê me bû

22. Şukr û sena medh û pesin
Ya Rebbena her bo te bin
Bo her kesî bo her kesî
Dost û diloanê me bû

23. Ka bes binale herfê **Sîn**
Zêdey te ne sê nuqtê şîn
Zanim yeqîn herfa henê
Yan şîn e yan şeynê me bû

24. Qasî çîqa xettê qelem
Ser kaxedê danî reqem
Ser Ehmedî bin sed şelat
Xetma xett û nuqtê me bû

69

Teşrînî Sanî - 14- 1389 (Mîd. 1970)

Mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. L'kewgîriyê Mehmed Begî gerham bi ser dûde³⁷⁶ ve bûm
Kewgîriya kêrra me kir b'ser girtina kîso ve bûm
2. Nêzî derêxistim ji mal meşham li sûk û çarşiya
L'bêhna kebaba çûm bi ser daxa kerê kurmî ve bûm
[r. 113]
3. Wek sofîyê teşbîh bi dest himmet ji şeyxan min dixwest
Emma çi fayde rast bi rast bi ser keydê³⁷⁷ şeytana ve bûm
4. Qelbê selîm bûbû teji j'hubba hevala wek qulung

³⁷⁶ Kurm.

³⁷⁷ Xefk, kemîn.

Gerham li dostê rast bi ser dostaniya rûvî ve bûm³⁷⁸

5. Tev bûme gem teşbîhê Mem hawar e Tacdîno çikû
Bextê me reş bû lew bi ser Bekwê Le'în 'Ewwan³⁷⁹ ve bûm
6. Ava şetê wek şerbetê bûbû mereq kû qur bikim³⁸⁰
Hayhayî derbas bûm bi ser govşa³⁸¹ rehê rûlê³⁸² ve bûm
7. Şînatiya dar û devî mehbûbê teb'ê her kesî
Me j' Cûdî ev menzer diva b' ser kirraj û kêrre³⁸³ ve bûm
8. Me d'eciband 'erda bilind ava bikin bajar û gund
Nişkê ve wer bûm û bi ser Behmûr³⁸⁴ û Dola Kûr³⁸⁵ ve bûm
9. Qencê limêjê pey îmam her du ne ev subh û 'işa'
Her min divan lê wey gidî bi ser tarikê cum'a ve bûm
10. **Sîrac** edîbê vê demê xwestî bikê suhbet di gel
Raziyy û sê nalê bi ser (Îbnû Hebenneqe) ve bûm

70

Eylûl-16-1390 (Mîd. 1971)

Fe'ulûn fe'ulûn fe'ulûn fe'ul

Muteqarib · — — / · — — / · — — / · —

1. Cîvata zemanî giran bû bi min
Ji ber wê revîm şubhê cinn û hesin³⁸⁶
[r. 114]
2. Di nav 'alema dostiyê ger me kir
Li xwe te'b û îza gelek pur me kir
3. Gelo geş li min bû wekî kerbeşî
Bi min nêrgiza ter bû tayê heşî
4. Heta qîr li min bû benîştê sipî
Ji 'eczê ketim bê ser û dest û pî

³⁷⁸ Li vir telmîha çîroka "Quling û Rûvî" kiriye. Ev çîrokeke meşhûr e û di çîrokê de her dem rûvî hîleyan li quling dike. Êdî ku dostaniya hinekan ne durust be, jêre dibêjin "dostaniya quling û rûvî".

³⁷⁹ Şexsekî di Mem û Zînê de ye ku bi fitnekariyê meşhûr bûye.

³⁸⁰ Qurkirin: Vexwartin.

³⁸¹ Govş: Tişt ku hatiye guvaştin. Meqsed ji vê, tişt tehl û pîs û zilindar.

³⁸² Cureyekî dar/deviya ye û ava pelê wê tehl e. Bi Tirkî zakkum.

³⁸³ Kirraj û kêrre: Cihê ku nayê cotkirin, hişkeber.

³⁸⁴ Navê gundekî Cizîrê.

³⁸⁵ Navê gundekî filehan ye li herêma Silopya.

³⁸⁶ Di çîrokên Kurdî de tê gotin ku cin ji hesin ditirsin û ji dengê hesin direvin.

5. Mera kû bibînim qe dilşa nekir
Dido rast bi hev re me peyde nekir
6. Hemî sohbet û guftûgo bil‘umûm
Xeberdanê pûç in netîce humûm
7. Ji ber kû me tê de nedîn dostê rast
Revîm da nebê tê de şîrê me mast
8. Me rabû kitêba xwe carek vekir
Li dehla kelam û luget meyze kir
9. Li nav şax û tirhê hurûfa meşîm
Li nuqtê beh û sêvê wan bûm gerîm
10. Ser û ber pel û çiçekên her yekî
Difûrîn ji bêhna xweş ew regekî
11. Were van elîfê wekî qedd û qam
Were “Cîm”ê anîne bîra me cam
12. Me şubhandî ha mislê biskê xelek
“Eyin” nav e bo her du çavên belek
13. Heçî “Ha” e hîlm û henûna hebîb
Heçî “waw” e weşl û ‘etif kir neşîb
14. “Rê”ya wek du burhan û “Nûn” erzenî
“Sê”a sê nuqut tê de bêşek enî
15. Beşaş in wekî “Geyn”ê hin devjev in
Temîs in wekî “Mîm”ê hin bêdev in
16. Hinek herfê meddê çi xweş radibin
Hinek herfê lînê li teb‘ê min in
17. Hinek herfê helqê dihatin zuhûr
Hinek şubhê “Ra” geh zirav geh sitûr
18. Hurûfê di şemsî ne hin ê qemer
Hinek qelqeke kû sukûn bête ser
19. Hinek mu‘telîf bûn bi deşm û bi derc
Hinek munqelîb hin xefî bûne qenc
[r. 115]
20. Hinek têne îşmam û rewm û fexim
Îmale dibin hin di lefz û kelim

21. Hinek sakin in hin bi cezm û bi ber
Bi şeddê ne hin jî bi cir hin bi ser
22. Qebûla cerr û nesbê ser xwe dîkin
Hinek jî hevalê xwe merfû' dîkin
23. Bi cezm û nesîb hin li hinka siwar
Ji wan kirye yeğma siwar û guhar
24. Were cumleyê mubteda û xeber
Were fi'lê fa'îl li ser qal û şer
25. Were ê mu'elley bi şert û ceza
Hinek mu'reb in hin qe nîn in bina
26. Ji wan îsm û fi'l in hinek fa'îl in
Hinek mudmer in hin ji wan 'amîl in
27. Hinek va heval in ji bo Zeydî hin
Li 'Emrî dixistin bi derba mezin
28. Hinek wey le'ellî weleyte³⁸⁷ xwezî
Dixwestin kû bigrin bi baqê kezî
29. Çi xweş şox û şeng in hinek nazenîn
Şepal in hinek şubhê Şîrîn û Zîn
30. Dilê min ketî wan hurûfê selîs
Evîndarî bûm rengê bûk û 'erîs
31. (Fenafîl-hurûf bûm)³⁸⁸ di vê meclîsê
Gerîq im ji bêhna gul û nercîsê
32. Me xwestî kû heta piçek rûh hebê
Ji vî buxçeyî derketî qet nebê
33. Çikû 'alema kubr û sugre hemû
Di nav de he ye bêguman mû bi mû
34. Çi tiştê kû dilxwaz û vîna te bê
Di dehlê hurûfa de peyde dibê
35. Guvaşa ney û sunbulê wan vexwar
Ji fêkî û tîrê hinara me xwar
36. Me qur kir peyala meya ehrufa

³⁸⁷ Xwezî, xweska.

³⁸⁸ Di nava herfan de tune bûm, wînda bûm.

Ji hiş çûm li ber dengê nay û defa

37. Di nav ‘alema wan de bûm har û dîn
Bi şekl û bi me‘na kû min cumle dîn
[r. 116]
38. Xulase me tev dîn wekî sor gula
Li ser wan me xwendî wekî bulbula
39. Ji wan cumle şan bûme razî dema
Yekayek me nasîn welakîn ema
40. Belê bes du herfa kirim dilbirîn
Li şeklê yek in lê ji hev re bi kîn
41. Xeta musteqîm in serê her duwan
Bi dûvê xwe xwehr in wekî kaşîwan
42. Ji wan sirrê wan û ‘ecêbmayî bûm
Bi dîqqet bi hîkmet nezerdarî bûm
43. Dema muhmel in du bura ne yeqîn
Di eşkalî jev re (xesîmun mubîn)³⁸⁹
44. Ji wan “Sîn” e yek jî bi re’ya sedîd
Ewa dî kû “Şîn” e bi şohret şedîd
45. Me rabû bi “Sîn”ê re sohbet kirî
Ji vê hîkmeta ha su’al jê kirî
46. Çira tû hevala xwe pev nakevin
Çîqa werne xîzê neyarê hev in
47. Dinêrim kû hûn her du tên bê nuqet
Dibin xwendevanê we şaş û gelet
48. Sebeb çî bi sê nuqteyê herfê “Şîn”
Beyan bû di nabeynê beyna bibîn
49. Wekî gotina ha kû min gote wê
Cewab da bi ezmanê halê xwe wê
50. Çî purs e ji min tû dikê lo kuro
Bi cezbê ‘eqil pur dibê ro bi ro
51. Ji bo min tû mensûb î lew tû ji min

³⁸⁹ Neyarê eşkere. Qismek ji ayeta 77an ya Sûretê Yasîne. Ev îfade di hinek sûretên dî de jî heye.

Dixwazê kû keşîş kim sirra pur mezin

52. Bi min tû diêşê tû dostê min î
Bi şekl û bi me' nî hevalê min î
53. Yeqîn wek te ye her yek in "Sîn" û "Şîn"
Belê "Şîn"ê sê nuqteyê min dizîn
54. Ewê "Ya" û "Nûn" bo xwe çimkû birin
Ji lew em ji hev re (bi zîq û zir in)
55. Bi wan her sê nuqta gelek bû kubar
Li min bar dikê herî û zerbê gedar
[r. 117]
56. Me got "Sîn"ê e'j'te qe bêbawer im
Kû (Cîm) sawcîm bû we hem hekem im
57. Çikû "Şîn" e pênc car li te dercûmel
Tû şêst î ew "Şîn" sê sed e bê cedel
58. Ji wê re hesûd î kû hem ew ji te
Bi taca serî kifşî bûye ji te
59. Eger çi dema muhmel in wek hev in
Belê der hesabî neqîdê hev in
60. Ewî gote min pa çira nanerê
Li me' na min û wê di xeyr û şerê
61. Se'îd im siyaset selamet ji min
Suhûlet sukûnet ji ewşafê min
62. Siyadet sîqayet sumû û surûr
Ji "şîn"ê şîqaq û şeqawet şurûr
63. Şe û şewtik û şerbikê wê he ne
Li wê şer û şehwet gelek zêde ne
64. Se'adet sedîd in şelatîne "Sîn"
Şeqawet sedîd in şeyatîne "Şîn"
65. Tû nabîne Seyda bû Şeyda mela
Dema "Sîn" bi "Şîn"ê ve bû mubtela

71

Teşrînî Sanî - 24- 1389 (Mîd. 1970)
Di 'eqîdeya îman û îslamê de

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · -

1. Ger bipirsin ji te kes ruknê di islamê bira
Bêj şhadetdan e hem dana zekatê ey çira
2. Girtina rojî û hem kirna limêjê ferz e hem
Hecc e ger mal hebê hem mani' nebêtin ji te ra
3. Ruknê îmanê şeş in bo te beyan kim ey delal
Da bizanê ê nekê bawer bizan ew kafir a
4. Ewwela îman û iqrar bike Ellah yek e her
He ye dê her hebê nîn in weke wî qet li dera
5. Hem bizanê he ne bona wî melaîk bê'eded
Hem kîtabê wî heq in ew sed û çar in wek çira
6. He ne pêgember sed û bîst bi hezara tevlî çar
Ewwelê wan Adem e *Seyyîd Muḥemmed*³⁹⁰ axir a
[r. 118]
7. Hem bizan roja qiyamet he ye ku piştî mirin
Her kesê sağ bê biçe yan cennetê yan agira
8. Hem qeder rast e çîqa bê serê mexlûqa ji xeyr
Yan ji şer cumle bi teqdîra Îlahê Ekber e
9. Vê bizan şertê mezin bo dînê Îslamê ev in
Bo Muḥemmed selewat **Sîraco** xufran ji me re

72

Şubat – 7-1370 (Mld. 1951)

Di behsa şî'r û mektûb û tercuma de ewwel di behsa xesaisê nebî (selellahû 'eleyhî wesellem)

Fe'ulun fe'ulun fe'ulun fe'ul

Muteqarib · - - / · - - / · - - / · -

1. Nebiyê me şeytanî pêlê nekir
Siha wî li 'erdê xuya qet nekir
2. Ne bawuşk û razanê qelbî nebû
Ji ber wî tu heywan reva wan nebû
3. Ji paş ve didît wek li pêşa xwe wî

³⁹⁰ Sellellahû eleyhî wesellem.

Nedît kes tu destav li ‘erdê ji wî

4. Li ser wî nedanîbû mêşa yeqîn
Sunnetbûwî ew hate rûwwê zemîn
5. Milê wî bi ser ehlê meclîs diket
Kesê kû jiber kê evan bêgelet
6. Emîn dê bibê ew ji dizy û şewat
Di gel derdê pîra newê wî tebat
7. Şelat û selam ser bibarin ji reb
Bi wî ya Xuda bid **Sîracî** ireb

73³⁹¹

Nîsan -22-1375 (Mld. 1956)

مفاعيلٌ مفاعيلٌ مفاعيلٌ مفاعيلٌ

Mefa ‘ilûn mefa ‘ilûn mefa ‘ilûn mefa ‘ilûn

Hezec · - - - / · - - - - / · - - - / · - - -

الا لا تكثر الهمُّ فما قدّرتِ كانتِ
وما ترزق فيأتيك وما لم تقدّر زالتِ³⁹²

وما شاء الله الخلق موجود ضروري
وما لم يفعل الله فمعدوم كما زاغت³⁹³

لأنّ الله فعّال لما شاء بلا ريب
فحزنك من الجهل بما من ربّنا جا ئت³⁹⁴

وإنّ العسر واليسر بأمر الله يلجان
كما لاج الدجى في الضوء تقدير به قامت³⁹⁵

مستفعلٌ فاعلٌ مستفعلٌ فاعلٌ

[r. 119]

كلّ يا أخي الصّبر واليغنى عن الحنظل
لأنّ أثماره أحلى من العسل³⁹⁶

والصّبر في كلّ حالٍ من لوازمك
عند الرّجاء وعند الضّيق والأمل³⁹⁷

³⁹¹ Ev helbest bi Erebi ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nîşan daye.

³⁹² Bala xwe bide pir zêde xem nexwe tişta ku qeder e çêbûye/Tiştê ku ji te re wekî riziq hatiye teqdîrkirin wê were, ya ku nehatiye teqdîrkirin çûye.

³⁹³ Tiştê ku Rebbê mexlûqan xwestiye heye û zerûrî ye/Tiştê ku Xudê neke, tune ye û ji holê rabûye.

³⁹⁴ Lewra Xudê tiştê ku dixwaze bêşek dike/Xemgîniya te ji cehaletê ye di derbarê tiştê ku ji Xudê hatiye.

³⁹⁵ Bêşek zehmetî û hêsanî bi emrê Xudê di nav hev de ne/Wekî ku tarîfî û ronahî di nava hev de ne û teqdîra Xudê ye.

³⁹⁶ Ey birayê min sebrê bixwe ji giyayê tehl dûr be/Lewra fêkiyê wê ji hungiv şîrîntir e.

³⁹⁷ Sebir her wextî ji hewceyiyên te ye/Di wextê teng û fereh û hêviyê de.

والصَّبِير مفتاح كلِّ فرجة غَلَّتْ
بِالنَّائِبَاتِ الحَدِيدِ ايَّ منقَلٍ³⁹⁸

وصاحب الصَّبِير ظافرٌ بما نابِه
من الشَّدَادِ والأهوال كالجبل³⁹⁹

وناطم الخطَّ يَرجو دعوة القارئ
هو الحَقِير سراجُ سيِّئِ العمل⁴⁰⁰

مفاعلٌ فاعِلٌ مفاعلٌ فاعِلٌ

لسانكُ لسانكُ يا مريد السَّلامَةِ
فإنَّ اللِّسانَ مَقَعَ في النَّدامَةِ⁴⁰¹

ولا تكثر القول بلى كن كأبكم
أذا لم يسلك المرء طالب حاجة⁴⁰²

وان كان زينٌ نطق أهل النَّكَمِ
ولكنَّ اكمال اللب بالصِّيَانَةِ⁴⁰³

وسهم اللسان من حديدٍ مسدَّسٍ
ولم يخط قطَّ راميٌّ بالفِضاحَةِ⁴⁰⁴

74⁴⁰⁵

Temûz - 15 – 1365 (Mld. 1946)

ومن يَتَّقِ الله يجعل له مخرجاً
ويرزقه من حيث لا يحتسب⁴⁰⁶

وبجعل لكلِّ الأُمور به فرجاً
ويكفِّر ذنوباً فقم وانتسب⁴⁰⁷

ظننت العلم أوْله مرار
علَّمت العلم آخره حلاوه⁴⁰⁸

³⁹⁸ Sebîr meftih e di wextê ku hemî derî girtî ne/Di dema ku nobeçiyên hesinî hemî der girtine.

³⁹⁹ Xwediyê sebrê her dem serkeftî ye/Li dijî şiddetê û ji tirsê weke çiya.

⁴⁰⁰ Xwediyê vê xettê hêviya dua'yên xwendevanî dike/Sîrac e yê xirab û xwediyê 'emelê nebaş.

⁴⁰¹ Emamet zimanê te emanet zimanê te heke tu selametê bixwazî/Lewra ziman mirovan poşman dike.

⁴⁰² Zêde neştexile weke kesên lal bibe/Wextê ku ti hewceyîya te bi axaftinê tune be.

⁴⁰³ Welew çiqas xebardana wî xweşik be jî/Qaîmkirina êqil bi muhafezekirina zimên e.

⁴⁰⁴ Tîra zimên ji hesin e û hesinekî şeş per/Bi zimên xeta neke ti caran lewra hetiketiye tîne.

⁴⁰⁵ Ev helbest bi Erebi ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nîşan daye.

⁴⁰⁶ Ew kesê ku ji Xudê bitirsê, xudê wê wî ji zehmetiyê derbixe/Xudê rizqê wî ji cihekî ku hêvî nake wê bişîne

⁴⁰⁷ Xudê wê jê re çêbike ji çiqas karê wî re fereceke derbixe/Xudê wê gunê wî jî efû bike, tu rabe û berê xwe bide Xudê

ظننت الجهل أوله حلٌّ
علمت الجهل آخره مراره⁴⁰⁹

فإن كنت اللبيب فلست تطلب
من الشيء وفي الأول حلاوه⁴¹⁰

وتأخذ أنت بالأشياء مافى
اوانلها اخى شئى مراره⁴¹¹
[r. 120]

ابعد العسر يسراً ما سمعتم
فإن فكرت هذا فى الحلاوه⁴¹²

لتأخذ أنت بالمعلوم حتماً
وتترك ما فى آخره مراره⁴¹³

75⁴¹⁴
يا رب تدرى شقوتى وقباحتى
انت ابتليت العبد بالمعصية⁴¹⁵

فبحق طه يا الهى و سيدى
كفر ذنوبى وامح عنى خطيئتي⁴¹⁶

فالذنب قد ضاقت صحائفى كلها
والعفو يحسبها كحجم الذرة⁴¹⁷

انت العفو لكل عبد مذنّب
انت المجيب لمستجيب الدعوة⁴¹⁸

يا رب فاغفر جم ذنوبى يا غفور
واستر عيوبى واجمعن بحبيبتى⁴¹⁹

ثم الصلوة والسلام دائماً
على النبي الشفع للأمة⁴²⁰

⁴⁰⁸ Min pêşiyê zen kir ku ilim tehlî ye/Lê ez niha dizanim ku dawîya ilim şîranî ye

⁴⁰⁹ Min zen fikir ku cehalet şîrîn e/Lê min fêhm kir ku taliyê wê tehl e

⁴¹⁰ Heke tu insanekî bîaqil î/Tu di destpêkê de şîraniyê naxwaze

⁴¹¹ Wextê ku tu rajê tiştekî/Di destpêkê de tehlî heye

⁴¹² Piştî zehmetiyê hêsantî heye ma we ne bihistiye/Wextê ku tu vê bifikirî ev di şîraniyê de ye

⁴¹³ Ji bo ku tu bigirî tişta qetî rast e/Tiştê ku di dawîya wê de tehlî heye terk bike

⁴¹⁴ Ev helbest bi Erebi ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nişan daye.

⁴¹⁵ Ya Rebbî tu neqenciya min xetayê min dizanî/Te ebdên xwe bi gunehan îmtihan kirine

⁴¹⁶ Tu bi heqqê Taha bike ey Xudayê min û seyîdê min/Gunhê min efû bikî û xetayê min jî ji ser min rakî

⁴¹⁷ Gunehan hemî deftera min tijî kirine/Qencyên min jî bi qasî zerreyekê cih girtine

⁴¹⁸ Tu ji bo hemî ebdên gunehkar Efûww î/Tu cewab didî û tu du'ayan jî qebûl dikî

⁴¹⁹ Ya Rebbî tu hemî gunehên min efû bikî ey Yê Xefûr/Eybên me jî veşêre tu min bigihîne dostên min

⁴²⁰ Piştê selat û selamên bêdawî/Li ser wî nebiyyê ku Şafiê ummetê ye

والآل والأصحاب والأزواج وال
اولادهم اصحاب حسن السيرة⁴²¹

76⁴²²

تذكر أيام الصبالي مصيبة
فروحي وريحاني في طيب عشرة⁴²³

مضى زمن الجهد بجهل و غفلة
فهل لي تذكر في أيام يقظة⁴²⁴

الا ائما وقت الشباب نجيمة
تأقل لما جاء شيب بفجأة⁴²⁵

كثرت ذنوبي ربّي كالزّمال
بل زائداً ربّي وكالجمال⁴²⁶

قد سؤدت صفحي من الذنوب
والخير باعد منّي بالأميال⁴²⁷

والعالمون جميعهم يحزّروني
حذر العصافير من الأنبال⁴²⁸
[r. 121]

فاغفر الهي ربّ لهذا الفقير
المذنب العاصي ذي الفعل⁴²⁹

ثمّ الصلوة والسلام سرمداً
على النبيّ وصحبه والآل⁴³⁰

77⁴³¹

لقد كلّ طبعي فهو غير مميّز
لأنّ الحجر والدّر عنده سيّان⁴³²

ايا قلبي الأعمى تفكّرت فيك إذ
هجرت ففبك النّار تلهب كالبان⁴³³

⁴²¹ Li ser alê wî eshabên wî û pêrekên wî/Û ewladên wî ewên ku xwediye jiyanekê spehî ne

⁴²² Ev helbest bi Erebi ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nîşan daye.

⁴²³ Biranîna wan rojên zaroktiyê ji bo min musîbetek e/Rûhê min rûhaniyên min di heyateke xweş de ne

⁴²⁴ Zemanê cehd û xîretê bi cehl û xefletê derbas bû/Di zemanê şiyarbûna min de qey wê feydeyekê bide min

⁴²⁵ Ey wextê xortaniyê ku wekî stêrikeke piçûk e/Weke stêrikeke piçûk ku di demeke kin de here ava ku pîrîti hat

⁴²⁶ Xudayê min gunehên min zêde bûne wekî qûmê/Ji qûmê ji zêdetir bûne wekî çiya ne

⁴²⁷ Rûpelê deftera min ji gunehan reş bûne/Xêr ji min dûr ketine bi mîlan

⁴²⁸ Hemî alim min ditirsînin /Weke ku çûk ji tîrê ditirsîn

⁴²⁹ Xudayê min tu vî feqîrî efû bikî/Vî gunehkarê asî û fêlxirab

⁴³⁰ Piştî selat û salamên daîmî/Li ser nebî û eshab û alê wî be

⁴³¹ Ev helbest bi Erebi ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nîşan daye.

⁴³² Tebîetê min kuh bûye û nikare tiştan ji hev derxe/Lewra li cemê kevir û durr weke hev bûne

ويا مجرمًا صبراً فقد قال ربنا
فإن مع العسر يسراً بدوران⁴³⁴
-*-

سلام عليكم متى ما شعشع ال بدر
وما طلعت شمس وما دور الدهر⁴³⁵

رسول الإله يا شفيعاً لعثرتي
ويا نور عيني ما بقى لى بك الصبر⁴³⁶

أناديك كل اليوم بالصيحة العليا
وأرجو شفاعتك إذا قامت الحشر⁴³⁷

جمالك لى فخر ولسائر الخلق
ونورك مشرق بها البر والبحر⁴³⁸

78⁴³⁹
مفتعل مفتعل فاعل
Mufte 'ilun mufte 'ilun fa 'ilun
Recez - . . - / - . . - / - . . -

يا مرحباً أهلاً وسهلاً بكم
قد فرّح قلبى برويتكم⁴⁴⁰

واحتريت قلبى بتلك النوى
فالحمد لله وصلنى بكم⁴⁴¹

إن لى كربة إلا هذا النوى
إن لى فرح إلا تقبيلكم⁴⁴²

ففى هذا اليوم زاحت ضيفتى
وغاب جنونى ولهفى بكم⁴⁴³

أقسمت برّب الورى أنت لى
طبيب وروحي فداء لكم⁴⁴⁴

⁴³³ Ey qelbê min ê kor min di te de tefekkûr kiriye/Wextê ku ez hatim terkkirin, di te de agir pê dikeve weke dara banê

⁴³⁴ Ey ew kesê gunehkar sebîr bike, lewra xudê gotiyê/Pîştî tengasiyê ferehî vedigere

⁴³⁵ Selam li ser te be, heta heyv ronahiyê bide/Û heta ku roj jî bihilin, heta ku zeman jî dewr bike.

⁴³⁶ Ey Resûlê Xudê ku şefaetê dide ji bo xetayên min/Û ey nûra çavên min êdî bête teбата min nayê.

⁴³⁷ Ez bangî te dikim temamê rojê bi dengê bilind/Ez hêviya şefaeta te dikim di dema qiyametê de.

⁴³⁸ Cemala te ji bo min fexr e û ji hemî muxluqatan re/Nûra te jî ronahiyê dide behr û bejê.

⁴³⁹ Ev helbest bi Erebi ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nîşan daye.

⁴⁴⁰ Mereheba û ehlen we selhen ji we re/Bi dîtina we dilê min xweş dibe.

⁴⁴¹ Qelbê min şewitî bi wê dûrbûnê/Hemd ji xudê re ez gihandime wan.

⁴⁴² Ji bo min ti xem nîn in ji xeynî vê dûrbûnê/Ji bo min ti keyfxweşî jî tune ne ji xeynî maçkirina we.

⁴⁴³ Ew tengasiya min îro hemî çûn/Dînbûna min jî çû û hesreta min jî bi wan çû.

⁴⁴⁴ Min sûnd xwariye bi rebbê kainatê ji bo min/Tu doktor î ruhê min jî te re feda be.

أَقْبَلْ فِي هَذَا الْيَوْمِ خَدًّا
وخالاً وجبهاً ووجهاً لكم⁴⁴⁵
[r. 122]

يا ليت لنا على هذا الحب
أدخلنا الجنة ربنا بكم⁴⁴⁶

جننا وقدمنا ومثينا في
هذا الوقت لأجل إقبالكم⁴⁴⁷

فسين وجيم جاء معذراً
من ذالك الجنب بشرفكم⁴⁴⁸

فأقبلوه واقبلوا عذرتة
فأهلاً وسهلاً بقدمكم⁴⁴⁹

79⁴⁵⁰

Şiyandim bi bal muderrîsên îmam xetîba Mardîn

جنناكم ببضاعة مزجات
أوفوا لنا الكيل من الصدقات⁴⁵¹

ما مثلنا في فحصكم الاكمن
يطلب في التوروز بذل صلات⁴⁵²

رحماكم المدعور - د س - يأمل
والله يجزي اجر ذى الحسنات⁴⁵³

حاجي و فكري اصطفى احسانكم
قد يحمد الصائم فهم عظات⁴⁵⁴

بكر أيا استاذ بالجوذ على
طلابكم طلاب ذى التفحات⁴⁵⁵

الرحم للرحماء مصدوق به
كونوا رواد المجد للطلبات⁴⁵⁶

⁴⁴⁵ Di îro de ez rûwan maç dikim/Xala, enî û rûwê we.

⁴⁴⁶ Xwezî ji me re ji bo vê hezjêkirinê/Rebbê me em bi we xistibana cennetê.

⁴⁴⁷ Em hatine û pêş ketine û em meşîne di vî wextî de/Ji bo pêşwazîkirina we.

⁴⁴⁸ **Sîn û Cîm** hatiye û uzrê xwe dixwaze/Ji cenabê we bi şerefa we.

⁴⁴⁹ Wî bidine xebirdan û uzrê wî jî qebûl bikin/Û ehlen we sehlen li ser hatine we.

⁴⁵⁰ Ev helbest bi Erebi ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nişan daye.

⁴⁵¹ Em hatine bal we bi malekî hindik/Malê me hindik e hûn temam kin.

⁴⁵² Nîn in yên weke me di lêkolînê wextê ku hûn li tiştên veşartî digerin/Di newrozê de teleb bike, qencyê bike.

⁴⁵³ Rehma we ya ku tê hêvîkirin hêvî bike/Xwedê ceza dide xwedyê xêra wa.

⁴⁵⁴ Me ev malik rast bi me'ne nekir. Ji ber vê yekê me wergera wê nekiriye.

⁴⁵⁵ Ecele bike ey mamosteyê min bi camera/Li wan kesên qenc û hêviya qencyê ji we dikin.

⁴⁵⁶ Ji kesên ku ehlê rehmê bin mirov hêviya rehmê ji wan dike/Bibin kesên ku qencyê dikin ji teleba re.

صحو الزّمان كن قريباً دأعماً
يرعاكم المولى من الكدرات⁴⁵⁷

اهدى الى خير (امام الخطبا)
ازكى صلاة الحرف والحركات⁴⁵⁸

80⁴⁵⁹

Eylül - 25-1971 (Mld. 1952)
و ايضاً الى المدرّسين المذكورين باللغة التّركيه

We eyzen îlel muderrîsîn el-mezkûrîne bi-llugeti T-turkiye⁴⁶⁰

Mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun

Recez --- -- / --- -- / --- -- / --- --

1. Ey muhterem hocalarım topunuzun çapındayım
Öldürmeyin bir hocayım çalışalım yol alalım⁴⁶¹
2. Şu atlasın bilgileri denizaltı gemileri
Kaptansınız hocaları kurtar aman yol alalım⁴⁶²
[r. 123]
3. Kimi sever tahrib eder kendi eliyle yaptılar
Yapi inanmaz⁴⁶³ bu haber çalışalım yol alalım⁴⁶⁴
4. Sizden izin aldım size geldim şu aç kapınıza
Vardım izin verin bize hoşça kalın yol alalım⁴⁶⁵

81

Hatiye tercumekirin ji 'erebî ji gulîstana şîrazî⁴⁶⁶

Mefa 'îlûn mefa 'îlûn fe 'îlûn

Hezec . - - - - / . - - - - / . - - - -

⁴⁵⁷ Di zelalbûna zemên de dewamî nêzik be/Xudê we biparêze ji tiştên nebaş.

⁴⁵⁸ Ez hediye dikim bi bal insanên qenc ve (Îmam Xetîban) ve/Selatên herf û herekatên herî paqij

⁴⁵⁹ Ev helbest bi Tirkî hatiye nivîsîn. Qismê pêşî, Tirkîya eslî ye û di pe yre jî wergera wê ya bi Kurdî heye.. Lê belê ji ber ku hinekî Tirkîya wî zeîf e, baş nayê fêhmkirin, dibe ku me baş newergerandibe.

⁴⁶⁰ Ji bo mamosteyên Zimanê Tirkî yên mezkûr.

⁴⁶¹ Ey mamosteyên min yên hêja, ez ne kêmi we hemiya me/Min nekujin ez mamosteyek im, em bixebitin û bimeşin.

⁴⁶² Zanînen vê etlesê û gemiyên binavger/Mamosteyên wan qeptan in xilas bikin û bimeşin.

⁴⁶³ Em ji xwendina van her du peyvên, ne emîn in. Lê belê tu me'neyeke di jî jê dernediket.

⁴⁶⁴ Hinek jê hez dikin, hinek jî tiştê bi destê xwe çekirine; xira dikin/Ti kes jî vê xebere bawer nake em bixebitin û bimeşin.

⁴⁶⁵ Min ji we destûr stand û birçî hatime ber deriyê we/Va ez hatim, destûrê bidine me bi xatirê we em bimeşin

⁴⁶⁶ Ev not ji aliyê helbestvan ve hatiye nivîsîn.

1. Li çolê dîtî Mecnûn tolê Leyla
Ji wî ra rast dikir daw û dehêla
2. Li wîna lewme kirbûn lewmedara
Digotin qedrê kûçîk girtî weyla
3. Ji wan ra gotî lewma qeṭ nekin hûn
Bi çavê xwe me dît ber konê Leyla
4. Ji bona xatirê wê qedrê se girt
Wekî se qedr e ev ka qedrê Leyla
5. Kesê dostê ji dil bê wê wilo bê
Belê dostî nemaye geyrî meyla

82

Hem dîsa ji 'erebî

Mefa 'ilûn mefa 'ilûn fe 'ilûn

Hezec · - - - / · - - - / · - -

1. Çiqa katib hebin tev wê fena bin
Belê ya kû nivîsandî dimênê
2. Tû nenvîse xetê xwe geyrê tişta
Di heşrê de tû feydê jê bibînê

83

Dîsa ji 'erebî- ji gotinên îmamê malikî r. d.⁴⁶⁷

Fe 'ulûn fe 'ulûn fe 'ulûn fe 'ul

Muteqarib · - - / · - - / · - - / · -

1. Cilê xwe spehî ke ḥeta karibê
Çikû nas bi libsê xwe qîmet dibin
2. Ji bona tewazu' cila gij meke
Xefê te li cem reb hemî zahir in
3. Bi cilkê perîtonk tu nabî bilind
Eger 'asî yî bo Xwedayê mezin
4. Zerar nîn e hem qeṭ j' cilê şal û çox
Dema mutteqî bê tesabîq nebin

84

Hem dîsa ji 'erebî

⁴⁶⁷ Ev not ji aliyê helbestvan ve hatiye nivîsîn.

Mef'ûlû mefa 'ilûn mefa 'ilûn fe 'ulûn

Hezec — — —/· — — —/· — — —/· — —

1. Ecêb e ji bo filhan dibêjin nebî 'Îsa
Kurê xaliqê 'alem hezar carî haşe Ellah
[r. 124]
2. Ji nûka dibê cihûwan dikujtin diselbandin
Eger rast e ev hingî li kûdê bû ew Ellah
3. Eger ew bi vê razî bê naxwe cihû baş in
Ji bo wan bikin şukrê filehno ji bo Ellah
4. We ger ne b' dilê wî bê cihû naxwe pê karin
Ji bo wan bikin ta'et çikû karine Ellah

85⁴⁶⁸

Dîsa ji 'erebî

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

Recez — — —/— — —/— — —/— — —

85 (1)

1. Ya sakîne qesra bilind nêzîk e kû rokî ji va
Te di bin zîkê 'erda giran de rebeno wînda bikin
2. Melek ji bo xaliq he ne her roj dibakin bi yeqîn
Biwelidîn ji bo mirin ava ji bo xira bikin

85 (2)

Dîsa ji 'erebî

Mefa 'ilun fa 'ilun mefa 'ilun fa 'ilun

Hezec · — · —/— — —/· — · —/— — —

1. Qelbê me qutbê me ye lubnan e qalibê me
Sirra me xidr e 'îrfan 'eynûl heyatê me ye
2. 'Eqlê me harûn e ruhê me kelîmê Xweda
Nefsa me Fir'ewn e hem hewa' Hamanê me ye
3. Kesê şeş û carekê vîna bixwîne li xwe
Wê bêjê qolinc ji min çû bû dermanê me ye

⁴⁶⁸ Li vir helbesta 85an heye lêbelê di bin vê hijmarê de du helbest hene. Êdî ji bo ya pêşî em ê bêjin 85 (1), ji ya dî re bêjin 85 (2)

86⁴⁶⁹

Dîsa ji ‘erebî - Şêxê Suheyli Ebdurrehman bîn Muhammed ul xusemî teweffe
sene 581

86 (1)

Mustefîlun mustefîlun mustefîlun

Recez - - . - / - - . - / - - . -

1. Ya ê dibînê ya di dil hem his dikê
Tû yî ê dihejmêrê kû kî çilo çi dikê
2. Ya ê di her tengî reca jê tê kirin
Ya ê ji wî tirs û gileh her kes dikê
3. Ya ê xezîneyê rizqê wî di “kun”⁴⁷⁰ de ne
Xêr tev li cem te ye minnetê bike tû dikê
4. Min nîn e çar geyrê derê te kû lê bidim
Ger bê me vekê li kû derê dê kutan dikê
5. Kî ye ê reca jê kim bi navê bikim hewar
Fezla te ger ji feqîrî xwe men‘ê dikê
6. Haşê ji merdiyê ê neqenc bikê bêreca
Fezla te zehftir e çar ji her gunhan dikê
7. Bi zelîlî hatim ber derî lew zanime
Kû zelîliya dergahê te nef‘ê dikê
[r. 125]
8. Piştî xwe min bi te her girêda tewekkullî
Vekirin du dest hêviy û zar **Sîrac** dikê
9. Tû bi hürmeta ê ku te hez jê kê şiyand
Tû di‘a qebûl dikê ê bi wî daxwaz dikê
10. Me ji tengiya cumla derêxe her li me
Lutfê bike her kes ji te hêvî dikê
11. Paşî şelat bîn ser nebiyy û hogira
Qencî çîqa kes xel bi wî mehder dikê

⁴⁶⁹ Hijmara vê helbestê wekî 86 hatiye nivîsîn, lêbelê di bin vê hijmarê de 3 helbestên ji hev cuda hene. Ji ber yekê em ê wan wekî 86 (1), 86 (2), 86 (3) nîşan bidin.

⁴⁷⁰ Ev peyv ji ayetên quranê hatiye girtin. Me‘neya wê “bibe”. Di dewama ayetê de dibêje “fe yekun”. Yanî Xwedê ji tiştêkî re dibêje “bibe û di cih de ew tişt dibe.”

-Adar -20-1376 (Mld. 1957)

Sala wîsalê gavek e
Bêhna firaqê salek e⁴⁷¹

Ji şî'rên hatin qulbaldin ji farisî

86 (2)

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. Ewna çi ne ê kû j'serî ta bi piyan tev de dev in
Ewna çi ne ê bêser û pê kû şev û roj her digerin
Ewna çi ye yek lehze l'cumle 'alemê tev digerê
Ewna çi ye ku xelk di zikê wî de temamen dinivin

Dîsa ji farisî

86 (3)

Mefa'ilûn mefa'ilûn fe'ulûn
Hezec - - - - / - - - - / - - - -

1. Yekî pirsî ji yê kur bûwî wunda
Ela ey pîrê merdan mîrê qenda
2. Te kir bêhna kirasê kur ji Misrê
Çira wunda dibû gava di bîrê
3. Ewî got hal û sirrê me 'eyan e
Di wextek wextekî wek berq vedane
4. Di gavek ser semayê ez siwar im
Di weqtek ez di çûna ban nikarim
5. Eger ser haletê mabane derwêş
Ne dinya û ne axret wî dida pêş

⁴⁷¹ Ev gotineke Pêşiyên Ereban e.

87

Dîsa ji farisî

Mefa 'ilûn mefa 'ilûn fe 'ulûn

Hezec · - · - / · - · - / · - -

1. Herîk bêhnxeş di hemmamê de carek
Giha destê ji destê dost û yarek
2. Me jê re got tû misk î yan ji enber
Kû bêhna te kirim sewda bi carek
[r. 126]
3. Ewî got ez heriyek bêqedr bûm
Belê nik sorgulê mame biharek
4. Kemala wê hevalê l'min eser kir
Eger ewna nebane d'bûme parek

88

Ji 'erebî

Mefa 'ilûn mefa 'ilûn mefa 'ilûn fe 'ulûn

Hezec · - · - / · - · - / · - · - / · - -

1. Bêfeyde ye wezna qesîd û şî'rekî menzûmkirî
Heta kû me'na gotinê bo te nehêlê vevirî⁴⁷²
2. Ji bo me 'Eliyê Şêr kir şîreta wezîrî
Go ê tu hewceyî wî bê ji wî re tu êsîr î
3. Lê ê ne hewceyî wî bê tû berber û nezîr î
Belê ê lê bikê xêr her jê re tû emîr î

90

Ji 'erebî

1. Hat nik Suleymanî roja qewl kirî tîtiyek
Paqek ji paqê kuleh va di devê wî da
2. Hat û bi ezmanê halê xwe ewî ev digot
Her kes wekî qedrê xwe hedyê bi ê di da
3. Ger bête daîn ji bo însanî qîmetê wî
Dê bidne wî etlesa jor û heçî tê da

⁴⁷² Servekirî, nenixumandî.

Fa 'ilatun fa 'ilatun fa 'ilatun fa 'ilun

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · - -

1. Bo me gotin tû çira her dem çigarê vedixwê
Go çîqa em te dibînin dû *kelêz*⁴⁷³ ser te diçê
[r. 127]
2. Me digo cinnê mitala ketî ser qelbê melê
Çi dema min li cigara xwe mizek da zû diçê
3. Çi bikim ez ji 'ezîmet⁴⁷⁴ ji tilism û ji hîcab
Pê b'xûr e 'ud û cawa tiştê vîrane diçê

Şi'ra Şaliḥ Begê Hênî Diyarbekrî⁴⁷⁵ me teşîr kirî

Mefa 'ilûn mefa 'ilûn fe 'ulûn

Hezec · - · - / · - · - / · - · -

1. Eger çêkê ji bona dehşê kerra
Ji zêr afîr di nêv eywanê Kîsra (Şaliḥ)
2. Li ser deynê tû kurtanek hevirmûş
Bi yaqûta bixemlênê li wî qoş (sîrac)
3. Murebbî bit ji bo wî Eflatûna
Mu'ellîm bit ji bo wê Îbnû Sîna (Şaliḥ)
4. Bi'elmênin ewî hêdî zirandin
Bikin hînê 'edem guh teptepandin (sîrac)
5. Tû wê avdê ji yenbû'a heyatê
Di şûna ceh bidê sêvê Xelatê (Şaliḥ)
6. Bidê wî rîsiyê reyḥan û sunbul
Bedêla kerbeşa reş baqê sorgul (sîrac)
7. Meke bawer kû ew saḥîb hiner bê
Ew ê dîsa wekî bavê xwe ker bê (Şaliḥ)
8. Li wî aqil xwuya nakê bi carek
Tebi' nayê guhertin piçk û parek (sîrac)

⁴⁷³ Dû, dûman.

⁴⁷⁴ Cureyekî tedawiya psîkolojîk.

⁴⁷⁵ Alim û helbestvanekî ji Hênê ya Diyarbekirê ye. Di navbera salên 1873 û 1925an de jiyana xwe derbas kiriye.

9. Dema tû wî ji eywanê derînê (Şalih)
Huner nayên ji wî geyrî zirînê
10. Ew ê rabê bikê teptep guhê şir
Revê bazdê heta kû bigihe *naxur*⁴⁷⁶ (sîrac)

93⁴⁷⁷

Teştîra li ser şî'ra diya me Fatîme (r. e.)

ما ذا على من شتمّ تربة احمد
المصطفى المختار زخر الباقي⁴⁷⁸

يكفيه من طيب ثراه نفحة
ان لا يشتمّ مدى الزمان غوالي⁴⁷⁹

صبّت على مصائب لو أنّها
وضعت على قلل الجبال الراسيا⁴⁸⁰

لتدكدكت من هولها أو أنّها
صبّت على الأيام صرن لياليا⁴⁸¹

[r. 128]

94⁴⁸²

Ji farisî

Mustef'îlûn fa 'ilûn mustef'îlûn fa 'ilûn

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. 'Eqlê jinê kê m e hem dînê ewê jî wiha
Ger bi te kê qencyê jê re nebîn yek biha
Ger bêjê laf û xeber dengê ewê mek guha
Bizan ji (Camî) kû ev şî'r ji bo min giha
2. Çikû 'eql û dînê jinê kê m e her
Weke hev bibîne tû pesn û xeber
Nexirhe bi medhan çiqqa xweş bikê
Nexwe gem dema kû xeber dane der

⁴⁷⁶ Garan.

⁴⁷⁷ Ev helbest bi Erebi ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nişan daye.


⁴⁷⁸ Ma çi heye li ser wî kesê ku axa tirba Muhammed bêhn kiribe/Mustefayê ku bereketa wî baqî ye

⁴⁷⁹ Besî wî insanî ye ku bêhneke axa pêxember bi ser de were/Besî wî ye ku ji binî bêhn neke di dirêjîya zemên de tiştên xweş bêhn neke

⁴⁸⁰ Bi ser min de hinek mûsîbet hatine rijandin/Heke wan mûsîbetan deynin ser çiyayê mezin

⁴⁸¹ Ew çiya wê ji heybeta wan mûsîbetan were xwarê/Ku li ser rojan werin danîn roj wê bibin şev

⁴⁸² Ev helbest, wergera helbesteke Molla Camî ye. Molla Camî alim û helbestvanekî navdar e. Di navbera salên 1414 û 1492yan de jiyana xwe derbas kiriye.



و ر ب ر و حالم ببین دازانی حال چیه
 و ر ب ر ب ا ب و بعوذ رفسی بدل خوش بکه
 و ر چ ق ا مین نالی قطبی ته حرام بی رقص
 و ر ب ی ب هیا گو آوز بونه طوب و تفنک
 گهرداری روزا روم شهبی گل ا ب ر ب ر و
 دا گو بدل بینه یکه آف چه اشق ا ف چ ر و
 سرخوش که گوشتدیان داشت لوان بی ب ر و
 نالین کتی عاشقان آخ واورک و ر ب ر و

Mustef'ilun fa'ilun mustef'ilun fa'ilun
 Recez — — — — / — — — — / — — — — / — — — —

Ser

1. Wer ber rû ھalim bibîn da zanibê ھal ھی ye
 Guhdarê roja rûwim şubhê gula berbero

⁴⁸³ Helebest ji çar malikan pêk tê. Li gorî nivîsandina tîpên Erebî her malik ji 'a navê dest pê dike û bi 'a navê jî, bi dawî dibe. Helbest di nava şiklekî geometrîk de hatiye nivîsîn.

Çep

2. Wer bi ribab û bi 'ûd reqsê bi dil xweş bike
Da kû bi dil bibne yek ev çi şev û ev çi ro

Bin

3. Wer çiva min naê qeş bê te heram bê reqis
Serxweş ke govendeyan da şev li wan bê bi ro

Rast

4. Wer bê bihaya kû awir bûne top û tifing
Nalîn ketî 'aşiqan ax û awirk wer bi ro
5. Ji "waw" a nîvî tê destpêkirin û tê tamamkirin
Ya reb dera em jê hatin tû me dîsa
6. Bibê wir kû cennet e xweş nî' met e
Selewat li ser nebiyê ummet e⁴⁸⁴

96⁴⁸⁵


Fa'ilatûn fa'ilatûn fa'ilatûn fa'ilûn

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · -

[r. 129]

⁴⁸⁴ Ev jêrenot ji aliyê helbestvan ve wekî heşîye hatiye nivîsîn û rêbaza helbesta xwe gotiye.

⁴⁸⁵ Ev helbest jî bi rêbazeke şeklî ya cuda hatiye nivîsîn. Helbest di nava şiklekî geometrîk de hatiye nivîsîn. Eslê helbestê bi Kurdî ye. Hem me şeklê wê li vir bi cih kiriye û hem jî li jêrê me li gorî hijmaran latîniye kiriye û hem jî me 'Erebiya wê berî ya latînî bi cih kiriye.



فاعلات فاعلات فاعلات فاعلات فاعلات
فاعلات فاعلات فاعلات فاعلات فاعلات

[r. 130]

Fa 'ilatun fa 'ilatun fa 'ilatun fa 'ilun

Remel - . - - / - . - - / - . - - / - . -

1

يا الهی تو عفو که هرچی گنهی مه کری
هم قبول که یا خدا قنجیی و خیری مه کری
Ya îlahî Tu bi 'efû ke herçî gunhê me kirî
Hem qebûl ke ya Xuda qenciyy û xeyrê me kirî

2

يا فقیر و خوه حسیب که یکی میه فان لدنی
شکعی دانیه تیده سبها بار دکری
Ya feqîro xwe hesêb ke yekî mêhvan li dinê
Şevêkê daniye tê da sibiha bar dikirî

3

يا پپوکو تو بکه توبه ژ چقا گنهان
لجھی خالی لسر حالی خوه هر دم بگری
Ya pepûko tû bike tewbe ji çiqqa guneha
Li cihê xalî li ser halê xwe her dem bigirî

4

يا الهی مه د قنجیی نه بوراندی عمر
هر د لهو و غفلتی ده مه خوه لی سر خوه کری
Ya Îlahî me di qenciyyê nebûrandî 'umur
Her di lehw û gefletê de me xwelî ser xwe kirî

5

يا الهی از د زانم رو رشم نینه عمل
ژ پریا گنهان لاشی مه خون لی ته وری
Ya îlahî ez dizanim rûreş im nîn 'emel
Ji piriya gunehan laşê me xûn lê tewirî⁴⁸⁶

6

يا الهی تو علیمی کو د نیف فا گنهان
قط ژ رحما ته خوه بی هیقی تو جارا نه کری
Ya Îlahî tu 'Elîm î kû di nêv va gunehan
Qet ji rehîma te xwe bêhêvî tu cara nekirî

7

يا الهی تو د زانی کو چقا ظالمه نفس
ژ خوره رهبری و هو گریبا وی مه کری
Ya îlahî tu dizanê kû çiqqa zalim e nefis
Ji xwe re rehberiyy û hogiriya wê me kirî

⁴⁸⁶ Wextê ku ji hinek tiştan laşê mirov alerjî dibe û dibe pelqaz.

8

يا الهی تو عفو که عفو تی هر ژ مزن
بو اوان کوله وکو بر دری وی سخره کری
Ya Îlahî tu 'efû ke 'efû tê her ji mezin
Bo ewan kole û kû ber derê wî suxre kirî

9

يا الهی تو عفو که مه برحما خوه گلاک
از دزانم کو عفو بو گنهی من چیکری
Ya Îlahî tu 'efû ke me bi rehîma xwe gelek
Ez dizanim ku 'efû bû gunehê min çêkirî

10

يا الهی تو عفو که هرچی کو چویه د زک
چه بشبهه چه اوی دل بخوه وی خوش دکری
Ya Îlahî tu 'efû ke herçî kû çûye di zik
Çî bi şîbhe çî ewê dil bi xwe wî xweş dikirî

11

يا الهی تو عفو که هرچی کر دست و زمان
لن گ چویی باسکی فه او هر دو گهی من حس کری
Ya Îlahî tu 'efû ke herçî kir dest û ziman
Ling çûyî baskî ve ew her du guhê min hîs kirî

12

يا الهی تو عفو که هرچی گنهی بدزی
ژ عبادان نه ژ ته لو تو لهر جی حازری
Ya Îlahî tu 'efû ke herçî gunhê bi dizî
Ji 'îbadan ne ji te lew tu li her cî hâzir î

13

يا الهی تو عفو که هرچی گنهی هشکرة
کو د ناڤ عبدی ته ده عیب و فهیت من نه کری
Ya Îlahî tu 'efû ke herçî gunhê heşkere
Kû di nav 'evdê Te de 'eyb û fihêt min nekirî

14

يا الهی تو عفو که هرچی گنهی مه کری
انس و جن پی حسیان ملیاکتا دفتر کری
Ya Îlahî tu 'efû ke herçî gunhê me kirî
'Ins û cin pê hîsiyan milyaketa defter kirî

15

يا الهی تو عفو که هرچی گنهی مه کری
د شف و روژده برحما خوه ستار سر مه کری
Ya Îlahî tu 'efû ke herçî gunhê me kirî
Di şev û roj de bi rehîma xwe star ser me kirî

16-17

هم ژ وان زوکا ژدل توبه عو پوشمانی کری
هم دتوبا واده من تا خري و سستی کری
Hem ji wan zûka ji dil tobe û poşmanî kirî
Hem di tewba wa de min te'xîrî û sistî kirî

18-19

هم قبول که تو ژ من فی هیفیا مه ژ ته کری
هم قبول که توبیا فی کسی ری ونداکری
Hem qebûl ke tû ji min vê hêviya me j'te kirî
Hem qebûl ke tobeya vî kesê rê windakirî

20-21

هم قبول که یا سریع و بر دری دایه گری
هم قبول که یا قریب و عملی بو ته کری
Hem qebûl ke ya Serî' o ber derî daye girî
Hem qebûl ke ya Qerîbo 'emelê bo Te kirî

22-23

هم قبول که یا خدا خوندن و ذکرى مه کری
هم قبول که یا خدا صوم و صلاتى مه کری
Hem qebûl ke ya Xuda xwendin û zikrê me kirî
Hem qebûl ke ya Xuda şewm û şelatê me kirî

24-25

هم قبول که یا خدا قنجیى سراجى کری
هم قبول که یا خدا قنجیى قلبى مه کری
Hem qebûl ke ya Xuda qenciyyê Sîracî kirî
Hem qebûl ke ya Xuda qenciyyê qelbê me kirî

26-27

هم قبول که یا خدا قنجیى و خیرى حق کری
هم قبول که یا خدا قنجیى و خیرى ظاهرى
Hem qebûl ke ya Xuda qenciyy û xêrê heq kirî
Hem qebûl ke ya Xuda qenciyy û xêrê zahirî

Sûretê Ibrahîm Ayetên 24 û 25an.

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

Bîsmîllahîrreḥmanîrreḥîm

{٢٤} أَلَمْ تَرَ كَيْفَ ضَرَبَ اللَّهُ مَثَلًا كَلِمَةً طَيِّبَةً كَشَجَرَةٍ طَيِّبَةٍ أَصْلُهَا ثَابِتٌ وَفَرْعُهَا فِي السَّمَاءِ

Elem tere keyfe derebe l-lahu meselen kelimeten tayyibeten ke şeceretin tayyibetin esluha sabitun we fer'uha fi s-sema'.⁴⁸⁷

{٢٥} تُؤْتِي أُكْلَهَا كُلَّ حِينٍ بِإِذْنِ رَبِّهَا وَيَضْرِبُ اللَّهُ الْأَمْثَالَ لِلنَّاسِ لَعَلَّهُمْ يَتَذَكَّرُونَ

Yu'tî ukuleha kulle hînin bi izni rabbiha, we yadribu l-lahu l-emsale li n-nasi le' ellehum yetezekkerûn.⁴⁸⁸

صدق الله العظيم

Sedeqellahul ezîm. Xwedê Teala rast dibêje.

97

Naca biha elebdulzelîlul muhtac Muhemmed sîrac rebbuhulkerîmul cewwadurreufun bîlibad⁴⁸⁹

Celle celalehu we emme newalehu⁴⁹⁰ bi ewna Xudê me derxa⁴⁹¹ wê di wextê 'esrê de.

Çand di weqtê megrebê de şîn bû çiqil û pel da berek girt ji şekir şîrîntir ji xurma nermtir ji eqîqê sortir ji stêrê ezmana bêhtir ji zêr û durra bihatir kesê jê bixwe feyde kir kesê nexwê xisar kir.

Şaban 22 1376

Mart 23 1957 Muhemmed Sîrac

98

Nisan 21 1363 H (Mîd. 1944)

Pevgihên Muhemmed Sîraceddîn

Elmîsbahul munîr fî-Şşelatî elel beşîr (ş'e.w.)

Fa'ilatûn fa'ilatûn fa'ilatûn fa'ilûn

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · -

1. Hem wekî kû tû dixwazê hem razî bê tû bidê
Li hebîb û al û eşhab û we ezwacan bidê
2. Qasî her derman û derda li resûlê xwe bidê

⁴⁸⁷ Xwedê Teala kiriye derbû mesele ku xebera xweş wekî dareke xweşik e ku rayên wê di cihê xwe de sekinîne û çiqilên wê dirêj bûne û fêkiyên wê tê xwarin.

⁴⁸⁸ Fêkiyên wê bi îzna xwedê her werxtî tê xwarin. Xwedê van temsîlan ji insanan re çêdike ku ew jî eqîl jê bigirin.

⁴⁸⁹ Ebdê muhtac û perîşan Muhemmed Sîrac lave ji Rebbê xwe kirin. Rebbê wî ji bo ebdên xwe kerîm, merd û rehîm e.

⁴⁹⁰ Xwedê pir mezin e, rehma wî ji bo her tiştî ye.

⁴⁹¹ Şitl.

Şubhetê reml û zugurkan⁴⁹² li nebiyê xwe bidê

3. Rebbê 'alem mehdera me bi hebîbê xwe bidê
Weke 'erd û asîmanî li hebîbê xwe bidê
 4. Rengê baranê li wî qencê hebîbê xwe bidê
Hinga 'ilmê xwe li wî qencê hebîbê xwe bidê
 5. Bêje rebbî tû li ser qencê hebîbê xwe bidê
Dî şev û roj tû li ser qencê hebîbê xwe bidê
 6. Tû bi hijmara ter û hişkî selaman tû bidê
'Ededê camid namî selaman tû bidê
 7. Sed hezar car weke 'erşê xwe şelatan tû bidê
Sed hezar car weke enfasa selaman tû bidê
 8. Sed hezar bar li Muhemmed selewatan tû bidê
Sed hezar bar bi tekkerum şerefatan tû bidê
 9. Sed hezar bar selewat û hem selaman tû bidê
Sed hezar bar selewat û tehiyyatan tû bidê
 10. Ya îlahî tu li ser qencê hebîbê xwe bidê
Sed hezar bar selawat û berekatan tû bidê
 11. Ya Îlahî sed şelat û sed selam
Tû bide her dem li ser xeyrilenam
- [r. 131]

99

Girtina dosta

Fe 'ûlûn fe 'ûlûn fe 'ûlûn fe 'ûl

Muteqarib · — — / · — — / · — — / · —

1. Kû sohet te kir guh bide her kesî
Dibê dost ji bo te kesê nanasî
2. Bila zanibin ku tû hij wan dikê
Bi hûrmet bi qelbî biya wan dikê
3. Muheqqeq bizane kû ew jî wisan
Ji bona te cumle dibin dostê can
4. Beşaş be bi her kes re çavê mino
Nebê ev şev e yan eva ha ye ro

⁴⁹² Kevirkên piçûk.

5. Rûwê gul vekirye ji lew bulbulan
Li wê bûne aşiq bi zar û eman
6. Yeqîn ro bi ro hatiye navkirin
Kû 'erda dila lê tê avakirin
7. Jiber ke tû navê kesê nas bikê
Her û her bi navê ewî ban bikê
8. Bi şîranî navê ewî hilbide
Gelet qet nebêje li min guh bide
9. Ewê hingî zanê tû jê hez dikê
Dilê wî bi hubba xwe nêçîr dikê
10. Bi 'elime hesandin li ehlê civat
Dema kû dipeyvin bi sebr û sebat
11. Hina jî di ber gotinê re bike
Ji ehwâlê wan her tû pursê bike
12. Rêya gotinê kû te da hem hesand
Bi hubba xwe qelbê ewana revand
13. Çi tiştê bi wan xweş bê wê bêje wa
Ji kewgîrî re bêje behsa kewa
14. Çi ya kû ne xweş bê bi wan jê birev
Tû şîrîn û tehlî neke tevlîhev
15. Tû şîrîn bike pê wezîfa ewî
Nîşan wî bide qencê ef'alê wî
16. Tû qedrê hevalê xwe şanî bide
Bi şîranî pêre xeber tû bide
17. Dema qedrê wî jêre da naskirin
Li cem wî jî qedrê te wê bê kirin
[r. 132]
18. Tûwê jê re bê dostekî pak û şaf
Li te sohbeta wî belaş û mu'af
19. Meqersiyî û qirqir bi kes re meke
Li nik wî xwe bêqedr û qîmet neke
20. Kesê kû meqersî li hinka bikê

Ji dostaniya wa xwe mehrûm dikê

21. Meqersî çikû wesf e bona neyar
Ji lew jev didê paş hemî dost û yar
22. Qe 'aîl⁴⁹³ neke yek ji xesm û neyar
Eger te bivê ew bibê dost û yar
23. Welê ger te ewna neheq qeş nekir
Di şer da li nefsa xwe hem lewme kir
24. Te ewna ji kîna xwe zûka derand
Bi bal dostiyê ve xirand û kişand
25. Dema tû xelet bê tû îqrar bike
Di cih de bi dilxweş bîînşaf bike
26. Kesê kû heval bê ji bo rastiye
Hemû kes didin destê dostaniye
27. Dibînin dilê wî wekî 'eynê şaf
Geravî tûnîn e zelal û şefaf
28. Bi nerm û rehet her xeber tû bide
Qeş dengê bilind û fehiş bernede
29. Feraset ji dengê nerim tête der
Kû nîşan e bona kesê mu'teber
30. Hemû kes j'xwudiyyê ewî hez dîkin
Bi wî re divîn tevlibûnê bikin
31. Dema kû su'alek kirin hin ji te
Heme zû cewabdan bila bê ji te
32. Ne sist û giran be di redda cewab
Dilê sa'ilê xwe neke tû kebab
33. Bi rastî bide bersiva hogira
Dibin ew ji bona te dost û bira
34. Tû serberstiya gotinê bid heval
Bila hurr û aza bibêjê meqal
35. Bila re'y û fikrê xwe zahir bikê
Di nav meclisê iştirakê bikê

⁴⁹³ Neheq.

[r. 133]

36. Bi vê pur dibê dilxweş û şadûman
Ji te kû te hûr kir di behra zeman
37. Bike kû hevalê te bawer bikê
Çiqa gotinê kû tû zahir dikê
38. Di nava dilê wî te anîne der
Hemî gewher in ew kelam û xeber
39. Wekî te ji dilê wî xeber da yeqîn
Te ew kir heval û qerîn û mu'în
40. Tû carna xwe bêxe cihê hogira
Hesêb ke xwe şûna kesê hazira
41. Bi fikr û xeberdan bi teb'ê ewî
Xwe zahir bike hem bi şeklê ewî
42. Eva hingî herdu dilê lev kevin
Di hubbê de herdukê gel hev bibin
43. Xwe zahir bike her bi hubba heval
Bila zanibê ew li nik te delal
44. Bi xêrxwazî ya ku tû jê re dikê
Dilê wî ji bona xwe me'mûr dikê
45. Belê bêmelaqîyy û hîlê xefî
We lakîn bi qelb û bi sidqa şefî
46. Di sohbet bi her kes xwe şîrîn bike
Di hubba hevala de merdî bike
47. Wekî kû dilê xwe te da dostekî
Yeqîn ke dilê wî te kir destekî
48. Ji bo te ewê bê hevalê ji dil
Bi wî tê bibê geş wekî baqê gul
49. Bike kû tû çav û dilê her heval
Bikê 'ucb û dilgirtinê pur kemal
50. Di zahir de şeklê xwe tezyîn bike
Digotin xeberdanê şîrîn bike
51. Çikû hey'eta baş di şekl û libas

Didê her kesî nasiya xas û nas

52. Bi vî sûretî tû hevala bigir
Di dunya dila de dimênê (nemir)
53. Hemî hogir û hemdemê yek demê
Şerîk in ji bo te di keyf û gemê
[r. 134]
54. Bi qencî ewê navê te hilbidin
Heta sağ î her bo te medhê bidin
55. Bi vî şeklî karê di muddek qesîr
Tû peyda kê dostan gelek pur kesîr
56. Kû kes dî nikarê di sal û zeman
Wiha bîgrê dostan bi mal û bi can
57. Xûdaya tû min bo xwe kê dost û yar
Bi dostaniya te qe nîn in neyar
58. Efû ke gunahê **Sîracê** hezîn
Bi rehîma kû dagirtiye ‘alemîn
59. Ji dê w bavê û ehlê me razî bibe
Di gel her Musulman tû kafi bibe
60. Şelat û selamê kû naên jimar
Bibarêne ser Ehemmed û çariyar
61. Hetanî heyayê ji hev qut nebin
Li al û li eşhabiyê wî bibin

100⁴⁹⁴

Qesîdeyên ‘eşq û evîne

Mef‘ûlû mefa ‘ilû mefa ‘ilû fe ‘ûlûn

Hezec — — ·/· — — —/· — — —/· — —

1. Dilber tû dîzanê li me dil bûye cihê jan û kula
J’wan awurê ta kû te li dil dane wekî tîr û gula
Belkî ji du zulfên ku belav bûne li ser herdu mila
Ma qey bi xilaf gotine ê çûne ji qend û ji mela
Kû gotine wan rehmetiyan (rê ji dila diçene dila)
2. Zanim bi Xudê nîn e di ‘alem de muhib xeyrê te kes

⁴⁹⁴ Di vê helbestê de ji bo ku wezin li hev were, me hinek kîte qut kirin. Wekî “ji” û “li”.

Mîna ye tû zanê kû ji 'îşqa te ez im dîn û teles
 Lewra kû te gotî me tû dîtî bes e dîsa ez û bes
 Her gav û se'et nale di dil de wekî çakûç û ceres
 Hubba te li min xêr û xweşî kirye gem û derd û bela

3. Şeş salê me bûrîne bi hezn û xem û ah û kul û şîn
 Yek lehze nebû kû tû li dil de ne xiyal û ne neşîn
 De j'bona Xudê bes tû biruska li birîna bireşîn
 Rebbê me dizanê kû coyê xwînê di cergê de meşîn
 Emma bi nerîna rûwê kafûrî cemed bûye hela
 [r. 135]
4. Sed carî dixwum sûndê bi wê bejn û bi ebrûyê hîlal
 Çiqqa kû hebin hûr û perî xûb û bedew rengê xezal
 Ber çavê me kêr in reben in tev de heram in ne helal
 Ğeyrî te me navin ji dinê lewmê mekin dost û heval
 Lewra ji ezel rebbê me mektûb kirî hêj (qal û bela)⁴⁹⁵
5. Ya Reb bi tû ezman û devan şukrê te qeş naçê serî
 Dayî me te ev rûperek belkî bi sûretbeşerî
 Ger nav li wê şîrîn e bela tev ji nebat û şekerî
 Yek 'eybê tû nabînê li bejnê ji piyan ta bi serî
 Maşî' te fe ehsente we ma lem yeşa' ellahû fela⁴⁹⁶
6. Heta nefesek derbikevê ez te jibîr nakime der
 Lewre tû li bîra me tê kû her divedim ah û keser
 Ger nav li me **Sîrac** e belê gotiye Dîn deyne li ber
 Hikmet çi 'ecêb e li du navan gelî guhdarê xeber
 Ya Reb ji te derd û ji te dermanê birîndarê kula

101

Hezîran - 24 – 1365 (Mld. 1946)

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · · · · · / · · · · · / · · · · · / · · · · ·

1. Evîn derdek 'ecêb e kû xiredmenda dikê şeyda
 Piling û şêrê zozana bi yek dînî dikê şeyda
2. Ji dil tim radikê pêtê digel toz û 'ecacê tê
 De ka sebr û sukûn kê tê fîğan û nale bê feyda
3. Welew wecha dikê teşwîr wekî roj û meha monîr
 Çilo 'aşiq nekê tehrîr di lewha dil demakî da

⁴⁹⁵ Ev îfade qismek ji ayetên quranê ye. Sûretê E'raf, ayeta 172yan. Me'neya wê ev e: "Gotin belê." Wextê ku Xwedê ji ruhan dipirse û dibêje "Ma ez ne Xwedayê we me?" Ruh jî dibêjin "Belê."

⁴⁹⁶ Tiştê ku tu bixwazê tu xweş çêdikî, tiştê tu naxwaze nîn e.

4. Numa ye wechê dildarê wekî heyva l'deh û çarê
Ji meşriq derket û da rê bûwî ew dem wekî 'îda
[r. 136]
5. We lew êşa di dil an dem diçê ba şîn û ba me'tem
Di cih de ah û jan û gem di cergê da dibin peyda
6. Li wan dêmê di kafûrî wekî bêhna gula fûrî
Me di yek xettê mestûrî ke ('îşq ataş) nûşet Seyda⁴⁹⁷
7. Dilim goftî ke ya beyhûş şeraba lêv û le'la noş
Demakî to şewed serxwoş bedaned tu ko kê mey da⁴⁹⁸
8. Hebîbek wek gula ned bo te jî gerden zerî zer bû
Ji ber dêmê gulî ker bû şefeq xurşîde der beyda
9. **Sîraceddîn** bike sebrê ez îin ser tû bike 'ibrê
Jibîr naçê heta qebrê ewa qamet xuda ney da

102

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun
Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Eya beyhuş û bêdaneş di gel emmanet û zenhar
Nebe bona kesê qariş ji cumle 'alemê bigzar
2. Bigir çavê xwe yê napak nebîne tû ji geyrî xak
Bibe merdê xwedîdrak bi cuz wî kes meke dildar
3. Eger cawîd bimênê tû neke terka evînê tû
Ji bulbul hemnuşîn î tû bike 'ibret meke bisyar
[r. 137]
4. Çikû hikmet yekiyya dil ew e terk kê hewwiya dil
Nekê ceh bo hemiyya dil nekê xana qerîb'ud-dar
5. Bike karê 'eqilmendan nebê mala te der gundan
Bi te 'olî⁴⁹⁹ dibê zindan çikû nîn e te jê yek par
6. Meke galib tû nefsa pîs ji bo wehşan meke şevlîs
Evê mudxê wekî bercîs bigoş kun merdû mî penddar⁵⁰⁰

⁴⁹⁷ Ev îfade bi Farisî ye: (Ku Seyda evîna weke êgir vedixwe).

⁴⁹⁸ Dilê min te ji min re got ey bêhiş şeraba lêv û le'la vexwe/Dema ku tu bibî serxweş tu ê bizanî ku kê mey daye.

⁴⁹⁹ Qesir.

⁵⁰⁰ Guh bide insanê ku şîret û nesîhetan dikin.

7. Eger dil wek zebanî ba bila nefsim zebanî ba
Min ê hikmet deranî ba bi qewl û gotin û goftar
8. J' devê qend û buzurgîna⁵⁰¹ (heye parse belê nîn e
Cihê rûkîrn û danîne) tû bişnû suxteê der nar
9. Der în pendan zehî ayed besî ez mew'izet daret
Nemîdanî bicuz daned pesendîde terayn efkar⁵⁰²
10. Ji dil dernakeve în dem⁵⁰³ evîna zîb û şîrîn dem
Heta bê mergê refîn dem hema bes ke ji şîn û zar
11. Eger xwed kû hebin mehweş perîreng hem çû werda geş
Bi yek ezwan mebe dilxweş bişo dil tû ji her zengar
12. Tû rûnêne dilê mehzûn bike cehda wekî helzûn
Neberde her wekî berzûn ewê serhişkê bêhevsar
[r. 138]
13. Çiqqa bêjim nebê lebbê hebibê xwe meke cubbê
Tû guh med 'alimê tubbê di va fikra bibe guhdar
14. Eger naçar evîn derket xwe hilda û bi ser ser ket
Tu cara tê meke şirket tû tê werde du sed destar
15. Me gotî gotina penda kû da tû j'rê nebê wunda
Nebê heyfa xiredmenda **Sîrac** gotî bi goşî ar
16. Xudaya⁵⁰⁴ tû bidê furset der an dem kû nebê muhlet
Selam sed bar di gel rehmet bidê ser hâzîr û şe'ar

103

Nîsan -15- 1365 (Mld. 1946)

Fa 'ilatûn fa 'ilatûn fa 'ilatûn fa 'ilûn

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · -

1. Aniya ber bisk û poran tev de gewga herîb û ceng
Kirme beyhûş kirme sewda lew ji min dernayê deng
2. Bêxwedî der çol beyarê hiştîme bêdad resed
Ta 'icaca 'îşqê rabû hilfirandim wek kereng

⁵⁰¹ Mezin û giregir.

⁵⁰² Di nav wan pend û şîretên ku pir in mewîze û nesîhetan/Tu ji wan fêhm nakî ji xeynî ew kesê baştirîn fikr û hizran dinase.

⁵⁰³ Vê demê.

⁵⁰⁴ Ey Xuda.

3. Dil bi xwe bûye esîr û girtiyê qeyd û lela
Lew bi fikrê se'yê bûye destê gotah payi leng⁵⁰⁵
4. Ma gelo îdî çi bêjim vê demê rabû qiyam
Lewra e'za tev de gotin nefsî nefsî bê dereng
[r. 139]
5. 'Erd û 'ezmanê dilî bûne xerab bûne hewa
Lezzet û keyfa li heşrê lê nema qeṭ lewn û reng
6. Hâkimê 'îşqê kû danî ew şehîna 'edliyê
Cumle e'za tev xelas bûn lê tenê dil bû pereng
7. Ma gelo dîsa li 'erdê nîn e kes mehder bikê
Belkî ev ḥalim bi lutfê jê nebê nalîn û deng
8. Qey ji dunyâe tamamî bûme 'asî sengi sar
Ez ji wê ḥilmê ji bona çi dikê her zûlm û neng
9. Ey şehê 'alem ji her fî'lê nebaş min tewbe ye
Hem ji bona xatirê Ellah li min hilmed tû çeng
10. Ma çi ḥewce kû tû min mirdalî bêxê cehnemê
Ev bes e kû te nedaye min ne lezzet keyf û beng
11. Ev bes e kû tû ji min dûr î bi dêma şubhê şems
Zatê pak zanê ji jana ev cîhan pur bûye teng
12. Qisseta ḥalî ji kû karim beyan kim dilbirîn
Sifrê qelbê me bi xwe girtî kenara zeng û jeng
13. Ger çi zâhir de wekî şem'ê bi nûr û pur pertûwem
Batinê de rûḥ diçê ez behrî an der zar û zeng
[r. 140]
14. Malik û loqman he ye bona te **Sîn û Cîm** gelo
Ġeyrî şah û ḥakimê ser surperî û şox û şeng

104

Adar – 20 – 1366 (Mld. 1947)

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. De rabe ser xwe ya dilber sehergahê ji eywanê
Veke çavê reş û şafî kû ro daketye mîzanê

⁵⁰⁵ Destê nekar û lingê kulek.

2. Bi ava sosin û werdan bişo dêmê di kafûrî
Kû da bîne tewafa gerdenê heccac ji Hîzanê
3. Serê biskê siyeh dîsa meqes ke da bibin zengê
Bi misk û galiba 'ettar reşêne şubhê reyhanê
4. Tû xeftanê bi gul berke kemerbestê bide piştê
Bila gulkê hevirmîşê bimalin wî derîzanê
5. Bi şe'r û kesrewana⁵⁰⁶ xwe kumê zêra bike bestî
Gelo kê dîtine wek te bi wê kîsm û girêdanê
6. Dikim qurban ji bona yek teliyya ta bi engoşter
Du sed Zîn û du sed Leyla du sed Şîrîn ji Îranê
7. Du birhên ta hîlalî her wekî qewsê kemandaran
Çen û pozê gurover her wekî goka li meydanê
[r. 141]
8. Dixum sûndê bi wê bejna te ya 'er' er wekî selwa
Heta sağ im tû mehbûb î te nadim ez bi cîranê
9. Welew kû har û dîn nabim di zahir de belê billah
Wekî perwane sotim der derûn şewqa gerîbanê
10. Ela innel hewa daun we lemyuced mudawîha
We in qame minel qebril hekîm hem 'Îseî banî⁵⁰⁷
11. Kul û eş û gem û derdan keser nayêne hijmarê
Weke axa Xudê bûne belav ser rûwwê cîhanê
12. Bi gav û sa'et û kêlik dem û weqta dinalim ez
Kesek nîn e bidê bersiv biçit nik wê perîxanê
13. Bibêjê ey nêkû fercam ber înzendî konî şowket
To çon xosro şehê 'adêl esîret suxtê nîşanê⁵⁰⁸
14. Xodaya men goneh kerdem 'efû ez sûyê to amed
Bê to dadem we feryadem bide hem bo me îmanê⁵⁰⁹

⁵⁰⁶ Destmal, humayî.

⁵⁰⁷ Bala xwe bidê bêşek eşq nexweşiyek e, kesî heta niha ew tedawî nekiriye. Heke Hekîm û Îsayê banî ji qebra xwe derkevin.

⁵⁰⁸ Ey aqîbet bixêr, bibêje tu ê ji wî zindiyê şewket û mezinahiyê bidî/Tu mîna Xusrew şahê adil î û esîrê te jî yekî şewitî ye.

⁵⁰⁹ Ey Xuda min guneh kir û ji aliyê te efû û lêborîn hat/Min gazî û hewara xwe ji bo te anî bes hem bi hewara min ve were hem jî îmanê bide min.

15. **Sîraceddîn** tehê destar û destbazeş nêmiayî
Bi cahê an Muḥemmed Mustefa hem alê dîwanê⁵¹⁰

105

Kanûna Ewwel- 20- 1365 (Mld. 1946)

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Perîzade nezer da min di cih de hiş me wunda bû
Du tîrê tûj kû berda min beşer teb'ê resen dabû
[r. 142]
2. Dema dêmê wekî mahê xuya bû der sehergahê
Bi sêrî ve ketim çahê ji du çêşman me xwîn dabû
3. Gelo bûm qatilê nefsê ji lew der mam di vê hebsê
Weya seyyareyek nehsê di tali' de qiran dabû
4. Bi dînatî ketim derḥal bi şîn û weyl û qîl û qal
Li min derbas dibûn bedsal dizî hê jî di zinda bû
5. Ji vê ḥicrê nebûm azad li dunyayê nebûm dilşad
We narul işqî bilmirsad we qelbî hemçû finda bû
6. Xwezî dilber biba loqman vekirba sîneyê xestan
Dizanîbû çî ye deman ji bo jana di min da bû
7. Eya dilber eya ḥorî eya rûḥûrewan gorî
Nenêre tû bi çavsorî li vî dînê di gunda bû
8. Li ê bin kon kû rûniştî te go dîno ji ne tiştî
Bi wê lefzê bûye kuştî çikû ne heqqê rinda bû
9. Ji wî weqtî heya îro xweşî nedye eya mîro
Dî şewqa gerdena şîro wekî luksa li zenda bû
10. J'ken û kêlma di nav lêvê ji dostê rî li ser sêvê
Ji wê 'enya kû nîv şêvê şefeq bê gaz û dohn dabû
11. Dixum sûndê bi wa biska kû bayê gerbî bêhiska
Hejand wek sunbulî xweska tewafa wan bi min dabû
12. Tû yî dilber li dunyayê eger rûḥim bidin bayê
Ji bîra min tû dernayê Xuda ev hez bi min dabû

⁵¹⁰ Ey Sîraceddîn tu qet qasî binê Eba û kirasê Hz. Muḥemmed jî nabî ku ew Alaya Dîwanê ye.

13. Evê 'aşiq tû bân bîrê meke amanc ji bo tîrê
Ji derya dil bû wek qîrê bi ah û nalî ken dabû
14. **Sîraceddîn** di ferqê da dil û can man di qeydê da
Serî danî di vê rê da ewî rûh der kemenda bû

106

Kanûna ewwel - 20 -1365 (Mld. 1946)

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Ji ah û hesreta der dil şev û rojê me xew naê
Bi 'eşq muh̄beta der dil ez im mehzûn li dunyâê
2. Welatê min wekî cennet zinar û av û dehl û şet
Li min bûye gelek zeh̄met ji ber ferqa Zuleyxaê
3. 'Eceb kû ez dikim sebrê di ferqa horiya qesrê
Niha ez naçime Misrê tewafa bejn û balaê
4. Li wê bejneke he ye 'er' er du reş mar û kezî 'enber
Li ser zertaca Îskender du çavê reş ne kil daê
[r. 143]
5. Xed û dêmê wekî rojê qedeş bin perd û bişkojê
Firaqa wê wekî dojê dil û can dane ber bayê
6. Di guh de zer guhar danî bi yek awur kirim janî
Yeqîn hiş bir bi talanî tû Heccacê li Beğdayê
7. Di wesfê wê de ez lal im di hicra wê de 'ebdal im
Di 'işqê Rustemê Zal im çi wextê germ û sermayê
8. Te Sîm û Cîm kirî Şeyda te hicret pê kirî 'îda
Belê beyhûş we bêfeyda diçê ser Tûrî Sînayê

107

Mef'ûlû mefa 'ilû mefa 'ilû fe 'ûlûn

Mef'ûlû fe 'ûlûn

Hezec - - · / · - - - / · - - - / · - -

- - · / - -

1. Dilber tû were carekê pêşber me diyarî
Bêxem bi deharî
Da ez te bibînim zeriya rûmeh e parî
Ey dost û nigarî

2. Bejna xwe bixemlên tû ji elwanê de er jeng
Yek carê bide deng
Da dil ji xwe re rabê sema bêhiş û zarî
Sermet û xumar î

3. Gava seherê rabû ji xew min dî du ejder
Pev re kiribûn şer
Bejna di zirav ser dihejandî bi seharî
Rabû bi kubarî

4. Bisk û guliyan girtî xunavek ji gulavê
Durdane di navê
Gerden bi dur û dev bi ken û guh bi guharî
Çen sêv e li darî⁵¹¹

5. Anî kever û zulf û kezî nêrgiz û gul bûn
Çavên ku ji kil bûn
[r. 140]
Ebrû ji kevan û xed û xal miskê tetarî
Çîçek di nizarî

6. Dunya li me kir bagê buhuşt gava xuya bû
Sorgul nû geha bû
Gava kû ji ber çavê me ket xwûn jê dibarî
Wek tavê buharî

7. Dîna te li min bo kul û derdan bûye darû
Gava bi me da rû
Ser yek tiliyek te digerênim cih û warê
Hem car û cewarî

8. Pesnê te çi bêjim bi derew haşa nikarim
Ey dilber û yarim
Çawa ku Xuda tû ji ezel kirye sitarî
Der her şebê tarî

9. Hefta kû biçek rûh me hebê rebbê me zanê
Der rûwwê cihanî
Eywana e dilê Xusro tû yî hem xwendekar î
Bêşûbhe ciharî

10. Dest û qelem û dev li me hişk bûn weke kayê
Hiş çû jixwe nayê
Lew bûme di 'işqa te de perwane di narê
Kû bûme nekarî

⁵¹¹ Peyva “darê” ji ber ku qafiye li hev were, me bi şeklê “darî” nivîsand.

11. Billah meke zûlmê li me dil bes bike xwûnrîz
Ateş meke tê dîz
Nazdariyê xanim li me dil bir bi hewarî
Girtî bi me karî

12. Awur bi yeqîn tilsimê sehhar û kehanan
Hiş birne ji canan
Gava direşênê dikê av teht û zinarî
Paşî dikê arî

13. Ma çawa sebir tê di firaqa te şepalê
Gerden ji şemalê
Mecnûn bi xwe wek min neketî deşt û beyarî
Hem Mem di megarî⁵¹²

14. Lakin Zîn û Leyla jî nebûn husna te mahê
Xurşîd e di gahê
[r. 145]
Bona te dibin cumle xidam cumle cewarî
Mecbûr û neçarî

15. Bes nal û fiğanan ke merêj xûnê ji Nîlî⁵¹³
Sîracê Xelîlî

Dilber bisipêre şefeq û rehmetê Barî

Hew kes pê dikarî

108

Şubat – 12- 1365 (Mld. 1946)

Mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun

Recez – – – – / – – – – / – – – – / – – – –

1. Ey dilberê bo min di dil wey nazika qend û şeker
Qelbê me wê tev kirye kul êsîr kirî can û ceger
2. Can û rûhê min wek tenûr şewtandiye bi zulfê bi nûr
Her dem ji lew ez dikme zûr bo min tunîn e qeş mefer
3. Bo me wekî fînda çira çawa ji bo min ya bira
Şafî he ye li behr û bera xeyrê şepala dêm qemer

⁵¹² Peyva “mexarê” ji ber ku qafiye li hev were, me bi şeklê “mexarî” nivîsand.

⁵¹³ Li vê derê peyva “Nîl”ê, peyveke mê ye. Li gorî rêzimana Kurdî divîbû mirov bêje “ji Nîlê”. Lê ji bo ku qafiye xira nebe, me bi şeklê “ji Nîlî” nivîsand. Jixwe di nivîsa tîpên ‘Erebî de herdu jî weke hev tene nivîsandin.

4. Loqman hekîm ger bê huzûr nakê dewa' van cerhê kûr
Îsa ji asman bê zuhûr êşa ji dil jê naçê der
5. Vê firqeta rûreş gelek wek min kirin şîn û belek
Agir li dil da kir pelek nîn e meded xeyrî seher
6. Weqtê seher ger carekî bayê nesîm dewware kî
Sed bîn selama barekî bigehênê cem ya qozeqer
7. Xal qozeqer bejna elîf çavê belek ebrû qedîf
Dêmê bi gul nûra letîf zulfê siyah bin de kever
[r. 146]
8. Ez dê wekî Eyyûb 'elîl şafî bibim her dikme qîl
Rabim meşim ez fisebîl biçme tewafa zendê zer
9. Werne diyar go şerm e tê kehra xezal vê sa'etê
Girtiye şêrê dewletê êsîr kiriyye bi yek nezer
10. Rebbê mezin zanê kubar te l'min ceger tev kirye nar
Zahir çima nakim hewar Wî daye min sebra emerr
11. **Sîn** paşî **Cîm** ebdê rehîm pur raciye lutfâ 'emîm
Ya Reb tû bîdyê rad û mîm sellim 'ela xeyril beşer⁵¹⁴

109

Mustef' ilun fa' ilun mustef' ilun fa' ilun
Medîd - - . - / - . - / - - . - / - . -

1. Derdê dilan giran e wek barê fil û gamêş
Jana zirav ne wek wî peyda dikê gem û êş
2. Geh nal e geh hewar e geh ax û ox jê xware
Geh teqreqa dil û nav wek çerx û lewleba êş
3. 'Aşiq çilo wekî Mem nav û dil nabine dem
Zîna bedew ji pacê tîr daye gurçika lêş
4. Qelbê me rengê dojah pur dibê roj bi roj e
Wellahî maraeyne⁵¹⁵ 'aşiq kû dil nebû rîş
5. Hûsna hebîbê find e min dil ji bo wê bend e
Heta wekî feraşê can suxte şod der atêş⁵¹⁶

⁵¹⁴ Selam li ser insanê herî bixêr bin. Ji bo Resûlê Ekrem tê gotin.

⁵¹⁵ Wellahî me nedîtiye.

⁵¹⁶ Can di êgir de şewitî.

6. Leyla eger ne h r e emma w  r  bi n r e
Mecn n k  padi ah b  der de t  b ye derw  
7. Bulbul  eta k  sa  e men   nak  ji ba  e
Gul  end  gul bi xar e emma w  teb  e dilk  
8. N l fer e dil  min lewre pur in kul  min
Wech   eb b  roj e pertter est ez an b  ⁵¹⁷
9. Wellah   a iq im ez ta sa    zende bim ez
 ubba   r n   Z nan ta mewt  b  min e p  ⁵¹⁸
[r. 147]
10. Ma qey li min ne  erm e hem ne qebah e ber me
S rac  eb n  kes d  xeyr   eb b  b  xwe 

110

Mustef ilun mustef ilun mustef ilun mustef ilun
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. J dunya   cumle   alem    ja t  b  min t  heband
Hatin murada dil hem    sen t  b  min t  neqand
2.   sentir e ji cumle kesa wechuke qibl  fil mesa⁵¹⁹
Z lm  meke  d  bes e te bi t r   avan dil  ikand
3. T rek ji wan  av  belek w   oriya teb  et melek
Av te dil lew b  helek ser v  dil  pur  em civand
4. Dilber  eb ba min t  y  billah teb ba min t  y 
Her dem cel ba min t  y  te j min hi    aq l revand
5.   r ntir e ji  ehd    esel enwertir e ji  ems   qemer
Min  ubb ha qelb -nkeser⁵²⁰ k  bisk li ser d ma hejand
6. Awur ji wan t r   kevan av te dil   b  ji wan
Derd  mezin    a giran hem cerg   dil tev de  eland
7. Cerg   dil  min firqet  sohtin bi nar  mu bet 
Emma di weqt  qurbet  dil b  xwo     em p  revand
8. Weqt  k  n z k  te bim  em  r   dil jar  te bim

⁵¹⁷ Ronah tir e ji w .

⁵¹⁸ Peyva “p   ” ji ber ku qafiye li hev were, me bi  ekl  “p   ” niv sand. Me neya “p   ” kar e.

⁵¹⁹ Di  ev  de wech  te.

⁵²⁰ Ji ev na w  dil sax b .

Her dem bi qurbanê te bim min dil ji derda pur hemand
[r. 148]

9. Te bi zulmê dil kirye kerî ya dilbera dêm gehwerî
Qey tû li êsîr nanerî gemya kula ser dil qefand
10. M'hemed **Sîraceddîn** gelek te' da di mexlûq û melek
Selam ji bo çavreş belek şandin seher badê gehand

111 (1)⁵²¹

Mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. Bûme hezîn û dil bi gem emman dilo emman dilo
Ji hubba hebîba rûh li cem emman dilo emman dilo
2. Ji hubba hebîba qam elif zulfê siyah dêmê şerîf
Wechê munewwer pur letîf emman dilo emman dilo
3. Wechê munewwer xal delal qam 'er' er û ebrû hîlal
Rûh û rewanê min li bal emman dilo emman dilo
4. Bûme birîndarek gedar hêstir ji çavan tene xwar
Wan kirne co xedd û 'izar emman dilo emman dilo
5. Her tû ji 'îşqê zer dibê l'nava kul û gem der dibê
Her rojê sed car der dibê emman dilo emman dilo
6. Emman dilo tû nanerê l'ehlê cefa l'ehlê berê
Bûn kuştîyê vê dilberê emman dilo emman dilo
[r. 149]
7. Carek binêre tû li wan hem bigre 'ibret tû ji wan
Da tû nebêjê el eman emman dilo emman dilo
8. Sebrê bike ya ez gulam da tû **Sîrac** bighên meram
Ser dilbera min sed selam emman dilo emman dilo
9. Hinga stêrê asîman hem şîniya deşt û çîyan
Avê şet û nehr û cawan emman dilo emman dilo
10. Kuçk û zugurk û sêlehê tiştê di bin şewqa mehê
Hem mîhrûya bînya sihê emman dilo emman dilo
11. Bêhtir ji van hem bê 'eded efzel şelatê ta ebed

⁵²¹ Ji ber ku du helbest bi hijmara "111"ê hatine nîşandan, me ji bo ya pêşî 111 (1) nivîsand.

Bin ser elîf û hê û med emman dilo emman dilo

111 (2)⁵²²

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

1. Ji 'îşqa dilbera taze Xudê zanê kû beyhoş im
Ji wan lêv û devê şafî yeqîna ez çi meynoş im
2. Bi wê qamê bi wê bejnê dixûm sûndê hezar carê
Ji dîna zulf û ebrûyan bi xwe sermest û serxwoş im
3. Ji çavê min diçê avek wekî xûna birîndaran
Dizanim kû bi çavê xwe hemî Xabûr⁵²³ û Nerdoş⁵²⁴ im
[r. 150]
4. Bi zâtê lemyezel dîsa li dunyayê tû meqsûd î
Heta kû rûhê hebê bona kenê şîrîn xebargoş im
5. Şev û rojê di vê fikrê tû yî Xusrew dil e eywan
Tû hem Şîrîn û Leyla yî bi xwe Qeys û Siyahpoş im
6. Ji wî wechê munewwer ez şerimkar im kû geyrî te
Hêbênim ger hêbênim ez 'eqîlpûç û fikirboş im
7. Eger Zîn û Zuleyxa gel Perî Şîrîn e Îranî
Bi dawê ve bibin zîro hemî qurban te nefiroşim
8. Çi hewce kû bibêjim ez kesê dîtî tenê zanê
Li dunyayê nebûne wek te Şîrîna kû jê xoş im
9. Li derdê vî birîndarî bike derman bi yek goftin
Bibêje bo te mehbûb im tû yî bulbul gula moş im
10. Heta kengî di vê qeydê ez ê b'mênim di zindanê
Di hicra çolbeyarê bêguman goyîn⁵²⁵ û xergoş⁵²⁶ im
11. Di fikrê weşletê bûrîn li **sîn û cîm'**ê bed e 'wam
Eger sed salê hêj ha bê bi vê fikrê ne beytoş⁵²⁷ im
12. We lew der zahirî weşlet bi canê fanîyîm yoqtur

⁵²² Ji ber ku du helbest bi hijmara "111"ê hatine nişandan, me ji bo ya duyem 111 (2) nivîsand.

⁵²³ Navê çemekî ye ku dikeve başûrê Silopyayê.

⁵²⁴ Navê çemekî ye.

⁵²⁵ Navê çûkekî ye ku dengê wî xweş e.

⁵²⁶ Felişî.

⁵²⁷ Poşman.

We lakin rûhê şîrînim çocûqdur ben de dergûş im⁵²⁸
[r. 151]

13. Senîn hicrînde yanmişim heyatî bû îkî gozum
Kelebek ateşî yaqtim hemen fırla ben o kûş ûm⁵²⁹
14. We fî qelbî lehîbun min xeram il hubbi mesrû'un
Meta ye'til beşîru⁵³⁰ ez bi sirra sîn û seydoş im
15. Deran dem mîkoned şadî o bazî in hemê e'îza
Zê abê zendeganî sê qedeh abê zelal noş im⁵³¹
16. Bê her çê meqsedê donya dibim dilşad depê vîra
Bila qasîd jî asmana bibêjê rûh jî can doş im
17. Emanet sed emanet ey evîndarê di mehbûban
Nekin terka şepala tim bibê der se'yê mengoş im
18. **Sîraceddîn** di 'îşqa dilberê bib hâris û guhdar
Çikû qitmîr tû yî dilber dibêjê ez deber noş im

112

Kanûn - 9 – 1365 (Mld. 1946)

Mustef'îlun fe'ûlun mustef'îlun fe'ûlun
Munserih — . . . / . . . / — . . . / . . .

1. Hubba hebîbê hale der hîfzê ta heyatî
Husna huseynê bal e ser canekî heşatî
2. Lewlake laûbalî bilmalî welehalî
Li enne lî letîfun yelhûnî 'en mematî⁵³²
3. War û welatê wêran wunda kirin bi awur
Wan weyzeban û weylên anîn jî walîdatî
4. Yek yar e yanî Yûsûf îro di vî zemanî
Ya Rebbi haşa haşa yek wek te Xusro⁵³³ hatî
5. Sultanê serserîr î sertacê xusr û xaqan
Belqîs tû yî Suleyman sîne li ser kelatî

⁵²⁸ Welew di zahir de weslet hebe jî, ruhê min fanî ye/Lakîn ruhê min î şîrîn zarok e û ez jî dergûş im.

⁵²⁹ Heyata min her du çavê min jî hesreta te ez şewitîme/Mîn agirê perperîstankê pêxist, zû rabe ez ew çûk im.

⁵³⁰ Di dilê min de agir heye, jî ber evîna ku li erdê hatiye xistin. Mizgîn da wê kengî were.

⁵³¹ Di wê demê de ku ew hemî endam şadî û yariyan dîkin/Jî ava heyatê ez ê sê tas ava zelal vexwim.

⁵³² Ku tû tunebana, wellahî mal jî min re ne xem bû/Lewra jî mirineke spehî...

⁵³³ Mîrê Farisan.

[r. 152]

6. Ram û murad giha me rêzan e teyrê bazî
Şukr û sena ji Barî hudhud bi mujde hatî
7. Asif bi ismê e' zem gel textê zêr kû anî
Êş û elem nemane muzqale innî atî
8. Cama dilê şikestî hatî cebarkirin hem
Caha lealeb ez xûn şub çeşmeyê heyatî⁵³⁴
9. Ê dîdenî tû nefxa rûh'ulqudus bi yek bar
Morden ji gorê yek dem şod zêndê her refatî
10. Bejna ji 'er' er û rû roja ji şerqê tali'
Biskê ji nêrgiza zer birhê hîlal nû hatî
11. Çavên di reş bi awur kafûr e dêm yeqînen
Anî mirat çena çak ber begçe ser Furatê
12. Lêv û devê şekir tam qend û nebat dirêjin
Wan her du sêvê sorik nû hatine ji xelatê
13. Sîn'a esîr û cîm'a camid biçe sukûn kûn
Sebra emir heram e wek benc û munkeratê
14. Can û cesed çira ye rûhê me gaz e zanim
'Îşq agir e fitîl e dil fikr e wek şixatê
15. Ya laîmen yelûmu fil 'îşqi ente kafîr
Bima qeda îlahî min muftîyîlheyatê⁵³⁵
16. Mehlen eya sefîhen qessirnî filmeqale
Lew kane bike ma bî em seyte kel mewatî⁵³⁶
17. Kella îza reeytum min qederil'ewazil
Qette'ne eydîhîinne mekanel me'kûlatî⁵³⁷
18. Inşaf û murwe nîn e serdarê nazenîna
Sîrac di 'îşqê bû ar dunya ji çar cihatê

113

⁵³⁴ Çala ji xwînê tijî dişibe kaniya heyatê.

⁵³⁵ Ey ew kesê lewmê dike di îşqê de dibe kafîr/Di jiyana xwe de ku bû aşîq xwe winda dike

⁵³⁶ Ev malik bi Erebi ye: Muhletê bide ey kesê bêaqil peyva xwe kurt bike/Tiştê ku li ser min, were ser te; tê bibî wekî miriya.

⁵³⁷ Ev malik bi Erebi ye: Muheqqeq wextê ku hûn bibînin ji qedera lewmakaran/Ku di cihê xwarinê de destê xwe jêkirin. (Li vir qala pîrekên ku ji ber Yusuf pêxember kêr li destên xwe dan dike).

Şubat - 5 – 1365 (Mld. 1946)

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

Recez - - . - / - - . - / - - . - / - - . -

1. Dilber bike rehîmê li min zulmê neke kar û 'emel
Carek binêre tû li min dil tev de bû hîrs û emel
2. Hîrs û emel tê de hebû jan û keder lê zêde bû
Jîn zerreyek peyda nebû hubba te ye şehd û 'esel
[r. 153]
3. Hubba te ya rûhê hebîb ez kirme mehcûr û xerîb
Sed pasipan bona mucîb da min hebîbek bê misil
4. Rûmah û xed şemsa şefaf zulf û gulê bûne metaf
Qam wek gula girtî xunav teşbîhê ev derbûmesel
5. Cebhet kever çavê belek zulfê siyah bûne xelek
Her çî kû dî dil bû pelek nav bû kula bûye mehel
6. Bûm 'aşîqê zulf û gulê gava bela bûn ser milê
Wek sosina lev herbilî pertew geha tûr û cebel
7. Keşte yeqîn Nûh tev civand ser cumleyê 'alem gerand
Gava me dî min ser tewand bûm Cûdiyê jana ecel
8. Ew xaliqê her 'alemê gava kû axa Ademî
Stirha ez û mehbûb hemî çêbûne ji yek nuqta we hel
9. Lew rûh û rahet tev yek e hem xaliq û madde yek e
Wer cismê ma ji hev kir feke hem nik hemeş min tê ecel
10. Hêvî me Rebbil 'alemîn ew fatirê erd û zemîn
Ê çêkirî husn û evîn min gel hebîbê kê weşil
11. Ez **sîn û cîm** 'ebdê te me bêhed feqîr im hewce me
Ewwel tû razî be ji me paşî bidêm roja hemel
[r. 154]

114 (1)⁵³⁸

Fe'ilatun fe'ilatun fe'ilatun fe'ilun

Remel . . - - / . . - - / . . - - / . . - -

1. Ji firaqa te hebîbê dil û can bûne tenûr
Te bi zulf û xedd û xalan kirme meytê di qubûr

⁵³⁸ Ji ber ku du helbest bi hijmara "114"ê hatine nîşandan, me ji bo ya pêşî 114 (1) nivîsand.

2. Çi bi sebr im çi 'ecûl im çi bi ah im çi girî
Tû li bîra me tê daîm bi Xudayê we Gefûr
3. Tû tû caran rehmê nakê zalimê bo me çima
Bike rehmê bo Xuda ez ji te hêvî me duhûr
4. Weqtî menî ba terefet asûdem û çeşm bê ab
Men bê çeşm ço to dîdem şudem ez ehlê surûr⁵³⁹
5. Keyf û lezzet me tûnîn e ta di firaqa te bim
Mislê perwane di ateş şewitîm ez ji herûr
6. Hûb çi derdek bê 'itab e nîn e derman û dewa
Xeyrê weşleta şepalê nazikê zulfê di hûr
7. Ger çi sağ im ne mirî me lê me nav bûye cemed
Rengê hêvest kû heşîn e lê di agir bê qusûr
8. Ger di weqtek rebbê 'îzzet bidê weşlete bi min
Ev **Sîrac** bê ser û pa wê biçê beyta wî ji dûr

114 (2)⁵⁴⁰

Mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. Îro bi dîna dilberê bûm pêtiya narê teres
Cerg û dilê wek mecmerê gazî dîkin mîna ceres
2. Gazî û nalîn û fiğan çûne ji min ta asîman
Lewre dikalim bê hedan hişk bû li min bêhn û nefes
3. Xemgîn û mehzûn û melûl Şeyda û reşpoş û zelûl
Bûrîn li min 'am û fusûl nûka felek bûye meqes
4. Ma ez çi bêjim ya bira derdê dila tev agir a
Wek tû bidê bayê kur e tev radibê pêt û qebes
5. Wan ebrûwê rengê hîlal çavên di reş şefî zelal
Anîn ji dil qîr û nuhal lew her bi jan e ew teles
6. Beyhûş û sewda serxweş e ji wan awura şîn bû heşe
Xûnî birne ber xwe leş e jê têr dibûn mûr û mekes
7. Mîna ye dil Ehrem e lew tofanê lê dabê derew

⁵³⁹ Dema ku ez bi hebûna te dilşad bûm û çav li av/Min wek te bi çavan dît ku bûme ehlê surûrê.

⁵⁴⁰ Ji ber ku du helbest bi hijmara "114"ê hatine nîşandan, me ji bo ya duyem 114 (2) nivîsand.

Hêja ne bo wêran e ew tê de pur in atêşperes

8. Dil ez kirim dûr û gerîb rûh kirye gaz laş kir kebîb
Dost û heval wî kirne zîb ma qey ji nû hê jî ne bes
[r. 155]
9. Nehwêt û neh barê qesem ba an ke nehwêt nexorem
An çêkî merdam ber serem payê nehed dil natê tes
10. **Sîraco** ger tû kin nekê jana evînê dûr nekê
Dê bimrê her tû carekê heman bibê min nîne bes

115

Fa 'ilatun fa 'ilatun fa 'ilatun fa 'ilun

Remel - · - - / - · - - / - · - - / - · -

1. Tehlîyy û tirşî ji bo min bûne şîrîn hinguvîn
Ins û cinn û teyr wuhûş tev bûn ji bona min hezîn
2. Ah û efgan pur ji min çûne heta ber saqê 'erş
Qet ji min naçin tû cara nal û zarîn û enîn
3. Qelb û can û cegerê min bûne xwînê ez dibêm
Hêviya min ew e ew şahê li ser textê Medîn
4. Kû ji van derd û bela û gem û êş û jan û kul
Ez şîfa bim bes bixwazim dewa bo derd û birîn
5. Innemeddunya cefaun leytenî⁵⁴¹ carek tenê
Kû bibînim wê hebîbê xed ji bin biska derên
6. Ya hebîbî ya muradî ente filqelbî mudam
Mîttu min hubbîke cehren misle mecnûnil hezîn⁵⁴²
7. Ew 'elîl e pur feqîr e hem birîndar e gelek
Sîn û cîm'a tû dewa' ke paşî canê wî derên

116

Şubat - 1 – 1360 (Mld. 1941)

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

[r. 156]

1. Ji nalîna dil û cergê di zîndana te me xanim
Wekî serxweş li ber mergê bi ax û wax û fiğan im

⁵⁴¹ Heçî dinya ye cihê cefayê ye.

⁵⁴² Ey hebîbê min Mirada min Tu her wextî di dilê min de yî/Wekî Mecnûnê Hezîn ji evîna te ez mirim.

2. Di hicrê de di ferqê de ez im êsîr di qeydê de
Wekî Mecnûn di çolê de bi şîn û ah û kovan im
3. Ev e çend sal li min bûrî nedî min keyf û mesrûrî
Giha min nefxeyê sûrê ji lew bê rûh û bê can im
4. Te derxa awura çandî di 'erda vî dilê jandî
Reh û şaxa xwe bûrandî di mêlakê de pê zanim
5. Evê darê berek çêkir ji barûd û risas têkir
Kû fikra pelweşîn lêkir di cih de dil go wêran im
6. Te dil kir xerbe û kavil esasê wê te kir za'il
Te qalik hiştî bêkakil ji lew re cismê bê can im
7. Tû yî Xusro şehê Îran ji paşa û cîhangîran
Di Fursê de tû yî nîran ji 'ebd û bend û kolan im
8. Nedî min wek te şîrînê berû gerden ji ayînê
Kû wunda kir Memê Zînê di 'îşqa wê de qurban im
9. Kirim qurban bi wan dêma der an kû hatî bîra ma
Dizanê kû di gahê ma kû çûn bulbul bi dîlan im
[r. 157]
10. Kû serxweş mest û bêhûş em ji lêv û dev û meynoş em
Ez an goft û tû pur xoş em şev û roj lewre sukran em
11. Gelo kengî ji bîra min diçê ew naz û heyra min
Ji lewhê dil de bîra min nivîsî -janê lawan im-
12. Eger Ferhad bidîta ew bi Şîrînê nezanî hew
Ji bîra wî diçû ew qewmê Îranî ji dil zanim
13. We lew wî ser kirî qurban nebû hiş lew kû bû dîwan
Belê sağ im wekî koran di nav û dîl de burkan im
14. Wekî perwaneê sadiq ez im bo agirê la'iq
Di ehlê dil de her fa'iq di behra 'îşqê xaqan im
15. Nedanî gotina Kurda j' devê qend û 'eqilmenda
Heçî kevrê mezin hilda tû car lê nadê ey can im
16. Eger tû 'aşîqê mûkî ji te his nayê derzûkî
We ger ne qey tû zarok î bi yek mehnê girêdanîm
17. Kesê kû 'îşq j' dil û can e di zahir hem çû sultan e
Di batin lerze û ta ne dibê tolê derîzan im

18. **Sîrac** ger rê neçê dilber tû ca wunda nekê dilber
Li dil deyn kursiyê dilber kû da dil bêjê eywan im
[r. 158]

117⁵⁴³

Nîsan- 6-1367 (Mîd. 1948)

Mef 'ûlû mefa 'ilû mefa 'ilû mefa 'ilû fe 'ûlun

Hezec -- ·/· -- --/· -- --/· -- --/· --

1. Dilber tû were der ji⁵⁴⁴ şebak û kulek û birc û sera⁵⁴⁵
Wer ser cesedê min kû dilêm tev de bû derd û kesera
Rehmê bike gorî ji me re dermanî bîne bi xwe ra
Da ez bi feda kim rûh û canê xwe yê şîrîn ji te ra
Derman çi ye dîna xed û dêmê te sipîd û kevera
2. Ez bûme birîndar û kezebxwînê te ya rûhê me dilber
Çav kirye sipî huzna hebîba me ewa nazîk û esmer
Zulfên te ji reyhanê reş in dêmê gulî şubhetê 'enber
Weqtê te nebînim bi Xudê serxweş im û dil bû du sed ker
Dîna te buhuşta min e zanim kû firaqet seker e
3. Rengê te hebîbê me nedît û tûne qet kes li tû 'erda
Min can û rûh û aqlê xwe tev li terîqa te bider da
Dest avêtî dawete tenê min bi xwe ew geyrî te berda
Ez bo te se û kole me min qet ji derîzanê meberda
Tû b'qedrê Xudê kî hewesa min ne di heşr û neşer e
4. Hûbba te ji bo min bi Xudê nîn e şubeh fexr e di her dem
Ey şahê li ser xwediyê rûhê qudsî bû hemdem
Dîsa ne tû bana dibû qebûl bo guneha tewbeê Adem
Ez hêvî dikim piştî mirim bo me bikê mehderê an dem
Billah ne tû bê talî' û bextê me siyah cumle qere
5. Ez şehde didim kû di wucûdê tû yî efzel ji hemî kes
Piştî me tû bê qet ji 'edû tirsê qe nakin tû hebê bes
Ey xeste **Sîrac** sen o habîbin hevesînden ankani⁵⁴⁶ kes
Ke hîç ezanbîş bi dîger wer bimirî da binemîres
Allah'a bi cahî o gezerken zed û pay ta bi sere

⁵⁴³ Di vê helbestê de malika pêşiyê ji hivdeh kêteyan pêk tê. Malikên di ji ji hîjdeh kêteyan pêk tên. Êdî ev xeletiyek e an jî bi zanebûn hatiye kirin, em nizanin. Ji ber vê yekê wezin li malika pêşiyê nayê.

⁵⁴⁴ Di nusxeyê de peyva "ji" tune bû, lê li gorî me'neyê divê hebe. Ji ber vê yekê, me lê zêde kir.

⁵⁴⁵ Di çapa TÎD de ev rêzik bi vî rengî hatiye nivîsîn: "Dilber tû were der ji şebak û kulek û burc û sera"

⁵⁴⁶ Ev peyv dibe ku xelet hatibe xwendin. Wekî din jî tu me'ne jê dernediket.

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun fe 'ulun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - -

1. Ji bo reb sed hezar şukran kû da min hûr û gilman
Îlahî ente rebbî hesbî fî ewqatî ezmanî⁵⁴⁷
[r. 159]
2. Te da min ya îlahî mehbûb ji wê re ez kirim meglûb
Curûhê bissînanî la leha el tîyamû îxwanî⁵⁴⁸
3. Bi wan tîr û bi wan remza bi wan goft û bi wan lefza
Mînel hub tehrîqu qelbî fî îltîhabî nîranî⁵⁴⁹
4. Xuda hewqa te da îhsan kirim 'aşîq ji bona wan
Wema lî en esîfhum qeş bi elfî elfî lîsanî⁵⁵⁰
5. Eger cînn û eger Adem eger mexlûqî der 'alem
Xulîqû kulluhum ecme' lî eclî kenzî 'îrfanî⁵⁵¹
6. Hebîba min çî xweş nûr e bi hunsa xwe ne wek hûr e
Leşerrun wahîdun ufdî lehu ruhî we reyhanî⁵⁵²
7. Gelo qey bone wî dîsa 'ecêbbûn Adem û 'Îsa
Belî wellahî lewla hû lema za'el mûnîranî⁵⁵³
8. Ne tû ba Ademê meqbûl ne Eyyûbê kû pur me'lûl
Qebîlte ew şefî îla lî eclî nûrî rebbanî⁵⁵⁴
9. Tû nûra rebbê mexlûqan bike rehmê li mehrûqan
We lew la teşfînî malî tebîbun malî lûqmanî⁵⁵⁵
10. Eger wesfê te her bêjim ji purya wan ezî gêj im
We la ye'lemû ewsafê îllallahû îxwanî⁵⁵⁶
[r. 160]
11. **Sîraceddîn** birîndar e rica wî rebbê geffar e
Kerîmun feselî'l-muxnî sualî kulle ezmanî⁵⁵⁷

⁵⁴⁷ Ya Rebbî tu besî min î di zemanî de.

⁵⁴⁸ Birînê min bi tîran e lê ku derman jê re were wê baş bibe bira.

⁵⁴⁹ Ji eşqê qelbê min dişewite di pêtiyê êgir de.

⁵⁵⁰ Ez nikarim wesfên wan bidim tu caran bi hezar hezar zimanî.

⁵⁵¹ Bixulqîne temaman ji bo xatirê xizîna min a îrfanê.

⁵⁵² Di şerekî de ez ruh û reyhanê xwe jêre feda dikim.

⁵⁵³ Wîlo ye Wellahî ku ne ji wî bana roj û hevye, ronî nedidan.

⁵⁵⁴ Te qebûl nedikir îlla ji bo xatirê nûra xudê.

⁵⁵⁵ Eger tu min şîfa nekî ne doctor ne jî lûqman heye.

⁵⁵⁶ Ey bira ji xudê pê ve tu kes nikare wesfê wî bide.

1. **Sîrac dîn** e şev û rojê wekî bulbul dinalê
Ji destê dilbera kû derd û derman tev li balê
Dixûm sûndê bi çav û ebrûyê ta⁵⁵⁹ wek hîlalê
Ji bîra min tu ca naçê dilberê tim tû l'xeyalê
Tebarek ez dibêjim her ji ber husn û cemalê
2. Cemal û husn û nûr û heybeta qeddê çinarê⁵⁶⁰
Nikarim ez beyan kim qet nîşan û sûretê yarê
Muqabil nîn e der dunya û der mulkê te ya Barî
Dikim feryad û hewar her wekî av û şetê carê
Dixwazim tu bikê rehîmê li min da bes bikim qalê
3. Bide min dîtina dilber ji bo min ew çi xweş rehîm e
Kû carek seh bikim kelmê bibînîm nûr bi van çeşme
Çima gemyan bibê zozan çima cennet bibê zehîme
Çima nalîn bikim her dem çima havîn bibê serme
Eger weşla te şud bû men we ger ne wer bike nalê
4. Firaqa dilbera nazik li canê min wekî nar e
Disojê cerg û mêlakê bibîne zulmeya yar e
Ez ê bêjim hereqtu fî hewake⁵⁶¹ wê bibê sare
Te gêm nîn e erê rast e belê firqet wekî mar e
De bes cewra firaqê ke çû ji zînê der Kurê Alê
5. Selaman ez ji bona wan dişînim her sehergahê
Rica û nalînê goyim wekî çengê di gel jahê
Bi can û dil dinalim lew kû dilber ten wekî mahê
Qe carek tû bike rehîmê ji bo kû bes bikim ahê
Bîdemi'l'eyni erseltu lehum 'erden lî ehwali⁵⁶²
[r. 161]
6. Tû bes nale **Sîraco** ta hebê rûhê te der qalib
Jibîrê naçê ger çende reqîbê te bibê galib
We ger ten ku bibê darek dizanim her dil e talib
Te dest û ser teliyy û rîş di wesfê wê de bûn katib
Li rebbîye-lhemdu lî l-mejbûb we ehzanî li-'uzzalî⁵⁶³

⁵⁵⁷ Kerîm e ew ez suala xwe her wextî ji Xudê dikim.⁵⁵⁸ Her şeş rêzikên pêşî ji yên di cuda ne. Wezna van jî ev e: (mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun).⁵⁵⁹ Te ya.⁵⁶⁰ Ji vir û pêde wezna helbestê diguhere. Êdî ev xeletiyek e an jî bi zanîn hatiye kirin, em nizanin.⁵⁶¹ Ez ji eşqa te şewitîm.⁵⁶² Min daxwaznameyek bi hêstirên çavan ji wan re şiyand.⁵⁶³ Ji xudayê min û mehbûbê min re hemd, kul û derdê min ji kesên ku xwe ji min dûr dikin re.

120

1364 (Mld. 1946)

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun

Recez - - . - / - - . - / - - . - / - - . -

1. Ma qey ez ê hewe dilber û hebîb û şîrîne nazenîn
Wunda kim û we j' bîr bikim j' me vê tû baweriya xwe bîn
2. Sûnda mezin min xwarî kû heştâ rûhê me p'çek hebê
Terka me nîn e ji bo hewe tû emîn bibe bike tû yeqîn
3. Ger çi ji we ez dûre destî bûm û ez bûme muhacir û derketî
Lakîn bi vî qelbê xwe ez ji bo dîtina we me dûrebîn
4. Halo bizane j' me xwê bibê şîn û yan qantir bizê
Kabok bibê spî şubhê kak û nexweş bibim bikevin nivîn
5. Qeş nabirim j' Xwudê hevî û lavê kû bikê merhemet
Min û dilbera mina bêmisl di zemanekî bikê pev gihîn
6. Rehma ewê bê hîsab û bê hijmar e ma nebihîstiye
(La teqnetû min rehetillahî)⁵⁶⁴ di tenzîleê mubîn
7. Ya Wahîdê bêmisil tû 'ebdê xwe yê **Sîracî** jibîr nekê
Tû li wî bikê rehîm û 'efû bikê her gunahê ewî kirîn
[r. 162]
8. Bi wî bid tû qencî û xweşî di diniyy û kû herê axretê
Wî hîfîz bike ji 'ezab û narê cehnemê bike wî emîn

121

Ab 27-1372 (Mld. 1953)

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

Remel - . - - / - . - - / - . - - / - . -

1. Nazîkek min dî di meşha wek kevoka xweş kedî
Çûm tewafa her du birhan min nekîr 'eyb û fedî
2. Çar teref gava me nêrî cih hemî xalî ne lê
Ew Beko 'Ewwan hesûdî Zîn periya xwe me dî
3. Ger çi min xef kir hebîba xwe di nav çox û 'eba
Zû nehat Tacdîn bişewtên xan û manê 'escedî
4. Dom kirî ser min mitala wek Memê ket nav xemê

⁵⁶⁴ Ji rehma Xwedê hevîya xwe qut nekin. Sûretê Zumer, ayeta 53yan.

Ah û hesret min tejî bûn lew ji hûtê Tacidî

5. Sed hezar heyf û mixabin Ahremen xatem birî
Şah Suleyman bûye xwînî bêkes û ehl û xwedî
6. Tik tenê maye li çolê Qeysê lawê 'Amirî
Sur perî Leyla xebînet bav ji wêna kir fedî
7. Ger çi Şîrîn bê mîsal bû lêbelê Ferhad yeqîn
Can di 'îşqê de sipartî rebbê çerx û gunbedî
[r. 163]
8. Ax hebîba min çîqa tû nazik û xûb î gelek
Ez dikim qurban ji bona te perî pênçih sedî
9. Reş bibê ji her du rûwan bextê meyê pîs û çepel
Dar kirî destê reqîbê me ewê gend û gedî
10. Kanî perwan kanî bulbul kanî find û kanî gul
Yek ji 'uşşaqan nebû şad gul nebûm qet kes nedî
11. Şîn û reş behra te ne îro **Sîraceddîn** bes e
Hicreta rûreş gelo ma qey tenê tenha te dî

123

Kanûn - 1362- (Mld. 1943)

Mef'ûlû mefa 'ilun mef'ûlû mefa 'ilun

Mutedarik: -- -/ . ---/- -- -/ . ---

1. Dilber bi firaqa te dil bû rengê kebabê
Rûhê me di 'îşqa te bû meytê di turabê
2. Min qet di şev û rojê xew nîn e ji dilsojê
Ta kengî di nêv dojê tê min bidê 'ezabê
3. Narek ji firaqê hate cerg û kezeba min pat⁵⁶⁵
Mîn hubbike qelbî mat edrikni bi şerabê⁵⁶⁶
4. Zulfê te ê reyhanî her du burû kevanî
Xal û xedê fûranî kir kû qiyamet rabê
5. Vê firqetê dil ker kir rengê bihokê zer kir
Cerhê me hemî der kir herkand çemê 'edabê
6. 'Eşqa te kirim Mecnûn lew derdê me tev nû bûn
Hestiyê me tev hûr bûn kû tû ketî niqabê

⁵⁶⁵ Şewitand.

⁵⁶⁶ Ji eşqa qelbê min mir, bigihe min şerabekê bide min.

7. Billahî tû yî mehbûb huzna te kirim Ye' qûb
Derdê te kirim Eyyûb bes rûhî cuda nabê
8. Sê sed Hekîmê Loqman bînî berik û derman
Hem neh sed û sed qurban derdê me dewa nabê
[r. 164]
9. Lê yek neçera dilber yek lefza lebê eñmer
Carek li me bê pêşber êşa me wê wunda bê
10. **Sîracî** birîndar e gotî du hezar car e
Selamê me ser yar e heçta kû fîraq rabê

124 (1)⁵⁶⁷

Şûbat - 6 – 1360 (Mld. 1941)

Mefa 'ilun Mefa 'ilun fe 'ûlun

Hezec · - - - / · - - - / · - -

1. Fihêt û 'ar nema min lew dinalim
Bi roj û şev dema dem her dikalim
2. Ji min hêstir dibarin şubhê baran
Kela min kû kelî ez bêmecal im
3. Beroşa cergê min bû pelpela wê
Kû pê ket agirê 'îşqa te zalim
4. Ji qelpagê du çavan nuqte barîn
Bi kehnîkê du çavan ez newal im
5. Bi wê avê ji nû agir vemirtî
Kela min piçkî sar bû ez delal im
6. Nebêje ez ji bîra te çûyîme
Nebêje ez di dil de bêsu'al im
7. Me carek xwariye sûnda mezin kû
Ji bîra min tû naçê mah û sal im
8. Heta aşî ji bo te ez qeraş im
Heta sağ im tû dostê milk û mal im
9. Ji bircê ez ketim lew ez xira bûm
Nema min şewq û quwwet wek hîlal im

⁵⁶⁷ Ji ber ku du helbest bi hijmara "124"ê hatine nîşandan, me ji bo ya pêşî 124 (1) nivîsand.

10. Ji miska 'îşq û ħubba te 'etarê
Me şûşa qelbê dagirtî delal im
11. Kû hildana sena û wesfê xanim
Dî nava 'alemê de wek Bilal im
12. Hela haşa nikarim jê xeber dim
Dî hêjmara ewan de kor û lal im
13. Ğemamî girtiye ser her du çavan
Dema kû fîsê ew fînd û şemal im
14. Ziman jî hem gurover bû di dev de
Wekî carek xeber da bêmîsal im
15. Ji nav lêvan dibarîn şekir û gul
Revandî aqil û hiş nîn e ħalim
[r. 165]
16. Çi zanî min şeker jehra dila ye
Gula sor hîle miska 'eqlê 'alim
17. Ji yek min xwar û bêhn kir min ewa dî
Nizanî min li çol im yan li mal im
18. Dî cih de hiş me çû bûm sergomer⁵⁶⁸
Gelo kîjan e rastî ka şimalim
19. Bî min bêhnek dibû sal sal dibû gav
Dî dûrbûn û gihanî law û kal im
20. Bî çehvên kehrebî awur kû da min
Kîşandî rûh bi ceyranê ji bal im
21. Du ebrû bûn tilismî seħr û kahîn
Kîşandin wê li me ger lawê zalim
22. Nema îdî herê cejna dilê min
Evîna kes ji vê ez bê mital im
23. Bî qeyda wan du reş maran girêdam
Esîrê mîrê Bota me di çal im
24. Dikim qurban ji bo te sed hezar Zîn
Yeqîn îro li şûna lawê Al im

⁵⁶⁸ Gêj.

25. Tesellî ke ji gûh bavêje huznê
Te dil nabêjê qet ez koreval im

26. **Sîraco** bes bike tû bes binalê
Pur in wek te nebê ez bê heval im

124 (2)⁵⁶⁹

Şubat - 11 – 1374 (Mld. 1955)

Mustefîlun mustefîlun mustefîlun

Recez - - - - / - - - - / - - - -

1. Wer dilbera mina bê misl û zû gavekê
Çariyy û xêlî hilde bo me tû carekê
2. Umre me çû bûme nobedar ber vî derî
Kengî bibînîm tû ji me pursî su'alekê
3. Ma qey tû yî heyva me ya 'îda mezin
Belkî xwûya bikê derkevê ji gemamekê
4. Me ji 'îşq û hubbê serê xwe danîbû li rê
Da kû serêm bibrê wekî qurbanekê
5. Mîna ye awurê tûj ji bo me s'qa kirin⁵⁷⁰
Zanê kû min dil e wek hesin di miğarekê
6. Hê min ji bo te rûhê xwe yê şîrîn feda
Ma qey çî hewce ye l'xwe bikê êzayekê
[r. 166]
7. Bes 'eyna rûwê meğnetîs pêşber bike
Da dil ji wê re guhê xwe berdê carekê
8. Lêvên tenik veke ser ewan rêza sedef
Da gul bibarê ji wan bi peyv û silavekê
9. Ê dîn bibêjê me îro zistan bû bihar
Çimkû nedîtiye 'îşq û hubba yarekê
10. Çî dizanê kû kenî yarê nefxa sureyya
'Aşiq ji ber wê ketin çî lerz û tayekê
11. Hêstir dirjihin û hûr dibin teht û çiya
Merkeb di 'etlê qe nameşê yek gavekê

⁵⁶⁹ Ji ber ku du helbest bi hijmara "124"ê hatine nîşandan, me ji bo ya duyem 124 (2) nivîsand.

⁵⁷⁰ Ji bo hêsinca (das, tevir, bivir) tûjkirin.

12. Bê nûr dibin roj û heyv û avhişkî dibin
Rabû li 'aşîqê yarê şubhê qiyamekê
13. Heyhey hewar û me sed hezar carî hewar
Çawa me nayê tebat di weşl û fîraqekê
14. Ger yar ji min dûr e her me nal û zarî ye
Wer weşl e rûh me diçê dibim wek darekê
15. Halo dikim dimrê me dê halo me bav
Kes nîn e kû l'vî derdê min kê çarekê
16. Lew min xwe avête bextê Loqmanê Hekîm
Ka tû li derdê dilê me nakê rayekê
17. Piştî ku teşxîsî kir mu'eyna vî dilî
Telyê xwe geztin û sed keser bi vedanekê
18. Wî gote min here qet bi min pursê meke
Nabê rehet dilê te bi hebb û tiryaqekê
19. Ev jan giran e yeqîn te dil xwîn girtiye
Rûwê dilbera kafûrî nîn e li malekê
20. Te b'xwe rêya çûn û nehatinê girtiye
Ê kû bi ser wî kevê nebînê 'elacekê
21. Ma kanî Mecnûn û kanî Ferhad kanî Mem
Ew tev de çûn û mirin hemî bi belayekê
22. Îro te şop û rêya ewan girtî **Sîrac**
Bes tû binale bela xwe tû ji xwe navekê

125

Adar - 12 – 1375 (Mld. 1956)

Mustef'îlun fa 'ilun mustef'îlun fa 'ilun

Medîd — . . — / — . . — / — . . — / — . . —

1. Der muh̄beta dilberê girtî tenê rêç û şop
Bê şek ewê esmerê berdane dil teng û top
[r. 167]
2. Lew her dikim ah û şîn cergê me tev pişpişîn
Xwîn co bi co lê meşîn herkîn şirik ka dilop
3. Awur kû berdan ceger sewdan û hiş çûne der

Wek ba li min kir eser laşê me lew bûye qop

4. Bêhn û nefes teng kirin em bêhiş û reng kirin
Cîba beden leng kirin gava kû gotin me hop
5. Behra xiyala me wa j'fîkr û mişalê ne wa
Carek li min kir zewa wî bi 'eşa û bi çop
6. Lewre **Sîracê** hezîn hubb û evîna şîrîn
Kirne dikan û xezîn ser hev kirin top bi top

126

Nîsan - 6 – 1357 (Mld. 1938)

Mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun

Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. Dilber çîqa şîrîn e lê firqet welew tehlî me dît
Dil girtî şefra muhbetê derman li wê tîrîş me dît
2. Jana hinav kir bûne şor te'ma devê min tûj kirin
Me ji wan hinarê radêşo hetwan geza miz lê me dît
3. Bekwê 'Ewan pesnê perî gotin hemî kal û rijî
Da dilxelînek çêbibê kizrandina cergê me dît
4. Gava me dî gotin kelê wek min nedît û seh nekir
Qeş min nebû dil şîreval mufsid genî hingî me dît
5. Xavî nemaye ev birîn zahir de hêka yek rû we
Batin dikê pelpel⁵⁷¹ wekî goştê kelandî bê me dît
6. Çi b'kim gelî dost û bira ma xef li cem heq batin in
'Eşqa gelek dil teng kirî heqê ewê rastî me dît
[r. 168]
7. Min gotî mast sed carî mast lew dew birayê mastî ye
Munkir wekî kunkê gezeb be'candina wê pê me dît
8. Nayê veşartin ma gelo rim nêv kuwara tîn veşar
Mufsid jî nû teslîm dibû gava ser û bayê me dît
9. 'Aşîq nikarin qeş bi xwe sirra veşêrin d'yek demê
Lew roj û şev nalîn û kal we j'bulbulê bağê me dît
10. Hubba şepala bêmîsal cergê **Sîrac** xwînî kirî
Qeş kes wesif nadê ji min geyrê kesê derdê me dît

⁵⁷¹ Wextê ku tiştek (av an jî xwarin) dikele, dengê ku derdixe.

Mef'ûlû mefa'îlû mefa'îlû fe'ûlun fe'lun

Hezec -- ·/· --- / · --- / · --- / · ---

1. Dilber tû dîzanê di fîraqa te şev û rojê digazin
Weşlet me nebû kerb û keser lewme dirazin
2. Ev çerxê felek çep geriha bextê me reş kir
Ê şûna gula sor bi me dan sîr û pîvaz in
3. Xwezîya me bizanî li me tali' werê xweş rû
Da em ji vê dewranê tenê xanî bixwazin
4. Qeş mumkin e kû em te jibîr bikne ji bîrê
Çavê me tejî kir şefeqa gerden û bazin
[r. 169]
5. Mewcek ji evîna te li qelbê hezînî da
Nişkê ve ji lew min ji kesî nîn e tû gazin
6. Bê şubhe dev û dil li me bûn radiyo tescîl
Çîqa kû xeber din ji cemal hadîse bazin
7. Bê husnê xeyala te me nabûrê nefes yek
Nûra te ye qiblet bifikir em di nemaz in
8. Ma kî ne fotografê du çavan kû şekil dîn
Teswîr li filîmê dilê bîtteb'î dixwazin
9. Xizna me hemandî bi du reş marê tîlismê
Te'zîm qe eser nîn e çi Sîna çi eyaz in
10. Heyho kû muho bin ji qedîfê dilê zîba
Ev nuqte û xet kû ji evîna te tîrazin
11. Fexra xwe dikim her li hevalan bi qumaşî
Dukan me tejî tûp e ne kû metrek û gaz in
12. Ey dil xwe neşewtêne wekî mûm û çirayê
Sîrac tenekê 'îşqê tejî petrol û gaz in

128

Temûz - 17 – 1377 (Mld. 1958)

Qesîda Muhmel bênuqut

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun

Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

[r. 170]

1. Dilo ka hew li ser wara wilo ah û keser der ke
Kum û kolos û desmala kul û derda li ser ser ke
2. Gelek wek me li wa wara weke hara digo hawar
Delalo hew here wir ser delala dil du sed ker ke
3. Kuro her war ew e ma ka gula sor û de ka adar
Weke totak weke her dem li ser ala me ser ger ke
4. Melûl û ger kela germa me wek agir de ka serma
Here 'erda kû kola wa li ser kol û di kûr wer ke
5. Hemû kes kor fikir wara hemû guh ker fikir wara
Ku da awur gula wara di mala dil de serwer ke
6. Gelo ka 'ar di mah û sal **Sîrac** kole li dor kola
Me hûr û rûh ew e lewre li wir her dil me mermer ke
7. Wilo gola dila dagir ji her ah û kul û derda
Ew e kû dil digo gih rûh li ser gih kes re gih ser ke

-129-

Adar 10-1375 (Mld. 1956)

Mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun

Recez - - · - / - - · - / - - · -

1. Ê kû ji min pursê bikê pesnê zerî
Ya 'aşiqan dil ser ewê bûn sed kerî
2. Ez dê bibêjim ma dibim ez pesnedar
Haşa xeber dim ez ji dêmê gul'îzar
3. Carek binêre tû li wê bejna şepal
Da tû bibê subhan ji neqşê zilcelal
[r. 171]
4. Rengê sipî anî kever çavê belek
Zendê di zer biskên di şey bûne xelek

5. Birhên di reş gerden zer û gulya qemer
Lêvên di sor barîn ji wan qend û şeker
6. Bejna bilind nowqa zirav lêvên tenik
Zenya te gok anî fereh bêhvîl kiçik
7. Destê nerim zendê qelew qirka dirêj
Kezyê stûr gava me dît em bûne gêj
8. Fincan memik mircan dinan biskê qeseb
Gustîlk e dev lêv kaxedî ker kir kezeb
9. Qama sipîndar dêm ji gul qeytan birih
Awur şewat avête dil baqê dirih
10. Meşwerdeka kêrgû kemax xebxeb kevok
Wê çavxezalê zer kirim rengê bihok
11. Da tû bibêjê sed tebarek bo Xweda
Kê dîtine wek vê di bin ‘erşê Xweda
12. Min tewbe ye îdî li kes lewmê nekim
Ser teb‘etê lewmê kû qet domê nekim
13. Anceq wekî vê çêbibin hûr û perî
Sîrac ji lew bû ‘aşîqê ber wî derî

-130-

Adar 14-1375 (Mld. 1956)

Mustef‘ilatun mustef‘ilatun

Recez: — · — — / — — · — —

1. Mehbûbê xwed ra dîdem biharî
Cumle bipoşîd j’belgê çinarî
2. Poşî û terhî qews û qezeh bûn
Anî ji ‘eynê zulfên di tarî
3. Lêv û devan tit kirne gula sor
Ken jê dibarî qendê tetarî
4. Îmam Xezalî danî —muselles—
Nîv her du birhan çavê sitarî
5. Şems û ‘etârîd ser erzeniyyê
Nîv wan de tîrek ew bû -qecarî-
6. Rûdêm û anî wer du xezîn in

Lê bisk û qembûr bûn xar û marî

7. Gava kû bê keyf ez wê dibînim
Qurban dikim her car û cewarî
[r. 172]
8. Rûhim fida bê gava kû hêstir
Ji çavan dibarin rengê merarî
9. Ew destê kin bê ser bête hildan
Ew çav teqî bê kû bik gedarî
10. Ya rebbi demmir kulelhusadi
Ya rebbi waxsif bîhîm kulle dari⁵⁷²
11. Her çi hebîbê carek bibînê
Wê ser tewênê bê 'eyb û 'arî
12. Wellahî 'îşqa dilber qe naçê
Hetta di gora pur teng û tarî
13. Ya reb tû reş kê rûwê fîraqê
Çawa kirim dûr lew dikme zarî
14. Her dem bi çavan Xabûr û Nîl im
Şûna dumû 'an xûn bûye carî
15. Ferhad bi feryad Şîrîn e Şîrîn
Em her du mane bê dost û yarî
16. Ya reb ji te her îhsan û qencî
Ber in gedayî kon rehme barî⁵⁷³
17. Îla meta ma ye' tilbeşîrû
Bilweşlî hetta axuz bise' rî⁵⁷⁴
18. Lew ci' tenî ya muferrîc kerbî
Ufdîke rûhî zakennehari⁵⁷⁵
19. Barî bi çeşmê rehma bibîned
În **sîn û cîm'a** dil hemçû arî
20. Hem ber hebîbet mehter selamet

⁵⁷² Ya Rebbî kesên hesûd hemîyan xilas bike/wan û xaniyan wan têxe binê erdê de.

⁵⁷³ Ji vî feqîrî re rehmkê bike ey Xuda.

⁵⁷⁴ Heta kengî ew ê mizgîniyê bîne wê were/û xwe bigihîne min û ez heyfa xwe li wan hilînim.

⁵⁷⁵ Heke tu werî cem min ku derdên min bibî/ez ê ruhê xwe di wê rojê de fida bikim.

Her ke çû dağim bad bê şemari
-131- Kanûna Sanî -27-1365 (Mld. 1946)

Mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun mustef'ilun
Recez - - - - / - - - - / - - - - / - - - -

1. Adar û nîsan û gulan her sê bihar in pur xweş in
Hezn û gem û derdê dilan tê de diçin hem bê leş in
2. Hezîran û temûz tevlî tebağ weqtê heşîna dar û bağ
Her kes dixebtê bêsemağ ev her sê havînê geş in
[r. 173]
3. Îlûn di gel her du çirî min tê de dil bû sed kerî
Lew dûr ketim ez dilberê payîz e ev pel diweşin
4. Kanûnê ê kû diduwa hem gel subata zînnewa
Tê de li min cewr kir hewa ev ji zivistanê reş in
5. Evna zivistanê 'esîr weqtê 'îbadet bo qedîr
Jar û belengaz û feqîr tê de dinalin bê weş in
6. Beytê **Sîraceddîn** tamam kû weqtê xista makelam
Ser dilbera min sed salam zulf şubhê reyhanê reş in

-132-

Mefa 'ilun mefa 'ilun fe 'ulun
Hezec . - - - / . - - - / . - - -

1. Selamê pur me bona wan şiyandin
Bi misk û mawerê tev de reşandin
Li nav ermûş û wistebreq gerandin
Nesîmê seherê jê re gehandin
2. Ji bo wê ez dibêjim wa delalê
Bi wî rebbê mezin tû l'vê xeyalê
Ji bona hêstira çavê dinalê
Çikû tîn her wekî ava newalê
3. Ji bo çi carekê ser nadê mehzûn
Evê 'aşiq ji bo te bûye Mecnûn
Dil û nava ewî lew bûye tev xûn
Ji ber te guh didê va şî'rê mewzûn
4. Şev û rojê ew e mecruhê 'îşqê
Ji ber wê awura teşbîhê berqê
Muşewweş bûm ji ber wê xal û şewqê

Xed û roj nakime nav wan tû ferqê

5. Te ez kuştîm bi wan çavê mukemmel
Bi zendê zer bi eswarê muqeffel
[r. 174]
Bi enya spî bi wî wechê mukemmel
Bi nûr û 'enber û miskê mucemmel

6. Ji ber tîrê te ê çeşmê sipî reş
Nemaye 'eqî û sewda tev muşewweş
Sîraceddîn çû per dane der ateş
Bûye arê di 'îşqa mihrûwa geş

-133-

Mefa 'îlun mefa 'îlun fe 'ûlun
Hezec · — — — / · — — — / · — —

1. Ji derdê firqeta te ez çî dîn im
Hezîn im pur hezîn im pur hezîn im
2. Ji ber 'îşqa te dîl min bûye pêtî
Bi wî rebbê mezin ez te d'hebînim
3. Bi roj û şev rica min bo te weşl e
Ji lew her dem li bîra xwe te tînim
4. Eger her dem li bîra min tû nayê
Bi vî qelbê birîndar ez nemînim
5. Bi çavê dîl bi ê 'aqîl bi ê rûh
Ji bo dîna te ez xweş dûrebîn im
6. Te hûş û 'aqîlê min tev revandî
Te nabînim ji lewre dilbirîn im
7. Belê gava kû min dêmê te dîtî
Dîlê min pur bi keyf e ez bi jîn im
8. Me dîl bûye ji ber zulmê du sed ker
Kû nêzîk e rûhê xwe ez derînim
9. De ka bes ke li min zulmê şepalê
Ji ber zumla te îdî naqedînim
10. **Sîraceddîn** birîndarê te dîlber
Dibêjê ez ji bo te can helînim

Mefa 'ilun mefa 'ilun fe 'ulun

Hezec · - - - / · - - - / · - -

1. Hebîba min tebîba min tû derman
Ji bona min ez im dînê di dêran
2. Dixwûm sûndê bi wî rebbê mezintir
Ji her tiştê wî çêkir derd û derman
3. Ew e derman ji bona min 'elîlî
Ew e şafî ji bona kûr birînan
[r. 175]
4. Ne Luqman karê sağ kê vê birînê
Ne Hatem xweş bikê gelbê feqîran
5. Ji geyrî wê hebîba pur menewwer
Ewa kû pur 'effî e pur dîlovan
6. Gelo carek he ye kû wê bibînim
Wekî Rustem bi gurz seknê li meydan
7. Eger carek bibînim wê şepalê
Li min ferz e tewafa zulf û xalan
8. Leqed mittu minel hecri keqeysin
We ente lentera mîsleke 'eynan⁵⁷⁶
9. We qed kellet fuadî bilkurûbi
We qedi-byebza 'eynî feqed Ken'nan⁵⁷⁷
10. Feerhîm 'aşiqen bate xerîban
'Enîl ewtanî lem yeskun fî' umran⁵⁷⁸
11. Reçaî min îlahîlxelqî dehren
Wusûlun me'hebîbî 'inde ridwan⁵⁷⁹
12. Fe ya rebbî bi cahî Mustefake
Enîlna qesdena îz ente Mennan⁵⁸⁰

⁵⁷⁶ Ez mirime ji dûrbûna hebîbê Qeys/Yên wekî te çav tu caran nabînin.

⁵⁷⁷ Ji derb û bela qelbê min betilî ye/Û çavên min jî spî bûne ji tunebûna Ken'an.

⁵⁷⁸ Rehmê bike ji aşiqê ku xerîb ketiye re/Ji welatê xwe ku di avahiya de nasekine.

⁵⁷⁹ Ricaya min ji xaliqê min e her wextî/Gihandina min û hebîbê bike li cenetê.

⁵⁸⁰ Ey rebbê min bi xatirê Mustefa kî/Tu me bigihîni mirada me lewra tu Xudayekî ku qenciyan dike yî.

13. We sellî summe sellîm zîd we barîk
‘Ela ġeyrîl enamî heble ‘ednan⁵⁸¹
14. Keza alin we eşhabin kîramin
We exfîr sîn’e cîm’in hîmle ‘îsyân⁵⁸²

135

Mustef’ ilatun mustef’ ilatun

Recez: – – · – – / – – · – –

1. Heṭṭa kû saġ im ḥusna we yara
Naçê ji kamim jana neyara
2. Nûra rûwê we rengê hîlalê
Pertew rijandî çol û nizara
3. Ma qey çi bêjim ez dûredest im
Sohtî li min te dîl kirye ara
4. Heṭṭa qiyamet ser min nerabê
Terka we nîn e ji qelbê kedara
5. Bextê me ê reş îro felek bû
Bêsoz û peyman ez kirme xewara
6. Wellah û tellah bîllah hebîbê
Tim tû li bîrê tê aşîkara
[r. 176]
7. Çerxa dilê reş tev bûye ateş
Rûḥ kir muşewweş kul kirye xara
8. Zînê qe navim ger ew perî bê
Xenzîr çi bînim îro li dara
9. Êş û kulê min ger bêne husban
Jana zirav e dîna du mara
10. Min kî veşandî dest ez te şahî
Ḥubbê vejandî derdê usara
11. Birhê te yê reş biskên di gulgûn
Awur du tîr in ji qewsê Buxara

⁵⁸¹ Selat û selaman bide û tu zêde bike û bereketê bidîyê/Qencê muxlûqata ku neviyên Ednan in.

⁵⁸² Li ser al û eshabên wî yên kîram/Û tu bixefrîne Sîn û Cîmê ku barê wî guneh in.

12. Lêvê şekir tam zenya wekî sêv
Qirka lûalî zendê siwara
13. Anî kever por reng ze' feranî⁵⁸³
Pozê çelakî qulpa guhara
14. Qama⁵⁸⁴ sipîndar xusro gulam bê
Fincanê ferfûr singa suwara
15. Noqa bikember ce'da Hesenkeyf
Zergo dinalin karwan bi bara
16. Mecnûn bidîta dêmê bi beybûn
Wê terkê kirba Leyla nîgara
17. Lêvê te yê sor kulîlka h' narê
Hinarê rûwê te gulla nizara
18. Ez kirme bêhûş sewda û Mecnûn
Şeyda û dîn û rengê sukara
19. Ma qey ez ê te bikme feramûş
Yek lehz û gavê leyl û nihara
20. Pêtê dirabê **Sîrac** ji cergê
Qeṭ nîn e nîsyan zanim tû cara
21. Lewmê mekin hûn dost û birader
Sellû 'eleyhî wed'û ji wa ra
22. Nîn e temamî l' goftarê **Sîrac**
Ya reb bihêlê wan tû ji mara

136- adar 21-1364 (Mld. 1945)

Fa'îlu fe'ûlun fa'îlu fe'ûlun

Muteqarib — · / · — — / — — · / · — —

[r. 177]

1. Hîcra te hebîbê dil kirye purî jan
Hubba te ye şîrîn xem kirye perîşan
2. Ayîneyê rû'yê manendeyê xorşîd
Por ez şefeq wey şod qelbê me rîşan⁵⁸⁵

⁵⁸³ Ev malik û ya di bin re li dawiyê hatibûne nivîsandin. Lê me anîne vê derê. Di çapa TÎD de jî bi vî rengî ye.

⁵⁸⁴ Di çapa TÎD de peyva “qama” bi şêklê “tama” hatiye nivîsîn. Lê rastiya wê divê “qama” be.

⁵⁸⁵ Cemal û rewneqa sûretê te mîna rojê ye/Û qelbê me mîna şefeqê jê ronahî bû.

3. Înnî le ‘emîdun mîn ħubbîke dehren
Eente bexîlun em maleke îman⁵⁸⁶
4. Ĥeṭṭa çî zemanî xwîn tê ji hinavan
Ĥeṭṭa çî heyamê tê bikujê esîran
5. Hukmê te keber ma mani’ nîye çeşmim
Ez behrê xodayî koştê meke zîran⁵⁸⁷
6. Qed faqe ‘elennasî zulmuke cîharen
Mînhum leke qetla mînhum lekde zîşan⁵⁸⁸
7. Cewra te li min kir kafir wê nebînin
Ĥunsa me hebandî bêhtir bû ji Zîn’an⁵⁸⁹
8. Êy ‘azêlê mêskîn zênharî bêxamûş
Ba sîwebûrebîn an destî berîdan
9. Wellahî laefnî‘ umrî fî hewaha
Ma dumtu bîremqîn fî heşrî we mîzan⁵⁹⁰
10. Ger çende kû daîm sebrê dikişênim
Lakîn te şepalê ez kirme ji dînan
11. Eşkenceyê zulfet dil septe bi yek dam
Aya tû yî xusro men xesmî gerîban⁵⁹¹
12. În kunte keşemsîn felqelbu keherba
În kunte bîhemmîm ufdîke be’yan⁵⁹²
13. Kengî li dinê em rûnin bi civatê
Da em biweşênin kurmê di birînan
14. Meynûş bêşewem ez le’l û lebê şîrîn
Ta zêndê bêmaned ta çerx û zemînan⁵⁹³
15. Elqelbu yudîu bîlĥubbî keşem’în
Wel’eynu temûcu bîddem’î keceyhan⁵⁹⁴

⁵⁸⁶ Ez her wextî qesda eşqa te dikim/Ma qey tî bexîl î yan îmana te nîn e.

⁵⁸⁷ Ji bo xatirê Xudatîyê nekuje.

⁵⁸⁸ Zulma te eşkere bi ser insanan ketiye/Hinek ji wan kuştîyên te ne û hinek jî bi qedr in.

⁵⁸⁹ Li vê derê peyva “Zîn” heye. Êdî ji bo ku me’neyên cuda neyên fêhmkirin, me bi dabirkê cuda kir.

⁵⁹⁰ Ez sûnd dixum ku ez ê umrê xwe di eşqa wê de fena bikim/Heta ku ez sax im di heşr û mîzanê de.

⁵⁹¹ Aya tu Xusrew î û ez jî wek dijminê te.

⁵⁹² Heke tu wekî rojê bî, qelbê min jî weke Hirba (Bûqelem, Bukalemun) ye/Heke tu xemgîn bibî ez ê her dû çavên xwe jî ter re feda bikim.

⁵⁹³ Ez ê ji le’l û lêva şîrînê bibim meynoş/Heta ku çerx û gerdûn zindî bimîne.

⁵⁹⁴ Qelb rehnî dibe weke findê/Çav jî pêl didin bi hêstiran weke çemê Ceyhanê.

16. Jan û elemê min hejmar qe tûnîn in
Katib kû werin gel her êl û 'eşîran
17. Ferhadî ço men hîç dilrîşê nêmişod
Şîrînê ço şîrîn nebowed hemço zîban⁵⁹⁵
18. Ya rebbî bi heqqê ceddîlheseneyn
Ew silha bi **Sîrac** fî misrî Xelîlan
[r. 178]

-137-⁵⁹⁶ sibat 22-1365- (Mld. 1946)

Mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun mefa 'ilun
Hezec · - - - - / · - - - - / · - - - - / · - - - -

من لا مني في حبها أرجو من الله الكريم
أن يبتلي بما أبتليت و اطعم الداء الأليم⁵⁹⁷

يا لئمي لو كنت منصفاً لما لاميتني
من جرب شرب السموم حلت به ويل النديم⁵⁹⁸

إياك يا من لا مني أن لا تطع ما قلته
علك أن تعشق يوماً تصدق قول السقيم⁵⁹⁹

إن الهوى أعي الطبيب لا تقبل ذوب الجسم
إلا هو الازم والملزوم و روح من عزيز⁶⁰⁰

و الوجه مرآة من المغناطيسي و الفؤاد
من الحديد كيف لا يجذب ذا الروح الرميم⁶⁰¹

من لا يحارب فهو سبع من فم الأكراد جا
من لم يبيت بيتاً كذا لا يعرف حال المقيم⁶⁰²

و الفرس قالوا لو حفظت سبع سبع من كتاب
مذما تعشقت فلا تدري ألف با أي كنيم⁶⁰³

⁵⁹⁵ Ferhad qet wekî min dîkul nedibû/Şîrîna weke Şîrînê jî çî nabe weke zîban.

⁵⁹⁶ Ev Ev helbest bi Erebî ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nîşan daye.

⁵⁹⁷ Ew kesê ku di hejzêkirana wê de lewma li min bike/Ez dixwazim xudê vê êşa zor bi wî jî bidê.

⁵⁹⁸ Ey ew kesê ku lewma li min dikî heke tu ehlê insafê be te yê lewme li min nekiriba/Ew kesê ku vexwarina jehrê tecrûbe bike wê weyla poşmaniye bi ser de were.

⁵⁹⁹ Hey ji xwe hebe ey ew kesên ku lewma li min dike/Heye ku rojekî tu ji aşîq bibî êdî tê xebardanên min qebûl bike.

⁶⁰⁰ Eşqê, zora doktora bîriye qebûl nake helandin cisim/Eşq û eş du tiştên ku bi hev ve girêdayî ne, weke ruhê kesê deyndar e.

⁶⁰¹ Ruwê wê wekî eynikeke meqnetîzê ye qelb jî hesin e/Çawa wî ruhê rizî nakişîne.

⁶⁰² Ew kesê ku nikare şer bike ew cenawîrek e ji devê Kurdan hatiye/Ew kesê ku di malan de neraketibe, halên kesên ku di malê de raketiye nizane.

⁶⁰³ Farisan gotine heke te ji ber kiribe heft û heft kitêb/Lê heke tu aşîq nebûbî tu elîfbê jî nizanî.

إن كنت لا تقبل ما قلت لك يا عماذ (عاذ؟) لي
فانظر إليها كي تعذرني بقولٍ مستقيم⁶⁰⁴
إن لم تكن مثل اللوات لمن حب الصادقة
لما قطعن الأيدي قلن هو ملأناك (ملأك) كريم⁶⁰⁵

هذا سراج جن في حب و شغف زائد
من حب قيس و الذي هو الذي يشفي العليل⁶⁰⁶

138⁶⁰⁷ (1)⁶⁰⁸
- Adar – 12-1365 (Mld. 1946)

Mefa 'ilun fe 'ulun mefa 'ilun fe 'ulun

Hezec . - - - / - - - / - - - - / - - -
آه – دمعت عيوني كالسيل و العيون
لفقد العين متى الوصل يهرول⁶⁰⁹

قد حرمت لها النوم جم الليالي و اليوم
حباً لذلك القوم أ أحمد أبسمل⁶¹⁰

حمداً لربي الله أتنا من حبيبناه
و لا زيد من ضاه كلا فلا مماثل⁶¹¹

إن كنت كالعبيد بالجسد القديد
و المقلة الرميد لكن أنا المقابل⁶¹²

لأنها في قلبي مضرب و لهب
فانظر إلى أبي لهب و سلمان المناقل⁶¹³

إذ المرء به حاك به حي به شاك
فلا طب يداواك إذا القلب مقاتل⁶¹⁴

⁶⁰⁴ Eger tiştên ku min ji te re got tu qebûl nakî ey kesê lewmedar/Tu ji li mehbûbê binêre da qene tu ji min mazûr bibînî bi peyveke rast.

⁶⁰⁵ Eger tu nebê weke wan kesên ku lewme li eşqa wê ya rast kirin/Lê wextê ku destê xwe jêkirin gotin ev melaîketek e.

⁶⁰⁶ Ev *sîrac* e dîn bûye di îşqê de û eşqeke zêdetirî eşqa Qeys/Ew ê ku şîfaya nexweşiyê dide, şîfaya eşqê jî dide.

⁶⁰⁷ Ev helbest bi Erebi ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nîşan daye.

⁶⁰⁸ Ji ber ku du helbest bi hijmara “138”yê hatine nîşandan, me ji bo ya pêşî 138 (1) nivîsand.

⁶⁰⁹ Ax çavên min hêstiran dibarênin weke lehî û kaniyan/Ji bo dûrbûna çavên wê hêstir têne xwarê wextê dibîne bi bal wê ve dibeze.

⁶¹⁰ Ji bo wê xew heram bûye di temamê şev û rojê de/Ji bo hezjêkirina wê qewmê ez hemd û besmelê dikim.

⁶¹¹ Hemd ji xudayê min re ku nave wî Ellah e ku daye me eva ku em hez jê dikin/Em hineke weke wê naxwazin, jixwe ji yên weke wê nîn in.

⁶¹² Eger tu weke yekî dût bê bi wî cesedê perçekirî/Bi wan çavên kor lakin ez li hemberî wê me.

⁶¹³ Lewra ew di dilê min de lêdixê û di dilê min de agir e/Li Ebû Leheb binêre û Selmanê ku li gelek deran geriyaye.

⁶¹⁴ Wî wextê ku hinek insan pê dixurin hinek pê sax in hinek şikbir in/Ti doktoriya ku tedawî bike nîn e wextê ku bi qelb re şer bike.

به السرور و الضر به الحلو به المر
هو الخذف هو الدر هو الهادي المضلل⁶¹⁵

بان الهوى في روعي مذ (منذ) ما رأيت روعي
كيف استوى لنوعي إذ جودي مزلزل⁶¹⁶

لو أبقى ما بقي أيام لا أنسى ذكر من قام
قد رمى قلبي أسهام ماذا على العواذل⁶¹⁷

إذ قلن أنت مجنون تطلب شمع زيتون
في النار و هو مرهون و الشمع في رزائل⁶¹⁸

و القلب ذاكر ما دام الحياة لصاً
بدا يطير كالمارد بين القبائل⁶¹⁹

سراج قم سرعاً و لا تكن صريعاً
للحب سميعاً و لا تكن بزائل⁶²⁰

138⁶²¹ (2)⁶²²

- (sibat) 20 – 1364 (Mld. 1945)

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun

Remel - . - - / - . - - / - . - - / - . - -

معشر العشاق كيف الصبر ما غاب الحبيب
عجياً للروح بالسكنى في ذا الجسم الكئيب
لا يقوم بانهازام تحت أقدام الغريب
إذ هو المعتوب لا العذال قط لا الرقيب
الأمان إني ضعيف مذنب عبد كئيب⁶²³

كيف أترك حب محبوب لها خد أسيل
وجهها بدر الظلام و لها عين كحيل
فوها كأس الشراب فيه عين السلسيل

⁶¹⁵ Keyfxweşî bi wî ye û zerar jî bi wî ye şîranî û tehlî jî bi wî ne/Ew qafîk e jî durr e jî ew e ku hîdayetê dide kesê di delaletê de.

⁶¹⁶ Hewa eşqê ketiye dilê min de berî ku ez ruhê xwe nas bikim/Çawa rast bûye ji Nûh re wextê ku çiyayê cûdî biheje.

⁶¹⁷ Heke ku roj bimênin ez jibîr nakim behsa wan ku rabûne/Hinek tîr avêtin qelbê min çî ji van lewmedaran e.

⁶¹⁸ Wextê ku digotin tu dîn î tu teleba dohnê zeytûnê dike/Dî êgir de hatiye sekinandin û şimaya tê de zail dibe.

⁶¹⁹ Heta heyat bi dizî derbas dibe/Difire weke wa yên ku di nava eşîran de sebê dîkin.

⁶²⁰ **Sîrac** zû rabe nebe weke dînan/Û tu guhdarê eşqê be û ji vê eşqa xwe cuda nebe.

⁶²¹ Ev Ev helbest bi Erebi ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nîşan daye.

⁶²² Ji ber ku du helbest bi hijmara “138”yê hatine nîşandan, me ji bo ya duyem 138 (2) nivîsand.

⁶²³ Ey civata aşîqan çawa wê sebir çêbibe heta ku hebîb winda bibe/Ecêb ji rûh bi seknandina wî di wî cismê xemgîn de/Weke kesê ku di bin lingên xerîban de û nikarê rabe ser xwe/Ew e yê ku lewme lê hatine kirin ne ku wî lewme li ti kesî kiriye/El eman ez ebdekî zeîf im gunehkar im û xemgîn im.

من يذوقها لا يموت ذاك من فضل الجليل
بالنبي المصطفى رب طعمني عن قريب⁶²⁴

مذ شددت الوسط يا رحي بمنطق الهوى
حل جمى حر شهب زنده هذا النوى
بيضت عين برمد الحزن كبدي قد شوى
صاح امهلني أطوف الخد إذ هذا الدوى
لا يكون مثل هذا مرهم الجرح النقيب⁶²⁵

غاب فكري ضل عقلي زاد حزني صبري راح
صرت مغروفاً في بحر الهجر يا نجم الصباح
أنت بالوصل بخيل إني للغم مراح
ما بقي في الأيدي إلا رب ارزقنا الفلاح

[r. 180]

أنت رب الخلق طراً أنت للداعي مجيب⁶²⁶

هب لنا وصلاً بمحبوب لطيف كالهلل
في حياة دار خلد دائماً قط لا يزال
في سرور مع قصور يا كريماً ذا الجلال
أنت جامع ليوم لم يكن فيه ضلال
إنك المنان معطي لسان لا تخيب⁶²⁷

فيحق اسمك الأعظم تقبل ذا الدعا
وامح عني كل ذنب صدرتني كنفاً (?)
وعطني خير الأكور والذي اغفر معاً
إن ذا عبد ذليل عند بابك قد دعى
فاعطه ما في الضمير و السلام للحبيب⁶²⁸

قد تهري الجسم من نار الفراق يا عليم
قسمي ذاتك إنك أنت جواد كريم
أين مانع لما أعطيت يا معطي اللئيم
إنني سين مسيء أنت غفار رحيم
بعد ذا قول و أصحابي الصلاة للحبيب⁶²⁹

⁶²⁴ Çawa ez ê terk bikim hubba mehbûbê jêre rûwekî şahîk û spehî heyê/Rûwê wê ji tarîtiyê re heyv e û çavên wê kilkirî ne/Devê wê qedehe şerabê ye di wê qedehê de ava kaniya zelal heyê/Yê ku tema wê bike namire ev ji fedla xudê ye/Bi xatirê pêxember ya rebbî tu bikî ku ez jî te'm bikim di nêz de.

⁶²⁵ Wextê ku min noqa xwe girêda bi kembera eşqê/Ev dûrbûna ji hebîbê, germa pizotê agirê dara kete cismê min de/Çavên min spî bûn bi êşa huznê kezêba min jî pijcha/Ey dostê min muhletê bide min ez bigerim li ser rûwê wê lewra ev e dermanê min/Weke vê nabe merhema birîna kûr jî.

⁶²⁶ Fikrê min çû winda bû aqlê min ji rê çû sebra min çû/Di behra dûrbûna ji wê, ez xerq bûme ey stêrika sibehê/Di nêzîkbûnê de tu ne merd î ji kul û derdan tijî me/Tiştek di dest de nemaye ya rebbî tu felahê bide min/Tu rebbê xelqê yî tu dewamî du'ayên duaçîyan qebûl dikî.

⁶²⁷ Tu bide me gihiştina mehbûbekê yeke wekî hevî/Di heyata dara Xulde⁶²⁷ de ku jibînî zail nabe/Di keyfxweşbûneke di nava qesran de ey Kerîmê Zulcelal/Tê insanan top bikî di wê roja tê de delalet nîn e/Muheqqeq tu didê wan kesên ku dixwazin tu wan vala navegerînî.

⁶²⁸ Bi xatirê navê e'zê me vê du'ayê qebûl bike/Hemî gunehên min ji min bibe ku ji min peyde bûne/Bide min tiştên herî baş û dê û bavên min jî/Muheqqeq ew ebdekî zelîl e li dergahê te dua'yan dike/Tişta ku di dilê wî de bidîyê û selam li ser hebîbî

Mefa 'ilun fe 'ûlun mefa 'ilun fe 'ûlun

Hezec · - - - / · - - / · - - - / · - -

1. Ez 'aşiqê heqîq im yara dilê me patin
Qurban dikim dil û can dema ji der de hatin
2. Nîlufêrê dilê min geş bû vebû ji ğuncê
Gava bi şewq û tîrêj wekî rojê hilatin
3. Şev û rojê xeyal e li min dîna hebîban
Ji çavan hêstirê sor herkîne wek ferat in
4. Mehbûb çikû ne wek gul dom nîn e her zemanî
Nabim bi rengê bulbul cih cumle tîrh û kat⁶³⁰ in
5. Min dil yek e ji lewre nîn e me xeyrê me 'şûq
Cihê yar tê de rûnê bo me cih û welat in
6. Weşla ewan dixwazim şev û rojên lîqayê
Ew in qencê zemanan bi min 'îd û berat in
7. Ne wek ehlê zemên im bivîr bikim mûrîdî
Meşhûr kirin dema kû (nû hat kevin xelat in)
[r. 181]
8. Bi dev hemî welî ne muştâq û mutteqî ne
'Umur ji nivî bûrî bê cehd û bê xebat in
9. Zahir bi rehîm û şefqet girîn ji ber gunahan
Batin binêr dilê wan çiqqa hişk in ne lat in
10. Her yek dibê ez im rast hevalê min heşif bû
Pîlan û xef gerandin hemî laf û petat in
11. Îro bi 'îşq û vînê girîn ji bo xwe murşîd
Siba jibîr kirin lew bê 'ezm û bê sebat in
12. Li nav şeyxan girêdan bendek wekî 'Ezazîl
Bûn munkîrê hevûdû bi sohbet û civat in
13. 'Îşqa kû virr esas bê kengî diçê temamî

⁶²⁹ Herifiye cismê ze'îf ji agirê fîraqê ey 'Elîm/Ez bi zatê te sûnd dixûm ku tu Cewad û Kerîm î/Ey ew kesê ku tu didî lewmekaran ji kî dikare ku vê men' bike ku/Ez **sîracê** guhenkar im tu jî Rebbeê Xefûr î/Pîstre jî gotinek heye selat û selam li ser hebîbî be.

⁶³⁰ Kat: Tîrh, kelem. Wextê mirov darê ji qurmê wê dibire û piştê di cihê qurm de şîn dibe, ji wan şax û tîrhan re "kat" tê gotin.

Dîwarê xwehr û piz ê li ser bê bînecat in

14. ‘Aşiq ew in tû cara bi xef hem aşîkara
Nekin ji bîrê yara ji ‘îşqê re rû‘at in
15. Xewwasê fikrê derket ji behra vî zemanî
Ji geyrî qaqilunek tişte bi dest nehatin
16. **Sîrac** ji lewre ma şaş li sûretê heqîqet
Bû sînema li ber wê va sagê bê heyat in

-140-

Kanûna Sanî – 20-1381 (Mld. 1962)

Mef‘ûlu mefa ‘ilun fe ‘ûlun

Hezec · - - - / · - - - / · - -

1. Destpêkirina me navê Ellah
Hem dûrkirina me le‘netullah
2. Hemd û şukur û sena û minnet
Her bo rebbê ‘erş û ferş û cennet
3. Efzel ji şelatê pur mumecced
Ya reb tû bidê li ser Muḥemmed
4. Muşfî‘ ew e bo **Sîracê** ‘asî
Ya reb bi wî ‘ef bike me‘asî
5. Hinga wereq û pelê nebatî
Nuqta meṭera li dunyê hatî
6. Hem tiştê hebê di ‘ilmê xaliq
Wî çêkirî nahi q û ji natiq
7. Hem sakîn û bê rûḥ û ji carî
Av û herî û hewa û narî
8. Hem hişk û teriyy û germ û sarî
Ev qasî salamê bê qerarî
[r. 182]
9. Her dem li rûḥê nebiyyê ummet
Ew ‘alî ye pur ‘ezîm e hîmnet
10. Piştî kû me dest bi navê wî kir
Hêviyy û reca ji zatê wî kir

11. Çend pursê kirin ji halê xwe min
Gotî kû sebir bike dilê min
12. Min gotî sebir ew der wîfaqê
Nedbu' dû newa û hem fîraqê
13. Pur ez gelekî dikim te' eccub
Çawa kû sebir he ye d'tecennub
14. Lê ez çi bikim ji bo Îlahî
Emrê me ew gotinê bi fahî
15. Gotin kû he ye mirin çi se'be
Es'ebtîr e fîrqeta bi kerb e
16. Ya rebbî bi zatê xwe qesem kê
Hasil bikê meqsedê qelem kê
17. Lê îro ji dest fîraqa rûreş
Ez dûrî kirim ji wê gula geş
18. Ez bûme kezebkul û birînkûr
Lew nav û dilê me bûne tennûr
19. 'Îşqa di dilê me de wek agir
Bayê seherê lê da nema kir
20. Wek mewcê di behra qîlzemê da
Hinga evîna dilê Memê da
21. Narê di fîraqê dil kirî ker
Sed carî eman ji dest birader
22. Dil bûye cihê kul û xem û derd
Zer bûye bizan wekî bih û werd
23. Her çî kû nexweş divîn şîfayê
Lê ez ji xwe re divim nemayê
24. Hubba te hebibê her disojê
Nava hemî 'aşîqê te rojê
25. Ew roja cîhanê ye di dehrê
Lewre kû Zuleyxa ye di Misrê
[r. 183]
26. Es'id ya hebibî bişşeref lî

Binnezretî min 'izarî ġalî⁶³¹

27. Weşfinî hebibî ya muradî
Ya nûra 'uyûnî bel sîwadî⁶³²

28. Summe ev Muḥemmed Sîrac ê dîn e
Xemxwarê te ye kû dilbirîn e

29. Merheb ji te re du sed hezar car
Qurbanê te bim sebah û êvar

-141-⁶³³

Mefa 'ilun fe 'ûlun mefa 'ilun fe 'ûlun
Hezec · - - - / · - - - / · - - - / · - - -

أَسْكَانَ بَدَاءَ الْجَزِيرَةِ تَيَقَّنُوا
بَأَنْكُمْ فِي خَاطِرِي مَتَوَطَّن⁶³⁴

وَأَنِّي فِي نَارِ الْحَبِّ ذِي كَبَدٍ مُحَرَّقٌ
وَفِي مَوْجِ بَحْرِ الْعَبْدِ ذِي جَسَدٍ مَغْرَقٌ⁶³⁵

وَأَنْتُمْ بَعِيدٌ مِنِّي بِرُؤْيَا الْعَيْنِ
وَبِالْجِسْمِ وَالذَّاتِ فَذَاكَ بِأَمْرَيْنِ⁶³⁶

وَأَمَّا فَحَاضِرُ بَذِي الْفِكْرِ وَالْخَطَرِ
وَأَبَيْتُ فِي أَنْوَارِكُمْ مِثْلِي فِي الْبَدْرِ⁶³⁷

وَمَا لِي رَجَاءُ مِنْكُمْ غَيْرَ أَنَّنِي
دَامَ اللَّيَالِي ذَكَرَ ذَا الْحَلَمِ جَنَنِي⁶³⁸

فِيَا لَيْتَ بَعْدَ الْعَبْدِ الْوَصْلَ بَيْنَنَا
وَالْقَاءَ ذِي الْكَرْبِ وَتَفْرِيحَ قَلْبِنَا⁶³⁹

وَأَبْقِنَ بِأَنِّي ذُو عَهْدٍ مَعْقَدٍ
وَفِي ذِكْرِكُمْ فِي كُلِّ يَوْمٍ مَعْهَدٍ⁶⁴⁰

⁶³¹ Ey hebibê min bextewar bibe ji bo min/Bi wan biskên biha û biqedir.

⁶³² Tu min şîfa bike ey dostê min ey mirada min/Ey nûra çavê min heta tu ronîya çavê min î.

⁶³³ Ev Ev helbest bi Erebi ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nîşan daye.

⁶³⁴ Ey ew kesên ku li deşta Cizîrê disekinîn bawer bikin ku/We di xatirê min de wetenê xwe çêkiriye.

⁶³⁵ Ez di agirê eşqê de xwedî kezebeke şewitandî me/Di pêlên behra dûrbûna te de ez xwedî cesedekî xeniqî me.

⁶³⁶ Hûn dîr in ji min bi dîtina çavan/Bi laşê xwe û zatê xwe jî dîr î.

⁶³⁷ Emma tu hazir î di fikr û xatirê min de nêzik î/Di nava nûra we de wekî ku ez di nava ronahiya heyvê de bim.

⁶³⁸ Ji min re tu hêviyên min nîn e ji xeynî vê/Ku hûn di aqil û xeyala min de ne biranîna we ez dîn kirime.

⁶³⁹ Xwezî piştî vê dûrbûnê wesil çêbûbana/Min ew kerb avêtbana û dilê min xweş bûbana.

⁶⁴⁰ Bawer bikin ku min soza saxlem bi we daye/Ji bo ku hûn her roj di bîra min de bin, min soz daye.

و إني حفيظ لمحبة محبوبي
و كاتم سر من حسادي و مطلوب⁶⁴¹

فمتى م تبعد عني يا ساكن القلب
و يا نور عين سال دمعي عاي الهدب⁶⁴²

و حبك دهر ا طال لحظي مرمداً
و قلبي حزيناً و اليدان موصداً⁶⁴³

و بعد سراج مخرق من شهابكم
و الملهوف حال ذاك بعد نوآنكم⁶⁴⁴

-142-⁶⁴⁵

Mefa 'ilun fe 'ûhun mefa 'ilun fe 'ûhun

Hezec · - - - / · - - / · - - - / · - -

لقد قال أحابي عجبنا لحبك
ألم يك فينا الطبي أم أنت جاهل⁶⁴⁶
[r. 184]

فاختر بما ترضى و ما تبتغي منا
فأنا نجب دعوتك بل نحن عامل⁶⁴⁷

فقلت لهم خلوا فاني ببليّة
لشدتها تصفر منها الأنامل⁶⁴⁸

ألم تعلموا أني عشقت بمن إذا
بدت تفتن من حسننها القبائل⁶⁴⁹

ألم تسمعوا شعب الفناء مرارة
و ورد خلال الشوك يجني الهراق⁶⁵⁰

فلا تكثر اللوم علي فإنكم

⁶⁴¹ Ji bo ku ez evîna mehbûba xwe muhazeze bikim, soz daye min/Û ez veşêrim siren me ji hasid û xwazginiyên min.

⁶⁴² Heta kengî tê dûr bikevî ey ew kesên ku di dilê min/Ey nûra çavên min hêstirên min herikîne ser mijgulên min.

⁶⁴³ Eşqa te her wextî dirêj bûye û fikra min nexweş kiriye/Qelbê min xemgîn e û her du destên min girêdayî ne.

⁶⁴⁴ Piştî jî **Sîrac** ji pizotên agirê we şewitiye/Û hale wî jî xemgîn e ev jî piştî dûrketina we.

⁶⁴⁵ Ev helbest bi Erebi ye. Me Kurdiya wê di jêrenotan de nîşan daye.

⁶⁴⁶ Dostên min gotine em ji hubba te ecêbmayî mane/Ma qey di nava me de jî xezal nîn in an tu cahil î.

⁶⁴⁷ Tiştê ku tu pê razî bî ji xwe re bigre û tiştê ku tu teleb jî dike ji me bigire/Em ê du'aya te qebûl bikin, belê qetî emê bikin.

⁶⁴⁸ Min go xwe ji min dûr bikin ez di belayekê de me/Jî zorbûna wê îmtîhanê teliyên min zer bûne.

⁶⁴⁹ Qey hûn nizanin ku ez aşiq bûme bi wê kesa ku/Wextê xuya bike ji eşqa wê qebile dikevî nava fitneyê de.

⁶⁵⁰ Qey we xwe bernedaye kûrahiya fenayê/Di pey striya de insanên mezin gula diçînin.

إذا صرتم مثلي لظلمت مفاصل⁶⁵¹

كذا قدر الرحمن من يوم أول
إلى آخر العمر صبور و حامل⁶⁵²

فحمدي لربي و الصلاة لأحمدا
و كربي لمن قد قال إنني عادل⁶⁵³

و قبل و بعد ثم حالاً وحاضراً
سلامي على المحبوب ما قال قائل⁶⁵⁴

فسين و جيم يا حبيبي بودك
مدى الدهر ملهوف و للوصل سائل⁶⁵⁵

-143-

Li meqamê şera hatiye gotin
Xeber bi zêr bikir û binêr⁶⁵⁶

Bîsmîllahîrreḥmanîrreḥîm

1. Hemd û medh û sena û şukr û pesnê mezin ji Xwedê re
Ew xwedayê insan xuluqandî ji yek nuqta avê 'eql û mîjî pêre
Hinek kirine musteḥeqê agirê şedîd bi hukmê 'edaletê çî jin û çî mêr e
Bi fezl û keremê da hinkan ew bihişt a xwe ya qesrê ewê hin ji zîv û hin ji zêr
e
Selat û selam bi qasî çiqas tiştê heyî ê çêbibê di nebiyê êxir dewrê re
Di gel al û eşhabiya sê behrê ji ehlê malê re
[r. 185]
Xwedayê mezin me bidê xatirê ewan wan bikê mehderçî û rêzan ji bo
musulman û xelqê re
Bi rehm û keremê me jî b'wa re derbas bikê di ser pira cehnemê re
Nebîyy û hogir û hevala bikin qesr û baxê cennetê em jî pêre
De lo lo delal de lo lo delal delolo delal gunhê me pur in xêrê me kanîn
2. Lolo delal were guhê xwe bide li ser vê gotinê vê we'zê vê şîretê vê qîssetê
Di guhê xwe bigre qewîtiyê vê tenbihê emantî vê 'îbretê vê hîkmetê
Guhekî xwe neke serad yekî neke bêjing lê paşî tê bibînê poşmanî û nedametê
Paşî poşmaniya te feyde nakê xwelîsero bike teqwatiya rebbê 'îzzetê
Emrê wî pêk bêne bêemriya wî neke her û her jê bixwaze şefqet û merḥemetê

⁶⁵¹ Gelekî lewma li min nekin lewra hûn/Wextê weke min bibin hûnê bibin perçe perçe.

⁶⁵² Bi vê qaideyê xudê roja ewil ev teqdîr kiriye/Heta dawiya emir em ê sebrê bikin û hilgirin.

⁶⁵³ Hemd ji Xudayê min re ye selat ji bo Ehmed in/Eşqa min jî ji wan kesên ku dibêjin ez lewmekekar im re ye.

⁶⁵⁴ Ji pêş û paş ve û di halê hazir de/Selama min li ser mehbûba min be heta ku insan bi axivîn.

⁶⁵⁵ Sîn û Cîm bi hezjêkirina te heta hetayê/Xemgîn e û weslê ji te dixwaze.

⁶⁵⁶ Ev her du hevok ji aliyê helbestvan ve hatine nivîsandin.

De hêvî he ye bi rehîma xwe ya gelek min û te ebdalê Xwedê bidê xatirê
nebiyyê ummetê

Di heşr û neşra giran de li me nekê barê giran zêdeyî quwwetê zêdeyî taqetê
Bi rehetîyî û sehlê gunhê me tev de 'efû bikê me tev de bixê qesr û bagê
cennetê

Lêbelê quwweta me nîn e li ser 'ezabê cehennemê weyla cehennemê agirê
Xwedê bi te ketê

De lo lo delal de lo lo delal delolo delal gunhê me pur in xêrê me kanîn

3. De gelî bira çî qewmî li me îro çî cîriya çilo çêbû ev çawa bû
Huş û sewdanê me heliya 'eql û mejî di serê me de xilas bû yan wunda bû
Ev xewa gefletê çîqa li me dom kir hişyariya me qet û qet nemabû
Xwedayê mezin ev dunya ha ava kir Ademî ji axa wêna dabû
[r. 186]

Ê weke Nebî Nûh û Nebî Suleyman Îskenderê Zulqerneyn tê de rabû
Heta serok û serwer pêxembera ew jî ji ber çavê me ket û kû cuda bû
Rebeno pepûko 'evdalo êsîro goyîno qiriko zemanê me bûrî axrê zemên li me
rabû

Eva -7593- heft hezar û pênc sed û not û sê sal e ji tarîxa hubûta Adem li me
rabû

Emê ketine heftê û heftê qernê çardehê temarî bi çava keto nûka tê kara xewê
dikê ev çawa bû

De lo lo delal de lo lo delal delolo delal gunhê me pur in xêrê me kanîn

4. Rûhê me qurbano rabe ji xewa geflet û bêhişiyê nebe 'eqilsiz û serîvala
Weke kewê ribat bisekne li kozikê nobeta xwe bigre ji ber dijminê di newala
Xurxur û qeqqeba xwe bike bike zîkrê rebbê 'alemê Xwedayê mezin heq
te'ala

Pîstemêrê te xwert e hebîbê Xwedê ye hewarê bigihênê di her hala
Lêbelê di girtina kewê temayîya dinê de nebe wek parsek û wek 'ebdala
Eger kû tû yek gavê zêde herê tê bikevê davê nefis û şeytên de wê te dine ber
çingala

Li meydana guneha weke goka destê zaroka wê te dine ber şeka ber kaş û ber
kopala

Ewê te bi çola delaletê bixin te qut bikin ji ehl û dost û yar û ji hevala
Piçek malê te yê îmanê jî hebê ewê ji te bistênin kine yeğme te hêlin vala
De lo lo delal de lo lo delal delolo delal gunhê me pur in xêrê me kanîn

5. Ez ê bi heyrana te bim tê neçê xeta Sûrî ya bêşerî'etê ticareta kavirê guneha
nekê bi temayî

Gumruka melaîketê xêr û guneha bumbe û temetîkên di rêya te de kemîna
xwe vedayî

[r. 187]

Girtin he ye kuştin he ye talaniya xêrê te he ye ewê lê hêjayî

Çîqa feyda te kirî bi yek carê wê ji te xîç bikin weke kaya li ber bê berdayî

Tê îdî bibê poşman tê bêjê weyla li mi xwelîserî kul û mitalê heft salê di dilê
me de mayî

De çawa min ê helal malê xwe yê xêra bi derda li ser tiştê ne hêjayî

Na wellah eger te bigrin bi mirinê wê te kine nezareta tîrbê hê îfada xwe nedayî
 Heta mehkema qiyametê rûnê wê mehkema te deynin wê derêxin wê mezbeta girêdayî
 Rast û durust e bixwênin te teslîmî erdiyanê zebaniya bikin te bixine hebsa cehnema deriyê dadayî
 De lo lo delal de lo lo delal delolo delal gunhê me pur in xêrê me kanîn

6. Tê herê nik wan dost û hevalê neqenc ewê bêjin gelo curm û cezayê te çi bû
 Tê bêjê mi jî weke we bêmriya dewleta Xwedê kir cezayê mi jî wek yê we bû
 De heger ji nû ewraqê te ji temyîza banî hatin yan bi fezlê bera'et bû
 Yan bi 'edaletê 'idam bû tê hingî heta hetayê tê de bimênê xwelî li serê te bû
 Yan eger cezakek dane te qederê çend sala bi te xweş e weke nûka ji diya xwe bû
 Nûka hişê te wê bê serê te tê bibêjê xwelîsero eva hanê çi hewce bû
 Wekî wilo ye de naxwe hema niha neke gunehan da paşî tû nebêjê weyl li me weyl li me bû
 Ez ê hingî bêjime te ma gelo eva henê me ji te re negot tê bêjê belê wellah we bû
 Rehma Xwedê li ser me bê di dunya û axretê şelat û selam li hebîbê Medîne bû
 De lo lo delal de lo lo delal delolo delal gunhê me pur in xêrê me kanîn
 [r. 188]
7. Wekî ku dîzanê rêya Sûrî ya guneha ne rêya kurrê bava ye ne rêya insana
 Tû cara pêde neçe gelek tê de fena bûne ji 'egîd û ji betl û ji berx û ji berana
 Eger piçek rast e malê te he ye di bajarê dunyayyê di sûka axretê de veke yek dikana
 Bibe ticarekî biqerne û wesîqe bi serbestî yan bibe şefar û hêdad wekî wana
 Du qurûşê serbestiya xêra çêtir in ji te re ji mîlyonê gunehê zêr û perana
 Di dikana xwe de rûne lingekî deyne li ser yekî kumê xwe xwehr ke wek hâkim û wek siltana
 Cuzdana îmanê bike berîka qelbê xwe de kumê ta'etê deyne ser serê xwe qet netirse ji korşeytana
 Bikeve treyna qeza û qederê bigere li çîqa ehwalê bajar û şaristana
 Pepûko yek deqîqe serbestî xweştir e ji hezar salê 'eşîrtiyê û berberiya du gundana
 De lo lo delal de lo lo delal delolo delal gunhê me pur in xêrê me kanîn
8. Delalê dilê mino bila tîrsa te bêhtir bê ji tîrsa tîyrekî çolê emanetî min li te bê
 Lêbelê şeytanê korî le'netî di rêya te de xefik û davikê xwe vedane li ber neqebê
 Ji çîqqa texlîta hebik tê de danîne hebikê wî rengîn e wek naylon û şîfonê Heleb'ê
 Geh genimê tematiyê û hirsê geh cehê fesad û fitnê daniye tê de hayê te jê hebê
 Geh birincê bitr û kubariyê nokê kîn û buğzê şolîkê serxweşiyê nîskê hesûdiyê wê tê de bê

Garisê şehwetê paçîkê emelê hemû jehrî kirine jehra suleymânî ne nêzîk nebê
Meyzêne li refê qîtik û kewan çiqqa kesê jê xwarî nefelîtî dideribê
Eva tê bi xwe dibînê ne hewce ye ji te re bêjim gazin û lewma te hingî bilanê
ji te bê

[r. 189]

Weke Îblîs û Bersîs û Fir'ewn û Qarûn xweliya tepikê deştiya li serê wan
bibê

De lo lo delal de lo lo delal delolo delal gunhê me pur in xêrê me kanîn

9. Çavê mino rabe ser xwe xewa sibeħa xortaniyê li te nayê şuxulkerê xwey û
‘ezîzê dilê xelqêyo

Devdaw û devzendkê hîmmeta xwe kurt ke di berya sinceqa xêra de bike
rêncberiya wê dinêyo

Cotê qantirê nefsa xwe girêde nîr û kilavê teqwayê bişidîne weke qeydêyo

Halet û gêsînê e‘za û cewariħa li pey berde di ‘erda xizmeta Xwudêyo

Hevsarê ‘edaleta nefsê bigire bi qamçiyê tirsê bajo nedyê muhletêyo

Xetta rêza şerî‘etê tû rast bike seda xwe bibe sêrî heta mirinêyo

Şûva ‘emelê xwe aşêv bike ji tuxmê tehlî û quncur û guhbelka guneh û
giyêyo

Ûovê îtaliyê niyyetê bi destê tewekkula xalis bireşêne piştî bê neqandin bi
bêjînga îxlasê ji zîwana rûmet û ‘ucbêyo

Ma vêce tû nizanê kû bendera mêzîna xêra wê giran bê weke heft tebeqê
‘ezman û ‘erdêyo

De lo lo delal de lo lo delal delolo delal gunhê me pur in xêrê me kanîn

10. Xwedê zanê kesê guhê xwe bidê van şîreta van we‘z û nesîhet û qewîtiya
Xeberek bi zêr e bikir û binêre mutî‘ be ji Xwedê re tê bibînê xêr û bêra wekî
çiya

Nebe bêhiş û gêj û weke kerê guhdirêj qelb û dil biqirêj dikê qîjeqîj di nava
mêrg û giya

Qet naxwazê gula geş mitala wê her kerbeş kezeba xwe kire reş bêhişê xwe
dikê meş ne ‘eqle ne mejiya

Bibe weke xezalê neke qehr û mitalê bigere di çol û newalê ji vê dê heta
berriya Şîngalê bi serbestiya

Ji dunyayê qet hez neke keyf û lezzetê tê de meke axreta xwe jibîr meke dinê
jêre wek hewaye

[r. 190]

Yek cêrî ye yek xatûn e yek nîsan e yek kanûn e yek zengîn e yek zenûn e te
li kîjanê dil ketiya

Xwedê zanê kesê vê zanê bê piçek mîjî di kuloxê wî de hebê yar û dostik wî
axret bê dinê jêre wê kole bê bi cêriya

Belê kesê hej dinê kê cêriyê bigrê xatûnê bi rê kê cêrî bê‘esl e wê bêbextiyê
lê kê du cara xwelî lê bû ji her duwan xusuriye

De lo lo delal de lo lo delal delolo delal gunhê me pur in xêrê me kanîn

11. Ya îlahî wa Xudayo wa mezîno wa hêjayo wa geffarê gunehayo tû vê du‘am
qebûl bikê

Tû b'hurmeta nebbiyyê Emîn tû b' 'erş û eflakê qewîn tû b'heqqê ayatê mubîn
tû b'lewh û mehfûza xwe kê

Tû b' 'izzet û celaletê bi qudret û weradetê bi kerem û 'edaletê bi re'fet û
rehma xwe kê

Sîrac du'a kir bidiyê li vê dinê zahidiyê di emrê xwe de 'abidiyê bi axretê
'emîdiyê ji ehlê xwe kê

Tû 'eqlê wî bike emîr zîkrê xwe her bîne li bîr nefsa ewî bike esîr ji şeytana
bike jîr tû bi heqqê esmayê xwe kê

Li vê dinê xweşkatî li wê dinê rehetî ji cehnemê emîntî ya îlahî tû bidyê tû bi
xwe kê

Bid xatirê pêxembera di gel da û bav û bira musulmanê limêjkera hemî 'ebdê
tev ji te re wana di ber 'efwa xwe kê

Bêhed şelat di gel selam bi teşrîf û bi îxtîram bide li ser qencê enam bi wê bid
me husnû'l-xîtam tû bi heqqê qurana xwe kê

Di gel al û eşhabiya gel nebî û gel weliya muhacir û enşariya

Çi haşimî û qureşîya çi 'ecem û hebeşîya tû b'not û neh navê xwe kê

De lo lo delal de lo lo delal delolo delal gunhê me pur in xêrê me kanîn

Temmet we ela nazimîha

Katibîha rehme

Amîn

ENCAM

Mela Sîraceddînê Xelîlî di sedsala 20an de jiyana xwe derbas kiriye. Xelîlî bi berhemên xwe û bi taybetî jî bi dîwana xwe ya giranbiha (Gulcivîn), di dîroka Edebiyata Kurdî de cihekî girîng girtiye. Em bawer dikin ku dîwana wî di nava gelê Kurd de baş were naskirin, qedrê wî yê di Edebiyata Kurdî de jî wê bilindtir bibe.

Mela Sîraceddînê Xelîlî perwerdehiyeke baş standiye. Pêşî li cem birayê xwe Şêx Beşîr xwendiyê. Di sala 1945an de çûye Amûdê. Li Amûdê li cem mala Şêx Ehmedê Kesk xwendina xwe domandiye. Piştê çûye Qamîşlo û li wê derê li cem Mela Ehmedê Zivingî xwendiyê. Mela Ehmedê Zivingî miftîtiya Qamîşlo kiriye û alimekî hêja bûye. Ji wê derê çûye Eleqemşê. Li wir li cem birayê xwe Şêx M. Beşîr maye. Ji xeynî zimanê Kurdî, bi Tirkî, Erebi û Farisî dizanîbû. Jixwe bi van her sê zimanan jî di dîwana xwe de helbest nivîsîne. Mela Sîraceddînê Xelîlî di dema Komara Tirkîyê ya herî zor û zehmet de jiyana xwe derbas kiriye. Di vî zemanê zehmet de dîwana xwe afirandiye. Dîwana wî ji her aliyê ve serbilind e. Ji aliyê zimên ve pir jêhatî ye û îmkânên zimanê Kurdî bi hostayî bi kar anîne. Di dîwana xwe de hem cih daye devoka Torê û hem jî ya Cizîrê. Zimanê wî pir zelal e.

Mela Sîraceddînê Xelîlî jî yek ji wan helbestvanan e ku pir li ser xebat nehatine kirin. Îro gelek hemsal û hemdemên wî hê jî li jiyana ne. Lêbelê ew bi xwe jî û berhemên wî jî baş nayên naskirin.

Di vê xebata xwe de me armanc kiribû ku em dîwana (Gulcivîn) Mela Sîraceddînê Xelîlî bidin naskirin û pêşkêşî bazara Edebiyata Kurdî bikin. Di roja me de xebat û lêkolînkirina li ser Ziman û Edebiyata Kurdî pir bi zehmet e. Wekî Ehmedê Xanî gotî “*Çib'kim ku qewî kesad e bazar/Nîn in jî qumaşî xerîdar.*”⁶⁵⁷ Ji ber vê yekê lêkolînên li ser Edebiyata Kurdî carinan qels dimînin. Lêbelê tevî hemî astengan jî bi piranî me ev armanca xwe anî cih. Di destpêkê de me dîwan latîniye kir û piştê jî me edîsyon krîtîka wê kir. Bi vê xebatê berhema Mela Sîraceddîn ya herî berfireh derdikeve pêşberî xwendevanên xwe.

Ji bo Edebiyata Kurdî xebatên kûr û dûr lazim in. Divê her Kurdek ji xwe re bike wezîfe ku birîneke Zimanê Kurdî derman bike. Ji ber vê yekê kî çiqas xebatên hûr û gir bike û berhemekê bîne holê an jî derxe meydana, ev ji bo Edebiyata Kurdî serfiraziyek e. Me jî xwest ku em Mela Sîraceddînê Xelîlî û dîwana wî ya bi navê “Gulcivîn” bidin naskirin. Belê bi tîpên ‘Erebî ev berhem hatiye çapkirin lê hemî Kurd nizanin bi tîpên ‘Erebî bixwînin. Wekî din jiyana helbestvan jî baş nayê zanîn û mixabin di derheqê vê de jî pir çavkanî nîn in. Me jî kurê wî Mehmet Wehbî Ataç, birayê wî Mela Abdullah Ataç û derdora wî jiyana wî berhev kir. Em hêvî dikin ev berhem bibe pêlik û çavkanî ji bo hinek xebat û xebatkarên li pey me werin.

⁶⁵⁷ M. E. Bozarslan, Mem û Zîn Ehmedê Xanî, Gün Yayınları, İstanbul, 1968, r. 62.

ÇAVKANÎ

Pirtûk

McDowal Dawid, *Modern Kürt Tarihi*, Doruk Yayıncılık, Ankara, 2004.

Bingöl Abdulkadir, *Kulîlkên Baxê Botan*, Weşanên Enstituya Kurdî, Amed, 2008.

Doskî Tehsîn Îbrahîm, *Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî*, Çapxaneya Zankoya Selaheddîn, Hewlêr, 2014.

Tan Altan, *Turabîbin 'den Berriyê 'ye*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2015.

Ataç M. Sıddik, *Kitaba Durra Birincî Mewlûda Kurmancî*, Renk Ofset, Nusaybin 2001.

Acar Hayrullah, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2016.

Zivingî Mela Ehmedê, *Gerdeniya Gewherî, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, weşanên Avestayê, Stenbol, 2013.

Saraç M. A. Yekta, *Eski Türk Edebiyatına Giriş: Biçim ve Ölçü*, Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir, 2011.

Adak Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul, 2014.

Van Bruinessen Martin, *Ağa, Şeyh, Devlet*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2011.

Kaya Zeynelabidin, *Melayê Cizîrî-Dîwan*, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1987.

Tunç Osman, Selman Dilovan, *Melayê Cizîrî-Dîwan*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2010.

Esgerov Şamil, Mehmet Kaplan, Huseyn Şemrexî, Mem û Zîn Ehmedê Xanî, Nûbihar, İstanbul, 2015.

Qasimlo Abdurehman, *Kurdistan û Kurd, Lêkolînek Siyasî û Aborî*, JN Weşanên Jîna Nû, ç. 1, Îlon, 1991, r. 88.

V. Minorsky, Th. Bois D.N. Mac Kenzie, *Kürtler ve Kürdistan*, Weşanên Dozê, ç. 2., 1996, Stenbol.

Cizîrî Şerefhan, *Omeriya Mirsom*, Weşanên MAR-HASê, Mêrdîn, 2009.

Veroj Seîd, *Geşepêdanên Rojhelata Navîn, Sûrye û Kurdistanê Rojava*, Weşanên Doz, Ç. 1, 2012, Stenbol.

Bilgegil, M. Kaya, Edebiyat bilgi ve teorileri, Enderun Kitabevi, İstanbul, 1989.

Bozarslan, M. E., Mem û Zîn Ehmedê Xanî, Gün Yayınları, İstanbul, 1968.

Savcı İlyas, Dargeçit Kültür ve Mimarisi/Çand û Avahîsaziya Kerboranê, Îmleç Kitap, İst. 2012.

Gümüş Nezir, Jîyan û Mewlûda Mela Sîraceddînê Xelîlî, Projeya Lîsansa Bilind, Mêrdîn, 2017.

Develioğlu Ferit, *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lugat*, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, 1995.

Akalın Şükrü Haluk, *Türkçe Sözlük*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 2011.

Pala İskender, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları, İstanbul, 2011.

Ucaman Abdurrahman, *Ferhenga Etîmolojya Zimanê Kurdî*, Weşanên Bîr, Diyarbakir, 2008.

İpekten Haluk, Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz, Dergah Yayınları, İstanbul, 2002.

Gotar

Adak Abdurrahman, “Dergahê şêx seyda” *Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre*, (ed. M. Nesim Doru), Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2012.

Adak Abdurrahman, “Serdema Xalidîtiyê Di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîk de” **Kürt Tarihi**, hijmar 30, İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları, İstanbul, 2017.

Hawar, j.9, 30 Îlon, Şam 1932.

Berhemên Destnivîs

Xelîlî, Mela Sîraceddîn, *Kîtaba Gulcivîn*, nusxeya destnivîs, istisnax: 1999.

Xelîlî, Mela Sîraceddîn, *Dîwana Melayê Cizîrî*, nusxeya destnivîs, istisnax: 1952.

Hevpeyvîn

Ataç Abdullah, Birayê Mela Sîraceddînê Xelîlî yê piçûk, Tebax 2017, (Kerboran/Dargeçit).

Ataç M. Wehbî, kurê Mela Sîraceddînê Xelîlî, cotmeh, 2017 (Diyarbakir).

Ataç Mela Seîd, Biraziyê Mela Sîraceddînê Xelîlî, Adar, 2018, (Dîlok/Gaziantep).

Karaca Kasım, gundiyê wî û mamosteyê edebiyata Tirkî, (Dîlok/Gaziantep).

Adak Doç. Dr. Abdurrahman, Serokê Beşa Kurdî ya Zanîngeha Mardin Artukluyê, Temûz, 2018, (Mêrdîn).


Deniz Adnan, Kanûna Pêşî, 2017, Mêrdîn.

Doskî Tehsîn Îbrahîm, Hezîran, 2018, bi rêya telefonê.

Babûr Tahir, Gundiyê Mela Sîraceddînê Xelîlî, Hezîran, 2018, (Batman).

PÊVEK

Pêvek 1: Sûretê Mela Sîraceddînê Xelîlî (1)



Pêvek 2: Sûretê Mela Sîraceddînê Xelîlî (2)



Pêvek 3: Sûretê Kêla tirba Mela Sîraceddînê Xelîlî





Pêvek 4: Sûretê tirba Mela Sîraceddînê Xelîlî (1)




Pêvek 5: Sûretê tirba Mela Sîraceddînê Xelîlî (2)














Pêvek 10: NUSXEYA DESTXET ya Mewlûda Mela Sîrac (MUSTENSIX: Mela Sîrac)












Pêvek 16: NUSXEYA DESTXET YA Dîwana Melayê Cizîrî (MUSTENSIX: Mela Sîrac)



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Yüksek Lisans Tezi

**MELA SÎRACEDDÎNÊ XELÎLÎ’NİN DÎVANI
(GULCIVÎN)
-METİN ve İNCELEME-**

Nezir GÜMÜŞ

11711011

Danışman

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mardin 2019